

# ZAREMA

Kovara Rexne û Teoriye



# KUNYE

## ZAREMA

Kovara Çarmehane ya Rexne û Teoriyê

**Hejmar:** 10

**ISSN:** 2148-4392

Gulan, Pûşber, Tîrmeh, Tabax - 2017

**Xwediya kovarê:** Fahriye Adsay

**Edîtor:** Fexriya Adsay, Mihemed Şarman

**Berpirsiyarên kinbeşan:** Kübra Sağır

**Serastkirin:** Yusuf Eldemir

**Berg û Sêwirandin:** Aysel Kazıcı Özalp (Şemal Medya)

**Helbesta Bergê:** Şêx Ubeydulahê Nehrî, Mesnewî, Weşanên Nûbihar; Werger: İbrahim Sunkur. (Wê ji Weşanên Nûbiharê derkeve)

**Wêneyê Bergê:** Mohra Şêx Ubeydulah, Kovara Kürt Tarihi

**Têbînî:** Mafê çapkirina gotaran li gor biryara lijneya weşanê ye. Lê nivîskar ji naveroka nivîsên xwe berpirsiyar in. Bi şertê ku çavkanî bê diyarkirin jêgirtina ji kovarê serbest e.

**Çapxane:** A GRAFİK

Diclekent Bulvarı Nil Koleji Şeker Apt.altı KAYAPINAR/DİYARBAKIR tel: 0412 237 27 07  
zulkufaltindag@gmail.com

**Şertên Abonetiyê:** Li bakurê Kurdistanê û li Tirkîyeyê ji bo salekê: 45 tl; li deverên din:  
20 Euro

**Hesab No:** Fahriye Adsay, 1150-35863917 5002 Ziraat Bankası/Ofis Şubesi – Diyarbakır

**Iban:** TR190001001150358639175002 (BIC code / Swift code TCZBTR2A)

**Navnîşan:** Öztaş Sitesi, 252. Ada, BO-7 Blok, No: 9 Şilbe Toplukonutları/Diyarbakır

Tel: (0505) 527 92 17- 0507 313 08 12

[www.facebook.com/kovarazarema](http://www.facebook.com/kovarazarema)

[www.twitter.com/kovarazarema](http://www.twitter.com/kovarazarema)

[zaremakurd@gmail.com](mailto:zaremakurd@gmail.com)

هه و النامه  
کتاب

---

---

---

# NAVEROK

---

---

---

**KAMAL SOLEIMANI:** Vejîneriya Îslamî û Neteweperweriya Kurd di Dîwana Şêx ‘Ubeydulah de / 4

**KAMAL SOLEIMANI:** Hizra Islamî ya Siyasî ya Modern, “Islamîti” û Neteweperwerî / 22

**ŞARO I. GARÎP:** Li Hemberî Notirvanên Neteweyê Notirvanên Nerîte / 38

**HEVPEYVÎN ligel FUAD ÖNEN:** Yekitiya Kurdan û ya Partiyên Kurdan ji Hev Cuda ne / 49

**HEVPEYVÎN ligel BARZOO ELIASSI:** Ger Tu Dewletê Nexwazî, Ewçax Tu Nikarî Şidetê Pawan Bikî / 56

**BEXTIYAR SECADÎ:** Zimanê Kurdî û Derhişê Subjeyê / 59

**AZÎZ TEKÎN:** Di Romana *Gundikê Dono De Wek “Êdin”* Temsîliyeta Tirkan / 66

**NURDAN ŞARMAN:** Em, Ew û Dodan / 75

**KHOSRO SINA:** Dahûraneke Pêkhatayên Baxtîn di Pêşandana Mîr Newrozî de li ser Bingeha Têgîna Karnawalê / 80

**HEVPEYVÎN ligel STRANBÊJ ERCAN BÎNGÖL:** “Ron”, Ev Album Divê Neyê Paşguhkirin / 94

**FERZAN ŞÊR:** *Pêşîrên Dayê* û Zilamekî Berşîr / 103

**BÎLAL ATA AKTAŞ:** Kuştina Ciwanekî: Aaron Swartz / 112

## **PIRTÛK NIRXANDIN**

**MIHEMED ŞARMAN:** Pirtûkeke sereke: Mehrdad R. Izady, *Kürtler* / 117

**ÎLKNUR BÎLÎR:** Mekanê Temsîla Rasteqîniyê: Sînemaya Dokumanter a Kurdî li Tirkiyeyê / 119

**ABSTRACTS** / 123

**KURTEJİYANA NIVÎSKARAN** / 127

**KINBEŞ** / 130

# Vejîneriya Îslamî û Neteweperweriya Kurd di Dîwana Şêx 'Ubeydullah de

KAMAL SOLEIMANI

Ji Îng: FEXRIYA ADSAY

**Puxte:** Ev nivîs lêkolînek e li ser bîr û bernameya Şêx 'Ubeydullahê Nehrî ya vejîneriya dînî û kurdî bi rêya tehlîlkirina berhema wî ya bi navê *Mesnewî*. Nivîsar bi taybetî dikeve dû têngiştina têkilbûna hizrên vejîna îslamî û neteweperweriya kurdî di şî'rên Şêx 'Ubeydullah de. Xwendineke hûrbînane ya *Mesnewiyê* tu şikekê tê de nahêle ku li gor nivîskarê wê berhemê, hem paşeroja kurdan û hem jî bernameya wî ya vejîna îslamî bi damezrandina dewleteke serbixwe ya kurdî ve girêdayî bûn.

**Peyvên sereke:** Kurd, osmanî, îslam, neteweperweriya dînî, dewlet

## Hilatina Şêx 'Ubeydullah û hêvîşikestina wî ya ji osmaniyan

Ev gotar armanc dike neteweperweriya dînî ya Şêx 'Ubeydullahê Nehrî ronî bike bi riya xwendineke hûrbînane ya *Mesnewiyê*, berhema wî ya helbestî ya nekişifkirî.<sup>1</sup> Yek ji taybetmendiyên girîngtirîn a serhildana Şêx xwe-cudakirina kolektîf bû ku dibû nîşaneyê hilatina diyardeyeke nû ya civakî-dîrokî di Rojhilata Navîn a modern de. Ji bilî Wadie Jwaideh (2006), bi gelemperî lêkolînerên neteweperweriya kurdî di ser xwe-cudakirina kurdî-dînî ya Şêx re gav kirine. Lê ev meyla di bizava Şêx de

1 Ger bereksê wê nehatibe diyarkirin, hemû wergerên di vê gotarê de aîdi min in.

---

---

---

---

---

---

girîngtirîn hoker e ku ew wek bizaveke dînî neteweperwer berbiçav kiriye. Ji ber vê, ev gotar hewlek e bo nîşandana ka bê Şêx kurd û êdinên wan çawa tarîf kirine û çawa bendên dînî yên di navbera kurd û ne-kurdan bêqîmet kirine. Tam ew tebeqebûna dîndariya gel ku xwe dispêre etnîsîteya wan, (li gor Şêx) têkilbûna dîn û etno-neteweperweriyê, ku di şîroveya wan a îslamê de cudatiya di navbera perîferî û navendê vedibeyîne, kişif dike. Niha, yekûneke girîng a lêkolîneriya ku hilatina Nehrî ya 1880an de bi belge dikin heye. Lê, ji xeynî çend nameyan, berhemên din î Şêx, wek mînak *Mesnewî* ne li ber destê ew kesan bûn ku berê li ser raperîna wî xebitîne. Sedema balnedayîna *Mesnewiyê* bi qismî ji ber neliberdestbûna wê bû. Ew bi awayê destxet belav bûye û tenê li ber destê meriv û pêgirtiyên Şêx hebû. Bi farisî hatibû nivîsandin ku ev ziman pir ihtimal e astengeke girîng bû bo merivên nêz ên Şêx ên ji nîfşên nû ku li aliyê Kurdistanê yê li Tirkiyeyê dijiyan. Wekî din, ji bilî xebata dîrokzan Sabri Ateş, piraniya lêkolînerên heyî li ser belgeyên ne-farisî yên derbarê serhildana Şêx hûr dibin. Ji ber vê sedemê, *Mesnewî* wek destxet ji aliyê merivên wî yên nêz û pêgirtiyên Şêx ên li Rojhilata Kurdistanê pê ve nehatiyê naskirin. Heta ev pirtûka helbestî di sala 2000î de hate çapkirin û derket pêş girseya xwîneran sed sal derbas bû. Beriya ku behsa *Mesnewiya* Şêx bikim, ez ê bi kurtasî çarçoveya peywenda dîrokî ku rê li ber vê berhema helbestî vekiriye, derxim.

Şêx ‘Ubeydulahê (b. 1883) Şêxekî Neqşîbendî yê kurd bû.<sup>2</sup> Ew di serdema xwe de yek ji girîngtirîn pêşeng û alimê dînî yên civata kurd bû. Robert Speer (1911), jiyannamenûsê misionerê navdar Dr Cohran, dema ciyê Şêx ê di nav misilmanên sunî de tarîf dike, diyar dike ku “di nav misilmanên sunî de piştî Siltan û Şerîfê Mekeyê ew şexsê pîroztirîn bû. Bi hezaran kes amade bûn bidin pey wî wek wekîlê Xwedê... Ew şexsiyetekî xwedî fazîlet, bihêz, adil û mêrxas bû (r. 74). Di belgeyên Parlamentoya Brîtanyayê de, Şêx wek kesekî “li ber deriyê xwe rojane navbera 500-1000 kesên ji her çînê pêşwazî dike”, hatiye teswîrkirin. “Zelal e ku şexsiyeta wî berovajî ya ku ji çavên rayedarên faris û tirk xuya dike” (Tirkiye. Hej. 5.; 1881. Belgeya pêvek 4 di nav hej. 8). Ji me re tê gotin, jiyana şexsî ya Şêx têra xwe sade bû û ew û kurê xwe bixwe hemû “kesên ji bo kar didîtin, ne girîng bû çiqas tiştên biçûk be jî... Ji destê sibê heta derengê şevê ew bi karê... gelê xwe mijûl dibû” (b.n.b.)

---

2 Neqşîbendî terîqetêke mezin a sunî mutasawif e ku di sedsala 12mîn de peyda bûye.

Şêx 'Ubeydulahê di warê siyaseta kurdî de bi taybetî dema şerê osmanî-rus de (1877-78) dema Abdulhamid II ji wî xwest tevî "*cihad*" a li hemberî artêşa rus bibe, derket pêş. Li gor gotina Şêx bixwe (2000: 108), wî dikaribû bi hezaran çekdar kom bikira.<sup>3</sup> Ev bûyer wê bibûya yek ji girîngtirîn hokerên di geşbûna hestên Şêx ên neteweyî û hêvîşikestina wî ya ji dewleta osmanî. Hevbandoriya kurd-tirk û helwesta artêşa osmanî ya li hemberî kurdan dema şerê osmanî-rus de xuya ye bandoreke kûr hiştiye li ser nêrînên Şêx ên derheqê îslamiyetê(n) ne-kurd de. A din, ev hevbandorî çalakiyên wî yên dû re li dijî herdu dewletên osmanî û qacar jî îzeh dike. Di encamê de, di sala 1879an de, salekê piştî Şer, Şêx li dijî dewleta osmanî serhildaneke têkçûyî pêk anî. Digel ku, dema raseriya hêzên dewletê û têkçûna bivênevê ya li ber çavan dît, jixwe re riyek peyda kir û Siltan qanih kir ku serhildan ne raperînek li dijî Siltên bixwe bû, lê ew encama xeyalşikestina gel bû û li dijî gendeliya rayedarên herêmî bû. Sala din, belkî jî bi hêviya ku ew raperîna sala çû dawiya çalakiyên Şêx ên li dijî dewletê be, Siltên medalya<sup>4</sup> da wî.<sup>5</sup> Lê tenê çend meh şûn de, Şêx hêza xwe ya yekitiya kurd (Kurdish League)<sup>6</sup> ku yekitiyek fireh a kurdên osmanî û îranî bû, bi kar anî û piraniya beşên Kurdistanê yên di bin desthilata qacaran de bûn, kir bin kontrola xwe. Lê, di demeke ku şerê kurd-qacar her diçû wek pevçûna *şîi-sunî* dihat famkirin, Şêx têk çû û di navbera artêşên qacar û osmanî de ma, tevî riwayetên ku yekîneyên rus jî hatine piştevaniya farisan kirine (*Vakit*, No. 1860. 1880). Dû re, Şêx, bi taybetî ser israra qacaran ji herêma xwe hat rakirin û şandin bo Stenbolê. Piştî reva wî û vegera bo Hekariyê, osmaniyan vê carê ew şand sirgunê bo Hîcazê, ku heta koça dawî ya di 1883an de lê ma.

- 
- 3 Ateş (2006: 311), lêkolînerêkî dîroka kurd-osmanî, diyar dike "Şêx 'Ubeydulah di nameyeke bo Siltan Abdulhamid de, dibêje ew hêzeke 30,000î bi rê ve dibe. Fermendarê osmanî yê sengerê Qafqas û Rojhilat Ahmed Muxtar Paşa, didomîne dibêje Şêx Ubeydulah, tevî tabûrên ji herêmên din jî wê bîn, heft tabûrên *redîf* (hêza yêdek) bi rêk kiriye. Îlaweyî yekîneyên binîzam, dibêje, "Şêx [Ubeydullah] Efendi yê ji Hekariyê 50-60 leşkerên bînîzam, him peya him siwar, ji deverên wîlayeta Wanê daye hev.
- 4 Medalya an xelat a bo şerefa yekî tê dayin.
- 5 Clayton, li herêmê, rayedarekî brîtanî yê koloniyal, payebilindê xwe Trotter agahdar dike ku "Şêx 'Ubeydulah pir dixebite ku nifûza xwe zêde bike. Ji xiristiyanan re xweş dike û gelek ji wan dû re ji Gewerê koç kirine li mintiqeya Şêx bi cî bûne da ku wan ji kurdên din biparêze. Tu guman tune ye ew hê jî difikire ji hukimdariya tirk xilas bibe. Ji aliyekî din Bahrî beg, yawerê Semîh Paşa vê hefteyê xelata ku Siltan dabû wî wê ji Şêx re bianiya (FO 195/1315 No. 20, Van, 25th May 1880).
- 6 Xuya dike nûçeyên derbarê avakirina yekitiya kurdan neteweperwerên ermen ên li Stenbolê û derveyî axa osmanî pir aciz kiriye. Bijareyên neteweperwerên ermen hewl didan vê wek tehdîdekê bo ermenan biresmîn. Ji ber vê Parlamentoya Brîtanî civîneke fermî çêkir û îzehet xwestin ji endamên kabîneya brîtanî ku lêpirsînekê bikin derbarê vê yekitiyê de. Bnr. *Tercüman-ı Hakikat*. No. 673 û 678 (1880). Xuya ye avakirina vê yekitiyê wek "fitkirineke Hukimeta Navendî, ku dixwaze pirsgerêka ermenan bifetisîne bi derxistina pirsgerêkek nû ya kurdan" fam kirine an xwestine nîşan bidin. (Nameya ji Monseigneur Krimian, Turkey No.5. 1881. Belgeya pêvek hej.6)

Divê ev bê destnîşankirin ku di berhema Şêx a helbestî de, teswîra du civatan, *romî* (tirkên osmanî) û kurdan, wek du gelên ji hev cuda, pir zelal e. Dijheviya “em” a beramberî “ew”ê di him wateya dînî him ya etno-neteweperwerî de hatiye pênasekirin. Osmanî bi gelemperî li hember îslamiyeta perîferiyê bi guman bûn.<sup>7</sup> Berteka kurdan a li hember oldarîya navendê wek gumanbar, qirêjî û neresen, heta ji aliyê Sa’id Nursî jî, navdartirîn alimê dînî yê ji bakurê Kurdistanê di nivê yekem ê sedsala bîstemîn de, li dû hev dihat dubarekirin (2009: 169-71). Di heman demê de, îmayên îdiayên pakî, raserî an reseniya şîrovekirina dîn bi îdiaya her komê ya etnîk an çandî re jî girêdayî bûn. Lewma, têgihiştin û sedeqeta dînî ya “di nav-komê” tê berzkirin û ya “koma derve” tê mehkûmkirin an reseniya wê bi awayekî xurt lê tê pirsîn. Di rexnekirina van koman a êndin de, bi taybetî ya dewletan de, ku bi neserkeftin an nexwestina wan a perwerderkirina kurdan dihatin tawanbarkirin, hevbandora dîn û neteweperweriyê berbiçav e.<sup>8</sup> *Mesnewiya Şêx* û nerînên wî yên derheqê tirkên osmanî de girîng in ji ber ku kêmasiyên hin aliyên lêkolîneriya heyî ya derbarê serhildanên Şêx ‘Ubeydulah ên li hemberî dewletên osmanî û qacaran de di salên 1879 û 1880ê de derdixin holê. Wek berê jî hat diyarkirin, xwendekarên neteweperweriya kurdî bi gelemperî di ser xwe-nîşandayîna cuda ya dînî û daberpîrsîna wê ya yekser a reseniya îslamiyeta ne-kurdan re gav dikin û ji ber vê li ser neteweperweriya wê nafikirin. Wek mînak, lêkolînerên wek David McDowell bêyî ku delîlên pêwle parve bike,<sup>9</sup> teşebisa Şêx wek “planeke li Stenbolê hatiye amadekirin ku piştewaniyek neîfşakirî pêşkêşî Şêx ‘Ubeydulah kiriye da ku tevgerê ku bikaribe dij-hevsengiyeyê çêbike li hember tehdîda ermenan (2004: 58). Dîsa bi awayekî şîbîner, Hakan Özoglu hewl dide raperîna Şêx tenê wek bertekeke dînî ku tenê bi Stenbolê ve bê girêdan teswîr bike (2011: 203-15).

Tomarên dewleta osmanî yên heyî rismekî cuda ji yê van lêkolînerên qalkirî şayesandine. Belgeyên osmanî bi awayekî eşkere radigihînin ku dewlet ji bo encamên muhtemel ên raperîna Şêx ên li aliyê osmanî yê sînor ketiye nav fikaran. Wek mînak, Wezîrê Berevaniyê ragihandiye ku Şêx tevî 70,000 çekdarên di bin emrê wî de kontrola hemû Azirbaycana Rojava kiriye destê xwe û serxwebûna kurd îlan kiriye. Rapor pêşbînî jî dike dewleta faris nikaribûye kurdan têk bibe. Lewma “li *bandora mezin a vê bûyerê li aliyê me yî sînor*<sup>10</sup> difikire,” li gor raporê, “çi tedbîr lazîm be divê zû bi zû bîn stendin. Rayedarên herêmî divê tavilê bicivin û yekîneyên alîkar ku *tenê*

7 Ji bo cudatîyên zêdetir ên di navbera Îslamiyeta navendê û perîferiyê bnr. Makdisi (2002 û 2002), Dringle (1998 û 2003).

8 Hin ji van rexneyan piştî dehansalan hatin barekirin di 1925an de di îlankirina Şêx Seîd a helîfetiya kurd de ku dewleta tirk tawanbar dikir ku bi zanebûn dev ji perwerdekirina kurdan berdaye, bnr. Strohmeir (2003).

9 Wek mînak bnr. li belgeya jêr ku berovajî îdiayên McDowell e: BOA. Dosya No: 5; Gömlek No: 99/2; Fon Kodu: Y. PRK.ASK. 10/21/1880).

10 (halen bizim terafa olacak sui-te’siratu pek büyüktür). Dupat lê hatiye zêdekirin.



ji [aliyê etnîkî ve] tirk û lazan pêk tîn bişînin.<sup>11</sup> Belgeyên osmanî hin pirsgirêkên din jî ku Şêx ji dewletê re derxistine, destnîşan dikin. Şêx, ji bo komên ku di piştewaniya serhildanê de ne jidil in teşwîk bike, gotegotek belav kiriye ku hikumeta osmanî piştgiriya tevgerên dij-qacaran dike. Ji ber vê, osmanî van gotegotan xeter dibînin û bawer dikin divê vê îdiaya Şêx bi her awayî red bikin.<sup>12</sup> Hin rayedarên brîtanî yê li herêma jî di wê baweriyê de ne “tevgerên Şêx divê bîn şopandin, ji ber ku ihtimal heye hikumetên osmanî û îranî bide ber şermê.”<sup>13</sup> Kaptan Clayton jî di yek raporên xwe de nivîsandîye ku Şêx “planeke wî ya berfireh heye bo lihevciwandina hemû kurdan bo dewleteke serbixwe. Şert û mercên [niha] ewil bala wî kişandîye ser aliyê Îranê. Ew ê dû re vegere vî alî û hewl bide heman tiştan ji tirkan bistîne.”<sup>14</sup> Belkî jî rewş baştirîn ji aliyê Major Trotter ve hatiye teswîrkirin dema dibêje “çûna Şêx ber bi Îranê ve [ihtimal e] ji ber fikra ku hikumeta Îranê ji ya Tirkîyeyê genîtir bûye û wê hêsantir be serxwebûnê ji desthilata Îranê bistînin.”<sup>15</sup>

### Kurd beramberî romiyan

Wek ku berê ji hat diyarkirin, li vir armanc ne nûvenivîsandina kronolojiya bûyerên dîrokî yê sedesala 19mîn e, ku ev bi awayekî fireh ji aliyê çendîn lêkolîneran hatiye lêkolandin (Ateş, 2006; Jwaideh, 2006; Olson, 1989), lê nîşan bide ka bê di berhema Şêx de rabêja neteweperwer çawa bi “vegötina neteweyê re dikeve nav hev.” (Divê bê destnîşankirin têkilbûneke bi vî awayî di çendîn cî û şêwazan de pêk dihat. Ji sedesala 19mîn vir ve hevbandoriya di navbera dîn û neteweperweriyê dem bi dem di nivîsên rewşenbiriya kurd a li Stenbolê bi dupatkirina tevkariya kurdan a etnîk bo şaristaniya îslamiyê,<sup>16</sup> koçberên kurd û pêşengên dînî yê ji Îranê,<sup>17</sup> û ji aliyê Şêx Ubeydulah bixwe, bi taybetî di helbestên wî de, dihat xuyakirin.) Berhema Şêx a helbestî ji me re têra xwe delîl dabîn dike bê Şêx îslamiyeta ne-kurd çiqas nîqaşbar dîtîye. Ew ji ber vê fikiriye ku lazim e kurd dewleta xwe ava bikin da ku bikaribin “dîne xwe yî heqîqî” bijîn. Sedesalek şûn de, berhema wî helbestî, *Mesnewî* hatiye kişifkirin û niha li ber destê xwînerên farisî ye. Edîtor Seyid Îslam Duagû di pêşkêşîya xwe ya *Mesnewiya* (2000) Şêx de rave dike piştî çend salên lêgerînê wî karibûye ciyê sê kopî

11 Cf. BOA. Dosya No: 5; Gömlek No: 99/2; Fon Kodu: Y. PRK.ASK. 10/21/1880). Dupat lê hatiye zêdekirin.

12 Cf. BOA: Dosya No: 486; Gömlek No: 62; Fon Kodu: A.MKT.MHM Tarih: 29/Ca/1298 (Hicrî) [28.04.1881].

13 Belgeyên parlamentoyê. Tirkîye. No. 5. (1881. Belgeya pêvek 2 di hej.8).

14 B.n.b. (Belgeya pêvek 3 di hej.54).

15 B.n.b. (Belgeya pêvek di hej.22).

16 Bnr. Soleimani, (2016) *Islam and Competing Nationalisms in the Middle East, 1876-1926*. Palgrave Macmillan US.

17 Bnr. Celîl (2007: 56).



destxetên ku tenê li ber destê malbat û pêgirtiyên Şêx bûne, tesbît bike. Hemû dîwan hinekî zêdeyî 6000 malikên bi farisî ne. Heta 1920an di medreseyên kurd de farisî yek ji zimanên hevpar ên fêrkinê bû. Nehrî di berhema xwe de *Mesnewiya Celal el-Dîn Rûmî*, şairê mutasewif ê binavûdeng ê sed sala sêzdemîn texlîd dike û hewl dide wî ji nû ve bide naskirin (Nehrî: 129). Rahman (2002) *Mesnewiya Rûmî* wek “berhemeke helbestî ya ji xweşîkbûnê wêdetir û kurahiya qasî vê populariteyêke dewasa bi dest xistiye û, bi rastî wek “Qur’ana Mutasewifan” dihate pejirandin (164). Duagû, di pêşkêşîya xwe de, destnîşan dike ev versiyona *Mesnewiya Şêx a çapkirî* eynî ji kopiya desxeta cara ewil e ya di 1962ya de ji ber hatiye derxistin. Nakokiyên bi versiyonên neçapkirî re di jêrenotan de hatine nîşandan.<sup>18</sup> Ev beşa ku têgihîştina siyasî ya Şêx dide xuyakirin ji zêdetirî çarsed malikên ku ew danûstendina xwe û pêgirtiyên xwe yên bi artêşa osmanî vedibêje, pêk tê. Xuya ye danûstendina kurd-osmanî ya dema şer bandoreke pir neyênî hiştiye li ser dîtinên Şêx ên derbarê tirkên osmanî de.

Di vê berhema helbestî de Şêx hinekî bi teredud nêzî meseleyên siyasî dibe, ji ber ku, ew bi me dide zanîn, pirtûk teqez derbarê babetên dînî de ye. Tê gotin ew bi îlhameke eşkere ya Neqşîbendî tarîfnameyek e bo vejîna îslamiyeta li Kurdistanê (Nehrî: 126). Şêx dibêje, kengî derbarê babetên dinyewî (*aḥvâl-e donya*) de nîqaşek derkeve, zehmet e ew ji niyeta xirab azade be (b.n.b.). Ligel vê, ew îdia dike ku ew “ji bo serpêhatiya kurd û romîyan [tirkên osmanî] vebêje, babetên bi vî rengî nîqaş dike” (b.n.b.). Dibêje “dikarin min bi xeybkirinê, ku gora gunehan e, tawanbar bikin” (b.n.b.). Lê heqê mazlûman heye derheqê zaliman de bipeyivin, bi taybetî ger behsa tiştên diqewime (*tebq-e majara*)” bikin (b.n.b.). Şêx vê armanca xwe bi mînaka tecrûbeya xwe ya dema şer firehtir rave dike di du malikên dawîya helbesta xwe (li ser vê serpêhatiyê) de dema dibêje “ew ji bo xatirê kurda ye ku ez dihêlim qelema min jan bide, binivîsîne û ji bo serpêhatiya wan bê nivîsandin li ser rûpelên bayê (*ruzgar*) da ku bibe yadigarek (*yadgar*) bo alemê (*‘alam*)” (b.n.b.: 127). Helbestên Şêx ên derbarê şerê rus-osmanî û amadekariya wê de, ku hin jê divê pişt şer hatibin nivîsandin,<sup>19</sup> heyraniya wî ya bo Abdulhamîd II nîşan didin (b.n.b.: 110). Ji nameyên wî yên bo Abdulhamîd II cuda, Şêx di helbestên xwe de wek xelîfe qala Siltên nake.<sup>20</sup> Li gor efsere rus P. I. Averyanov, Şêx ji meşrûiyeta îdiaya osmanî a bo xelîfetiye bawer nedikir (1995: 214-216). Averyanov diyar dike, ev ji aliyê kurdan jî ku bi giştî bawer dikirin “osmanî xelîfetiya misilmanan bi darê zorê stendine û hikuka Îslamiyete îhlal kirine,”

18 Bnr. destpêka bo Nehrî (2000: 1-2).

19 Destnîşan dike ku xilaskirina pirtûkê ji ber şer taloq kiriye (Nehrî: 104).

20 Di hin nameyên wî yên şexsî yên bo Siltên, Şêx têgeha ku her tim tê bikaranîn *Khilafetpanahi* (penaberê Xelîfe) bi kar tîne Cf. BOA: Dosya No: 1525, Fon Kodu: PRK.ASK. Tarih: 7/ Temmuz /1296 (Hicrî) [7.19 .1880]. Hin nameyên din hene ku tê de Şêx vê têgehê jî bi kar tîne. Cf. BOA: Dosya No: 1492, Fon Kodu: PRK.ASK. Tarih: 20/Haziran /1296 (Hicrî) [7.1.1880].

(b.n.b: 214-216) dihat pejirandin. Lê, Şêx bê teredud ew wek *îmam*<sup>21</sup> an belavkarê dîn û edaletê, bi nav dikir (Nehrî: 130).

Mirov dikare ji vir derxe ku destpêka şerê rus-osmanî de Şêx hurmetek wî mezin hebû bo Siltên. Bi taybetî ev di vegotina Şêx de eşkere dibe dema dibihîze Siltan nikaribûye hestên xwe kontrol bike dema nameya Şêx ku di 1877an de bang li kurdan kir li hemberî Rusyayê tevî cihadê bibin (Nehrî: 110). Ji Şêx re hatiye gotin name ewqas hestbar bûye ku Siltên taqeta wî têr nekiriye temama wê bixwîne. Lewma, Abdulhemîd ji îmamekî xwestiye li ba wî rûne û dewama nameyê bixwîne (b.n.b). Ev eşkere ye ku ‘Ubeydulah berteka Siltên wek nîşaneyê sêdaqeta wî ya mezin a dînî û dîndariya wî şîrove kiriye. Şêx fikiriye ku Abdulhemîd bi wî re hemfikir e û ew bobelatên hatine serê dewleta osmanî encama terikandina qaideyên îslamî û pêdeçûna ihmalkariyeke mezin a bêexlaqiyê (*bar Kabā'êr moşerr*) bû.<sup>22</sup> Lê di wê baweriyê de bû dewleta osmanî ewqas xira bûye ku Abdulhemîd jî nikare wê serast bike. Ji qabiliyeta wî zêde bû guherînên binemayî (*tabdil in hay'at*) bikaribe pêk bîne (Nehrî: 110). Nehrî îdia dikir belavbûna vê çanda ne-îslamî hatiye wê astê ku Abdulhemîd êdî nikare desthilata xwe bi kar bîne an bi karîgerî bi rê ve bibe.<sup>23</sup>

Tesbîten bi vî awayî nîşan didin ne ku tenê di warê amûrên temama dewletên osmanî de hêvîşikestineke mezin bi Şêx re çêdike, lê ew jixwerehesibandina nakokbar a misilmantiyê ya him ji aliyê dewletê him ji aliyê periferiyê, ku dibe nîşaneyên etnîk û komunal jî, ronî dikin. Nakokiyên wisa zelaltir bûn di rasthatina Şêx a bi arteşa osmanî re, ku li gor wî bi awayekî eşkere tunebûna rabitayên heqîqî yên di navbera amûrên dewletê û îslamiyê temsîl dikir. Her çiqas bijareyên osmanî îslamiyeta “*xelkên şerqî*” bi giştî bi awayekî neyênî dinirxandin jî, hin aliyên ku dikare têkeve xizmeta rêvebiriyê karîgertir tolere dikirin.<sup>24</sup> Necib Ali, rayedarekî osmanî di 1873 de, dema derbarê dîndariya kurdî ya Şêx ‘Ubeydulah de nêrîna xwe dibêje, dibe mînakek baş bo nêzîkbûna dualî ya bijareyan li hember dîne li periferiyê:

[Şêx] hewl dide, *kurdên ku meyla wan ber bi putperestiyê ve heye, bîne ser rîya rast*. Nehiyeya Şemzînanê ku Şêx lê dijî li ser riyên koçerîya eşîra ye û li ser sînore [yanê li çeperên welatê osmanî]. *Bo nîzam û ewlehiya vê herême sê çar mifreze îcab kir. Lê bi saya*

21 Ji misilmanên şîî cuda, sunî têgeha *îmam* bi awayekî pir sist bi kar tînin. Sunî peyva îmam piranî wek bikaranînek giştî (‘aam) famdikin. Lê, peyva xelîfe bikaranînek wê taybet heye. Gelek ramangêrên sunî îdia dikin unwana xelîfe ji bilî çar xelefên ewil ên piştî Pêxember pê ve ji bo tu rêvebiran nikare bê bikaranîn. Hêjayî gotinê ye Seyîd Beg, ramangêrekî misliman û wezîrê dadê yê tirk î dij-xelîfetiyeke dilalavek di sala 1924a de di parlamentoya tirkan de bi bîra hevkarên xwe yê nêz-xelîfetî dianî ku “alimên Kurdistanê tu car xelîfeyên osmanî cidî negirtine.” Bnr, TBMM Zabıtları. VII. 1 Mart 1340 (1924): 55-65

22 (*garçe sultan ma\*yay-e fath ve zafar---did dar ejra-ye shar'-e namvar*). (Nehri: 110).

23 (*kardeh bidinan salbe ihtiyar---bar sare mellat ze daste shariyar*) (ibid.: 110).

24 Bnr. Makdîsi (2002: 768-96).

*hebûn û alikariya Şêx... tenê mudîrek û heşt zabtiye* bes in bo birêvebirin û hevdana hemû bacan di wexta xwe de (Ateş, 2006: 332 de hatiye şîrovekirin. Dupat lê hatiye zêdekirin).

Paragrafa jorîn, wek ku di deqê de derketiye pêş, dide xuyakirin hin nêrîn û têgihîştinên derheqê kurdan de dema ji aliyê bijareyên *şîi* yên faris tên îfadekirin çiqas bêtir neyênî dibin. Wek mînak, burokratekî îranî, Iskender Quranîs, Şêx wek “serokê dînî yên eşîrê koçer ku qet ne adet ne dîn nas dîkin” tarîf dike (Ateş, 2006: 332). Kurd wek komeke mirovan dihatin dîtin ku li ser sînoren dewletên muhteşem ên qacar û osmanî de dijîn. Alîxan Afşar, ku bixwe li hember Şêx şer kiriye, di bîranînên xwe de dibêje “ev mirovên bêaqil, nezan, kirêt, û belaya Xwedê koçerên sunî ne, li çiyayê bilind û negihînbar dijîn, piraniya wan bi koreyî dane pey Şêx Ubeydulahê rêşaş” (2007: 30, 221).

Dema em li Nehrî dinêrin, “hemû bobelatên hatine serê Împeratoriya Osmanî,” encama yekser a qirêjîya çandî û exlaqî ya vê dewletê û teb’ayên wê bû (Nehrî: 110). Lewma bi israr digot “dema dîn diçe îman jî wînda dibe û dema mumîn tunebin wê serfirazî (*nusrat*) çawa pêk were (b.n.b.). Li gor wî, tirkên osmanî pusulaya xwe ya exlaqî wînda kirine û ji ber vê ye wan têkçûna ji ber destê rus an têkçûneke ewqas bêrûmet dan dewamkirin (b.n.b.). Nehrî îdia dike di navbera asta dîndariya gel û, têkçûn û serfiraziyên wan î dinyewî de korelasyonêk yekser heye. Divê bê bibîrxistin di nav vejînerên sedsala nozdemîn û bîstemîn de helwesteke bi vî rengî berbelav bû.<sup>25</sup> Lê ligel vê, Şêx ne di wê baweriyê de bû ku civak hemû bi yek awayî “qirêjî” bûye an ji “riya rast” derketiye. Bawer dikir di navbera komên etnîk ên cuda de helwestên cuda hebû di warê misilmantî û exlaqê de. Şêx di wê nêrînê de bû ku têkçûna tirkên osmanî, digel hejmara wan a zêde, ji nîşaneyên têkçûna wan a exlaqî pê ve ne tu tiştek bû û “misilman niha ji aliyê eşqiyayan tên îdarekirin” (b.n.b: 111). Bi taybetî di warê artêş û burokratan de pir hişk bû û bê tereddud ew wek “neyarên bêfam ê xelkê dîndar [yanê, kurd]” teswîr dikir (b.n.b: 120).<sup>26</sup>

Di maweya Şer de, ji riwangeya Şêx, aliyê osmanî ji du komên dijber pêk dihat: romî (tirkên osmanî), “ji aliye exlaqî ve bêxem” û “kurdên bixwe bawer ku xwedî dîndariyek xurt bûn” (b.n.b: 117). Kurd wek xelkekî dîndar tê teswîrkirin, ku ji nav wan bi deh hezaran şervan kom kiribû dema gazî kiribû ku beşdarî cîhada li hemberî dagirkirina rusan bibin (b.n.b: 108). Bi hatina kurdan (li gor Şêx, tekane hêza heqîqî şer kiribû), artêşa rusan li pey hev gelek têkçûn xwarin:

Dema li Ebexeyê<sup>27</sup> şervanên me<sup>28</sup> bi rûsan re rûberû bûn,<sup>29</sup>  
Ûris bi têkçûneke xedar re rû bi rû man

25 Destpêka Seyyid Qutb a bo al-Nadawi (1945: 10-11).

26 (*bi muhaba bar goruh-e ahl-e din*).

27 Ciyekî nêzî bajarê Wanê, li bakurê Kurdistanê/Turkiye.

28 Dupat lê hatiye zêdekirin.

29 Divê bê diyarkirin ku hemû helbest ji aliyê nivîskar ve ji farisî bo îngilîzî hatine wergerandin

Kurd di cengê de mîna şêrên qehreman,  
Rûs, wek xezala bireve ji ber wan.

Dengê wan î mîna brûskan ew kirin ewr [ên bêşikl]  
Xwîna rûsan bi ser deştê ve diherikî

Serî rûsan mîna zîpikê diketin xwarê (b.n.b: 116),

Hûrgilî û dehşeta pêvçûnan bi muşkilpesendî tê ravekirin û motîvasyonê şervanan bi etnîsîte û dîndariya wan ve tê girêdan. Şêx rola kurdan a di şer de wisa teswîr dike:

Bo şêrên me, çiya ji pir biçûk diman  
Biriqandina rewnaq a şûrên kurdan  
Wek çilayê vedikeve û vedimirin, gotin têrê nakin  
Hêzên neyar dikevin xwarê di lêgerîna ciyekî ewle de  
Xurmîna kurdan olan dide li bilindtirîn ezmanan

Xurmîn û dengê bilind ê *gaziyan*<sup>30</sup> [kurd]  
Tevî tirs û gumanên ûrisan  
Û ruhên bêlaş ên ûrisan ezman tiji kiribû  
Ji ber ku laşên bêruh her der sor kiribû  
Dema qîrînen rûsan digihişt ezmên  
Milyaketan ji jor ve pesnê *gaziyan* didan (b.n.b.)

Şêx îdia dike “romî” qe dil nedikirin şer bikin, heta yek ji leşkerên wan wêrekî kiribû ji bo li dij rûsan şer bike tevî kurdan bûbû, dema hatibû dîtî ji aliyê payebilindên xwe bi tundî hatibû cizakirin. Wek mînak:

Yek ji leşkeran [osmanî], mêrxas û bi bejnûbal  
Piştî ku tevî me bûbû dema şerê kurd û rûsan  
Bi daran lêdan xwar, giran hat cizakirin  
Heqê xwe yî xwarinê winda kir, şerefa wî lewitandin  
Gunehê wî nedihat efûkirin û ewqas mezin bû  
Piştî ku tevî kurdan bû, ewqas mêrxas bû ew (b.n.b: 117).

Li gor Nehrî, dilnexwaziya artêşa osmanî ya tevî kurda şerê rûsan bike, ligel nedîndariya wan bi bêhurmetî û antîpatiya wan a bo kurda tê ravekirin (b.n.b: 117-24). Sedemên li pişt dilnexwaziya artêşê bo pêgirtiyên Şêx nayên zanîn. Lê, tiştê tê zanîn, li gor Şêx û pêgirtiyên wî artêşa osmanî wek bêdîn, bêvîn didîtin û gendel bû ku halê heqîqî yê dewleta osmanî temsîl dikir (b.n.b.). Rola osmanî piranî wek wêranker dihat dîtî. Întibaya wan li ser kurda hiştibû ew bû ku wan bi temamî ji

30 Gazi, ew kesê ji bo dawa dîn şer dike. Lê, Şêx li vir vê têgehê taybetî bo şervanên kurd ên di şerê osmanî-rus 1877-78 de tevî osmaniyan şer kirine, bi kar tîne.

gelê kurd nefret dikirin. Şêx “romî” wek komek mirovên ku tenê piştevanî û hewesa kurdan a di şerê dijî îstîlaya rûsan israf dikir, didît. Jê wêdetir îdia dike artêşa osmanî û fermandarên wê mêrxasî û fedakariya kurdan bi nefret, bêqîmetî, hesûdî û birrîna heqê wan î xwarinê xelat kiribû. Derbarê vê de Nehrî wiha qal dike:

Digel ku *gaziyan ewqas muhteşem şer dikirin*  
*Ji romiyan alikarî nedihat*  
 ...  
*Hêzên takviye yên kurd bi serê xwe neyar tekbin*  
*Fermandarên tirk ew bi nefret û hesûdiyê xelat kirin*  
*Hewl dan ji kurdan xilas bibin û xwarina kêr kirin*  
*Bi rojan nan nexwarin, şervan sebra wan nema*  
 ...  
*Kîna romiyan bêsinor bû*  
*Kîn û çavnebariya wan, kî dikare bende wan keve? (b.n.b: 117-20)*

Şêx rave dike bê rom çawa hemû şaşiyên cîhana misilmantiyê temsîl dikin. Wan wek mînaka klasîk a “qirêjiya misilmanan” dibîne, kirêt (*sofleh*) dibîne, ji samimiyeta dînî mehrûm, û gurên ku dikevin dilqê şivên (*az gorgan, ra’i pustin*)” (b.n.b:111). Bêqîmetkirin û henekpêkirina bi kurdan, ku ji aliyê Şêx ve wek qewmê dînê pak (*qowm-e pak din*) tê teswîrkirin, ji aliyê artêşa tirk ve kir ku taliya talî qada şer bite-rikînin. Şêx tiştên li jor wek nîşaneyên neyartiya osmanî ya bo kurdan, ku bi dîtina wî mêrxasiyêke mezin kiribûn û raseriya xwe ya exlaqî nîşan dabûn.

Jê wêdetir, di vegotina Şêx a derbarê hevbandoriyên kurd-osmanî yên dema şerê rûs-osmanî de nêrîneke hişk heye. Li gor vê, Şêx osmaniyan wek misilmanên navekî dibîne; di dilê wan de hestên xurt ên dîndariyê tunene. Îdia dike osmanî an romî, wek ku wan bi nav dike, minafiq in, îmana wan tune, bi derewa dibêjin em misilman in. Qala hedîsekê, gotinên bo Pêxemberê Îslamiyê tê atfikirin, dike ku li gor naveroka wê Şêx bawer dike dîndariya osmaniyan jî nimûneya vê ye (b.n.b: 109, 127). Li gor vê hedîsê, Pêxember îlan kiriye ku sê pîvan hene, li gor van mirov dikare bêje yek minafiq e an na. a) ger yek dema diaxîfe derewan bike b) ger yek soza xwe negre c) ger yek kesekî din, bawerî bi wî anîbe, bixapîne.<sup>31</sup> Li gor vê, Şêx rave dike ku derheqê osmaniyan de çî hîs dike:

*Ez çiqas qala bêdaletiya wan bikim nekim, ew ê li ba tiştên qewimiye ne tiştêk be. Romiyan ji bo her yek soza ku di destpêka Şer de dane me, bêşerefi kirine. Hemû tiştên me ji bo wan kir berhewa kirin. Wan soz dan wê li xwarina şervanên kurd miqate bin, û wan soza xwe xwar... Kirinên romiyan da xuyakirin ku hemû fedakariya kurdan hewante çûye (b.n.b: 127)*

31 *‘Alamatul munafiqi thalathatun: ‘idha hadatha kadhiba, wa ‘idha wa’ada ‘akhlafa, wa idh[a] ‘utmi ‘una khana.*



Dema dîndariya osmaniyan ji aliyê Şêx ve wek ne-mewcûd, derewîn û bêsamîmîyet tê resimkirin; dîndariya kurdan wek bereksê vê tê qalkirin. Tenê mîrxasî û dîndariya ereban bi qasî ya kurda ye ji ber ku, li gor Şêx, ew ji heman kokê tîn.<sup>32</sup> Li ser vê wisa dibêje:

Bi ferasetek xwezayî tîn dinyayê  
 Şêr in, nîşaneyên mîrxasiyê ne  
 Mînakên şênber ên qehremaniyê di şer de  
 Hatemê Tayê<sup>33</sup> ne, sembolên fidakariyê.

‘d’ya di kurd de dîn e (dîndarî)  
 ‘k’ kemal û mukemelî ye  
 ‘r’ ruşd e, kemaliyeta rûhî  
 Tenê di kurdan de hûn dikarin bibînin<sup>34</sup>  
 Hemû ev fazîlet li hev civiyane. (b.n.b: 120-121)

Hilatina Şêx’Ubeydulahê di siyaseta kurd de serdemeke nû destnîşan dike û şeweya geşedana wê ku tê de têkelbûna neteweperweriyê û dîndariyê bi eşkereyî xuya dike. Ev têkelbûna di nav bizavên kurd ên siyasî de, ku di hin rewşan de heta 1960an dewam kiriye, taybetmendiyê tekane bexşî wan kiriye.<sup>35</sup> Ev bi saya wê rastiya ku kurd di heman demê de “Êdin”ê perîferîk ê dînî û etnîk temsîl dikirin tê ravekirin. Kurd bi giştî wek “paşverû” û “nezan” hatine şayesandin di serdema dawî ya osmanî de.<sup>36</sup> Ji ber vê, di çavên bijareyên osmanî de dîndariya wan jî, wek awayê îslamê ya “paşverû” hatiye nîşandan.<sup>37</sup> Ji ber ku bijareyên osmanî bawer dikirin ti millet “bêyî ku ronahiya îlim û îrfana Stenbolê bistînin”<sup>38</sup> nikarin bîn asta têngiştina wan a modern a îslamiyete. Wan îslamiyeta kurdan an bi giştî îslamiyeta ne-tirk, “kevn” an “paşverû” didîtin. Mezheba şafî (yek ji çar mezhebên mezin ên qanûnî ya îslamiyeta sunî) di redkirina riayetkirina propagandaya mezheba henîfîtiyê ya di nav împeratoriye bi israr tevgeriyabûn: “Vê şaxa îslamiyete di helwesta xwe ya pasîf a li hember dewlete riayetî henîfîyan, mezheba sereke ya osmanî, nedikir” (Mardin, 2006: 60).

32 Di nav kurdan de ne kem e ku îdia bikin ew û ereb ji heman kokê ne. Heta Said Nursî jî (2009: 579) îdiayek wî wisa heye. Lê di nav kurdan de ev nêrîn li hember neteweperweriya ereb guherî, taybetî piştî avakirina Iraqê.

33 Hatim al-Ta’î, di wêje û çanda erebî de sembola comerdiyê de.

34 *Ke nadarad hich aqwam-e degar.*

35 Meylên bi vî awayî di sala 1926ê de serhildana Şêx Seîd, di 1949ê de Komara Kurdistanê û heta radeyekê di 1960î de tevgera Mistefa Barzanî de tê dîtin.

36 Têngiştineke bi vî awayî ya derheqê kurdan de dû re dema komarê de jî hebûna xwe domand (bnr. Zeydanlıoğlu, 2008).

37 Ev nêrînen neyênî ketiye nav biwêj û îfadeyên tirkîjî. Wek mînak, “*Kürt ile itin Allahu birdir;*” “*Allah Kürdü, Kürd Allahu sevmez*” (Alakom, 2010: 33-4). Ji bo bêtir agahî derbarî helwesta giştî ya bo gelên li perîferiyê, bnr. Makdisi, (2002 û 2002), Dringle (1998 û 2003).

38 Bnr. Tercuman-ı Hakikat. Hej: 595 (Pûşber 7, 1880).

### Projeyek kurdistanî ya vejîneriya îslamî

*Mesnewiya* Şêx îzaheteke yekem-dest a fikrên wî yên siyasî û neteweyî pêşkêş dike, ku ev alikariya me dike em baştir fam bikin bê nêrînên wî yên dînî û neteweyî çawa nifuzî hev kirine. *Mesnewiya* wî li aliyekî, zêde çavkanî tune ye li ber destê me ku derbarê hûrgilî an taybetmendiyên vejîna Şêx a dînî dabîn bikin. *Mesnewiya* wî tê wateya projeyê vejîna dînî. Îdia dike *Mesnewiya* xwe ji bo têgihîştin û nirxandina berhemên Romî<sup>39</sup> çareyek pêşkêş bike dinivîsîne.<sup>40</sup> *Mesnewiya* Şêx, ligel vê, piranî li ser şaxa Neqşibendî ya sufîzma îslamî hûr dibe. Pirtûk hûrgilîkirineke helbestî ya dîroka terîqetê û rêberê e bo pêgirtiyên vê terîqetê. Îzaheta wî ya nû ya helbestî, ji aliyekî ve, jinûvesazkirina dîroka Terîqeta Neqşibendî bû da ku “qaideyên wê yên resen û pak” ji şaş-şiroveyên niha û berbelav ên nifşê hemdem, veqetîne (b.n.b.). Li gor Şêx, dûrbûna zanebûna xelkê ya derheqê Terîqetê ji “qaideyên wê yên resen” hatiye wê radeyê ku mirov bi zorê dikare navbera herduyan de manendiyan bibîne (b.n.b.).

Nêrînên Şêx ‘Ubeydulah dişibe yên vejînerên din î misliman ên hemdem. Ji ber rewşa giştî ya karên dewleta hemdem aciz bû. Derheqê dewleta osmanî de pir reşbîn bû. Eşkere ye ku Şêx bawer dikir kêmasiyên dewleta osmanî ji ber xemsariya wê ya li hember qanûn û qaideyên îslamî ne. Ew difikirî qanûnên osmanî yekser dijberî yên îslamiyet û (*khelaf-e*)-*Shari‘a* ne (b.n.b: 110). Li gor wî, qanûnên îslamî ji ayetên Qur’anê û kevneşopê Pêxember pê ve ne tiştê in; û ji ber vê, tiştê ne li gor wan nûjeniyên (*bid‘a*) qedexekirî ne (b.n.b:111). Ev, ji hêlekê, cureya selefîzma Muhamed ‘Abduh (1849-1905) û Muhamed Raşid Rida (1865-1935) nîşan dide, ku di nêzîkbûna Şêx a ber bi vejîna dînî de bi qaideyên Neqşibendî re têkel bûne. Heta, dema îdia dike “qanûnên vê umetê –ku baştirin qanûn in- xwe dispêrin Qur’an û kevneşopê Pêxember (b.n.b.)”, fikra muştarektîya qanûnên umeta îslamê jî bi bîr tîne. Lê, xuya ye ev şêwe vejîna ji yên wek ‘Abduh û Rida cuda dibe ji ber ku ‘Ubeydulah tenê li ser vejîna dînî ya di nav kurdan de disekine. Şêx piranî bi rewşa Kurdistanê re elaqeder e; ev wî ji vejînerên din ên misliman vediqetîne. Vejînerên ereb jî rojeva wan bixwe hebû. ‘Abduh jî di wê baweriyê de bû “osmaniyan xelîfetî bi darê zorê dest xistine û tirk nikarin ruhê peyama Muhamed fam bikin ji ber ku ew muhtedên vê dawiyê ne” (Enayat di *Satan*, 2008: 39 de neqil dike). Dîsa jî, ji Nehrî cuda, di heman demê de bi temama cîhana misilman re elaqeder dibin. Lê Şêx xuya ye ji Kurdistanê wêdetir bala xwe zêde nade cîhana misilman.

Şêx Ubeydulah bi taybetî derbarê dîndariya kurdan de nêrînên wî erênî ne lêbelê di eyn wextê de li hember terîqetên sufî, terîqeta wî Neqşibendî jî tê de, têra xwe

39 Mewlana Celaledînê Romî (wer.)

40 Şêx dibêje, armanca wî ya sereke ya nivîsandina vê *Mesnewiyê*, ravekirina *Masnaviya* Rûmî bû ji ber ku “maneya kûr a di helbestên emirê vê terîqetê lazim e ji “avam”ê re bê kişifkirin (Nehrî: 13).



rexneyî ye. Ew qirejiya li Kurdistanê wek qirêjiya terîqetên mutesewif dibîne. Ji ber vê sedemê ye ku xwe mecbûr dibîne kevneşopa sufi ya nifşên berê du-qatî vejîne:<sup>41</sup> a) qirêjiya sufizmê bixwe, b) li Kurdistanê hebûna hewesa dînî ya di asta îstisnayê de, ku pêwîstî rêberî û pêşengtiya ruhanî hebû (Nehrî: 130). Ubeydullah diyar dikir bêyî rêbertiyeke heqîqî ev hewes û kelecana dînî wê têkeve riyeye şaş (b.n.b). Wî digot xwezaya mucbîr a dîn (an pêgirtiyên terîqetê) mecbûr kir nivîsandina *Mesnewiyeke* duyem ku ya yekem li bende wê ye û wê bivejîne (b.n.b:129). Bi riwangeya Şêx, li Kurdistanê kevneşopa tasawufê wate û dînamîzmaya xwe ya hundirîn winda dike. Ji dêvla merhaleyên berztir ên ruhaniyetê bi riya perwerdeya îcabkirî û bidestxistina zanîna pêwîst, ev dibû meseleya mîratê. Ji bo derbaskirina merhaleyên tasawufê, mutesewifek êdî hewcedariya wî bi xebata salên dirêj û hewlên bo ruhaniyeteke kûr a şexsî tunebû (b.n.b:130). Ji ber vê, ligel hewesa wan a dînî, “kurd li deşta dîn ((*şahra-ye din*))” digerin (b.n.b). Li gor Nehrî, berovajî kevneşopa dewrêşên bisebir (*Salaf*), ku mecbûr dikir yek li hember xwe rexnegir û li hember kêmasiyê kêsên din bitolerans be (*be her kes husn-e zann*), mutesewifên hemdem wek nimûneyên mukemeliyeta dîndariyê li xwe dinêrin û yên din bi fesadiyê îtham dikin (b.n.b:131).

Qadeke din ku Şêx ji kom û şexsiyetên vejîner ên din î misilman vediqetand helwesta wî ya li hember rabirdûya Îslamê û “dewra wê ya zêrîn” bû. Şêx aîdî kevneşopekê bû ku di dîroka Îslamiyê de ji sêdaqeta *tajdidê* (nûkirin)<sup>42</sup> bawer dikirin. Lewma, wî bawer dikir, tevî dewra îstisnâ ya Pêxember û Raşîdûn, dîroka misilmanan bûye şahidê gelek dewrên zêrîn ku yek ji van jî di rabirdûya nêz a Kurdistanê de dikare bê dîtîn. Şêx banga “vegera bo Îslamiyeta bakîr ku di Qur’an û kevneşopa pêxemberî de hatibû tarîfkirin” dikir, ku di kevneşopa mezin a tesawifê de, li Kurdistanê nifşên berê jî tê de, hatibû sepandin û nûkirin. Bîranînên wê hê zindî ne, tenê çend dehsalan berê Hizretî Mewlana Xalid, damizrênerê şaxa xalidî ya Terîqeta Neqşibendî, dijiya. Ji vejînerên din î misilman wek Cemaleddîn Afganî (1838/1839-1897) û Abduh cuda, Şêx di wê baweriyê de bû ku li Kurdistanê “qirêjî” ya<sup>43</sup> misilmantiyê reh bernade dewra

41 “Nevî ji riya bavûkalên xwe derketin û wan îcadên qedexekirî anîn (*tark karde har kas âsâr-e salaf--- mukhtari’ gashte be bid’at har khalaf*).” Ji ber vê, min cisaret kir berhemên van mirovên dîndar derxim holê [vejînim (*la ‘alaj amad jasarat dar miyan--- ke konam âsâr-e in pakân ‘ayân* [Nehri, 131]).

42 Têgehên wek *ihya’* û *tajdid* rehên xwe kûr berdane di dîroka misilmantiyê de. Îmam el-Haramayn el-Juwayni (1028-1085) û Abû Hâmed al-Ghazâlî (1058-1111) wek pêşengên nasandina van têgehên tîn qebûlkirin. Lê, Celaleddîn el-Suyuti (1445-1505) ye yê ku bûye nûnerê sereke yên van têgehên. Bo bêtir agahî, bnr. Al-Suyuti (1972).

43 Her çiqas eşkere nehatibe gotin jî, fikra qirêjî an xirabûnê jixwe di nav hewlên vejîne de jî cîyê xwe girtibû. Di sedsala 19mîn de, ev fikra jirêderketina misilmanan ji riya rast yek ji awayê ravekirinên sereke ya serdestiya leşkerî, teknîk û zanistî ya Ewropayê li ser cîhana misilmanan bû. Di salê 1940î de, Abu al-Hassan al-Nadawî li ser heman babetê pirtûkek nivîsand, ev fikra derbarê qirêjiyê û dûrketina misilmanan ji serdema zêrîn a Îslamiyê pir baş temsîl dikir (al-Nadawî, 1945: 10).

emewiyan.<sup>44</sup> Vê bi mirina bavê wî bixwe û Mewlana Xalid di nivê yekem a sedsala nozdemîn de dest pê kiriye. Wî bawer dikir Kurdistan di nav du demajoyên qirêjîyê de derbas dibû: yekem, windabûna azameta Kurdistanê ku ji niv sedsalê zêdetir e dest pê kiriye dema, li gor Şêx, Kurdistan navenda ilmê bû û li cîhanê bala hemû kesên li dû zanîne digerin dikişand. Kurdistan baxçeyê zanîne bû, xelk û alema “ji her herême û ji her qewmî” dihat Kurdistanê da ku bendera mêweyên zanîne rakin. Bêguman, îdiaya Şêx a derbarê navendbûna Kurdistanê ya ilm û îrfanê di xwe de hin hêmanên heqîqetê dihewand. Dîrokzanê osmanî, Katib Çelebî vedibêje:

bazara ilmê li Tirkiyeyê xira bûbû, û hema bêje alim li ber windabûnê bûn. Ewçax şagirtên ilmê ku li ciyên ji navendê dûr dixebitîn, li ser axa kurdan vir de wê de, hatin Tirkiyê û dest pê kirin forseke mezin bidin xwe. Ez, nivîskarê naçizane yên van rêzikan, wek şagirtêkî li ser riya nîqaş û xebatê ji aliyê hin mirovên şarezaya hatim handan ku ilmê heqîqetê tiştan bi dest bixim, çawa ku Platon ji aliyê Sokrates hatibû handan (1957: 26)

Li gor Şêx “ev deryayên ilm îrfan û ronahiyê” winda bûn çûn û tiştan li şûna wan maye qalikê wan e. Ruhê mîrata nifşê berê winda bûye, wek ku berê hatibû qalkirin, gelek ji Şêx û xelîfeyên heyî bi cahilbûn û mijûlbûna bi “îdiayên beredayî yên gihiştina alema nexuyayî” dihatin tawanbarkirin (b.n.b). Ji tecrubeyên mîstîk an destkeftiyên ruhanî bêpar dihatin tarîfkirin. Bi nêrîna Şêx, Kurdistanê bi vî awayî şênbûna xwe û “deryayên wê yên ronahiyê ziwa bûn” winda kir (b.n.b). Aliyê duyem ê vê demajoya qirêjbûnê, ku Jwaideh baş bala xwe dayê, tunebûna dewleteke kurdan a serwer bû û ji serî heta dawî xirabûna rewşa civakî-siyasî bû. Şêx zêde tişteki nabêje ka rewşa yekem ji ber ya duyem e an na. Lê, ilm û îrfana li Kurdistana osmanî ya sedsala nozdemîn bandora wêranker a têkçûna mîrekiyên kurd ên li ser rewşa civakî-siyasî yên li Kurdistanê eşkere dike.<sup>45</sup> Şêx dewletê tenê wek saziyeke ku dikare nîzam û ewlehiyê ava bike nabîne, lê wek aktoreke avakar a şaristanî an moderbûnê jî dibîne. Li gor wî, yek girîngtirîn rolên ku dewlet dikare bilîze perwerdekirina xelkê ye. Ev aliyê rola dewletê hema bêje her tim di nêrînên wî, name û helbestên wî de tê îmakirin. Ev yek ji girîngtirîn hokeran e ku Şêx ber bi dewleteke kurd a serbixwe ve dibe.<sup>46</sup> Ev helwesta derbarê dewletê de bi taybetî di vê beşa nameya Şêx a bo misyonerê amerîkî Dr. Cochran de baş xuya dike:

Di nav tiştên din î xirab de, belkî we eşîra... Şikak jî, ku bi kirinên xwe yî xirab û wêranker tê naskirin... û [ku] wê di halê xwe yî hov de bimînin... bihîstibe. Dewleta osmanî jî, wek a Îranê, ya ne xwediyê amûrên bişaristankirina van insanan e an jî wan îhmal dike. Navê

44 Ji bo temsiliyeta vê nêrîna derbarê dîroka Îslamiyê ku hewl dide “destpêka xirabûna misilmanan” tesbît bike, bnr. Maududi (1985).

45 Ji bo bêtir agahî li ser mîrekiyên kurd bnr., Jwaideh (2006).

46 Brw. Nameyên Şêx bo Iqbal ad-Dowleh di nav Celîl, *Kürt Halk Tarihinden 13 İlginç Yaprak/13 Rûpelên Balkêş ên Dîroka Gelê Kurd*: 38-43.

*Kurdistanê bi xirabî derketiye û hatiye bêqîmetkirin, ferq nehatiye xistin navbera kesên aştxwaz û dilxirab.*<sup>47</sup> (dupatkirin lê hatiye zêdekirin).

Di nameya jor de, Şêx îdia dike hikumetên osmanî û îranî bi zanebûn rê li ber perwerdeya ev eşîrên kurdan digrin. Angaşî dike ev komên kurd di “halê hov” de dihêle ku ev herdu hikumet siyaseta xwe li Kurdistanê bikaribin bidomînin. Lewma, him dewleta osmanî jî a kaçarî jî li dijî kurdan bi kirina heman tiştan tawanbar dike. Ji aliyekî ve, ji perwerdekirina gelê kurd direvin û dihêlin ev eşîr hemû sûcên kirêt bikin; ji aliyekî din ve jî, vê bo “*resimkirina hemû kurdan wek hov*”<sup>48</sup> bi kar tînin. Şêx dibêje ji ber vê hemû kurd bi hev re wek “hov” tînin naskirin. Lewma:

Divê hûn vê bizanibin ku ev hemû ji ber ihmalkariya rayedarên tirk û farisan e, ji ber ku Kurdistan di navbera ev herdu welatan de ye, herdu hikumet, ji ber sedemên li gor xwe, şexsên baş û xirab de ji hev venaqetînin. Bi vî awayî ev şexsên xirab wek xwe dimînin, xelkekî xwedî rûmet navekî xirab pê dikeve û wêran dibe.<sup>49</sup>

Li gor vê, dikare bê angaştkirin ku Şêx avakirina dewletekê wek amraza serkeftina vê projeya vejîner jî dibîne. Dewletê tenê dabînerê qanûn û nîzamê nabîne lê wek garantorê neteweyeke perwerdekirî jî dibîne. Eşkere ye ku Şêx perwerdeyê wek dermanê tengaviya kurdan dibîne. Tevî vê, li gor wî, tunebûna perwerdeya giştîyê li Kurdistanê sedema sereke ya vederkirina kurdan e. Şêx di nameya xwe ya bo Iqbal ed-Dewle<sup>50</sup> dibêje “em dizanin ligel kurdên baş ên xirab jî hene lê tu kes nafikire *ku yên xirab perwerde bike*”<sup>51</sup> û [lewma ne mumkun e] kurd bê perwerde şaşiyên xwe rast bikin (Celîl, 2007: 42). Li gor vê, Şêx perwerdeya giştîyê wek mifteya jiyana birûmet û insanî û ji bo kurda wek riya revînê ji hejariyên niha, dibîne.

Rola amrazî ya perwerdeyê ewqas zêde tê barekirin, tê wê radeyê ku wekîlên Şêx jî girîngiya perwerdeya giştîyê bipejirînin. Xelîfe Seyîd Muhamed, xwezûrê Şêx, di civîna xwe ya bi konsolosê brîtanî Abbott re, endîşeyên xwe anî zimên ku Ubeydulah, “ger bi ser keve, wê ji heqê heydûdan bê, li ser sînorên Tirkiye û Îranê nîzamê ji nû ve saz bike, li qaideya wekhevîyê muameleya wekhev bi xiristiyan û misilmanan re bike, *perwerdeyê bi pêş ve bibe*,”<sup>52</sup> û bihêle dêr û dibistan bînin avakirin.” (Jwaideh: 85).

Xuya ye Şêx di wê baweriyê de bû ku bicîanîna projeyên li jor qalkirî desthilatdariya dewletê pêwîst dike. Bêguman, wî ji vê bawer fikir ku hedef divê li ber çavên ewropîyan maqûl, û herwiha, modern bin.<sup>53</sup> Xelîfe Seyîd Muhamed, dema ji bo afi-

47 Belgeyên Parlamentoyê. Tirkiye. Hej. 5. (1881. Belgeya pêvek 3. No 5/61).

48 B.n.b.

49 B.n.b.

50 Waliyê Urmiyeyê di salê 1880an de.

51 Dupat lê hatiye zêdekirin.

52 Dupat lê hatiye zêdekirin.

53 Hemû delîl destnîşan dikin ku Şêx têdigihîşt ku li cîhanê çî diqewimî. Dr. Cochran dibêje

randina dewleteke kurd ji ewropiyan piştgirî dixwest, ev hedefên muntazam pêşkêş kiribû. Ji vê wêdetir çûbû û gotibû ger ‘Ubeydulah qewlên xwe neyîne cî, “ew amade ye li dadgeha Ewropayê bê darizandin û li bende encamên wê be” (Tirkiye No. 5; 1881. Belgeya pêvek di hej. 56). Di heman demê de, Şêx, bi riya wekîlê xwe, digot ne faris ne jî osmanî naxwazin bo refaha kurd û xiristiyanan gavên girîng bavêjin û fikra xwe xurttir dikir. Ji belgeyên jor jî dikare bê famkirin, Şêx di navbera tunebûna perwerdeya giştîyê û hebûna diyardeyên wek rêgiriye de korelasyoneke yekser dibîne ku ger ew di afirandina dewletekê de serkeftî bibe, soz dide wê ji holê rake,. Di *Mesnewiya* xwe de ku tê de berdengên (muxatab) biyanî tunene, derbarê hebûna rêgiriya kurdan de tu agahî tune. Lê, angaşt dike mirovek çiqas bi qabiliyet dibe bila bibe an pêşiyên wî/wê çiqas biesil (*asl-e najib*) dibin bila bibin, pêdiviya wî/wê bi perwerdeyê heye ku bikaribe potansiyela xwe bi kar bîne (Nehrî: 121). Herwiha ji bo temsilkirina gelê kurd zêr wek analojîyekê tê bikaranîn, îdia dike digel ku zêrê xam heman made ye ku xişir jê tîn çekirin, ji bo bibiriqe û biqîmet bibe divê li ser bê xebitandin (b.n.b). Li gor wî, kurd “qewmekî yekta’ ye di warê hostatiya huner û fazîletê de (*fazl u honar*): ger ew baş bîn perwerdekirin, tu kes nikare bi qasî wan şareza bin” (b.n.b). Ger ew “di bin serokatîyekê de bîn ba hev, wê bibin xwedî dewleteke yekta (*bî-masal va bî-nazir*)” (b.n.b). Li vir dupata Şêx a li ser yekitiya kurdan di bin serokatîyekê de, bi nêrînên wî yên neteweperwer ên deqerûtir ku di nameyên wî de cî digrin, li hev e (bnr. Celîl, 2007: 45-58). Ev bi taybetî girîng e ji ber ku dema bo yekitiya siyasî bang dike, Şêx kurdên ne-misilman bi awayekî eşkere li derve dihêle.

Agahiyên derbarê hûrgiliyên ku Şêx tê de dewleteke modern bi têgîn dike, û firehiya têgihiştina wî ya dewletê, gelek kêr in. Lê, ên li jor tîn wê wateyê ku Şêx ji pêwistiya dewletekê bawer dikir da ku kurd bîn perwerdekirin, xwe biparêzin li hemberî êrişên biyanî, ewlehî û hêminiya xwe ya hundirîn pêk bînin (bnr., Nehrî: 121).

### Encam

Ji bo biencamkirina vê mijarê, bandora paşxaneya etnîk û peywenda çandî di têgihiştina Şêx a derbarê Îslamîyetê de berbiçav e. Bi gelek awayî, sînoren şîroveya wî ya îslamî bi sînoren neteweyî yên “muxayel”, bi qewlê Benedict Anderson, re li hev in. Şêx, li gor sînoren etnîsîteya kurd sînoren xwe yî dînî ji nû ve xêz dike. Berhema helbestî ya Şêx a berê nekişifkirî bû bo me agahiyên kêmpayda yên têgihiştina wî ya derbarê kurd û êdinên wan de dabîn dike. Ji ber ku helbestên wî diselmînin ku nêrînên wî yên dînî bi neteweperweriya wî re li hev in, berhem alikariya çareserkirina îhtilafa nêzbûnên dualî yên derbarê serhildana wî de dike. Şêx vejînerêkî kurd î misilman bû. Lê, vejîneriya wî ya dînî vederker bû. Ne wek piraniya vejînerên misilman ên

---

Şêx “hez dikir li ser her babetî bi min re sohbet bike. Ew heftiya li mala wî mam, min bi wî re gelek axaftinên xweş kirin. Pir bala wî dikişand agahiyên derbarê îcadên nû û xweşikayên cîhana Rojava (nql. Speer, 1911: 80).





- Celil, C. (1998). *1880 Şeyh Ubeydullah Nehri: Kürt Ayaklanması (1880 Serhildana Kurd a Şêx Ubeydulah Nehri)*. Wer. M. Aras. Istanbul: Pêri Yayınları.
- Celil, C. (2007). *Kürt Halk Tarihinden 13 İlginç Yaprak (Sêzdeh Rûpelên Balkêş ji Dîroka Gelê Kurd)*. Istanbul: Evrensel.
- Chelebi, K. (1957). *The Balance of Truth*. Bi pêşkêşiyekê hatiye wergerandin (wer. Lewis. G. L.). London: George Allen and Unwin LTD.
- Deringil, S. (2003). "They Live in a State of Nomadism and Savagery". *Comparative Studies in Society and History* 45(2), 311-42.
- Deringil, S. (1998). *The Well-Protected Domains: Ideology and the Legitimation of Power in the Ottoman Empire, 1876-1909*. London: I.B. Tarus .
- Jwaideh, W. (2006). *The Kurdish National Movement: Its Origins and Development*. Syracuse, N.Y.: Syracuse University Press.
- Iqbal, M. (2006). *The Reconstruction of Religious Thought in İslam*. Batu Caves: Selangor Darul Ehsan.
- McDowall, D. (2004). *A Modern History of the Kurds*. London: I.B. Tarus .
- Mardin, Ş. (2006). *Religion, Society, and Modernity in Turkey*. Syracuse, N.Y.: Syracuse University Press.
- Makdisi, U. (2002). After 1860: Debating Religion, Reform, and Nationalism in the Ottoman Empire. *International Journal of Middle East Studies* 34 (4), 601-17.
- Makdisi, U. (2002). Ottoman Orientalism. *The American Historical Review* 107(3), 768-96.
- Maududi, A. A. (1985). *Khilafat va Mulukiyyat (The Caliphate and Kingship)*. Paveh: Entesharât-e Bayan.
- Nehri, S. U. (2000). *Mathnavî-yi Shaykh Ubaydullah-i Nehri: Tuḥfat al-Aḥbab*. Urmia: Haidari.
- Strohmeier, M. (2003). *Crucial Images in the Presentation of a Kurdish National Identity: Heroes and Patriots, Traitors and Foes*. Leiden; Boston: Brill.
- Nursi, B. S. (2009). *İçtimai Dersler (Social Lessons)*. Istanbul: Zehra Yayıncılık.
- Olson, R. W. (1989). *The Emergence of Kurdish Nationalism and the Sheikh Said Rebellion, 1880-1925*. Austin: University of Texas Press.
- Rahman, F. (2002). *İslam*. Chicago: University of Chicago Press.
- Satan, A. (2008). *Halifeliğin Kaldırılması (The Removal of the Caliphate)*. Istanbul: Gökkuşbu Yayınları.
- Soleimani, K. (2016). The Kurds and "Crafting of the National Selves." Di nav M. M. Gunter (ed.), *Kurdish Issues: Essays in Honor of Robert W. Olson (236-257)*. Costa Mesa: Mazda Publishers.
- Speer, E. R. (1911). *The Hakim Sahib, the Foreign Doctor: A Biography of Joseph Plumb Cochran*. New York: Revell.
- van Bruinessen, M. (1992). *Agha, Shaikh, and State: The Social and Political Structures of Kurdistan*. London; Atlantic Highlands, N.J.: Zed Books.
- Zeydanlıoğlu, W. (2008). "The White Turkish Man's Burden": Orientalism, Kemalism and the Kurds in Turkey. In G. Rings and A. Ife. (eds.), *Neo-Colonial Mentalities in Contemporary Europe? Language and Discourse in the Construction of Identities (155-174)*. Newcastle upon Tyne: Cambridge Scholars Publishing.





*Netewe [yek ji ew] têgehên cîhana modern e ku  
herî zêde ew nehatiye teorîzekirin  
- Partha Chatterjee<sup>5</sup>*

**Puxte:** Ev gotar destnîşan dike ku ne neteweperwerî ne jî dîn dikare bi serê xwe bîn lêkolandin û têkiliya navbera “îslamîti” û neteweperweriyê teorîze bike. Ez îdia dikim îslamîti nikare ji netewe-dewletê wêdetir sistemeke siyasî tesewur bike û xuya ye sînorên siyasî yên rabêja netewe-dewletê dahundi-randiye. Dahundi-randîneke bi vî awayî jî li fahma îslamî ya têgehên umet û ‘gerdûnxwaz’iyê (universalist) jî bandor dike. Ev xebata min bi israr bala xwe dide ser peywenda analîza şîrove-yên dînî. Di hizra dînî de digel hêmanên ber-dewamiyê, bandorên peywendê pratîka şîroveya dînî vediguherîne û mohra taybetîtiya demkî (temporal specificity) lê dixe. Muhammad Iqbal (1877–1938) demekê diyar kiribû ku “ji ber vê peywira misilmanekî modern pir girîng e. Lazim e ew temama sîstema îslamê bêyî ku bi temamî ji rabirdûyê veqetîne ji nû ve hizir bike.” Lê jinûvehizirkirin ne tiştêkî bi serê xwe ye û nîşaneyên hevbandoriya bi peywendên civakî-dîrokî re di xwe de dihewîne; di serdema neteweperweriyê de hizra dînî bi qasî ku ji peywenda xwe bandor digre ji peywenda wê jî bandor digre. Ev diyalektîk xwe wek beramberî û têkelbûna berdêlvan (mutual entanglement) xuya dike. Di vê nivîsê de, ez li ser van beramberî û bêrdêlvaniyên neteweperwerî û îslamîtiyê disekinim.

### **Destpêk**

Di vê gotarê de ez li ser bandora neteweperweriyê ya li ser hizra îslamî ya modern disekinim. Bi vî awayî, min gotara xwe kir du beş. Di ya yekem de, bi riya mînakên dîrokî nîşan didim di dawîya sedsala 19mîn û destpêka sedsala 20mîn de rabêja neteweperwer çawa hêdî hêdî dinizile nav şîrove-yên nû yên îslamê. Nîqaş dikim ku şîrove-yên îslamî her diçe vederker (exclusionary) dibe. Gelek nivîskar û ramangerên tirk û ne-tirk bo misilmanekî heqîqî pîvanên xwe danîne.<sup>6</sup> A rast, tenê di peywenda

5 Partha Chatterjee, *The Nation, and Its Fragments: Colonial and Postcolonial Histories*, Oxford India Paperbacks (Delhi; New York: Oxford University Press, 1995), xi.

6 Bo bêtir agahî derbarê vê babetê de bnr., Kamal Soleimani, *Islam and Competing Nationalism*

neteweperweriyên misilman ên dijber de mirov dikare gotinên neteweperwer ên vejînerên ereb wek Muhammed ‘Abdul (1849-1905) û Rahman el-Kawakibi (1855-1902) fam bike.

Li dijî vê paşxaneyê bû ku el-Kawakibi îdia dikir ku xwîna erebên Hîcazê wek ên din neguheriyê û xira nebûye û ji ber vê tenê ew guncav in bo serokatiya cîhana misilman. Dupatek bi vî awayî derbarê xwînê de, îdiayeke nixumandî bo Qureyşiyên heqîqî –Xwedê giravî xwediyên heqîqî yên xelîfetiye ne- di nav misilmanan de pey-dabûn û îstîlaya siyaseta etno-neteweperwer destnîşan dikir.<sup>7</sup>

Beşa duyem a vê gotarê bo tespîtîkirina ku “îslamîti” nikare di nav sîstemeke siyasî ya ji netewe-dewletê wêdetir bifikire, terxan dikim. Ez dibêjim îslamiyan fikra sî-norên siyasî yên neteweyî dahundirandine. Dahundirandineke ku bandor li pênaseya têgehên umet û ‘gerdûnxwazî’yê jî dike.

### I. Vejîna îslamî ya modern û peywenda wê ya civakî-dîrokî

Di hizra dînê misilmantiya modern de, netewe jixwe heye, eşkere ye: ji ber ku aktorê dînî di nav paradigmataya neteweperweriyê de tevdigere, meyl dike terza îfadeya wê ya dînî bi ya neteweperweriyê ve girêbide. Jiyana di nav ‘paradigmataya neteweyî’<sup>8</sup> de awayê hizirkirineke modern a neteweyî ferz dike, û dike ku aktorê neteweperwer terza îfadeyên neteweperwer bo ravekirina nêzîkbûna xwe ya bo neteweyê bi kar bîne.<sup>9</sup> Ev paradigma pêdiviyên xwe li ser şîroveyên dînî ferz dike, û wek peywendekê jinûvehizirkirina dîn kar dike, herwiha bandor li asoya wê û sînorên wê dike.

Pêdiviyên paradigmatîk ên wisa divê bo kelijîna dîn û neteweperweriyê wek zemînên girîng bînin hizirkirin. Ji ber heman sedemê, heweskariya misilmanên modern a bo peyda kirina rêbazên demokratîk di serdema zêrîn de divê di nav vê peywendê de bê dîtin. Hewldanên wan î bo jinûvesazkirina rabirdûya dînî jî dibe ku meyla wan bêtir li ser çêkirina rabirdûyeke bikaribe bi dewleta modern re li hev be, ne ku ji dil lobî bikin bo jinûve-nasandina ‘misilmantiya resen.’ Nêrînên misilmanên modern ên derbarê dewletê de, jihev-veqetîna hêzan û rêbazên rêvebirinê, wek ku di paragrafa jêr de hatiye bimînakkirin, tenê vê meylê destnîşan dikin:

Dema serî li niha, rabirdûya dîrokî û dewra çar xelîfeyan didin, piştî hûrnêrinekê ji me ve xuya dibe ku di wê dewrê de *sîstema siyasî ya serwer –heta radeyeke mezin- bala xwe daye qaideya jihev-veqetîna hêzan*. Di wê heyamê de zagonçêkirin hatibû spartin bo “lijneyeke hiqûqzanên ku ji darêzgeriya zagonî serbixwe bûn.” Xelîfe, wek serokdewlet, ne pîsporek bû di warê şerîetê de; ji dêvla wê, *erka wî –ya sereke- bi bicîanîna zagonan û rêvebirinê*

*in the Middle East, 1876-1926*. (New York: Palgrave, 2016).

7 ‘Abd al-Rahman al-Kawakibi, *Um Al-Qura* (Cairo: al-Azhar, 1931) 196-97.

8 Bnr. Michael Billig, *Banal Nationalism*. (London; Thousand Oaks, Calif.: Sage, 1995).

9 Bo nîqaşeke berfireh derbarê vê mijarê de bnr. Billig: 1995.

*sînokirî bû. Ew ên xwedî hêzek serbixwe bûn dadger bûn. Xelîfe û rêvebirên wî tabîî wê bûn, wek her kesekî din (îtalîk aîdî min in, K.S.).*<sup>10</sup>

Geleperîkirin û xeletiyên dîrokî li aliyekî, di paragrafa jor de, têgeha dewleta modern li ser rabirdûyê tê ferzkirin an rabirdû bi têgeha modern re tê lihevanîn. Netewe-dewleta modern dibe pîvana jinûvexwendina dîroka rêvebirîya misilman. Ev xwendina ku di îdiaya yekşêwe û berdewamiyê de ye dişibe dîroknûsiya neteweperwerîya prîmordial. Ji ber vê, lazim e bê destnîşankirin ku mirov nikare ne neteweperwerî ne jî hizra dînî ya îslamiya modern bi tenayî li ser bixebite.

Vejîneriya îslamî hewleke jinûvesazkirina rabirdûyê ye –rabirdûyeke ku him xizmeta niha bike him ji niha re meydan bixwîne. Vejîneriya îslamî, tevî awayên wê yên cihê yên dîrokî, li hemberî têngînkirinên hemdem ên îslamê helwestên tezat nîşan daye. Rexnelêgirtina li misilmanên modern ji ber dûrketina wan a ji ‘misilmantiya resen’ bûye kakilê îdiayên vejînerên îslamî. Îdiayên bi vî rengî bêyî ku haya wan jê hebe vê rastiye jî tesdîq dikin ku zanîna dînî an şîroveyan derbarê îslamê de beşek ji hewlên mîrovî ne û lewma her dem îzafî ne û bi peywendê ve girêdayî ne. Şîroveyan vejîner jî ne îstisnayeke vê qaideyê ye. Lê, şeweyên modern ên vejînerî an ‘îslamîti’ye îdia dikin ku peyama resen, di halê xwe xwerû de, dikare ji nû ve bê bidestxistin. Varyasyonên îslamî eşkere ne di îdiaya xwe ya bo gihiştina taybet a bo wateya resen.<sup>11</sup> Têgeha fundamentalizm jî –digel pênasekirina wê ya gewherxwaz û pêjdaraz- bi îronî îdiaya vegera bo têngîhiştina resen bo “qaideyan bingeîn” di xwe de dihewîne. Bi giştî, boçûnên vî rengî di xwezaya derveyî peywendê ya dîn de hûrgilî û berfirehiya (şumûlbûn) baweriyê nîşan didin.

Şîroveyan dînî nikare ji şertên dîrokî û peywendên xwe yî civakî-siyasî bîn veqetandin. A rast, xwendineke serveyî ya berhemên zanyarên dînî yên dawîya sedsala 19mîn meyla nijadî û etnîk a berbiçav eşkere dike. Lewma, bandorên etnîk ên li ser şîroveyan dînî jî dibe ku berdewamî û taybetîtiya peywendê mecbûr dike. Wek mînak, vejînerên misilman ên ne-tirk derbarê xelîfe û siyaseta wê de bêbiryar in. Bebiryarîya wan ji ber hestên wan î neteweyî û dînî ye û ketiye rengê hestên antî-kolonyal. Herwiha, şîroveyan vejîneran di heman demê de di bin bandora rewşa neteweyî, modernîst, û civak, siyaseta û çanda antî-kolonyal de cereyan dikir.

Vêga pirs ev e, di çihana îslamê de gelo neteweperwerî bixwe di gewherê xwe de sekuler e an na. Dîrokê de, hizra dînî her tim marûzî gelek şîroveyan maye. Dînê îslamê jî ne îstisnaya vê qaideyê ye, û ew bawerîya ku komên cuda yên etnîk ku ji aliyê Xwedê

10 Nql. Al-Şa‘îdî Al-Tashrî‘ wa-sann al-qawānīnfi al-dawla al-Islāmīya, dirāsatahlīliya/Legislation and the Enactment of Laws in the Islamic State: An Analytical Study, (Cleveland: Dār al-nahḍa al-Islāmīya, 1992) 46-55.

11 Brwb. (Berawird bike). Sayyid Quṭb, *Milestones*, 1st ed. (Karachi: International Islamic Publishers, 1981). û *The Islamic Concept and Its Characteristics* (Indianapolis IN, USA: American Trust Publications, 1991).

ve hatine tercihkirin an gelê Wî yê hîlbijartî ne hin ji van şîroveyan e. Ji ber vê, pir zehmet e mirov xwendinên neteweyî yê îslamê li derve bihêle ji ber ku “Bi qasî şertên ku îslamê li ser piya dihêle ewqas cureyên îslamiyetê hene.”<sup>12</sup> Her wiha xebera antropolog Talal Asad e ku ‘dîn’ nikare pênaseyek wê ya gerdûnî bê kirin, lazim e “em guh bidin kesên jê bawer dikin ka ew çawa pênase dikin.”<sup>13</sup> Lê zehmet e mirov bi Asad re hem-fikir be dema dibêje “her çiqas di dîroka hemdem a Rojhilata Navîn de îslamîtiyê her tim daye dû neteweperweriya ereb, û rasterast xitabî netewe-dewletê dike jî, divê wek awayekî neteweperweriyê neyê dîtin.”<sup>14</sup> Asad dema dibêje îslamîti ne sekuler e rast e<sup>15</sup>, îdiaya wî ya bêbal ku dibêje “neteweperwerî di eslê xwe de sekuler e” problematîk e.<sup>16</sup>

Nêrîna Asad ji ber çend sedeman lêhûrbûnekê heq dike. Divê destnîşan bikim ku ew argumenta xwe dispêre pênaseya xwe ya têgeha umetê, ku vejandina wê armanca talî ya îslamîtiyê ye.<sup>17</sup> Li gor Asad, ew awayê ku umet pê tê tesewurkirin îslamîtiyê ji meylên neteweyî, wek erebyetî, cuda dike. Asad îdia dike ku erebyetî umetê wek umeta ereban (el-‘arabiyye) –civateke siyasî- texeyul dike. Herwiha diyar jî dike ku ev civata siyasî ya muxayel cuda ye ji “mekaneke ji aliyê teolojîk ve hatiye pênasekirin ku derfet dide misilmanan [ên serdema navîn] li dinyayê wacibeyên dîn bi cî binin.”<sup>18</sup> Xwendina Asad him bandora dîrokî ya neteweperweriya ereb li ser îslamîtiyê û him meylên neteweperwer ên niha di şîroveya vejîner a ereb-îslamiyan a bo umetê, nabîne. Rast e ku îslamîti bi “kevneşop”ê re elaqeya wê heye. Lê, bi qewlê Katherine Ewing, kevneşop di nav “nerîna moderniteyê” re derbas bûye.<sup>19</sup> Mirov dikare komên vejîner ên misilmanan wek ew ên ku dixwazin “serdema niha ji nû ve şîrove bikin bi riya jinûvenirxandin û jinûvesazkirina rabirdûyê ku bi peywenda modern re guncav be.”<sup>20</sup> Lewma, di xwendina Asad a peywenda modern de ku ev girêdanên “kevneşop”ê çêdikin tê ihmalkirin.

A din, xwe-cudakirina etnîk herî zêde di vejîneriya misilmanên ereb de berceste bûye. Ji aliyê dîrokî ve, vejînerên ereb misilmanên ne-ereb wek yek ji sedemên “xi-

12 Aziz al-Azmeh, *Islams and Modernities*, Phronesis (London; New York: Verso, 1993), 1.

13 Nql. Ann Taves, *Religious Experience Reconsidered: A Building-Block Approach to the Study of Religion and Other Special Things* (Princeton, N.J.: Princeton University Press, 2009), 23.

14 Talal Asad, *Formations of the Secular: Christianity, Islam, Modernity*, Cultural Memory in the Present (Stanford: Stanford University Press, 2003), 199.

15 B.n.b., 195.

16 B.n.b.

17 B.n.b., 196-98.

18 B.n.b., 197.

19 Katherine Pratt Ewing, *Arguing Sainthood: Modernity, Psychoanalysis, and Islam* (Durham and London: Duke University Press, 2006).

20 Andrew Rippin û Jan Knappert, *Textual Sources for the Study of Islam*, Textual Sources for the Study of Religion (Manchester Greater Manchester: Manchester University Press, 1986), 30. dûpat hatiye lêzêdekirin.

rabûn” an “qirêjbûn”a (*inhiṭat*) îslamê dîtine.<sup>21</sup> Piranî di îslamiyetê de rola ne-ereban bi awayekî neyênî nîqaş kirine. Îmaya etnîk a ravekirinên wisa eşkere ye, ji ber ku vejînerên ereb “nepakbûn”a têgihîştina ne-ereban a misilmantiyê bi karakterên wan î etnîk û bi dîroka wan ve girêdidin.<sup>22</sup> Wek mînak, Muhammad ‘Abduh, vejînerê îslamî yê navdar î misrî qet teredud nake dema dibêje “ji ber ku tirk dereng bûne misilman, nikaribûne ruhê îslamê fam bikin.”<sup>23</sup> Dibêje desthilata tirkên osmanî “xwerûbûna (*khulus*) zimanê erebî xira kiriye û di nav misilmanan de bûne sedema lihevnekirin û terîqetparêziyê.”<sup>24</sup>

Li gor fikra ‘Abduh di navbera zimanê erebî û îslamê de girêyek organîk heye. “Qirêjbûn”a ya yekem, li gor ‘Abduh, bûye sedema “hilweşîn”a ya duyem. ‘Abduh di berhema xwe ya sala 1902 de, *al-Islam wa al-Nasraniyya*, îdia dike ku “îslam [di eslê xwe de] dînê ereban e.” Lê biryara xelîfeyê abasî “bo afirandina artêşeke biyanî ku ji tirk, deylemî û xelkê din [ne-ereb] pêk tê... îslam jixwe dûr xist –an biyanî kir... ew [dîn] guherand kir ne-ereb (*ecem*).”<sup>25</sup> Tenê ‘Abduh wisa nedifikirî. Ji aliyê vejînerên

21 Heta Muhammad Iqbal jî xirabûyîna (*inhiṭat*) Cîhana Misliman dipejirîne. Yek ji helbestên wî bi sernavê “di dema xirabûyîna de, teqlîd ji îjtihadê çêtir e,” wiha dibêje:

Serdema niha gelek teşqele vedişêre  
 Di bin serê xwe de; mîzaca wê ya bêsekin  
 Diherike di nav aloziyan de. Civaka  
 Miletên qedîm di vê wextên modern de  
 Di nav sergêjîyê de ne; bêruh bi guliyê jiyanê ve girtiye  
 ...

Îstiqrara di nav teqlîda hişk de.  
 Tu jî bide ser riya bavê xwe, ji ber ku li wir e  
 Aramî; riayet tê wateya  
 Hevgirtina civatê.  
 Di payizê de, tu ku bê pel mayî  
 Wek mêywe ti car ji darê neqete,

Muhammad Iqbal, *Rumuz-I Bekhudi* wer. Iqbal Academy Pakistan (Iqbal Academy, 1918, <http://www.allamaiqbal.com/> Hat dîtin: 10/01/2016). Divê bê destnîşankirin ku Iqbal ev helbest di sala 1918ê de nivîsandiye. Di berhemên piştî vê salê de, xuya ye zêde girîngî nade riayet/teqlîdê. Wek mînak, di berhema xwe sala 1930î de, Iqbal diyar dike ku “hurmeteke derewîn bo dîrokê û vejandina wê ya sînî ji bo *xirabûna* xelkê nabe derman” (dûpat hatiye zêdekirin). Bnr. *The Reconstruction of Religious Thought in Islam* (California: Stanford University Press, 2012), 203.

22 Bnr. Muhammad ‘Ammara. *Abd al-Rahaman Al-Kawakibi: The Martyr of Islam and Freedom*. (Cairo: Daralshuruq, 1988)

23 Hamid ‘Enayat, *Seyri Dar Andishay-E Siyasi-Ye Arab/ An Overview of Arab Political Thought* (Tehran: Sherkat-e Sohami-ye Kitabha-ye Jibi, 2536), 149.

24 B.n.b.

25 Muhammad ‘Abduh, *Al-Islam Wa Al-Nasraniyya/ Islam and Christianity* (Cairo: al-Manar, 1323/1905), 123.



din î îkonîk jî, el-Kawakibi û Rashid Rida (1865-1935) jî tê de, şîroveyên manend dikirin.<sup>26</sup> Heta Hassan el-Benna (1906 – 1949), damezrênerê Biratiya Misilman, carekê îlan kiribû ku “em înkâr nakin ku neteweyên cuda taybetmendiyên xwe û karakterekî xwe yî manewî yê cuda heye [lê] em bawer dikin ji van aliyan ve para mezintirîn û bêkêmasî ya ereban e...”<sup>27</sup>

Berovajî fikra Asad, xuya ye pênaseya umetê ya vejîneran ji neteweperwerên ereb zêde cudatir tiştêkî nabêje.<sup>28</sup> Li vir divê bê destnîşankirin ku jinûvepênasekirina umetê gelekî di bin tesîra têkoşîna antî-kolonyal a dawîya sedsala 19mîn û destpêka sedsala 20mîn de têkoşîneke ku şikil daye xwe-têgihîştina misilmanên modern û kiriye ku vejîner hemû alema misilman wek bitunek siyasî-dînî bibîne li hemberî Rojavaya kolonyal a xiristiyan. Ligel vê, gotinên misilmanên ereb ên vederker û etno-dînî derbarê xelîfe de derfet dida umet di nav sînorên etnîk û siyasî de bê sêwirandin.<sup>29</sup>

Bi rastî, nivîsên vejînerên misilman, wek ên el-Kawakibi dibin *mînakên* veneqetînbariya îdiayên îslamî û neteweperwerên ereb ên bo xelîfetiya dawîya sedsala 19mîn û destpêka sedsala 20mîn. El-Kawakibi îdia dike ku hemû misilman wek destpêka îslamiyê wê bikevin dû xelîfeyekî ereb. Li gor wî, ev rast e ji ber ku bawer dike “ji hemû komên etnîk, ereb ên zêdetirîn biwesf in (*ansab*) ku lazim e wek kaniya [resen] dîn (*marja’an fi al-dini*) bèn dîtin û bo hemû misilmanan bibin rol model (*qudwa*).”<sup>30</sup> Di nivîsên el-Kawakibi de fama etnîk a *umetê* têra xwe eşkere dibe dema misilmanan wek *umam* (bi awayê pirhejmar) polîn dike.<sup>31</sup> Lewma, îlan dike ku “ti neteweyê misilman (*umam al-Islamiya*) bi qasî erebên Nîvgiravê ne bi hewes in bo parastina serxwebûn û azadiya xwe.”<sup>32</sup> El-Kawakibi îdia dike erebî ne tenê zimanê

26 Brwb. Mahmoud Haddad, “ Arab Religious Nationalism in the Colonial Era: Rereading Rashîd Riḍā’s Ideas on the Caliphate “ *Journal of the American Oriental Society* 117, no. 2 (Apr. - Jun., 1997). Also, ‘Abd al-Rahman al-Kawakibi, *Um Al-Qura* (Cairo: al-Azhar, 1931).

27 Hasan al-Banna, “Our Message,” [http://www.ymsite.com/books/our\\_message/index.htm](http://www.ymsite.com/books/our_message/index.htm). Hat dîtin: 10/01/2015.

28 Asad tesdîq dike ku umet were wateya “xelkekî” (*Formations of the Secular: 197.*) Lê, ev têgeh ji tiştê ku Asad wek “şîûra ‘xelkekî’ –di Qur’anê de ‘civatek’- bi nav dike” (B.n.b.) zêdetir tişt dihewîne. Di Qur’anê de, civatek misilman jî wek umetê tê pejirandin, Ibrahim –mirovek tenê- jî wek umetê qebûl kirin (2/143; 21/92; 23/52). Her wiha, komek biçûk a misilman, a cihû û ya xiristiyan jî [(3/104; 7/159; 3/113) berovajî civatên wan î giştî yên cuda], bi têgeha umetê hatine destnîşankirin. Qur’an carna vê têgehê bo pênasekirina kevneşopeke dînî (7/159), û carna bo civateke kesên peyameke nû ya pîroz înkâr dikin an dipejirînin jî bi kar tîne (3/113). Merhaleya destpêkê ya jiyana mirovatiyê –ku wek homojeniyê kolektîf tê fikirîn- jî wek umeteke yekgirtû tê pênasekirin (*umma wahîda*, 43/22 & 23).

29 Bo bêtir agahî bnr., beşa sêyem.

30 Al-Kawakibi, *Um Al-Qura*, 196-97.

31 *Umam* (pirjimar; yekjimar: *umma*)

32 Al-Kawakibi, *Um Al-Qura*, 195.

yekemîn (*khusus*) î yek ji sê parên gelheya mislimanên cîhanê ye, ew zimanê wan î zêdetirîn berbelav (*umum*) û dewlementirîn e.<sup>33</sup> Bo berevaniya mafê taybet ê ereban bo xelifetiyê, el-Kawakibi çendîn taybetmendiyên “payebilind” ên neteweyî yên ereban dijmêre, û dibêje ew “yekemîn *umma* ne ku prensibên istîşareyê tetbîq bikin.”<sup>34</sup> Jê wêdetir, bal dikêşîne ku ereb “ummaya zêdetirîn amade ne *al-ishtrakiya*<sup>35</sup> (wekhevîtî) bi cî bînin...”<sup>36</sup> û zêdetirîn dilxwaz in bo rûmetdayina peymanên xwe.”<sup>37</sup>

El-Kawakibi pir zelal dibêje bicîanîna peyama Pêxember û vejîna îslamiyetê tenê bi riya damezrandina xelifetiya ereb gengaz e.<sup>38</sup> Di wê baweriyê de ye jî ku xelife-yekî ereb ancax dikare rizgariya (*falah*) ereban pêk bîne.<sup>39</sup> Her wiha, el-Kawakibi ji helbestvanê ereb ê serdema navîn neqil dike ku dibêje “xelk girêdayî milukê xwe ne [bo her serkeftinê] û wê ti carî di bin hukimdariya milukên ne-ereb de xilasiya ereban pêk neyê.”<sup>40</sup>

Divê bê destnîşankirin ku pirtûka el-Kawakibi di nav vejînerên misilman ên ereb de gelekî populer e. Ewqas populer e ku Sammi Dahhan, yek ji jiyannamenûsê el-Kawakibi, dibêje pirtûk “ji aliyê Abduh an Rida –du kesayetên vejîner ên navdeng-ve hatiye revîzekirin.”<sup>41</sup> Li gor el-Kawakibi, îslam û ereb nikare ji hev bînin veqetandin. Tenê gelê ereb dikare “hilweşîna şaristaniya îslamî” ku tirk û gelên din î ne-ereb bûne sedem, bide sekinandin. Di eslê xwe de,

berevaniya el-Kawakibi ya şaristaniya îslamê payebilindkirina ereban bû di geşbûna vê şaristaniyê de. Fezîletên îslamê –zimanê wê, Pêxemberê wê, nîzama wê ya exlaqî û siyasî ya destpêkê de- serkeftinên ereban in. Bi nêrîna wî, paşveçûna îslamê ji ber kirinên tirk û gelên din î ne-ereb bûye ku ketine nav umetê, û heyfa xwe lê tîne ku tirk bûne misilman... el-Kawakibi bang li osmaniyan dike ku dev ji dawa xelifetiyê berdin û vî meqamî radestî xwediyên wê yên heq, yanê ereb, bikin.<sup>42</sup>

Rabêja xelifetiyê di dawiya mayî ya alema sunî de piranî zanîna xwe ji fikrên antî-kolonyal werdigirt, û ji ber vê car bi car bi xwe re fikra piştewaniya osmaniyan

33 B.n.b.

34 B.n.b., 196.

35 Têgeha *el-ishtrakiya* di wateya sosyalizmê de tê bikaranîn. Lê li vir xuya ye qesta el-Kawakibi wekhevî ye.

36 Al-Kawakibi, *Um Al-Qura*, 196.

37 B.n.b.

38 B.n.b., 150-51.

39 B.n.b.

40 B.n.b., 151.

41 Abbas Mahmud Al-Aqqad, *‘Abd Al-Rahman Al-Kawakibi* (Beirut: Dar al-Kitab al-‘Arabi, 1969), 81.

42 William L. Cleveland, *A History of the Modern Middle East* 2nd ed. (Boulder, Colo.: Westview Press, 2000), 126.



dianî. Lê, bo ereban xelîfetî têgeheke li derveyî vê helwestê bû.<sup>43</sup> Her wiha, dawiya sedsala 19mîn û destpêka sedsala 20mîn de, di nav ereban de fahma têgehên wek umet û xelîfeyê ji yên suniyên din bêtir regekî wan î etnîk hebû. Boçûneke bi vî rengî bo vejandina vê saziyê, bi pêşengtiya xelîfeyekî ereb, bertekên têkel ên van şexsiyet û komên misliman wek ‘Abduh, Rida û Vahabî yên li hemberî kolonyalîzma ewropî dikare ronî bike. Ji ber tirsê ku îdiaya wan têk bibe –heta dema li hemberî kolonyalîzma ewropî aliyê osmaniyan digirtin ji- him neteweperwer him vejînerên ereb bêdil bûn xelîfetiya osmanî meşrû bibînin.<sup>44</sup>

Şaş e ku mirov hizir bike piştî mirina Xelîfeyê çaremîn di sala 656ê de, misilmanan her tim umeteke yekreng texeyul kirine. Ev rast e ku di serdema navîn de misilmanan bawer nedikirin ku civata wan temamî civateke siyasî ye.<sup>45</sup> Belkî tenê çend dehsal piştî mirina Pêxemberê misilmanan rêvebiriya siyasî ket destê du hevrikên siyasî –yek navenda wê li Medîneyê û ya din li Şamê. Peydabûna navendên hevrik ên hukim-dariyê bû destpêka parçebûna misilmanan a bêdawî –ev parçebûn, di sedsalên pey re, rehendên wê yên nû çêbûn û hê mezintir bûn. Lê, îxtilafa misilmanan bi awayekî cuda hat şîrovekirin. Heta hedîs jî (gotinên pêxember, yj. *hadith*, pj. *ahadith*), qe nebe ji aliyê teolojîk ve wek pîrozkirina (*rahmahtun*) Xwedê, bo rewakirina ixtilafên nav umetê hatin bikaranîn.<sup>46</sup> Şîroveyên bi vî rengî<sup>47</sup> bi temamî bêbingeh bûn, bi giştî ji înkarkirina pêwistiya dewletê bigre heta rewakirina hevhebûna du dijberên siyasî di nav civatê, rêz dibûn. Piraniya suniyan amade bûn qebûl bikin ku piştî çar xelîfeyan (Xwedê giravî *Khulfah al-Rashidun*, an Xelîfeyên Rêberiya Rast) hedîs bi temamî meşruiyeta hemû milûkan red dike.<sup>48</sup> Li gor heman hedîsê, piştî wê civata misliman wê ji aliyê milûkên zorbe an bêdad (*‘adud*)<sup>49</sup> bèn îdarekirin.<sup>50</sup>

Mirov çiqas dupat bike têr nake ku fikrên vejandina umetê û xelîfeyê rastîn bi hîl-tina neteweperwerî û anti-kolonyalîzma di cîhana misilmanan de çawa li hev aliqîne, diyardeyeke ku ser peywenda dîrokî ya hevpar a neteweperweriya ereb û vejîneriya îslamî kişif dike. Di nav du sedsalên borî de, vejîna îslamî bûye awayekî ku misilmanên modern nîgeraniyên xwe formule dikin. Vejîneriya îslamî, bi xwe şêwazên wê yên

43 Brw. Al-Aqqad, *‘Abd Al-Rahman Al-Kawakibi*.

44 B.n.b., 75.

45 See, Talal Asad, *Genealogies of Religion: Discipline and Reasons of Power in Christianity and Islam* (Baltimore: Johns Hopkins University Press, 1993), 197.

46 Alimên misliman hê jî li ser vê hedîsê nîqaş dikin. Bnr., <http://www.ebnmaryam.com/vb/t32140.html>. Hat dîtin: 10/01/2016.

47 Bnr. Soleimani (2016).

48 Bnr. Soleimani (2016).

49 *‘Adud*, ji kokpeyva *‘adda* tê; wateya wê esil, devlêkirin an bidestxistina tiştêkî bi zora diranan.

50 Otorîteyên mezin ên hedîsên sunî wek Terminal û Nisaei vê hedîsê neqil dikin. Bnr., <http://www.dd-sunnah.net/forum/showthread.php?t=5679>. Hat dîtin: 10/01/2016

curbecur hene, bi cureyên cuda yên neteweperweriyên etnîk, erdnigarî û hokarên din î peywendbar ve dihat barkirin. Ji destpêkê ve, vejîneriya îslamî bixwe di fikara rêvebiriyêke pêbawer û resen de bû, bi taybetî jî li hemberî gefa kolonyal. Lê, ev nebû asteng ku neteweperwerî bi hêsanî binizile nav rabêja îslamiya modern a vejîner.

Dawiya sedsala 19mîn û destpêka 20mîn de, ereban rabêja xelîfetiye ji misilmanên din zêdetir “etnîsize” kirin. Lê, hewce nake mirov bêje di temama cîhana misilman de fikra xelîfetiye her diçû bêtir hêz ji neteweperweriyê digirt. Di 1924ê de hilweşandina xelîfetiya osmanî ev meyla hevpar a di nav misilmanan de kişif kir. Çiqas komên cuda yên misilman hewl didan rabêja nostalgîk a xelîfetiye zindî bihêlin jî, di heman demê de heta ji wan dihat pêşekî didan sînoren xwe yî neteweyî bo xelîfetiya îslamê.<sup>51</sup> Îltimasên neteweyî yên vî rengî di yekem konferansa bo vejîna xelîfetiye ya di 1926ê de li Qahireyê encam dan. Di konferansê de “her şandeya beşdar xwest hukimdarê xwe bike xelîfe.”<sup>52</sup> Yanê, damezrandina xelîfetiye di eslê xwe de ne gerdûnî bû. Ger ew wek berceştkirina dewleta rastîn a îslamî bûya jî, komên îslamî, bi giştî, afirandina xelîfetiyeke muhtemel di nav warên xwe yî mewcûd û lokal, neteweyî de disêwirandin. Ev girîng e mirov li ber çav bigre ka ev komên ku wek fundamantalîst an îslamî tèn binavkirin jî sînoren dewleta netewe-dewletê dahundirandine an na.

### I. Îslamîti, neteweperweriya banal û netewe-dewlet

Manewraya îslamiyan a di nav sînoren netewe-dewletê de û armanca wan a stratejîk bo kontrolkirina binemayên dewletê ew mecbûr kirin ku bi çendîn awayan bi neteweperweriyê re mijûl bibin. Helbet, îslamîti *ne* neteweperwerî ye, ger neteweperwerî di *eslê xwe de sekuler* bê tesewurkirin. Lê, wek ku Partha Chatterjee dibêje neteweperwerî dikare têgeheke pêkhatî be û ji bo bi orf û adetên çandî yên herêmi re li hev bike têkeve şiklên cuda, eleqeya wê ya bi neteweperweriyê têkeltir e.

Hewldanên îslamiyan ku bi saya netewe-dewletê kar dike bixwe dibe zemîna kelijîna dîn û siyasetê, ku ji aliyê “berjewendiyên neteweyî” tê xwedîkirin. Dewleta modern ne bi temami dîn ji qada giştî rakir, ne ew di siyasetê de qedexe kir, ne jî li hemberî dîn bû guhnedêr an bêalî. Netewe-dewleta modern her daîm dîn îdare kir, ji nû ve li ser fikirî, û bi neqandinê hin wechên dîn daxilî xwe kir an ji xwe dûr xist. Lê muameleya dewletê a bi dîn(an) re di nav çarçoveya rejimeke legal (yanê sekulerî) de bû, û ji ber vê şîroveya dewletê ya derbarê dîn de bendîkar bû. Ger mirov

51 Di nav misilmanên Asyaya Başûr de ji bo meseleya ka neteweperwerî çawa dikare di nav tevgera xelîfetiye de bê bicîkirin, bnr. Adeeb Khalid, “Pan-Islamism in Practice: The Rhetoric of Muslim Unity and Its Uses,” in *Late Ottoman Society: The Intellectual Legacy*, ed. Elisabeth Özdalga (London; New York: RoutledgeCurzon, 2005).

52 Kemal H. Karpat, *The Politicization of Islam: Reconstructing Identity, State, Faith, and Community in the Late Ottoman State*, Studies in Middle Eastern History (Boston, MA: Brill, 2001), 257.

çav li axaftina tîr a dînî ya îslamiyan bigerîne, ferq dike him îslamî him ne-îslamî di îdarekirina dîn de stratejiyên manend hebandine. Dewlet çi îslamî be çi neteweyî be şîroveya dînî dike pawana (monopoly) xwe. Pawankirineke wisa an bi riya guhne-dan an bi temamî cezakirina şîroveyên dînî yên aktorên ne-dewletî pêk tê. Pratikên dewletê Îran<sup>53</sup>, Misir<sup>54</sup>, Erebestana Siudî û Tirkîyeyê<sup>55</sup> yên sî salên dawî de têra xwe mînakên vê didin me.

Îslamiyan îslam ji nû ve şîrove kirin û di nav çarçoveya paradigmayê neteweperweriyê de bi wê re muamele kirin. Bandora pêdiviyên paradigmayêke wisa lazim e neyê sivikkirin. Ger îslamî, wek heta niha nikaribin bêyî netewe-dewletê –wek “awayê îdeal” ê rêvebirina modern- bifikirin, wê bibin rehînek din a ku Billig bi konetî wek “neteweperweriya banal”<sup>56</sup> bi nav dike. (Neteweperweriya banal dikare wek tesdîqkirina bêhemdî û berzîkirina netewe-dewletê bê famkirin. Bi gotîneke din, netewe-dewletê bê îtirazê tê qebûl kirin.) Tiştê îslamiyan motîve dike mijûliya wan a bi siyaseta modern re ye an na, ev pîrseke talî ye. Li vir mesele ew e ku vîzyona siyasî ya îslamiyan ji ya cureyên din î *homo nationalis* nikare bê veqetandin. Di îslamîtiyê de jî, wek di awayên din î hizra modern de, sînorên dewletê bi yên neteweyê re li hev diqelîbin. Yekî/a îslamî memnûn e ji rewşa xwe ya legal û neteweyî ku ji dawîya mayî ya “umet”a îslamê cuda ye û nebendkirî ye.

Normalbûna memnûniyetên vî rengî modern e û neteweyî ye. Ger pênaseyek wisa rast be, ewçax ên îslamî ne li gerdûneke cuda de dijîn ne jî awayekî cuda yê jiyandî disêwirînin an diparêzin ku bikaribe li derveyî çarçoveya netewe-dewleta modernê bicîkirin. Li gor îslamiyan, wek welatî, qebûl kirina sînorên neteweyî ne dubendiyek e. Ji ber vê ye ku li Îranê farîsên misilman ên şîî bi serbilindî, tevî tiştên din, ku divê serokdewlet li Îranê hatibe dinyayê û şîîyê bi eslê xwe îranî be (*Iraniul-asl*), kirine mecbûriyeteke makezagonî.<sup>57</sup> Rastiyeke wisa raberî me dike ku yekî/a îslamî divê wek muadilê xwe yî xirîstîyan an cihû wek “*homo nationalis*”ekê bê tesewirkirin. Ligel vê,

53 Zextên bînavber ên dewleta Îranê li ser aktorên dînî yên cuda, bi pêşengtiya *Shi'i Maraji'* (an Ayetullahên Mezin), delîlê vê rastiya nikare bê înkarkirin ku dewlet dixwaze şîrovekirina dînî ya dînê xwe pawana xwe.

54 Serpêhatiyên Nasr Hamid Abu Zayed û Nawal al-Saadawi, li hemberî şîrovekirinên îslamê yên bêdilê dewletê, du mînakên helwesta dewleta sekuler in.

55 Belkî li Tirkîyeyê siyaseta nixumandinê beriya her tiştî bê-alîtiya dewleta ‘sekuler’ a li hemberî dînê kir. Li Tirkîyeyê di nîqaşên berdewam ên derbarê serpoşê de, dewletê bêsekin û her dem îslamîbûna nixumandinê da ber pîrsan. Dewlet aliyekî nîqaşê bû, ne ji ber berevaniya wê ya sekuleriyê bû, lê bêtir hewl dida bide zanîn nixumandinê tiştêkî ne-îslamî ye. Dewleta tirk bi eşkereyî zanyarên îslamî yên nêz-dewlet teşwîq dikirin û piştewaniya wan dikirin ku dînîbûna nixumandinê bidin ber pîrsan.

56 Bnr. Billig, 1996.

57 Bnr., Made 115mîn a Makezagona Komara Îslamî ya Îranê. [http://www.roshd.ir/Portals/0/KarAfarini/PDFs/rules/ghanoone\\_asasy.pdf](http://www.roshd.ir/Portals/0/KarAfarini/PDFs/rules/ghanoone_asasy.pdf). Hat dîtin: 10/01/2016.

bi qewlê Balibar, “sînorê derve yê dewletê bûye ‘sînorê hundirînê welatîyan,<sup>58</sup> wek ku rastiya hişk a jîyanê ya di paradîgmaya neteweyî de îcab dike.

Wek berê jî hat raberkirin, îslamî kêfxweş in ji sînorên netewe-dewletê. Bi gelem-perî, ji bilî hin retorîkên derbarê rola kolonyalîzmê di ferzkirina sînorên erdnigarî yên niha, lîteratureke girîng tune ku raber bike ku dahundirandina sînorên neteweyî dikare bo sedeqeta dîndariya misilmanan bibe pirsgirêk. Tesdîqkirina bêhemdî ya sînorên etnoneteweyî yên heyî û derbirînên neteweyî yên barekirî vê rastiye destnîşan dikin.<sup>59</sup> Li vir tiştê lazîm e bê dupatkirin, misilmanek, çî kevneşoparêz be çî îslamî be, ne şert e xwe bêdîn bibîne dema sînorên netewe-dewletê tesdîq dike. Takên wisa xwe wek parçeyek ji civata dîndaran ku ji aliyê sînorên etno-neteweyî yên bêdilê wan hatiye parçekirin, nabîne.<sup>60</sup>

Çend dehsaleyên dawî li çend welatan kontrola desthilatdariya dewletê pêşkêşî îslamiyan kir. Vê derfetê, di çend mînakên de, potansiyela xwenîşandana alternatîfa netewe-dewletê dabîn kir. Lê, ne tenê îslamiyan ti rêbazên alternatîf ên rêvebiriyê pêşkêş nekirin; pir êşkere nikaribûn di awayên rêvebiriyê de ciyawaziyeke radikal raber bikin. Wek mînak, dema îslamî desthilatdar bûn hewl dan zagonên neteweyê bêtir bikin dîni, li aliyê din bi temamî têkçûn di rakirina sînordariyên ku ji aliyê

58 Etienne Balibar û Immanuel Maurice Wallerstein, *Race, Nation, Class : Ambiguous Identities* (London England; New York: Verso, 1991), 95.

59 Ji xeynî Biratiya Misliman û Partiya Ba's a Iraqê, ti dewletên ereb herêma ereb a li Îranê wek axa ereban a dagirkirî nabînin. Di lîteratura siyasî ya Biratiya Misliman de, ev herêm wek “erebîstana dagirkirî” an ‘*Arabstan al-muhtallah* (têgeha *al-muhtall* bi giştî ji aliyê neteweperwerên ereb bo Filistînê bi kar tînin) pênase dikin. Bnr., <http://www.ikhwanwiki.com/index.php>. Hat dîtin: 10/01/ 2016. Helbet Biratiya Misliman (*Ikwan al-Muslimin*) di çend dehsaleyên borî de bi rejîma Îranê re têkiliyek wê pir tîkel hebû. Ev mînak tê destnîşankirin bo bixêzkirina ku di lîteratura komên îslamî de sînorên etnîk û dîni çawa dikare ji xwe ber li hev bialiqin. Di van referansan de neteweperweriya veşartî bêtir êşkere dibe dema Biratiya Misliman (a sunî) li Îranê piştgiriya erebên şîî dike lê ji qedera kurdan re jî, ku piraniya wan sunî ye, bi temamî çavê xwe digre.

Dewleta Îslamî ya Iraq û Levant (ISIL) wek anomaliyek muhtemel û komeke ku ji bandora neteweperweriyê dûr maye xuya dike. Lê, çendîn hoker hene ku nîşan didin berovajîya vê rast e, ji ber ku: a) ISIL bixwe bertekek erebên sunî ye li hember geşedanên ku di dehsalên borî de li Iraq û Sûriyeyê rû dane. Ji ber vê sedemê ye ku efserên ba'sî yên berê marîpiştê binemaya leşkerî ya ISILê pêk tînin. 2) Xuya dike peyama gerdûnî divê ji zarûriyetek îdeolojîk bêtir wek amraza peydakirina milîtanên ji çar aliyê cîhanê bê dîtin. Beriya piştgiriya amerîkî ya hewayî bo kurdan sala 2014a de, ISIL li derveyî Iraq û Levantê şer nekiribû. Komên derveyî wir ku tê gotin parçeyek ji ISILê ne, ji kirinên wan îlham digirtin. Ew ne dewama ISILê yê rêkxistinkirî bûn. 3) Zimanê erebî zimanê fermî yê ragihandinê ye û di xwe-têgihîştinê de cîyekî navendî digre, ku karakterê wê yê etnîk diselmîne. 4) Dîsa, ew yekî ne-ereb hêjayî rola xelîfetiye nabînin.

60 Bo nîqaşeke balkêş derbarê lihevaliqîna sînorên dîni û neteweyî bnr. Philip W. Barker, *Religious Nationalism in Modern Europe: If God Be for Us*, Routledge Studies in Nationalism and Ethnicity (London; New York: Routledge, 2009).

komên etnik ên serdest di nav peywenda neteweyî de hatibûn danîn. Wek mînak, rejima Îranê an hukimeta tirk a nêz-îslamî ne tenê wek dewletên faris û tirk tevgeriyan, lê bi awayekî gewherî di warê temsiliyeta siyasî, çandî û zimanî ya Adinê etnik de bêtehemuliya wan dewam kir.

Dema îslamî desthilatdar bûn, bi gelek awayî siyaseta neteweyî ya muhafezekar ji nû ve hilberandin. Lê ligel diruşmeyên wan î gerdûnî û dij-rojavayî, nêrînên siyasî yên îslamiyan têra xwe neteweyî ne. Wek hemû netewe-dewletên din, siyaseta karên derve ya dewletên îslamî bi gelemperî ji aliyê “berjewendiyên neteweyî” ve tîr diyarkirin. Wek mînak, him rejima Îranê him komên îslamî yên ereb derbarê gelek babetên wêranî de xwedî helwestên cuda ne, ku ji pêwendiyên firehtir ên îslamî bêtir ji aliyê siyaseta lokal ve tîr diyarkirin. Wek mînak, komkujiya endamên Biratiya Misilman û mirovên sivil ên bêberevanî li Hamayê<sup>61</sup> tîkiliyên dostane yên navbera Îran û Suriyeyê qels nekir; ew xurttir jî kirin. Şerê qirkirinê yên li Balkanan û piştevaniya bêsînor a Rusyayê bo rejima Slobodan Milošević di salên 1990î de qet nebû sedema ku Îran rexne li siyaseta derve ya Rusyayê bigre. Çespanîna gelheya misilman li Çînê jî têra xwe ne girîng bû ku li Îranê di çapameniya dewletê de çî bigre.<sup>62</sup> Dema dor tê ser misilmanan, li derveyî sînorên xwe yî neteweyî, ev dewlet guhnedêr in an babetên vî awayî re li gor zarûretên banal ên berjewendiyên xwe yî neteweyî muamele dikin.

Xala sereke ev e ku fahma misilmanan a derbarê îslamê de di bin bandora neteweperweriya modern û arezûya kontrolkirina dewletê de ye. Li vir armanc ne ev

61 Komkujiya Hamayê di Sibata 1982ê de pêk hat, dema artêşa Sûriyeyê di fermanên serokê welêt, Hafiz el-Esad, li dijî bajêr operasyonêk giran a bejayî da meşand. Pevçûna niha ya li Sûriyeyê û hevalbendîtîyên li dor vê pevçûnê mezintirîn manîfesto ne ku kom û rejimên îslamî li ser hîmê meyl û berjewendiyên neteweyî çawa dabeş dibin. Balkêş e ku Hizbullah, Îran û rejima Beşar Esad hevalbendên Rusyayê ne. Helwesta Tirkîyeyê zêdetirîn ji aliyê bêtehemuliya wê ya bo destkeftiyên siyasî yên kurdan tê diyarkirin û ji ber vê carna dibe hevalbendê Rusyayê, carna dibe yê Siûdî, Qatarî û DY.

62 Di 2009î de Ibrahim Nabavi, satîrîstê îranî yê navdar, neliheviyên di siyaseta dewleta Îranê ya derbarê mislimanên li dinyayê eşkere kir. Nabavi, derheqê bédengiya rejima Îranê li hemberî zextên Çînê li ser kêmara xwe ya misliman, wiha nivîsandibû:

Berevaniya mislimanên li Almaniya, Îtalya [û li welatên din î Ewropaya Rojava] mecburiyeteke dînî ye. Ji ber ku ew in, ku ji Îranê, Iraqê, Tirkîyeyê û Sûriyeyê bo jiyana xwe reviyane... Ger ew misliman dixwazin bimrin bila vegerin welatên xwe... Meseleya mislimanên çînî parçeyek ji meseleyên navxweyî yê Çînê ye. Ji ber ku zêdetirî hezar sal in mislimanên çînî welatê xwe neterikandine û ew tenê li welatê xwe tîr kuştin. Dîsa, em nikarin îtiraz bikin li komkujiya ku Rusya li Çeçenyayê dike ji ber ku em ê tîkilî meseleyên wan î navxweyî nebin. Ew misliman li Rusyayê jî najîn; li welatekî din dijîn... Em bê şert û merc hemû mislimanên kuştî piştî koça wan a bo welatekî Ewropaya Rojava, wek Almaniya, diparêzin.  
<http://www.roozonline.com/persian/tanssatire/tans-satire-article/archive/2016/july/12/article/bc1127ea53.html>. Hat dîtin: 10/01/2016.



e ku îslamiyan bi bêsamimiyetê sucdar bike lê armanc ew e ku bê destnîşankirin wan netewe-dewlet “wek cureyek îdeal” pir zêde dahundirandine. Ancax di vê peywendê de mirov dikare gotinên Hassan el-Banna fam bike dema dibêje “ger dema qesta wan bi ‘welatparêzî’ yê xurtkirina pêwendiyên be ku şexsan bi welatekî diyar ve girêbide, û raberkirina rêbaza bicîanîna vê xurtkirina berjewendiyên wan be, ewçax di vê babetê de em ligel wan in. Ji ber ku îslam vê wek peywireke dînî ya pêwîst qebûl dike...”<sup>63</sup>

Nêrîna li welatparêziyê wek peywireke îslamî bixwe nîşaneya kelijîna neteweperwerî û îslamîtiyê ye di jinûvesazkirina hizra îslamî ya modern de. Belkî ya girîngtir jî hebandina bêqestî ya rêbazên modern e di pênasekirina neteweyê de ji aliyê kesên wek el-Banna, ji ber ku ev diyar dike ku “yên îslamî” nasnameya neteweyî pir zêde pejirandine. Asta bandora neteweperweriyê ya li ser îslamiyên wek el-Banna, dema nêrinên wî bi yên Iqbal re –ku *Adinên* wî ne-misilman in- bê beramberkirin, dikare bê famkirin.<sup>64</sup> Iqbal nîqaş dike ku “hestên welatparêziyê ku hizra neteweyî tîne bîra mirov, cureyek perestiya objeya material e, ev jî li dijî ruhê îslamê ye ku wek protestoyek li hemberî hemû awayên kone û qebe yên putperestiyê peyda bûye.”<sup>65</sup>

### Encam

Nasnameya neteweyî awayekî taybet ê nîşandan an sêwirandina neteweya mirov e. Bi qewlê Billig “xwedîbûna nasnameyê neteweyî xwedîbûna rêbazên axaftina derbarê netewetiyê ye.”<sup>66</sup> Xwedîbûna rêbazên axaftina derbarê netewetiyê diyardeyê modern e. Wek ku li jor jî hat diyarkirin, aktorê dînî yê modern jî meyl dike neteweyê wek diyardeyê jixwe-êşkere têbigihê; ji ber ku aktorê dînî di nav paradigmaya neteweperweriya modern de tevdigere, amade ye hişmendiya xwe ya dînî bi ya neteweperwer ve bike yek. Her wiha, ji ber ku paradigmaya neteweperweriyê bo jinûvehizirîna dîn peywendekê çêdike, bandor li jinûveşîrovekirina wê dike û wê xwedî dike. Paşxaneya etnîk û peywendên neteweyî/çandî fahma misilmanê modern a derbarê îslamê de dişêwîne. Bi gelek awayan, di civatên cuda yên misilman de şîrovekirina dînî teqabulî sînorên neteweyên wan î “muxayel” dike. Gelek mislimanên kevneşoparêz û îslamî netewe-dewletên xwe yî heyî bê îtiraz dipejirînin û sînorên xwe yî dînî û dîrokên xwe ji nû ve xêz dikin da ku bi yên neteweya wan re guncav bin.

Fikra sabit a îslamiyan bo desthilatdariya dewletê qasî ku nîşaneya dahundirandina îslamiyan a sînorên neteweyî ye, heman demê de bandora neteweperweriyê li

63 Hassan al-Banna, “Our Message”.

64 Bo pirtûkek balkêş derbarê neteweperweriya misliman di destpeka sedsala 20mîn de li Hindistanê, bnr. Faisal Devji, *Muslim Zion: Pakistan as a Political Idea*, (Cambridge: Harvard University Press, 2013).

65 Muhammad Iqbal, *Stray Reflections* (Iqbal Academy, 1910), 35.

66 Billig, *Banal Nationalism*, 8.

ser hizra misilman a siyasî ye jî. Îslamî dema tîn ser desthilatdariyê, mecbûr dimînin gelek fikrên xwe yî mexrûr, “gerdûnî” biterikînin ji ber hewcedariya berjewendiyên banal ên dewletê. Îslamiyên modern ji netewe-dewleta modern bêtir li ser hin zagon û polîtîkayên dewletê nîqaş dikin. Bo yên îslamî, xwezaya dewleta modern hê jî li ser nehatiye fikirîn ji ber ku ew bê îtiraz tê pejirandin. Ên îslamî li dewletê, di awayê wê yê modern de, wek aktorê sereke bo guherîn û kontrolkirina bicîanîna polîtîka û bernameyên xwe yî muhafezekar, dinêrin. Lewma vejîna îslamî ya modern, digel awayên wê yên curbecur, vederker, lokal e û di nav sînorên netewe-dewleta modern de dimîne.

---

#### ÇAVKANÎ

- ‘Ammara Muhammad. *Abd al-Rahaman Al-Kawakibi: The Martyr of Islam and Freedom*. (Cairo: Daralshuruq, 1988)
- ‘Abduh, Muhammad. *Al-Islam Wa Al-Nasraniyya/ Islam and Christianity* Cairo: al-Manar, 1323/1905.
- ‘Enayat, Hamid. *Seyri Dar Andishay-E Siyasi-Ye Arab/ An Overview of Arab Political Thought*, Tehran: Sherkat-e Sohami-ye Kitabha-ye Jibi, 2536.
- Al-Aqqad, Abbas Mahmud. *‘Abd Al-Rahman Al-Kawakibi* Beirut: Dar al-Kitab al-‘Arabi, 1969.
- Al-Azmeh, Aziz. *Islams and Modernities*. Phronesis. London; New York: Verso, 1993.
- Al-Banna, Hasan. “Our Message.”  
[http://www.ymsite.com/books/our\\_message/index.htm](http://www.ymsite.com/books/our_message/index.htm). Hat dîtin: 10/01/2016.
- Al-Kawakibi, ‘Abd al-Rahman. *Um Al-Qura*. Cairo: al-Azhar, 1931.
- Asad, Talal. *Formations of the Secular: Christianity, Islam, Modernity*. Cultural Memory in the Present. Stanford, Calif.: Stanford University Press, 2003.
- . *Genealogies of Religion: Discipline and Reasons of Power in Christianity and Islam*. Baltimore: Johns Hopkins University Press, 1993.
- Balibar, Etienne, and Immanuel Maurice Wallerstein. *Race, Nation, Class: Ambiguous Identities*. London England; New York: Verso, 1991.
- Barker, Philip W. *Religious Nationalism in Modern Europe: If God Be for Us*. Routledge Studies in Nationalism and Ethnicity. London; New York: Routledge, 2009.
- Bazargan, Mehdi. *Inqlab-E Iran Dar Do Harakat/ the Iranian Revolution in Two Opposing Directions* Tehran: Mazaheri, 1983.
- Billig, Michael. *Banal Nationalism*. London; Thousand Oaks, Calif.: Sage, 1995.
- Chatterjee, Partha. *The Nation and Its Fragments: Colonial and Postcolonial Histories*. Oxford India Paperbacks. Delhi; New York: Oxford University Press, 1995.

هه و الناصه  
 كتيبي



- Cleveland, William L. *A History of the Modern Middle East* 2nd ed. Boulder, Colo.: Westview Press, 2000.
- The Constitution of the Islamic Republic of Iran.*  
[http://www.roshd.ir/Portals/0/KarAfarini/PDFs/rules/ghannoone\\_asasy.pdf](http://www.roshd.ir/Portals/0/KarAfarini/PDFs/rules/ghannoone_asasy.pdf).
- Devji, Faisal. *Muslim Zion: Pakistan as a Political Idea*. Cambridge: Harvard University Press, 2013.
- Ewing, Katherine Pratt. *Arguing Sainthood: Modernity, Psychoanalysis, and Islam*. Durham and London: Duke University Press, 2006.
- Green, Garrett. *Theology, Hermeneutics, and Imagination: The Crisis of Interpretation at the End of Modernity*. Cambridge, U.K.; New York, NY: Cambridge University Press, 2000.
- Haddad, Mahmoud. "Arab Religious Nationalism in the Colonial Era: Rereading Rashid Riḡā's Ideas on the Caliphate." *Journal of the American Oriental Society* 117, no. 2 (Apr. - Jun., 1997): 253-77.
- Iqbal, Muhammad. *Armaghan-I Hijaz 1938*. <http://www.allamaiqbal.com/>.
- . *The Reconstruction of Religious Thought in Islam*. California: Stanford University Press, 1930.
- . *Rumuz-I Bekhudi* Translated by Iqbal Academy Pakistan. Iqbal Academy, 1918.
- . *Stray Reflections* Iqbal Academy, 1910.
- Karpat, Kemal H. *The Politicization of Islam: Reconstructing Identity, State, Faith, and Community in the Late Ottoman State*. Studies in Middle Eastern History. Boston, MA: Brill, 2001.
- Khalid, Adeeb. "Pan-Islamism in Practice: The Rhetoric of Muslim Unity and Its Uses." In *Late Ottoman Society: The Intellectual Legacy*, edited by Elisabeth Özdalga, xvii, 348 p. London; New York: RoutledgeCurzon, 2005.
- Qutb, Sayyid. *The Islamic Concepts and Its Characteristics*. Indianapolis IN, USA: American Trust Publications, 1991.
- . *Milestones*. 1st ed. Karachi: International Islamic Publishers, 1981.
- Soleimani, Kamal. *Islam and Competing Nationalism in the Middle East, 1876-1926*. New York: Palgrave, 2016.
- Rippin, Andrew, and Jan Knappert. *Textual Sources for the Study of Islam*. Textual Sources for the Study of Religion. Manchester Greater Manchester: Manchester University Press, 1986.
- Taves, Ann. *Religious Experience Reconsidered: A Building-Block Approach to the Study of Religion and Other Special Things*. Princeton, N.J.: Princeton University Press, 2009.

# Li Hemberî Notirvanên Neteweyê Notirvanên Nerîtê

ŞARO I. GARÎP

Jl TIRKÎ: BESRA

*Ew ên netewe û gelên din înkâr dikin, yekemîn  
penageha ku wê birevinê gerdûnîxwazî ye*

Ev gotar ceribînek e derbarê netewe, neteweperwerî û etnîsîteyê de ku du sed salên dawî de sosyolojî, siyaset û antropolojî de yek ji wan babetan e ku zêdetirîn tîrî nîqaşkirin. Nîqaşên li ser tîrî neteweyê li seranserê dinyayê hê jî bi heraret dewam dikin.

**“Babeta bîngê a felsefeyê endustrîbûn ne lê neteweperwerî ye; makîneya dîkelê û computer ne lê netewe ye.” (Nairn, 2015)**

Wê zêde ne şaş be ger mirov bêje li Tirkiyeyê lê bi taybetî di nav kurdan de derbarê van mijaran de sergêjiyeke zihnî heye. Wek mînak kurd ji aliyekî ve nehewcetiya dewletê diparêzin lê li aliyê din pir bi hewes hewl didin şaşî an kêmasiyên dewletên serwer rast bikin. Di mînakeke din de kurd di her firsetê de dibêjin tu derdê wan bi ala neteweyê re tuneye lê diyar e derdê wan bi ala wan re heye. Di her wesîle û nîqaşê de dupat dikin ku ew ne neteweperwer in. Gelek caran em nikarin xwe rizgar bikin ji paradîgma û teoriyên ku dinya me ya zihnî dorpêç dikin û pîrsa bikin. Bi taybetî raveya zanistî ya di warê sêbareya netewe, etnîsîte ango dewletê de carbicar dikare bê veguhestin bo zanîna îdeolojîk û taliya talî hegemonyayeke îdeolojîk. Em dibînin di vî warê de bi taybetî teoriyên Anderson, Gellner û Hobsbawm ji aliyê alîgirên wan ve

---

---

---

---

---

---

li bazarê baş tèn firotin. Ji ber ku olîgarşiya fikrî ya navenda serwer, wek zanîngeh û çapamenî van fikran di piyasayê de di tedawulê de dihêlin. Lêbelê xebatên payeberz ên Anthony D. Smith, digel ku ev paradîgma û hegemonyaya teorîk hejandin jî, ji ber ku ji aliyên etnîsîteyan, ku ji ew amrazên navborî yên tehequmê bêpar in, ne bazarkarîkirina wan em dikarin îdia bikin têt nehatin xwendin jî. Ji ber vê, Anderson bi rêwresmeke muhteşem hat veşartin û Smith jî bi rêwresmeke sade hat veşartin.

### **Destpêk**

Yek ji pirsên vê xebatê ev e, ka bo çi hewcedarî heye bo netewe an neteweperwerî, ya rasttir bo têgeha nasnameya neteweyî. Ango wek ceryanên gerdûnîxwaz îdia dikin gelo hemû gunehên du sedsalên dawî yên netewe, ya rasttir, yên neteweperweran e? Di vê nivîsê de em ê liser ew hokerên dibe sedema sergêjiya di warê têgeha neteweyê de ku ev du sedsal e teorisyen liser negihîştine pênaseyeke hevpar, bisekinin.

Wê baş be em ewil bi kurtî behsa bandora rêbazê ya li ser lêkolînê bikin. Boçûnên me yî di warê xebatên zanistên civakî de li gor amrazên em bi kar tînin diguherin. Têgeh, mînak û teoriyên wek referans tèn nîşandan dikare bandoreke mezin bikin li ser analîz û encamên lêkolînan. Wek mînak, lêkolînek dikare bi teleskopê di nav çarçoveyeke makro de jî bê kirin, lê bi mîkroskopê analîzeke ber bi kûrahiyê jî dikare bê kirin. Berawirdkirin, delîl, mînak an hin caran pirsên heyatî gelek caran gelek tiştan li nîqaşên zanistî zêde dikin.

Her çi qas rêbaza lêkolîner, hîlbijartina têgehan, nîrxandin subjektîf be jî, mijara lêkolînê bixwe û dane, diyardeyên derveyî me ne û objektîf in. Hin sînoren boçûna me ya subjektîf hene, divê nîrxandinên me honakê neke şûna diyardeyê yan daneyan neguhere û nebe lêkolînêke manîpulekirî ku ji serî de encama wê diyar e. Li vir wek rêbaz, netewe û neteweperwerî di çarçoveyeke makro de tenê wek nîqaşeke teorîk li ser nayê sekinandin lê çêbûna neteweyê û hîmên mîkro yên teorîk ên neteweperweriyê û bandora wan a li ser tevgerên yek bi yek takekesan jî bi awayekî mîkro wê liser bê sekinandin. Heta ku gengaz be gelek caran wê bê hewldan bi berawirdkirin û mînakdayinan teorî û realiteya heyî di heman demê de bê famkirin.

Dikare bê gotin, nîqaşa derbarê netewe û neteweperweriyê taliya talî nîqaşa li ser nasnameyê ye jî. Di vê gotarê de bêtir em ê ji vî alî ve nêz bibin. Ne gengaz e û ne rast e jî mirov bo peydabûna diyardeyên netewe û neteweperweriyê dîrokeke teqez

û sînorên diyar bide. Ji ber ku ev diyarde ne di demeke diyar de lê di nav pêvajoyekê de çêbûne. Yek ji nîqaşên demên dawî, tezên ku îdia dikin netewe û netewe-dewlet emrê xwe tije kirine. Dema mirov di dîrokê de li awayên îktisadî û siyasî yên civakan dinêre, wek mînak dewletên xulamker an feodal ji hezar salî zêdetir dewam kirine. Ji vî alî ve tê wê wateyê, him civaka kapîtalîst him netewe û neteweperwerî ku tê gotin ev du sed sal e heye, her çiqas niha dewra xwe ya kemilî bijîn jî, wê zû bi zû ji ser dikê neçin. Ji ber ku diyardeyên netewe û neteweperweriyê di pêşveçûyina civakan de teqabulî realîteyekê an êwreke pêşveçûnê dike.

Di sedsala 20mîn de kêmkirina dewlet hene ji holê rabûnê lê dewletên nûava çar caran zêde bûne. Di sedsala 21emîn de hejmara dewletên nûava kêmkirina bûbin jî, pêvajoya çêbûna dewletên nû dewam dike (Jahn, 2015, pp. 13-31). Li aliyekî din jî, gelek etnî an gel ji ber bêdewletbûnê asimîle bûne ango ji aliyê fizîkî ve winda bûne. Wek mînak her tim jî Yekitiya Ewropayê tê dayin bo xilasbûna netewe-dewletê. Ger Yekitiya Ewropayê bi ser keve jî, di nav yekitiyê de eyn wek nasnameyên qewmî yên serdema împêratoriyan netewe jî wê wek xwe bimînin û dikare ber bi împêratoriyeke biçê. Niha zehmet e mirov pêşbiniyekê bike gelo wê di nav sedsalên bê de sîstema siyasî ya cîhanê xwe wek bajar-dewlet, netewe-dewlet an împêratoriyeke modern birêxistin bike. Lêbelê em dikarin bi hêsanî pêşbînî bikin ku nasnameyên etnîk an neteweyî ku ji bajar-dewletên antîk heta roja me bi hezaran salan dewam kiriye, wê zû bi zû ji holê ranebin.

### **Etnîsîte, Netewe û Nasnameyên Kolektîf**

Di zanistên civakî de, bi gelemperî wek di mijarên din de, di warê netewe û neteweperweriyê de jî ligel pêvajoya tîr a nîqaşê hemramaniyek peyda nebûye. Berê berê divê ev bê diyarkirin, têgehên netewe, etnîsîte û netewe-dewlet gelek nêzî hev in. Lewma di pênasekirina wan de gelek caran teşqeले derdikeve. Di vê xebatê de bêtir em ê têgeha neteweyê ya Smith esas bigrin. Ewil, divê qala du boçûnên sereke yên derbarê neteweyê de bê kirin.

- 1- Ewên neteweyê wek sazkirinekê dibînin
- 2- Ewên neteweyê wek çêbûnekê dibînin

Di vê xebatê de tê îdiakirin netewe wek pêvajoya wêrara civakî ya domdirêj çêbûye, ne ku hatiye saz kirin. Dema qala saz kirinê bê kirin, lazim e qala aktorên wê jî bê kirin; a duyem, saz kirina nasnameyê teqabulî kêmtir wextê dike li gor çêbûnê. Wek mînak, dema em li hin hêmanên nasnameyên neteweyî dinêrin, dîn, ziman an nasnameyên welatî di nav salên dirêj de lê di nav hevbandoriyekê de û li ser qebûleke hilberîneke kolektîf e. Yanê, di nav demeke kurt de komeke bijarte bi yekalî ew saz nekirine. Nasnameyên etnîk û neteweyî di nav hev de ne. Nasnameyên neteweyî

di nav du sed salên dawî de, berovajî îdiayên modernîstan, nehatine sazkirin lê ew ji nav pêvajoyeke wêrarê derketiye ku diçe heta serdema antîk û belkî beriya wê jî. Wek Connor dibêje, tevgerên etno-neteweperwer encama pêvajoyeke wêrarê ye. Ev fikra Connor hizra me destek dike: “raveyeke ku zêde nehatiye dîtin wisa dibêje, di nav baskî, bretonî, gallî û komên wek wan de, bilindbûna pêla etno-neteweperwer, merhaleyê xwezayî û heta texmînkirî ya pêvajoyeke ku du sed sal e dewam dike, nîşan dike.” (Connor, 1994, r.169).<sup>1</sup>

Jinûvesazkirin ji encax dikare rêxistinîya siyasî ya neteweyî destnîşan bike ya na teqabulî nasnameya neteweyî an çanda etnîk nake. Û aloziyeke din jî (ji bilî deqên zanistî yên cidî), bêyî ku li êwrên neteweperweriyê yên wêrarî an cure an kategoriyên cuda bê nêrîn, bi giştî wek blok tên nirxandin. Di vê nivîsê de wê hizreke nêzî pênaseya netewe û neteweperweriyê ya Smith bê parastin. Smith neteweyê wisa pênase dike: navê civateke mirovan e ku axek/welatekî dîrokî, efsane û bîra dîrokî ya hevpar, çandê girseyî, aboriyeke hevpar, maf û berpirsyariyên hevpar parve dikin (Smith, 2014, r.32). Pêkhateyên wek ax/welat, zagonên hevpar di pênaseyên teorisyenên din de jî hene.

Di nîqaşên neteweperweriyê de qenaetek din a berbelav heye ku hemû netewe di dem û mekanên cuda de dane ser heman rêyê û xwedî heman taybetmendiyên e. Lê ne geşbûna kapîtalîzmê ne modernbûn ne diyardeyên din î civakî nebûne xwedî heman taybetmedî û merhaleyên mînakên ewil (wek mînak, endustriya Îngilîstanê û ya Çînê bi heman awayî nebûye). Wek diyardeyê civakî (siyasî û çandî) netewe, li ser xeteke rast (linear) pêş ve neçûye lê pêşveçûna wê li gor zeman û mekanê bi awayên cuda bûye û erkên wê jî cuda bûne. Modelên neteweyê, yên rojavayî yanê yên li ser hîmê sazî û axê (territorial) çêbûne û yên rojhilatî yanê yên xwe dispêrin etnîsîteyê, navbera wan de cudatî hene. Awayê rojavayî bêtir awayê *staatsnation* e (dewlet-netewe: Fransa, Îngilîstan, Tirkiye), li ser teritoryekê bi riya saziyan (siyaset an dewlet) çêbûye, *Kulturnation* jî (çand-netewe: Almanya, Italya) terza rojhilatî ye ku li ser hîmê etnîk û qewmî ava bûye (Smith, 2014, r.24). Dewlet-netewe di çarçoveya rêxistîbûna sazîyê de be jî, pîvanên netewebûnê dihewîne yên ku di pênaseya jor de derbas dibe. Ev awayê neteweyê zêdetir encama serdema ewil û rêxistîbûna etniya berwarî ye. Etniya berwarî<sup>2</sup> bi giştî rêxistinbûnek e ku ji aliyê arîstokrasiya etniya tovîk tê kirin. Wek mînak, gelek neteweyên wek bermayiyên împatoriyan peyda

1 “One explanation that has been overlooked is that the surge of ethnonationalism among Basques, Bretons, Welsh, and other such groups reflects a quite natural and perhaps even predictable stage in a process that has been underway for approximately two centuries” (Connor 1994: 169).

2 Smith, bo birêxistinîkirina etnîk a berwarî filistînî, normandiyayan dide, bo bêrêxistinîkirina etnîk a berjor jî îrlandî, baskî û katalanan mînak dide (2014, 91). Divê bo birêxistinîkirina berwarî kurd jî wek mînak bê dayin.

bûne (Fransa, Îngilîstan, Ispanya...) bi vî awayî çêbûne. Ji ber ku koma etnîk a tovîk ku burokrasiya dewletê, amrazên stratejîk (leşkerî, siyasî û aborî) destê wê de ye, wek koma damezirîner bi îdiaya ku aîdê wê ye dewleta nû radestî koma xwe ya etnîk dike, yanê dewlet-netewe çêdibe. Wek mînak bermayiya osmaniyan tirkên girt ser xwe û wek rêxistîbûneke etnîk a berwarî dewlet û dewlet-netewe bi hev re saz kirin. Etniyên berjor (dikey) jî ne wek terza rêxistinbûna komek bijarte lê awayekî rêxistinbûnê ye ku hemû tebeqe beşdar dibin (Smith, 2014). Pêla duyem a neteweçêbûnê jî bêtir dikare wek teqlîda neteweyên serdema ewil an berteka wan bê dîtîn. Em dikarin neteweyên Ewropaya Rojhilat mînak bidin. Neteweyên pêla sêyem ên serdema antî-kolonyal in. Kategoriyên neteweyên pêla duyem û sêyem bi giranî li ser hîmê birêxistinbûnên etniyên berwarî çêbûne. Ji ber ku ew ji amrazên etnîsîteya berwarî bêpar e loma ji birêxistinbûna girseyî pê ve ti şensa wê tune. Ji ber ku netewe ji nişka ve li ser dika dîrokê peyda nabe, di nav pêvajoyekê de çêdibe, modela Hroch ku vê pêvajoyê rave dike di êwrên A, B, C, D de di neteweyên serdema 2. û 3mîn de birêxistinbûnên berjor û berwarî roleke çawa listine, vê bi awayekî empirîk daniye holê. Hroch tevgera neteweyê di nav sê êwran de dabeş dike. Êwra yekem, “neteweperweriya romantîk” (komên biçûk, nivîskar, arîstokrat); êwra duyem, “şiyarbûna neteweyî” (komên mezintir, komele); êwra sêyem, “neteweperweriya siyasî” (tevgera girseyî) (Hroch M., 1985). Wek mînak awayê birêxistinbûna kurdan terza birêxistinbûna etniya berwarî ye. Ferqa di navbera cureyê neteweyên serdema yekem û yên 2em û 3emîn de neteweperweriyên van serdeman jî cuda kiriye. Wê serrû be mirov hewl bide netewe û neteweperweriyê ji hev îzole têbigihê. Smith neteweperweriyê bi rehendên wê yên dîrokî û civakî pênase dike: “Neteweperwerî qasî ku parçeyek ji ‘ruhê serdemê’ ye, ewqas jî girêdayî motîf, texeyul û fikrên berê ye jî. Neteweperwerî di gelek radeyan de kar dike û qasî ku îdeolojiyêke siyasî û tevgerêke civakî ye, wek awayekî çandê jî dikare bê dîtîn” (Smith, 2014, r.118). Netewe û neteweperwerî ku di heyama me de yek ji nîqaşên zêdetirîn biheraret e, li gor hin kesan tiştêkî naletî ye û li gor hin kesan jî pîroz tê dîtîn. Wek mînak ên naletê li neteweperweriyê tînin dibêjin neteweperwerî:

- Bêtifaqiyê dixê navbera gelan, dibe sedema pevçûnên navbera etnîsîte û çandan de.
- Li ser navê nasnameyê azadiya him takekes him koman tê tengkirin.
- Astengî ye li pêş armanca mirovatî û gerdûniyê.  
Lê yên pîroz dibînin jî ji ruwangeyêke erênî li neteweperweriyê dinêrin û dibêjin:
- Çanda kêmaran diparêze.
- Dîrok û wêjeya wînda dide jiyandin.
- Rê li ber qeyrana nasnameyî digre.
- Li hember tîran kaniya berxwedanê ye, civak û piştevaniya civakî rewê dike.



Mirov heta di nav awayên neteweperweriyê de tesnîfekê neke, bi gelemperîkiri-neke qebe nikare van îdiayên di leh û aleyhê neteweperweriyê de fam bike. Li jor me gotibû neteweperweriyên serdemên 1, 2 û 3emîn taybetmendiyên wan cuda hene. Lazim e em di nav van idiayan de, neteweperweriyên serwer û ya bindest têxin nav du kategoriyan û dû re analîz bikin. Wek mînak, neteweperwerên neteweyên serwer bi saya îmtiyazên serwerbûnê bêtir îdiayên di aleyhê neteweperweriyê de diparêzên. Lê dema em ji aliyê neteweperwerên neteweyên bindest dinêrin, em ê bibînin ku ev ne rast in. Ji ber ku yê ku tovên bêtifaqiyê diçînin neteweperweriyên navendê ne. Neteweperweriya serwer, çand û nasnameya neteweya bindest înkâr dike yan wan asimîle dike û heta tune bike, û ew dibe sedema nîfaqan. Yanê ev ne helwesteke rast e ku mirov rabe liberxwedana yên tên qetilkirin û asimîlekirin suçdar bike û wan wek sedema nîfaqê bi nav bike. Ne rast e ku nasnameya neteweyî rê li ber nasnameyên takekesî digre ji ber ku nasnameya takekesî di nav nasnameya komî şikil digre û tak nasnameya komî bi hev re hildiberînin. Lê ev rast e ku nasnameya neteweyî rê li ber nasname û azadiya komên din digre ji ber ku nasnameyên serwer meylek wan bi vî awayî heye. Îdiaya ku nasnameya neteweyî li ber gerdûnîbûn û yek-mirovayetiye dibe asteng ji ruwangeya serweran tê ravekirin. Ev gerdûnîbûn, bêyî nirxên neteweyên bindest tevî bibe tenê bi tifaqa yên serwer hatiye çêkirin û li ser piştta yên bindest bilind dibe û li wan tê ferzkirin. Neteweyên bindest di nav gerdûnîbûna serwer de û di nav malbata mirovatiyê de ji xwe re ciyekî nabîne. Berovajiya vê dikare bê îdiakirin, dema neteweyên bindest li hemberî neheqiyên li wan dibe serê xwe radikin û hewl didin di nav malbata mirovatiyê de ji xwe re ciyekî bibînin, dikare bê gotin ku ew gerdûnîbûna heyî ya bêdalet û malbata mirovatiyê bi pêş ve dibin.

Ger em li îdiayên leyhê neteweperweriyê binêrin, elbet neteweyên bindest bi giştî dikevin dû dîrok û wêjeya xwe, di dîrokê li şopên qewmên xwe digerin û hewl didin zêdebariyên (surplus value) xwe yî çandî ji mêtinkaran xilas bikin. Bi taybetî ev di êwra neteweperweriya romantîk de pir zêde ye. Yanê neteweperwerên neteweyên bindest notirvaniya nerît an çandên xwe dikin. Ya na, wê çanda wan bê talankirin û çanda talankirî her tim li ser neteweya serwer tê hesabkirin. Hewldana rizgarkirina nerîtan ji muzexaneyên neteweyên serwer ku bûne gorên etnîk, ne ji ber miraqa wan a tiştên antîka ne, bîlakîs hewldana lêvegerandina malên hatiye dizîn bo xwediyê wan e. Nirxên wan î dîrokî di muzexane û galeriyên neteweyên serwer de tîne pêşandan. Bi taybetî wêje û dîroka kurdî yek ji baştirîn mînakên vê talanê ne. Kurd, ji ber ku nasnameya wan ji aliyê neteweyên serwer bi salan e tê tepisandin, bi trawmayeke mezin re rû bi rû mane û li wan hatiye ferzkirin nasnameyeke din li xwe bikin. Ev trawmayê takekesên bixwenebawer û jixwe-biyaniybûyî afirandiye û bûye sedema qeyraneke nasnameyî. Lê yên neteweperwer dikarin vê bixwebawerî û îtibara neteweyî li wan vegeirînin û rê li ber vê qeyranê bigrin. Neteweperwerî dikare bi awayekî lez li hemberî tîran piştevaniya etniya bindest qewm bike. Lêbelê, ev argumentên di leyh

de ji bo neteweyên serwer ku notirvaniya neteweyê dikin, derbas nabe. Ji ber ku neteweya serwer bi gelemperî çanda din înkâr dike û hewl dide bîra hevpar a bindestan tune bike yan di nav xwe de bihelîne. Bi gotineke din, rê li ber qeyrana nasnameyî, talana çandî û tehequmê vedike.

Dema nasmaneya xurt tunebe, mirov li ber şemûka qeyranê ye –ne tenê dilgiran e, hema bêje nikare wek bi awayekî asayî tevbigere. Serdemên ku mirov bi gefa windakirina nasnameya xwe re rû bi rû dimînin, wek qeyran tèn pênasekirin (Taylor, 2002, r.271).

Lazim e di nav hemû van nîqaşan de em li ser teoriyên modernîst bisekinin ku mohra xwe li wan xistine. Tê zanîn ên modernîst diyardeyên netewe û neteweperweriyê bêtir wek encama modernîteyê dîtine. Her çiqas piştî rexneyên teorisyenên wek Smith û Connor yên modernîst, wek Anderson, Hobsbawm (Hobsbawm & Ranger, 2006), Gellner (Milliyetçiliğe Bakmak, 2016) pejirandin ku kokên neteweyan di antîkîteyê de ne, dîsa jî îdia dikin netewe di eslê xwe de berhem an projeyek e ku ji aliyê bijarteyên modernîst hatiye sêwirandin. Hejmara kesên ku neteweyê wek diyardeyekê ne, lê wek honaka neteweperweran (carna ya burjuwaziyê) dibînin gelek in. Ji ber du sedeman em dikarin li vê tezê îtiraz bikin. A ewil, îdiayeke mantiqî ye. Pêwendiya navbera netewe û neteweperweran dikare bê şibandin pêwendiya navbera masî û masîgirê. Ger masî tunebû wê masîgir jî tunebûya! A duyem, lêkolîna ampîrik ya Horch ku derbarê neteweyên şiyarbûyî yên Ewropayê de bi berfirehî û berawirdkî amade kiriye, raberî me dike ku di nav pêşengên destpêka nasnameya neteweyî de, di heyamên cuda de, gelek tebeqeyên cuda hebûne (Hroch, 2011).

Anderson û Gellner neteweyê wek projeyeke bijarteyan dibînin. Wek mînak, di ser mînakê “leşkerê meçûl” re dibêje netewe jî wek cimaetên dînî bi rêya sêwirandinê hatiye sazkirin (Anderson, 1991, rr.20-23). Dibêje bi saya modernîte, xwendin-nivîsandin û çapameniyê çandêke hevpar û hesteke cimaetî çêbûye û ji bo zimanê standart ên îro tèn bikaranîn jî dibêje.

Gellner û Anderson bi taybetî di mînakên xwe de cî didin Tirkiyeyê. Beriya her tiştî, neteweya kurd ku mafê bikaranîna zimanê wan ji destê wan hatiye girtin, bi wêjeya devkî nasnameya xwe ya neteweyî bi awayekî xurt didomîne. Her çiqas dirûşmeya “Kurdîstana muxayel li vir veşartî ye” bê gotin jî, neteweya kurd ne bo dewletê ne bo Anderson û Gellner ne tişteki îcadkirî an texeyulkirî ye. A din, gelo modernîst wê çawa rave bikin ku zimanê almanî, fransî yan spanyolî, digel hebûna latîniya xurt, bo çi ji holê ranebûn! Neteweya Anderson û Gellner encax dikare halên pir îstisnayî yên projeyeke honakî ya modernîteyê rave bike. Wek mînak, konseptê neteweyê ya li Tirkiyeyê projeyeke bijarteyan e û hemû gelên xeynî tirkan bî vê sêwirînê wek tirk hatine qebûlkin.

Wek ku Smith dibêje, girêyeke organîk heye di navbera nasnameya etnîk û ya neteweyî de. Loma modelên neteweyî yên li ser nasnameyên etnîk bilind dibin gelekî

bi îstîkrartir in û ji aliyê sosyolojîk ve jî biberekettir in (Smith, 2014, r.73). Neteweyên DYA (USA), Awistralya an Arjantînê ku ewelîyatek wan a etnîk tune ye mînakên îstisnayî ne. Lê ev halên îstisnayî dikare piraniya pêşveçûna werarî ya civak, etnîsîte an neteweyên li cîhanê temsîl bike. Ji ber vê, anormalî ne lê geşedanên dîrokî yên rewa divê bibe bingeş ji bo encamên lêkolînên zanistî.

### **Girîngiya nasnameyê**

A rast, modernîst li bende bûn ku aîdiyeta etnîk û nasnameya neteweyî bi refahê bîndarîkî ve girêdane. Lê modernbûn du serê wê hebûn, li aliyêkî wê bandora hatiniya aborî li aliyê din bandora hişmendiyê hebû. Belki bi saya zêdebûna hatiniya xwe wê ji şerê nasnameyî feraxat bikira lê ji aliyêkî ve bi geşbûna aborî re wê hişmendî jî bilind bibûya û bi amrazên cudatir şerê bo mafê xwe bimeşandina. Lê wek wan derneket. Wek ku Nairn gotiye, di eslê xwe de û baş e ku kes eslê xwe yî xwemalî wînda nake (Nairn, 2015, r.79). “Ez bawer nakim ku mirovatiyê, ji bo li hemberî macdonaldbûnê, îslamîbûn an bernameyên telewîzyonê yên sibehan têk biçin, împeratorî bi erdê ve rakiribin” (Nairn, 2015, r.124).

Tiştê li bende bûn nebû, bi modernbûnê re etnîsîte jî modern bûn û di warê nasnameyê de berxwedaneke nedîtî nîşan dan. Heta niha di nav nasnameyên civakî de herî zêde bo nasnameyên neteweyî an etnîk bedel hat dayin. Gelo bo çî mirov an civak ewqas amade ne bo van nasnameyan bedelên giran bidin?

Du rehendên pêkhatiyên nasnameya neteweyî hene; yek ji pêkhatiyên derûnî yanê rehenda hestî ye, a din pêkhatiya sosyolojîk (çandî) û ya siyasî ye. Etnîsîte di çêbûna nasnameyên kom û takekesan de roleke girîng dilîze. Loma aîdiyeta etnîk pêdiviyeyeke hestî ye. Li gor ramangerê kanadayî Michael McDonald ji aliyê çêkirina nasnameyê fenomena çêbûna komê, bi rêya qebûlditîna hundirîn a komeke etnîkî û çêbûna wê ya di demeke dirêj de gelekî girîngtir û zexmtir e, ji yekitiya armancê, ku komên li ser berjewendiyên hevpar ava bûne li ser xwe dihêle, (McDonald, 1986, r.120).

Piştgiriya di nav komên etnîk de, tevgerîna wan û bi taybetî berdewamiya wê fenomeneke tarîfa wê zehmet e û tenê bi desthilatdariya bijarteyan û teoriyên derbarê berjewendiyan de nikare bê ravekirin. Ev pirsê ku takekesên endamên komeke etnîk in çima, wek mînak, di nav komên çînî an yên din î siyasî de birêxistinî nabin, çima di nasnameya xwe de îsrar dikin, heta mirinê jî didin ber çavê xwe, divê baş bê lêkolandin.

Antropolog Arnold L. Epstein ku di warê berxwedêriya kêmarên etnîk de dixebite, xwedî konseptê berfireh a etnîsîteyê ye. Di sêwirîna wî de nasnameya etnîk encama têgihîna hundirîn, û bertek û hevbandoriyên derveyî ne ku li hev bandor dikin. Li gor Epstein, “çanda mahrem” (intimate culture), ji bo nasnameya etnîk roleke mezin dilîze. Wek “tevgera etnîk” hin nirx û helwestên ku di jiyana rojane de xuya dikin, wek

nasnameya etnîk bi taybetî di zarokatî û ciwantiyê de tèn veguhêztin. Ji ber vê, dîrok bo nasnameya etnîk/neteweyî rola navbeynkariyê dilîze. Di nav vê peywendê de, dîrok derfet dide berdewamiya komê û ya takekes (xwe-bûyîn). Hestên nasnameya etnîk ji merivatiyê, temasên şexsî yên wek derdor/têkiliya bi hevalan re û tora têkiliyên li ser hev siwar dibin pêk tê. Hevbandoriyên bi vî awayî ewlehî, bawerî, qebûldîtin û hesta biqedirbûnê çêdikin (Epstein, 1978). Nasnameyên etnîk/neteweyî wek malbatê nasnameyên esasî ne, yanê ew wan hilnabijêrin. Loma ev nasname ne zû bi zû çêdibin ne bi hêsani winda dibin. Wek endamtiya tîmeke futbolê an partiyeke siyasî ku em wan hildibijêrin, bi qasî ketina nav wan derketina ji wan jî rihet e (Garip, 2012).

Epstein berxwedêriya koma etnîk bi pêdiviyên hundirîn lê bi taybetî jî bi yên derveyî ve girê dide. Li vir, ji ber ku çî takekes çî kom be li ser çavkanî û hêza pê-nasekirin/desthilatdariyê di nav rakêşiyê de ne, aîdiyeta etnîk jî dikeve bin bandora kombûnên desthilatdarî û berjewendiyên (Epstein, 1978, r.100).

Dema em di çarçoveyê fireh de binêrin, ji pênaseya neteweyê ya wan neteweyan em dikarin fam bikin ka çîma kom girîngî didin nasnameya neteweyî.

**Axeke hevpar:** Sedema li pişt romantîzekirina welêt ew e ku ew ax ciyê lêjiyînê yê hevpar e. Yanê ev romantîzm ne xweşkirineke utopîk e, helbesteke ku bo warê jiyanê hatiye terxankirin. Beriya her tiştî ew ji aliyê fizîkî ve tevî dewlemendiyên xwe yên binerd û sererd ciyekî lêjiyanê dabîn dike. A din, ew war e ku çanda hevpar li ser wê çêbûye.

**Bîra hevpar û dîrok:** Bîra hevpar, mîrata hilberîna kolektîf e ku kom wê di nav berdewamiyekê de dewr digrin. Wek mînak, dîrok û bîra hevpar di nav zimên de hatine kodkirin. Hemû ev nerît, bo mîrata dîrokî, etnîsîte/neteweyê sermiyanêke bêhempa ya zanîn û çandê ye. Ligel vê, ruhê hevpar ê komê, komê û endamên wê li hemberî metirsiyên derveyî diparêze.

### Encam

Çawa ku hiqûqa gerdûnî, li ser hîmê edaletê di warê maf û azadiyê de bêyî ku cudatî têxe navbera nijad, dîn û zimanan her kesî dike xwedî mafê wekhev, di warê mafên koman de jî ku takekes tê de şikil digre, maf û azadiya ku huquqa navneteweyî diyar kiriye, çî mezin çî biçûk hemû kom divê wek hev jê îstifade bikin. Ger em etnîsîte an neteweyan wek civatên mezin, cimaetan wek komên biçûk pênase bikin, hemû kom lazim e ji hemû azadi û mafan bi qasî hev îstifade bikin. Çawa ku azadî û mafên bingehîn li ser nayê bazarkirin, nayê dewrêkirin û nayê parçekirin, mafên koman ên hevpar jî, wek dîn, ziman, ax hwd. azadî û mafên bi vî rengî ne. Bi qewlê Connor, ji ber ku di qada navneteweyî de hin kom ji van mafên xwe bêpar tèn hiştin, pevçûnên etnîk û neteweyî derdikevin. Connor diyar dike ku ji 5000an<sup>3</sup> zêdetir

3 Kymlicka, Will (1995) *The Rights of Minority Cultures*. New York: Oxford University Press. "Introduction:" rr.1–27.

komên etnîk hene lê ji van ji sedî 10ê wan, mafê wan dewletbûnê heye. Dest nîşan dike ku alozî ji vir derdikeve û sedema pevçûnan ne ew etnîsîteyên serhildêr in lê bêparhiştina wan a ji vî mafî ye.

Ferqek heye di navbera neteweperweriya ku yên serwer kirine amraza tepisandinê û neteweperweriya rewa ku bo azadbûna bindestan pêwîst e. Teoriyên serdest (Gellner, Andersen, Hobsbawm hwd.) ku neteweperweriyê li gor rojava û bi rêbazên serwer rave dikin, kêmasiyeke wan heye ku nahêlin em vê ferqê bibînin. Teoriyên dijber (Smith, Connor hwd) ku him kêmasiyên teoriyên serdest eşkere dikin him ruwangeyeke nû pêşkêş dikin derbarê netewe û neteweperweriyê de lê kêma kes haya wan ji van teoriyan heye. Ev jî bi awayekî yekser an neyekser bi rêya teorîk xizmeta îdiayên serweran dike ku wan li hemberî têkoşîna bindestan a azadî û nasnameyê saz kirine. Tehekuma teorîk mêtîngeriya niha rewa dike lê di heman demê de vê mêtîngeriya ji nû ve hildiberîne. Neteweperweriya kurdî muzdarîb e ji rexneyên him ji hundir him ji derve ku bi rêya referansdayina teoriyên serdest tên kirin.

Neteweperweriya neteweyên serwer, ser navê gerdûnîbûnê bedelê şerê giran ên etnîk li ser piştî neteweperweriya naletî ya xumamî dike û ji aliyekî ve him sucên xwe bin cilik dike, ji aliyekî ve jî nahêle neteweyên bindest derkevin ser dikê. Neteweperweriya serwer tevgereke bêmilkirin/bêkokkirin û bênasnamekirinê ye. Talana welat û çandê mîna keke baş e bo vê. Medeniyeta çandên zincîrkirî tê xespkirin û ji medeniyetê tên derxistin. Tiştî hatiye serê çanda aztek, maya, afrîka û kurdan ev e. Loma notirvanên neteweyên serwer, li ser navê lanetkirina neteweperweriyê beriya ku wek “biricimkirina şeytanê” dest bi biricimkirina notirvanên nerîtan bikin, hewcedariya wan bi ayîna “derxistina şeytanê hundirê xwe” heye. Taylor xwe dispêre mecbûriyeta kategorîk a Kant û dibêje her insan yekta ye û resen e û lazim e her kes ji vê yektabûnê reseniya di xwezayê de heye sadiq bin û rêz bigre. Helbet vê tehemula beramber wek tiştêkî luks ne lê wek pêşmerca bihevrejîyanê dibîne. Lê vê tenê bo takekesan nabêje bo koman jî diparêze (Taylor, 1993).

Neteweperwerî di destê neteweyê bindest de amraz/îdeolojiyeke girîng a azadiyê ye. Erkeke wê ya girîng heye bo vejandin an zelalkirina hişmendiya neteweyî ku tê xwestin bê xesandin. Komên ku hişmendiya wan a etnîk/neteweyî hatiye xesandin xwebaweriya wan kêma e, di baxçeyê hişmendiya kesên din de dîl hatine girtin. Loma dikarin afirîneriya xwe jî wînda bikin. Wek ku bo neteweperweriya hemû bindestan pêwîst e, divê neteweperweriya kurd jî di nav vê çarçoveyê de li ser bê fikirîn, wateya xwe ya heqîqî bibîne û zemîna wê ya meşrû bê dîtin.

**Nîşe:** Ev nivîs bi saya derfetên madî û manewî yên Weqfa Lêkolînên Civakî (Sosyal Araştırmalar Vakfı) hatiye nivîsandin. Spasdar im bo wan.



## ÇAVKANÎ

- Anderson, B. (1991). *Hayali Cemaatler*. (I. Savaşır, Trans.) Istanbul, Türkiye: Metis.
- Connor, W. (1994). *Ethno Nationalism*. Princeton.
- Epstein, A. L. (1978). *Ethos and Identity: Three Studies in Ethnicity*. London, England: Tavistock.
- Garip, S. I. (2012). *Ethnische Konflikte im Vergleich: Baskenland-Kurdistan*. Berlin, Almanya: Lit Verlag.
- Gellner, E. (2016). *Milliyetçiliğe Bakmak*. (N. Soyarik, & Ö. Saltuk, Trans.) Istanbul, Türkiye: İletişim.
- Hobsbawm, E. J., & Ranger, T. (2006). *Geleneğin İcadi*. (M. M. Şahin, Trans.) Istanbul, Türkiye: Agora Kitaplığı.
- Hoch, M. (2011). *Avrupada Milli Uyanış* (1 ed.). (A. Özdemir, Trans.) Istanbul, Türkiye: İletişim.
- Hoch, M. (1985). Das Erwachen kleiner Nationen als Problem der komparativen sozialgeschichtlichen Forschung. In H. A. Winkler, & H. A. Winkler (Ed.), *Nationalismus*. Königstein, Deutschland.
- Jahn, E. (2015). *Politische Streitfragen* (Vol. weltpolitische Herausforderungen). Wiesbaden, Almanya: Springer.
- Kymlicka, Will (1995) *The Rights of Minority Cultures*. New York: Oxford University Press. "Introduction".
- McDonald, M. (1986). Collective Rights and Tyranny. *University of Ottawa Quarterly*, 56, 115-120.
- Nairn, T. (2015). *Milliyetçiliğin Yüzleri* (1 ed.). (S. Kırdar, & M. Ratip, Trans.) Istanbul, Türkiye.
- Smith, A. D. (2014). *Milli Kimlik* (7 ed.). (B. S. Şener, Trans.) Istanbul, Türkiye: İletişim.
- Taylor, C. (1993). *Multikulturalismus und die Politik der Anerkennung*.
- Taylor, C. (2002). *Wie viel Gemeinschaft braucht die Demokratie*. Frankfurt am Main, Deutschland.



HEVPEYVÎN LI GEL SIYASETMEDAR,  
NIVÎSKAR FUAT ÖNEN:

## Yekitiya Kurdan û ya Partiyên Kurdan ji Hev Cuda ne

Di nava kurdan de fikrên gelek cuda, hizbên dijberî hev hene, lê tu ji kê re behsa meselaya kurdî bikî, teqez hemî gazinan ji cudatiyan dikin û hêviya yekitiya kurdan dikin. Hewqas kes hem behsa yekîtîyê dikin lê çima ev perçebûn ev dijberîtî çima? Derbarê “yekitî”yê cenabê te dikarê çi bêje?

Hebûna gelek hizbên cuda xwezayî ye. Kurdistan welatekî fireh û neteweyê Kurd neteweyekî qedîm e. Ev netewe di hundirê hizbekê de hîlnayê. Ji xwe hizb, partî tê wateya li ser hin cudatiyan xwe bi rêxistinkirinê. Partî ango parçeyek, qismek ji civatê. Partî bira partî be wê hemberîyeke wê di nav civatê de hebe û cudatiya partîyê ji yên din zelal be. Li Bakûrê Kurdistanê pirsgirêk ne di hebûna gelek partîyan de ye. Heta hûn ji min bipirsin hejmara partîyên me hindik in jî. Ji bo neteweyekî ku serjimara wî 15-20 milyon be hebûna 7-8 partîyan çima zêde be? Di mijara hebûna gelek partî de pirsgirêka me ya herî mezin li Bakûrê Kurdistanê hebûn û xurtbûyina partîyên Tirkîyê ye ku pişgiriya van partîyên dagirker di nav girseyan de ne kêmi partîyên me ye. Ev karesateke sîyasî ye. Pirsgirêka partîyên me jî ne hejmara wan e. 4-5



*Hebûna gelek hizbên  
cuda xwezayî ye.  
Kurdistan welatekî  
fireh û neteweyê*

*Kurd neteweyekî qedîm e. Ev  
netewe di hundir hizbekê de  
hîlnayê. Ji xwe hizb, partî tê  
wateya li ser hin cu-  
datîyan xwe bi rêxis-  
tinkirinê.*



*Mijara yekîtiya Kurdan û yekîtiya partiyên heyî du tiştên cuda ne. Di nav girseyan de hêvî û daxwaza yekîtiya partîyan jî yekîtiya Kurdan jî xwezayî ye û nîşaneya nirxên neteweyî ye.*

partiyên me bi heman peyvikan xitabî heman girseyan dike û di civatê de hemberî-yeke civakî peyde nekirine. Ji qabîliyeta temsîlkirina civakî bêpar û di rojeva sîyasî de bê bandor in.

Mijara yekîtiya Kurdan û yekîtiya partiyên heyî du tiştên cuda ne. Di nav girseyan de hêvî û daxwaza yekîtiya partîyan jî yekîtiya Kurdan jî xwezayî ye û nîşaneya nirxên neteweyî ye. Lê heman tiştî ji bo banga yekîtiya partîyan ji rêvebirên van partîyan re nikarim bêjim. Bi sedem ku çend kadro bi alîgirên xwe re partîyek nuh ava dikin û dibe sibê banga yekîtiya partîyan dikin. Ev nabe û ne samîmî ye. Ger partîyeke din ku hûn dikarin pê re yekîtiyê çê bikin hebû we ji bo çi partîyeke nuh ava kir? Avakirina partîyeke nuh tê wateya ku hûn ji partiyên heyî ne razî ne û hûn îdîa dikin ku partiya we ava kiriye dê valahiya sîyasî dagire û bi bernamêya xwe bi kar û barên xwe wê ji partiyên din cudatir tevbigere û xwe bispêre zemîneke civakî ya cuda. Baş e li paş îdîaya xwe bisekinin û bira bivin partî. Ev ne pozbilindî ye ku partîyek bibêje ez ji yê din cudatir û sîyaseten rasttir im. Berovajî wê ger ev îdîa te nîn be pêwîstî bi te nîn e ku tu partîyeke nuh ava bikî. Her dem nîqaş û banga yekkirina partîyan xapandin e, hewldana veşartina békêriya sinifa siyaseta me ye. Ger bira partî bin divê li ser bernamêyeke sîyasî pevrekarkirin bê nîqaşkirin. Lê bernamêyeke kar li holê nexwiya ye.

Yekîtiya Kurdan an yekîtiya neteweyî têgîneke modern e û pêkanîna wê li ser aîdiyetên modern pêkan e. Di serdema modernîteyê de ev aîdiyet aîdiyeta welat û neteweyê ye û dewletbûyinê ji xwe re dike hedef. Ango yên ku bi aîdiyeta Kurdistanê dewletbûyina neteweyê Kurd ji xwe re neke hedef û her dem behsa yekîtiya neteweyî dikin an xwe dixapînin an jî me dixapînin. Aîdiyeta partîyan di hindurê van aîdiyeta bilind de watedar e û dikare kêrî bicîhanîna yekîtiya neteweyî bê.

Dikarim bêjim ku sedema pêknehatîna yekîtiya neteweyî ya esasî lawazmayîna aîdiyeta welat û netewe ye. Berovacî vê xurtmayîna aîdiyeta jêrîn (ku aîdiyeta partîyan jî yek ji wan e) asteng e li ber yekîtiya neteweyî. Sedema din jî ew e ku dewletbûyin ango taleba desthilatiya navendî lawaz e.

**Kurdistan di nav çar dewlatan de parçe bûye. Her perçe xwedîyê çand û zara-veyekî cûda, sîstemeke cuda ya sîyasî ye. Li gor cenabê te ji bo temama Kurdis-tanê sîstemeke ku mirov daxwaz bike heye, an li gor te Kurdistan divê çawa were birêvebirin bi kujan sîstem û dezgehan?**



Fuad Önen

Sîstemên rêvebirinê li gorî rasteqînîyên neteweyan û mercên cîhanî teşe digirin. Netewe jî di pêvajoyeke dûr û dirêj de ji alîkî de ava dibin û ji alîyê din de tên avakirin. Ango di tevaya neteweyan de taybetmendîyên avabûyî û yên avakirî henin. Sîstemên rêvebirinê xwe dispêre wan rasteqînên avabûyî û îradeya avakeran. Ger li vir em neteweyên otokton û alakton ji hev cuda bikin em dikarin bêjin ku di neteweyên alakton de avakerî, di yên otokton de avabûyîni tayîner e. Heman tişt di sîstemên rêvebirina neteweyan de jî heye. Ji ber vê yekê ye ku sistema rêvebirinê ya DYA yekane ye û sedema wê alaktonîya “neteweyê” Amerika ye. Dewleteke yekgirtî ku ji 51 jêrdewletan pêk tê xwe dispêre pêvajoya avakirina vî neteweyî. Heman tişt jî bo Sistema Serwerîya Tirkan jî dikare bê gotin. Ev sîstem jî di pêvajoya avakirina neteweyekî alokton de teşe girtiye. Di erdnîgarîyeke pirnetewe û pirwelat de avakirina neteweyekî alokton bi sistemeke jenosidal pêkan e. Lewma Sistema Serwerîya Tirkan (SST) li dinyê sistemeke aşkere jenosidal e.

Aloktonên Efrika Başûr jî li ser otoktonên wê derê sistemeke jenosidal ava kiribûn. Lê dikarim bêjim ku SST ji sistema apartheid ya Efrika Başûr jî jenosidaltir e. Weke encam em li kîjan sistema rêvebirinê binihêrin em ê bibînin ku dîroka li pişt wan û



ne afirînerê neteweyê ye. Îradeya avaker ji bo neteweyekî heyî rêya xwebirêvebirinê vedike ango rizgarker e.

- Em neteweyekî dereng mayî ne di dewletbûyinê de. Ev ji bo me rewşeke neyinî ye. Neteweyên din di ser dewletên xwe re li ser dika dîrokê ne. Em hîna bi hezaran xortên xwe feda dikin ji bo ku karibin derkevin ser dika dîrokê. Lê di her neyinîtiyê de erênitî jî he ye. Bi giştî dewletên heyî bi teşeyên otoriter, totaliter hatine avakirin. Piştî şerên navxweyî yê bi dehan sal gîhanin teşeyên pirdeng û pirreng. Sistema rêvebirîya Kurdistanê divê di serî de pirreng û pirdeng be. Weke nimûne ev dewletên heyî ji bo ku zimanekî fermî saz bikin gelek ziman û zarava ji holê rakirine. Em dikarin rêz li hemû zaravayên xwe û zimanên kêmarên Kurdistanê bigirin ku sistema xwe li ser pir zimanî û pir zaravayî ava bikin.

- Kurdistanî serbixwe û yekgirtî divê ne unîter be û di hindur xwe de gelek teşeyên xwe bi xwe rêvebirinê bihewîne. Li gor şerd û mercên damezirandinê û pêvajoya têkoşînê di nav parçeyan de formên federal, konfederal, herêmên xweger (otonom) dikare bibe perçakî modela rêvebirina me.

-Kongreya Neteweyî divê valatîya bêdewletîyê dagire û weke dewleta sibê ji îro de bê programkirin. Kongreya Neteweyî divê bibe navnîşan ji bo gengeşî û çareserkirina van kêşeyan.

**Gelo di nav kurdan de fikra neteweperweriyê hatiye teorîzekirin? Di warê netewepeweriyê de di nav kurdan de bêserûberîyek tune ye gelo? Li gor cenabê te çi pirsgirêk hene di vî warî de?**

Teorîya netewe bi xwe nîqaşbar e, teorîyeke standart tune ye ji aliyê akademîyan de heta ji aliyê ekolên fikrî de jî tê pejirandin. Heman tişt ji bo teorîya neteweperweriyê jî derbasbar e. Bi qasî ku ez dizanim, di dema şerê cîhanê yê yekemîn de gengeşiyek xurt li ser teorîya netewe û neteweperweriyê çêbûye (nîqaşên li ser mafê çarenûsî, aforîzmayên Lenîn, prensibên Wilson...). Di dema şerê cîhanê yê duyemîn de ev nîqaş di ser nijadperestiyê de meşîyaye. Û ji têkçûna sistema Sovyetê û vir de ango di dema şerê cîhanê yê sêyemîn de nîqaşa li ser teorîya netewe û neteweperweriyê ji nuh ve xurt bûye. A balkêş ew e ku di demeke ku tê gotin dawî li neteweyan û netewe-dewletan hatiye de ev nîqaş ji

*Sistemeke ku mirov daxwaz bike sistema Kurdistanî Serbixwe û Yekgirtî ye. Lê nuha em ji wê hedefa xwe ya stratejîk dûr in. Heta em bigihêjin wê hedefê em ê gelek sistemên rêvebirîyê li parçeyan bibînin û em dibînin jî.*



nuh de gûr dibe. Ji vê jî dîyar e ku ev nîqaşeke sîyasî ye û her alîyek dixwaze sîyaseta dewletan bi hin teorîyan bixemilînin.

Di nav tevgerên rizgarîya neteweyî de kesî bi qasî tevgera rizgarîya neteweyî ya Kurdan nîqaşên teorîk nekiri ye. Em di nivîsarên Ho Shi Min, Amilcar Cabral, Mahatma Ghandi, Fidel Castro û yên wekî wan de tûşî nîqaşên teorîk li ser netewe an neteweperwerîyê nayên. Li gor wan ew netewe ne û mafê wan heye ku neteweyên wan bi dewlet bin û xwe bi xwe birêve bivin. Û ez bawer nakim ku ev ji eşqa me ya teorîyê tê. Li vir bêserûberîyek heye. Lê ev

bêserûberî ne teorîk e lê sîyasî ye. Di tevgerên rizgarîya neteweyî de serxwebûnxwazî asayî ye li her derê cîhanê. Di tevgera rizgarîya neteweyî ya me de serxwebûnxwazî bûye helwesteke awarte. Bêserûberî ji vir tê. Îjar hin alî ji bo vê helwesta awarte biparêzin teorîyên nedîtî bi lêv dikin. Tu divê di pênasekirina netewe de alîgirê teorîya primordîal, an konstruktivist be an jî xwedî ramanek derî wan alîgirê teorîyêke din be. Ji van teorîyan ti jî nabêjin bila kurd nebin dewlet li ser axa xwe.

*Gelek xwendeyên me li tunebûna dewleteke navendî dinihêrin û wer hizir dikin ku mîrateke me ya xwe bi xwe rêvebirinê tuneye û di warê xwe birêvebirinê de jî xwe mahkûmê ji sifirê de destpêkirinê dibînin. Ev nerîneke oryantalist e.*

Bi ya min pirsgirêka esasî ew e ku, xwendeyên Kurdistanê û bi taybetî sîni-fa sîyaseta me aîdîyetên modern ên bilind (aîdîyeta welat û netewe) danehundirandine û li ser van aîdîyetan desthilatîyek navendî nakin hedefa sîyaseta xwe ya esasî. Di helwesta sîyasî de tunebûna hişmendîya dewletê rê li sergêjîyên teorîk vedike.

### **Rabêja PKK a dijî netewe-dewletbûn û sîstema kantonal ku hewl dide li Rojavayê Kurdistanê ava bike, dikare wek post-neteweyî (post-nationalistic) bê pênasekirin?**

Rabêjeke PKKê ya bi hedarî tuneye ku em bikaribin pênase bikin. Di vî bîst salên dawîn de PKK 4-5 rabêj guhertîye û ev ne mijareke teorîk e. PKK bi teorîyê pratîka xwe saz nake. Berovacî wê ji bo pratîkên xwe yê konjonkturî hin teorîyan saz dike. Sîstema kantonal ne sîstemeke post-neteweyî ye. Sîstema kantonal li Belçîka, Swêrsa û Fransa parçeyek ji sîstemên neteweyî ne. Li Rojavayê Kurdistanê bi çi awayî dibe post-neteweyî? Ji xwe PKK piştî kantonan berê ji bo Rojavayê Kurdistanê sîstemeke federalî xwest, dûre navê wê kir Federasyona Rojava û Bakurê Sûriye, çend meh berê



jî Rojava jê derxistin û kirin Federasyona Bakurê Sûriye. Ev nimûne jî dide nîşan ku mirov bi rabêja PKKê nikare pratîka PKKê pê nase bike. PKK li ser reel-polîtîkaya ku tê de ye sîyasetê dike û pratîka wê bi hesabên reel-polîtîker tê meşandin, ne bi teorîyan. Hewceyê gorinêye ku di vî hesabî de destên dewletê dagirker û gelek dewletên din heye. Rêxistineke dij-dewlet çawa dibe ku dibe parçeyekî hesabên gelek dewlet?

Nîqaşên li ser dij netewe-dewletê jî wisa ne. Dijdewletbûyin û dijnawetewew-dewletbûyin ne heman tişt in. Lê bi tevayî di bin rabêjên dij netewe-dewlet re li dijî dewletbûyina Kurdistanê tê derketin. Ger hûn ne li hember dewletbûyina Kurdistanê ne û dipejirînin û diparêzin ku dewletbûyin mafê neteweyê Kurd e, formeke ne netewe-dewlet pêşniyar bikin. Esasen netewe-dewlet formeke dewletê ye di serdema modernîte de. Wekî din jî formên dewletê henin. Ji aliyê din ve tu nikarî tevaya dewletên cihanê di kevaneka netewe-dewlet de bîne ba hev û gişa weke hev bihesibîne. Weke nimûne kes nikare dewleta Swêdra û ya Tirkîye û ya Îranê wek hev bike û bêje her sê jî netewe-dewlet in. Ev teşe argument qaşo nîqaşeke teorîk vedike. Lê helwesteke sîyasî ye û armanc pêşlêgirtina dewletbûyinê ye.

Di mijara dewletbûyin û dij-dewletbûyinê de, rabêja PKK û pratîka PKK heman tiştî nabêje. Di cîyên ku kontrola PKKê ya leşkerî tê de heye, pratîka PKKê pratîka jêrdewleteke otoriter û totalîter e, ne ku pratîkeke dij dewlet e. Rast e PKK gelek caran rabêjê anarşîzan bi kar dihîne, bi taybetî jî van salên dawîn argumentên Murray Bookchin. Lê pratîka PKK ne anarşîzan e, lê otorîteryan û totalîteryan e. Anarşîst dij-dewlet in bi her pratîkên xwe. Rêxistinên anarşîzan di hindurê xwe de jî li hember nîzaman jî dijî fahmên dewletê û hîyerarşîyê ne. PKK bi tarza rêxistinên xwe, bi têkilîyên li gel dewletan datîne û cîyên lê serwer, bi fahmê dewletan tevdigere. Daxwaz ne dewleteke navendî ye, lê di bin serwerîya dewletên navendî de jêrdewlet e. Alternatîfa PKKê ya li hember dewletan ne bê dewletî ye, lê jêrdewleteke Partîyî ye.

*Ji nuha de ji bo sistema rêvebirinê ya Kurdistanêke Serbixwe û Yekgirtî em nikarin bin şemayekê sîyaseten ferz bikin jî, em dikarin çarçoweyekê jê re dahînin.*

BARZOO ELIASSI:

# Ger tu dewletê nexwazî, ewçax tu nikarî şidetê pawan bikî

Di nava kurdan de fikrên gelek cuda, hizbên dijberî hev hene, lê tu ji kê re behsa meselaya kurdî bikî, teqez hemî gazinan ji cudatiyan dikin û hêviya yekîtiya kurdan dikin. Hewqas kes hem behsa yekîtiyê dikin lê çima ev perçebûn ev dijberîti çima? Derbarê “yekîti”yê cenabê te dikare çi bêje?

Ev rast e ku hemû partî û rêxistinên siyasî dawa kurdayetî û yekîtiya kurd dikin û xwe nûnerê heqîqî yê gelê kurd dibînin. Lê rastî dide xuyakirin ku di siyaseta kurd de navend tune ye û di navbera du partiyên siyasî PKK û PDKê de ku dixwazin nasnameya kurd têxin bin hegemonyaya xwe û kontrol bikin ew ê çawa bê birêvebirin û îcrakirin, têkoşînek heye. Tam jî axaftina li ser yekîtiyê di navbera partiyên cuda yên siyasî de destnîşan dike ku yekîti tune ye lê têgeha yekîtiyê bo pêkanîna armancên xwe yî vî awayî bi kar tînin: “em bi berjewendiyên beşeke taybet a civaka kurd teşwîk nabin, em giliyên gerdûnî yên gelê kurd temsîl dikin.” Ev bo hemû partiyên neteweperwer rast e. Bi gelemperî, li her çar aliyê Rojhilata Navîn, yek partî radibe vîzyona xwe ya taybet wek berjewendiyên her kesî be gelemperî dike û xwe wek nûnerê heqîqî yê dewletê pêşkêş dike. Dema deng û partiyên mixalîf li hember van partiyên siyasî yên hegemonîk radibin, ev nayên naskirin, wek îxaneta bi neteweyê re tê dîtîn û lazim e bîna marjînalîzekirin, bi her awayî bîna tepisandin. Ger bo partiyên desthilatdar hêza nerm kar neke, tundî her dem amraza ewil a bicîkirina hegemonyayê ye.



Barzoo Eliassi

**Kurdistan di nav çar dewlatan de parçe bûye. Her perçe xwediyê çand û zara-  
veyekî cûda, sistemeke cuda ya siyasî ye. Li gor cenabê te ji bo temama Kurdis-  
tanê sistemeke ku mirov daxwaz bike heye, an li gor te Kurdistan divê çawa were  
birêvebirin bi kijan sîstem û dezgehên?**

Ev pirseke zehmet e. Kurd him bi awayekî xwezayî parçe bûne ji ber zaravayan  
lê ji aliyê siyasî jî parçe bûne ji ber dabeşbûyîna axê ku wan dewletan afirandine.  
Lê divê kurd him cudatîyan jî wekhevîyan jî bipejirînin û nefikirin ku cudatî kêşe  
ne li ber riya wekhevîyê. Dewletên niha xizmeta kurdan nakin û divê ji nû ve bên  
pênasekirin ku kurd bikaribin nasnameyên xwe yî pirneteweyî an sînor-derbas îcra  
bikin. Gelek caran şîrovekarên ji komên etnîk ên zal li Rojhilata Navîn vê pirsê

dikin: kurd ji me çi dixwazin? Koma zal nasnameya xwe gelemperî dike, neteweyî dike û wê dike nasnameyeke serdest ku îdia dike riwangeya wê xwezayî ye, gerdûnî ye û şîpa sereke ye. Lê tevgerên kurd bi awayekî tund li hember vê rabûn bi daxwaza civakeke pluralist ku, li gor zanyarê siyaseta Robert Dahl, “nehêle desthilatdarî, hêz, nifûz û kontrol li yek navendê tenê kom bibe û bike ku ev li tak, kom, komele, sazî û rêxistinan belav bibin.”

**Gelo di nav kurdan de fikra neteweperweriyê hatiye teorîzekirin? Di warê neteweperweriyê de di nav kurdan de bêserûberiyek (complexity, confusion) tune ye gelo? Li gor cenabê te çi pirsgirêk hene di vî warî de?**

Neteweperwerî têgeheke zehmet e bo welatekî him ji aliyê siyasî û him çandî ve parçebûyî ye, wek kurdan. Kurd dikarin hevsengiya neteweyî bi dest bixin ger bika-ribin ji nav çeşitdariyê yekitiyekê peyda bikin û bo nasnameyeke çandî ya homojen hewes nekin. Neteweperwerî gelek daran endezyariya civakî ya kolonyal a çêkirinê a “gel” mecbûr dike. Lazim em wek şênberkirina çeşitdarî û cudatiyan qala neteweyeke kurd bikin bêyî ku pênasekirinên hîyerarşik bîn kirin ku filan beş an filan kes kakila neteweya kurd pêk tînin.

**Rabêja PKK a dijî netewe-dewletbûn û sîstema kantonal ku hewl dide li Rojavayê Kurdistanê ava bike, dikare wek post-neteweyî bê pênasekirin?**

PKK têkiliyek wê tevlîhev heye bi neteweperweriyê re. Bawer dikim PKK guhertinek biaqilî kir di nêrîna xwe de ku ew hemû siyaseta xwe bi yek îdeolojiyekê, yanê neteweperwerî, bi sînor nake. Mecbûr e hesabê meseleyên wek pluralîzm, çîn û zayendên civakî jî bike ku gelek partiyên siyasî ji vîzîyonê bêpar in. Ew ê naîf be ku mirov bêje PKK dij-neteweperwerî û dij-dewlet e. Di tevgera kurd de gelek nakokî hene. Ger tu dewletê nexwazî, ewçax tu nikarî şidetê pawan bikî (monopolize). Dewlet ne dezgeheke paşverû ye lê rêxistineke civakî ya modern e bi awayên xwe yî rizgarker û tepisîner. Bi rastî GEL obje û sujeya sereke û delalî ya neteweperweriyê ye. Dema tu wek nişteciyên qedîm behsa kurda bikî, tu awayê rabêja primordialist a neteweperweriyê dipejirînî. Ji ber vî pîr hêsan e ku têkevî dafika morfolojiya neteweperwer. PKK li Rojava pêşketinên baş pêk anîn lê lazim e deriyê xwe ji partiyên din î siyasî re veke ku dengên wan jî bîn temsîlkin. Ez fam dikim li Rojhilata Navîn rewşa niha ya gel zêde ne guncav e bo nîqaş û muzakereyên

# Zimanê Kurdî û Derhişê Subjeyê

BEXTIYAR SECADÎ

Ji Soranî: Memê Mala Hinê

**Puxte:** Ev gotar li ser têkiliya yekser a zimên bi derhişê subjeyê re disekine. Di navbera zimên û derhişê de şîrkatiyek nêz û pêwendiyek yekser heye. Ziman subjektivîteyê saz dike û her wiha tê nîqaşkirin ku sazûna nasnameyê zêdetirîn ji aliyê şert û mercên pêvajoya fêrbûna zimên ve tê diyarkirin. Di çêbûna subjeya nasnameyê de biyanîbûna zimanî merhaleya herî krîtîk e. Li gor vê, ev xebata li ber dest hewl dide di nasnameya subjeya kurd de temsiliyeta zimanê kurdî dest nîşan bike. Ev gotar angaşt dike di navbera zimanê kurdî û nasnameyê de sê têkiliyên pir nêz hene ku ev in: di ziman û nasnameya kurdî de girîngiya rabirdûya xwedî imtiyaz a li hemberî dahatûya bêimtiyaz, tunebûna takekesiyê di peyvên de û her wiha di nasnameyê de, û yên onomatopoeic jî tê de zalbûna dengên xwezayî di zimanê kurdî de, û hêman û meylên xwezayî di subjeya kurd de.

## Destpêk

Mekanîzmaya navbera sêgoşeyî ya ziman, derhiş û îdeolojî dibe sedema pêkhatina subjeyê. Piraniya nivîs û semînerên min li ser peywendîya navbera ziman û îdeolojî û her wiha ziman û nasnameyê bûye. Min kêmtir bala xwe daye peywendîya navbera ziman û derhiş. Heta niha ji hêla min ve girîngî nedana bi mijara derhiş ji ber sedemên taybet in û bi kurtî ya ku dixwazim nêrîna xwe li ser nasnameya subjeya kurdî hêdî



hêdî û merhale bi merhale bixim ber destê xwêner û her merhale jî di nav xwe de ji çend beşên cihê pêk tê ku hin ji wan pênase, argument, pêşîne, çarçoveya teorîk, mînaka cesteya beranalîz, şîrove û encamgirî ne. Ev hemû, ji bilî danîna têgeha nû û her wiha danîna hevwateryekê ji bo zaraveya rexneyî û teorîk in.

Pêwîstiya me kurdan gelek bi analîza îdeolojîyê hinek jî bi analîza pênase û rave û têgeha derhiş heye. Hewldana ji bo têgihiştina mekanîzmaya navbera ziman û derhiş beşeke haşahilnegir a her cure mijarên girîng û hûrgilî pêk tîne ku divê li nasnameya subjeya kurd bikole. Lêbelê berîya vê lêkolînê, pêwîst e bêtir û bi awayekî cidîtir bala xwe bidin ser têgeha derhiş. Derhiş bêtir ew tiştê ku di kirdar û berhem û kesayetîya subjeyê de amade ye tîne bîra me û piştguhkirina rola herî berçav a derhiş di pêkhatina nasnameya subjeya kurd de bi awayekî berdewam yek ji wan çewtîyên lêkolînan e ku di vî warî de hatine kirin.

### **Rola kûr û demdirêj a derhiş: Mînaka yekem: Fikra olî ya li Tirkîyeyê**

Çima li Tirkîyeyê? Digel ku piraniya kanalên ragîhandinê xwedî ramana sekuler in, çima piraniya xelkê vî welatî hîn jî oldar in? Bersiv eger ji bo kesekî ku haya wî ji teorîyên li ser derhişê mirov û şîyan û karîgerîya demdirêj be, gelek sade ye. Tirkîye çend sedsal bûbû yek ji navendên mezin ên dinyaya Îslamî. Subjektîvîteya olî (Religious subjectivity) niha jî aliyê destnîşanker ê nasnameya subjeyî ya Tirkîyeyê pêk anîye. Ji ber xweveşartina ol û peyv û hevokên olî yên di zimanê wan kanalên sekuler de em gelek bi hêmayên îdeolojîk dihesin. Ango ziman ew peyv û hevokên Îslamî ji Osmanîyan wergirtine.

Ev hêma bi temamî ketine nav zimanê Tirkî û Tirkî tenê ji giranî û sextîya Erebi hatiye maliştin û vî zimanî qalibeke xwemalî û îfadekirineke nazik wergirtiye. Lêbelê desthilatî û rêjeya bikaranîna van hêmayan ewqas zêde ne ku wan karîye heta astekê li wî welatî rê li ber modela sekuler bigire. Di van çend salên dawî de ku aliyên sîyasî yên desthilatdar ên niha hatin ser kar, ev xet bi hêztir bû û niha hema bêje Tirkîye dibe welatekî bihêz ji bo modela Îslamî. Çend sal berê amadebûna Erdogan di civîna Komkara Erebi ya li Misrê de û sîyaseta wekî hev a Tirkîye û Komkara Erebi li ser çend pirsên nazik derxist holê ku Tirkîye û nasnameya Tirkî, -em wisa pê dihesin ku- xwe wekî mal û modela dinyaya Îslamî dizane. Yek ji encamên destnîşanker ên subjektîvîteya olî di subjeya Tirkî de ew subje ye ku dixwaze bibe beşeke Ewropayê û hebûna gelek hêmayên îdeolojîk ên di zimanê Tirkî de bûne aliyên bihêz ên derhişê wê subjeyê.

Yek ji rêyên geşbûna gotara sekuleran guhertinên zimannasî ya him ji hêla pêk-hate û hevoksazîyê ve him jî ji hêla peyv û gotinê ve ye. Wekî ku Baxtîn gotiye, peyv ji hêlekê ve dikare guhertina herî biçûk a civakî tomar bike û ji hêla din ve jî ew bi xwe dikare bibe amajeyek ji bo geşbûna xeta gotarsazîya civakî. Gerçî Atatürk ji bo vê yekê hewl daye, lêbelê agahdarîya desthilatî zêde nebûye hêmayên îdeolojîk. Ev



kar, angu maliştina îdeolojî ji hêma û veguherîna her cure barê îdeolojîk a di peyvvan de, rênivîsa talî alîkar jî be dîsa ji hêla teorî ve ne mumkun e. Angu dibe ku dewletek bikare di kêlîyekê de û li gor yasayên hukmî alfabeya welatekî biguherîne. Lêbelê nikare bi awayekî lez û bez barê maneyê ya hêmayên îdeolojîk biguherîne. Yasa nikare bi awayekî lez barê îdeolojîk a peyvvan biguherîne û eger ev kar bi ser keve jî inçex di demeke dirêj de pêkan e.

### **Mînaka duyem: Tevgera farisîya sade ya li Îranê**

Mînakeke din a desthilatîya derhiş, têkbirina hemû hewlên cidî û bihêz a paqijkirina zimanê Farisî ji peyv û qalibên Erebi bû ku ji hêla çend kes û navendên Îranî ve çend sal berê hatibû kirin. Di warê îdeolojî û derhiş de listik berevajî dibin. Angu li dewsa ku peyvên Farisî xwemal bin û peyvên Erebi bîyanî bin, berevajî hin peyvên Farisî bûne xwedî barekî gelek giran ê îdeolojîk ku êdî peyvên Erebi bi awayekî îdeolojîk nayên dîtin. Bi maneyeke sadetir, peyvên xwerû yê Farisî di zimanê Farisî de ji bo axêverên Farisî bîyanî dibûn lê hevmaneya Erebi ya van peyvvan bîyanî nedihatî dîtin.

Faktora îdeolojîknebûna peyvên Erebi yê di zimanê Farisî de ji wê yekê tê ku gelek sed sal ew peyv di derhişê Îranîyan de bi cih bûne, di hemû tekstên kevn û nû yê Farisî de hatine bikaranîn û di Îrana kevn de wekî model û cure hebûne û dúbare bûne. Îdeolojî heta ku di derhiş de cîgirtir û mîsogertir be, bibandortir dibe û di vê rewşê de ku êdî îdeolojîkbûna wê tê jibîrkirin û dibe beşeke wê nasnameyê. Li gor deskeftên dawîn ên zanistî jî, dubarebûn dibe egera geşbûna snapsên xaneyên mêjî. Analîza min a li jorê ku şîroveya zanistî ya wê nêrîna populer e wekî “Peyvên Erebi bûne mulkê zimanê Farisî” tê îfadekirin.

### **Jixwebîyanîbûna zimanî**

Ew pêvajoya ku ziman takekesan dike subje yan jî bi awayekî baştir bibêjin, ew pêvajoya ku ziman takekesan dike subjeya xwe, bi ‘jixwebîyanîbûna zimanî’ (linguistic alienation) ku gotineke sereke ya Lacan e tê ravekirin. Nasnameya Subjeyê ji ber zimên û bi rêya zimên şikil digire. Bi gotineke zelaltir, ziman her nasnameyêke subjeyê pêk nayne, heta ji vê jî girîngtir, ziman di derhişê subjeyê de bi cih dibe û dest bi avakirina subjektîvîteyê dike. Nasnameya mirov, di rastîyê de hemû subjektîvîte ne ku di nav derhişê wê subjeyê de hene. Piranîya van subjektîvîteyan îdeolojîk in û ji ber zimên hatine sazkirin.

Ji bo ku ev teorî ji vê zêdetir nebin gerdunî û cîhangîr (Ev, ji wê rexneya Lacan hatiye girtin) divê em behsa wê yekê bikin ku pêvajoya bîyanîbûna zimanî di heman demê de di nava xwe de hilgirê lêpêçîna îdeolojîk e jî. Angu, bi armanca dîyarkirina nasnameya subjeyê, divê ew hêmayên îdeolojîk destnîşan bikin ku di pêvajoya bîyanîbûna zimanî de dibin egera sazûna subjektîvîteya nasnameya subjeyê. Hêmayên

îdeolojîk ên ku di derhişê subjeyê de bi cih bûne û li vir peywendîya navbera îdeolojî û derhiş dibe pirsgirêkeke teorîk ku divê were çareserkirin. Lêbelê ez ê li vir behsa wê çareserîyê nekim.

### Derhişê subjeya kurdî

Hewcedarîya her cure behsa zimanê Kurdî û derhişê subjeya Kurdî ya di warê lêkolînên Kurdî de, ewil bi pênase û ravekarîya têgeha derhiş dibe. Belê, ev kar, karekî heta tu bibêjî sext, demdirêj û fireh e. Lêbelê distnîşankirina subjektîvîteya hazir a di zimanê Kurdî de wê rêya sext û zor ji me re li hev tîne. Ango, ji bo têgihiştina derhişê Kurdî divê ewil em wan subjektîvîteyan fêhm bikin ku wan derhişan pêk anîne. Ev jî dîsa me bibe ser xebata li ser zimanê Kurdî yan wan zimanên ku di perwerdekirina subjeyên Kurdî de hatine bikaranîn, anga Farisî, Erebi û Tirkî.

Derhiş ne tenê xwedî bingeheke zimanî ye, her wisa rêya hînbûna ziman e jî ku subje pê dibe xwedî derhişekî tekûztir ji wî derhişê ku berê pê re bû (Mebest ew derhişê subjeyê yê berîya hînbûna zimên). Li vir, dema ku em dibêjin bingeha derhişê wekî bingeha zimên hatîye danin, em bi temamî wekî Lacan difikirin. Ango, ew zimanê ku kesekî dike subje, di heman demê de şikil jî dide derhişê eynî kesî. Ev jî, peywendîya rasterast a navbera ziman û nasname ye. Helbet em xeletî nekin. Li vir mebest ji ziman, zimanê subjeyê ye û mebest ji nasnameyê jî nasnameya subjeyê ye. Ev peywendî peywendîyeke dualî ye û bi awayekî ku her yek ji wan hevûdu pêk tînin û bi vî awayî di navbera zimanê Kurdî û derhişê subjeya Kurdî de dîyalektîkek heye. Ji ber vê jî ez di navbera wan de gelek tiştên wekî hev dibînim. Behskirina vê wekhevîyê wê gelek wext bigire. Lêbelê ez ê li vir behsa vê nekim.

### Zimanê kurdî û derhiş: Çend mînakên pratîkî

Ji bo nîşandana peywendîya derhiş û zimanê Kurdî cihê herî baş berhemên edebî û hunerî ne ku bi awayekî derûnî ruhê kesayetîyan derxistiye holê. Roman û film du cureyên edebî û hunerî yên cihê ne ku ji ber sedemên taybetî ji cureyên din baştir dikarin bi vê pirsê re rûbirû bibin û derûnîya kesayetîya me temsîl bikin. Wek mînak, min ev kar berîya xwendina romana Şêzad Hesen a bi navê *Hesar û Segên Bavê Min* û romana Eta Nehayî ya bi navê *Grewa Bextê Helale* temam kiribû. Li jêrê jî helw didim ku gelek kurt hin mînakên din ên encamên alîyê derhişê yên subjeya Kurdî di zimanê Kurdî de û berevajî bicihbûn û temsîlkirina hin taybetmendîyên zimanê Kurdî di derhişê subjeya Kurdî de bixim ber dest.

### Yekem: Raborîxwazîya subjeya kurdî

Eger ez bixwazim li vir amaje bi çend mînakên teorîk ên li ser peywendîya ziman û derhiş bikim, dikarim amaje bi nebûna lêkera alîkar a dema bê di rêzimanê Kurdî de

bikim û paşê behsa derencamên vê meseleyê di derhişê Kurdî de bikim. Di zimanekî wekî Îngîlîzî de ji bo destnîşankirina van lêkerên alîkar ên dema bê em xwedî gelek şeweyên cihê ne. Di zimanê Farisî de herçiqas bi mebesta dîyarkirina lêkera alîkar a dema bê sûd ji 'xwah' tê wergirtin jî ev cure bikaranîn îro bûye şeweyeke fermî. Ango li dewsa 'xwahim reft' 'mîrum' tê gotin. Di Erebî de jî 's' û 'suf' eynî rolê pêk tînin. Lêbelê di Kurdî de em ne xwedî şeweyeke taybet a lêkerên alîkar ên dema bê ne.

Nebûna lêkerên alîkar ên dema bê ya di zimanê kurdî de û bi taybetî jî di Soranî de him sedem e, him jî encam e. Ev yek bixwe derencama cureyeke 'raborîxwazî' ya derhişê subjeya zimanê kurdî (helbet di Kurmancî de lêkera alîkar a dema bê yê nêzik heye). Ango 'Ez diçim' ji 'Ez ê biçim' cihê ye. Ji ber vê yekê ez dibêjim nebûna lêkerên alîkar ên dema bê sedem û encam e. Lewre em nizanin ka zênîyet nebûna vê lêkera alîkar pêk anîye an jî nebûna vê lêkerê alîkar ev zênîyet pêk anîye. Helbet lêkolînên min gihîştin wê encamê ku di zimanê Kurdî de nebûna wê lêkera alîkar bixwe ev zênîyet pêk anîye. Li vir ez ê zêde li ser vê pirsê ranewestim. Lewre peywendîya vê yekê bi gelek sedemên cihê cihê hene. Helbet divê vê jî bibêjim ku zanîna vê meseleyê bixwe dikare di nehiştina vê zênîyetê de roleke sûdewar pêk bîne. Ev dîyarde, anga agahdarbûna subjeyê ji kêmasîya cewherên xwe, ji hêla subje bixwe ve wekî meta-awareness tê binavkirin.

### **Duyem: Nemana serxwebûna peyvê**

Mînakeke din a li ser peywendîya navbera ziman û derhişê Kurdî, nemana serbixweyî û tekîtiya peyvan a zimanê Kurdî ye. Min li cihên din jî behsa vê xesletê kiriye û gelek mînak nîşan dane. Bi kurtî, di zimanê Kurdî de komek peyv hene ku yek ji karên dubarekirinê (reduplication) pêk tînin. Rast e, ev cure peyv di zimanekî wekî Farisî de hene. Wekî pencere mencere. Lêbelê ev rewş di zimanê Kurdî de bêtir bi rêya bi hev re nivîsandina du peyvên serbixwe tê pêkanin. Ev peyv di zimanê Kurdî de gelek in û min gelek ji wan kom kirine. Hin ji van ev in: *Karûbar, şaşûdax, halûmal, carûbar, awûtaw, demûçaw, hatûhawar, qînqîre, takûtera, parûpêrar, malûminal, serûber, gîrûgirift, teng û çeleme, kosp û tegere, kelûpel...*

Ji bo ku rola van peyvyan eşkere be, divê em bizanin ka çend sed ji van peyvyan hene û hemû jî tînan zanîn û rojane ji hêla her kesî ve û di kanalên dîtbar û bihîstbar û înternetê de tînan bikaranîn. Wekî ku tê zanîn, di van cure peyvyan de gelek caran bi awayekî berdewam maneya beşeke peyvyan diguhere yan jî ji bingehe ve maneya wan nîn e. Bi gotineke din, di van cure peyvyan de taybetmendîya serbixweyî û tekbûn ji peyvyan hatîye girtin û xalên giştî lê hatine barkirin.

Ev taybetmendî bûye sedem û encama piştguhkirina tekbûna him nasname him jî sîstema ferhengîya me. Wek mînak, di govendê de ji bilî sergovend, takekesîya tu kesekî govendê namîne. Ew hemû kesên ku bi hev re govendê digerin divê bi rîtmekê û tevgerê govendê bigerin û eger kesek wiha neke, ahenga govendê tîk

diçe. Ango, ên ku govendê digerînin di hareketê de serbixwe nîn in û divê rîtm û tevgera giştî li ber çav bigirin. Yekem encama vê sîstema hunerî piştguhkirina afirandinê ye. Ji ber vê jî wekî ku tê zanîn, wek mînak, afirandin di govendê de li gor reqsên neteweyên din gelek kêmtir e.

Him ji hêla gotin û him jî ji hêla nivîsandinhe ve nebûna serbixweyîya peyvê ji nebûna serbixweyî û tekanebûna warên din ferhengî reng daye. Ev mînak gelek in û encamên wan ên di wênesazî û muzîk û edebîyatê de min destnîşan û diyar kirin û di derfeteke din de ez ê veguhezînim.

### **Sêyem: subje û xweza**

Yek ji wan taybetmendîyên ku min li jorê behs kiribûn û divê derencamên wan di derhiş de were dîtîn şênberkirina alîyê xwezayî ya di zimanê Kurdî de ye. Belgeya herî baş a nîşandana xwezayîbûna zimanê Kurdî ew peyv in ku wekî 'navdeng' tên zanîn û hejmara wan gelek zêde ne. Ev taybetmendî ji zênîyeteke pêşmodern derdikeve. Xwezayîbûna ziman û subjektîvîteya pêşmodern hevûdu pêk tînin. Ev, zênîyeteke modern e ku dikare wek mînak di nivîsekê de bi hişmendî û derhişî rê li ber alîyên siruştî yên zimanê Kurdî bigire û bi awayekî berdewam hewla raçavkirina cewhera zanistî bike, ango ziman ji xwezayîbûnê ber bi zanistîbûnê bibe. Bi zanistîkirina zimanê Kurdî wekî beşeke ji xeta çendalî û tevlihev a geşbûna zimanê Kurdî tenê di pêvajoyeke demdirêj de bi ser dikeve.

Her cure guhertin di zimên de hewcedarî bi maweyeke demdirêj heye û bila ji bîra me neçe ku guhertina di zimên de tê wateya guhertina di derhiş de. Ev pêvajo ewqas zehmet û demdirêj e ku li gor gelek bîreweran ev pêvajo bi ser nakeve. Lêbelê çend bîrewerên paşpêkhatexwaz, wek mînak Judit Butler, ev yek ji bo me analîz kiriye ku ev kar dikare were encamdan. Helbet di asteke gelek biçûk de û bi radeyeke gelek kêmtir... Ji ber vê jî, em bi awayekî gelek hêsanî tilîya xwe deynin ser wê xesletê nezanistîbûna teksteke Kurdî ku nivîskarê wê, berhema xwe wekî berhemeke zanistî bi nav dike. Ji hêla din ve jî, eger hemû berhemên bîrewerê Kurd wek mînak bikin mijara lêkolînê, bi hêsanî dikarin wan dijayetîyan dest nîşan bikin (dijayetîya perwerdeyî, dijayetîya metodoljî, dijayetîya maneyî) ku di sîstema fikrî ya wî bîrewerê de ye.

### **Encam**

Peywendîyeke qewî, dualî û rasterast di navbera ziman û derhiş de heye. Pêvajoya hînbûna zimanê dayikê di rastî de pêvajoya şikilgirtina derhişê subjeyê ye. Bi gotineke sadetir, pêkhateya derhişê subjeyê li gor çawatîya sîstema zimanê dayikê, him ji hêla peyvsazî ve him jî ji hêla hevoksazî û pêkhateyê ve tê dariştin. Bi eynî awayî, hînbûna zimanekî nû ji bo subjeyê di temenê navsalî de bi xwe re cureyeke cihêtiya nêrînê pêk tîne. Di navbera taybetmendîyên zimanê Kurdî û taybetmendîyên subjeya Kurdî

de cureyeke wekîhevbûn û lihevçûn tê dîtin. Di vê lêkolînê de bi kurtî bal li ser sê taybetmendiyên raborîxwazî, nemana serbixweyiya peyvê û aliyê xwezayî yê zimanê Kurdî hatîye kişandin ku di subjeya Kurdî de jî ev yek bi gelek awayên cihê tê dîtin.

---

## ÇAVKANÎ

- Althusser, Louis. *Lenin and Philosophy and Other Essays*. Trans. Ben Brewster. trans. New York: Monthly Review Press, 1971.
- . *Writings on Psychoanalysis: Freud and Lacan*. Oliver Corpet and François Matheron, eds. Trans. Jeffrey Mehlman. New York: Columbia University Press, 1996.
- Benwell, Bethan and Elizabeth Stokoe. *Discourse and Identity*. Edinburgh: Edinburgh University Press, 2006.
- Boucher, Geoff. *The Charmed Circle of Ideology: A Critique of Laclau and Mouffe, Butler and Žižek*. Melbourne: Re.press, 2008.
- Butler, Judith. *The Psychic Life of Power: Theories in Subjection*. Stanford: Stanford University Press, 1997.
- Elliott, Anthony. *Psychoanalytical Theory: An Introduction*. Oxford: Blackwell, 1997.
- Fairclough, Norman. *Language and Power*. London: Longman, 1989.
- . *Critical Discourse Analysis: The Critical Analysis of Language*. Boston: Addison Wesley, 1995.
- Fink, Bruce. *The Lacanian Subject: Between Language and Jouissance*. Princeton: Princeton University Press, 1995.
- Lacan, Jacques. *The Seminar of Jacques Lacan, Book I: Freud's Papers on Technique, 1953-1954*. Jacques-Alain Miller, ed. Trans. John Forrester. New York: W. W. Norton, 1988.
- . *The Seminar of Jacques Lacan, Book XI: The Four Fundamental Concepts of the Psychoanalysis*. Jacques-Alain Miller, ed. Trans. Alan Sheridan. New York: W. W. Norton, 1978.
- Larmore, Charles. "The Concept of a Constitutive Subject." in *The Talking Cure: Essays in Psychoanalysis and Language*. Colin MacCabe, ed. London: Macmillan, 1981, rr. 108-31.
- Vasterling, Veronica. "Butler's Sophisticated Constructivism: A Critical Assessment." *Hypatia*, C. 14, No. 3 (Havîn 1999), rr. 17-38.
- Williams, Caroline. "Althusser and the Persistence of the Subject." *Borderlands*, C. 4, No. 2, 2005. Available from:  
[http://www.borderlands.net.au/vol4no2\\_2005/williams\\_interview.htm](http://www.borderlands.net.au/vol4no2_2005/williams_interview.htm) [Ketina malperê:14 Çile, 2009]
- Wolfreys, Julian. *Critical Keywords in Literary and Cultural Theory*. New York: Palgrave Macmillan, 2004.
- Žižek, Slavoj. *The Sublime Object of Ideology*. London: Verso, 1989.
- , ed. *Mapping Ideology*. London: Verso, 1994.

# Di Romana Gundikê Dono De Wek “Êdin” Temsîliyeta Tirkan

AZİZ TEKİN

**Puxte:** Berhema wêjeyî de ji nû ve hilberîn, di mijarên nasname, îmaj, îmgeyê de rê li ber meriv vedikin. Wek tê zanîn ji nû ve hilberîn û zexmkirina rastiyê rêya herî baş û hêsan a afirandina “êdin” e. Em jî bi vê xebatê, di romana *Gundikê Dono* ya Mahmut Baksî de li ser temsîliyeta tirkan sekinîn. Berhema ku taybetiyên dema xwe û dorhêla xwe di nava xwe de dihûndirîne, herçiqas bi rehetî neyên dîtîn jî “bîra kolektîf” a civaka xwe dide der û wateyên cihê jî dihewîne. Di romanê de, di derbarê “êdin” de şikl û şemalên fîzîkî, li xwekirin, hewîn, helwest, tevger, baweriyên de bi rêya şayesandinê piçûk dîtîn, piçûk xistin, wêdakirin an bi dîtina wek xwe çêkirina îmajan bê analîzkirin. Ev hemû li ser mînakên ji romanê hatine girtin dê bê kirin

**Peyvên sereke:** îmaj, bîra kolektîf, nasname, êdin, derhiş

## “Em”ê ji ser “êdin” tê afirandin an “êdin”ê “me”

Di afirandina îmajê de têgehên sereke “ez/em” û “êdin” in. Di serî de li gorî “min” “adin” heye. Ev adinî bi gelemperî li gorî nasnameya ferdî ye. Ev ji bûyîna ferd dest pê dike heya ku xwe wek endamek civakê bihesibîne hîs bike berdewam dike. Yek jî li gorî “me” “êdin” heye. Piştî ku ferd xwe endamek civakê dihesibîne rewşa êdin ya hevpar/kolektîf nas dike. Ji vê pê ve cihêtiyê ne li gorî xwe, li gorî civaka tê de dijî dinirxîne û şîrove dike.

Çendek pênaseyên “êdin” hene. Saziya Zimanê Tirkî (TDK) di derbarê xala êdin de wiha dinivîse; “1. Tiştê ku behsa wî tê kirin an jî ji du tiştên dişibin hev ya ji hêla



---

---

---

---

---

---

girîngiyê de dûr. 2. Tişt an kesa/ê ji nav çandê hatî wêdar kirin” (Öteki, TDK). Wek ku ji pênaseyê jî tê famkirin ji bo “êdin” dûrbûn hewce ye. Ev dûrbûn ne tenê ji hêla fîzîkî her wiha ji hêla girîngî û cîh de jî derbasdar e. Di heman demê de kesên li derveyî çanda serdest cîh digrin in. Kifşkirina “êdin” ji hêla kes an civakê, di heman demê de kifşkirina “ez” jî ye. “Ez” an “em” beriya ku bi “êdin” re rû bi rû bimîne derfeta ku xwe nas bike nabîne, bi kifşkirina “êdin” re tiştên di nava xwe de dibîne. Di dîrokê de bi destpêka hewldana serdestkirina “ez” an “em” “êdin” xwiya dibe. Di hin qonaxan de daxwaz û helwesta tunekirina “êdin” çêdibe ku ev heta asta nijadperestî û şer diçe. Ev di encameke neserkeftinê ya pişaftin û şibandina xwe ya li hember tişt û kesên ji çanda heyî cihê ye.

“Êdin” di nivîsarên wêjeyî ku em behs dikin bi rêya şibandin û îmgeyan tê çêkirin. Sigmund Freudê ku têgeha “derhiş” di çarçoveya teoriya psîkanalîzê de pêş ve xistibû xwediye çend wateya ye ango li pişt binhişa tê dîtin zêdetir esasek nayê dîtin an jî veşartî jî heye. Ev tiştta ku em dikarin wek “binhişa nivîsaran” bi nav bikin di rastiyê de “binhişa kolektîf” û “derhiş” bi xwe ye. Li gorî hin teorîsyenan, nivîsar berhemên binhişê ye. Nivîskarên ku afirînerê hunera honakî ne her yek vebêjerê çîrokên û honakger in, di heman demê de wek endamek civaka xwe, çî baş çî xerab cîh didin diyardeya “êdin”.

### **Wek qada binavkirinê berhema hunerî**

Wêje, qadeke hunerî ye ku honak û rastiyê bi hev re li hev diguncîne û xwediye feraseteke wate avakirinê ye. Ev rastî û wate avakirin bi navgînên ziman tê çêkirin. Û ev wate avakirin bi bîra kolektîf tê çêkirin. Bîra kolektîf bi rêyên cihê xwe digihîne ferd û komên civakî. Pevguheziya girseyî, wêje, pergela perwerdeyê, hunerên çandî; formên cihê yê rabirdûya bi awayên porformatîf an jî bi niviskî û devkî qeyd û depo dike (Connerton, 1999). Ev qeyd û depo gelemperî bi ser wêjeyê tê kirin. Bilginê dibê “Komên mirovahiyê xwe di rabirdûya hevpar de dinasin, vê rabirdûyê li bîra xwe neqş dikin, bi rêya rîtûelan bi bîr tînin û şîrove dikin” (Bilgin, 2007: 219), di berhemek xwe ya din de (2013) di derbarê bîra kolektîf de wiha dibêje: “(...) bîra kolektîf, bi ser hin sembol, bîranîn, berhemên hunerî, tore, hînbûnî, nirx, bawerî û agahiyên kevneşopî, mîrateya raborî barkirî, bi kurtasî bi bîra kolektîf ava dike” (r. 41).

Di berhemên hunerî de ji nû ve avakirina wateyê karekî domdar e. “Rastiya dîrokî ne tê kifşkirin ne jî tê çêkirin; lê bi rêya ‘vegotin/çîrok’an ji nû ve tê afirandin/

hûnandin” (Jusdanis 1998; 38). Kesên wêjeyê wek navgînek pêhasindinê difikirin di wê baweriyê de ne ku wêje dikare “rastiyê” vebêje. Vê nêrîna ku wêjeyê wek eyne dide xûyan wisa bawer dikin ku çi di civakê de diqewime û civak di nava xwe de çi dihundirîne divê bi heman awayê veguhezînin berhema hunerî.

Umberto Eco teza, bi xwendina berhemek hunerî re tekakesek di tevahiya jiyana xwe de çi agahî bi dest xistibe cardin li hiş tê vexwendin, bi xwendinê re tekakes heta wê kêliyê çi agahî û nirxên civakî li ba xwe hiştibe cardin dijî û dinirxîne diparêze. (veguheztin Demirözü: 2003: 172). Ev agahiyên li hiş tèn vexwendin kêrî îmajê ji hêla nivîskar ve bo xwendevanan tê avakirin û qasê hejmara xwendevan an jî qasê hejmara kesên bi berhema hunerî re dikevin pêwendiyê cardin tê hilberîn.

Di vê qonaxê de bîrdoziya nivîskar, xwendevan û di heman demê de bîrdoziya berhemê derdikeve pêşberî me. Ji ber nivîskar xwediyê bîrdoziyê û armanceke wî/wê ya veguhestinê heye, nivîsar bi bîrdoziya nivîskar hûnandî ye. Dema xwendevan jî nivîsarê dixwîne, li bêjingê dixê, çawa li ba nivîskar dibe bi heman awayê wate li nivîsarê bar dike û bîrdoziya nivîsar û nivîskar li gor xwe cardin hildiberîne. Di berhemên wêjeyî de bîrdoziya di derbarê “êdin” de gelemperî bi rêya watedarkirinê tê çêkirin. Watedarkirina berhema bîrdoziyê ye û Stuart Hall wiha pênase dike: “Desthilatdariya îdeolojîk destlilatdariya watedarkirinê ye. Ji hev belavkirina destlilatdariya watedarkirinê, tê wateya betalkirina watedarkirinên derbasbar. Têkoşîna li ser wateyê tê kirin, şeweyek têkoşîna îdeolojîk e. Navgînên vê têkoşînê saziyên medya-çandî ne. (...) Hêza îdeolojîk, bi siyaseta vê navkirinê ve girêdayî ye” (veguhestin, Arslan, 2015: 11). Wek ji gotinên Hall jî tê famkirin ev watedarkirin ji ser berhemên wêjeyî ku him saziyên medyatîk û him jî saziyên çandî ne tê kirin. Van Dijkê dibê: “Îdeolojî, çarçoveya pêdiviya pênasekirina sosyo-çandî ya komek civakî wek “xwe” û “êdin” raber dike” (veguhestin, Arslan, 2015: 12). Foksiyonîbûna bikaranîna watedarkirinên îdeolojîk di nivîsarên wêjeyî de nîşanê me dide.

Takekes an jî komên civakî, diyarkirin, watedarkirin û pênasekirinên derbarê xwe de li gor tişt û kesên ne ji wan û dût dikin. Di hin deman de ev ne hewce ye ku wek mekanî dût bibe, wek mînaka *Gundikê Dono* her çiqas êdin ji hêla fîzîkî nêzik bin jî ji hêla xeyalkirina paşeroj, pêşeroj û fikir de ji hev dût in. Hin dem jî ev li gor bîrdoziya nivîskar jî diguhere; wek ku axa, şêx û begên nijadkurd dût tèn hesabandin. Dema me behsa avabûna merheleyên îmaj û nasnameyê kiribû hatibû nîşandayîn ku takekes an jî komên civakî ji ser kesên ne ji wan ava dibin. Ne hewce ye ku ev pênase rast be an jî nêzê rastiyê be. “Xwe-îmaj” a komek civakî kêrî fonksiyonkirina îdeolojîyê tê. Wek li jor jî hatî behskirin ev bi rêya; hevokên bi watevakar, binavkirin, wesfdayînan tê çêkirin. Hêla îdeolojîk ya binavkirin û pênasekirin di mînaka peyvên “terorîst” û “şervanê azadiyê” de bi zelalî li ber çavên me tê raxistin. Ev watedarkirin û binavkirinên îdeolojîk bi gotinên Hall; “têkoşîna li ser watêyê tê kirin e” (veguhestin, Arslan 2015: 11).

### Îmaj an jî “rastiya me ava kirî”

Îmajên ku pêwendiyên wan bi rastiyê re bi guman in, hest û ramanên “me” yên di derbarê “êdin” de ne. “Îmaj; encama yekparebûna ramanên tevlîhev, hest, bîranîn û hwd. li gor îdeolojiyek e. Bi lêhûrbûnek li ser îmajan nîşan dide wê bê dîtîna ka nivîskarek bi zanetî an ne bi zanetî baweriyên di nav civakê de cih girtine çiqas dişopîne.” (Milas, 2000: 7). Îmaj, bi taybetî di avakirina nasnameya neteweyî de fonksiyonek girîng digre. Di vê şopandina îmajê de hin caran “êdin” bi tevayî tê tîpolojîkirin, streotîpkirin û “yên ji me” kesên îdeal tîna afirandin, hin caran jî “êdin” bi kesên ji me ye tê zeliqandin û wek rola kesên bi yên baş re –ku ew em in- bi hev dike dilîze û bi vî awayî zexmkirina îdealbûna kesên ji me tê kirin.

Li hember îmaja ku ji bo komeke derve tê çêkirin, pênaseyên komên civakî di derbarê xwe de dikin jî “nasname” ye. Pênaseya nasname jî bi gelemperî ji ser kesên hember, êdin tê çêkirin. Avakirina nasnameyê bi avabûna netewedewletan û taybetî bi navgînên dewletê derbasê merheleyeke din bûye. Di romana kurdî de ku em li ser xebitîne, saziyên dewleta kurd tune ne, rewşenbîr, nivîskar û sîyasetmedar rola dewletê digrin ser xwe. Siyasîbûna nivîskar û rewşenbîr Baksî vê gotina me piştrast dike. Gregory Jusdanis (1998) ku li ser rola entelektûelan di avakirina nasnameya neteweyî de disekine, di vê mijarê de wiha dibêje: “Elîtên demê, bi sêwirandina raboriyek cihê ji bo daxwaza netewekirina girseyên, girîngiya muxayîlek hevpar firq kirine û di wê hişmendiya de ne ku wêje peywira eynêbûna “bîra kolektîf” dibîne û çîroka wan vedibêje” (r. 68). Ji hêlek din ve hew ne tenê rewşenbîr rola avakirina neteweyan digrin ser milê xwe hin caran jî li gor bîrdoziya xwe pêşengtiyê li fikrên çînî, zayendî, olî û hwd. jî dikin. Di romana *Gundikê Dono* de jî cih bi cih nêrîna çînî ya nivîskar xwûya dibe.

Li gor angaştê Ali Rattansi, post-modernîzm bo hin nasname hin nasnameyên din marjînalîze bike hatî afirandin (veguhêstin Arslan, 2015: 24). Bi taybetî di mijara nasanemeyê de “marjînalîzekirin” rêyek hêsan e, lewra li vir ser “êdin” re wêder kirin, hefskirina qadek sînorê wê diyarkirî û tunekirin rehetir e. Ev car caran dibe sedem ku hin nasname bi awayek fanatîk vekişin ber bi xweparastinê. Pir caran ev êrîşkirin û xweparastin di nav nivîsarên wêjeyî de jî berdeham dike. Wek mînakê *Gundikê Dono* jî nasnameya kurdîtiyê bi rêya nivîsê hewl dide xwe biparêze.

Romana Mahmut Baksî ya bi navê *Gundikê Dono* di sala 1988’an de hatî weşandin. Baksî di vê romana xwe de bi nêrînek ne dûrî rastiyê bûyerên komek gundî û ser wan re jî civaka Kurdistanê ku di demek her diçe tevlîhev dibe, lêgerînên wan vedibêje. Ji bo wan kesên çîroka wan tê vegotin, ji ber kevneşopiyên êdî nikarin debar bikin, her diçe bi van dijwariyên kevneşopiyê re rû bi rû dimînin. Têkoşîna wan a li hember van kevneşopiyên tê vegotin. Cihê bûyerê lê derbas dibin *Gundikê Dono* ye ku dikeve herêma Xerza. Romana ku tîkiliyên axa û gundiyan kiriye mijara xwe bi paşve vegeirîna bûyerên dîrokî cardin pevdixê, wek “êdin” di gelek cihan de behsa tirkan

dike. Bi mînakên me ji romanê girtî ye em ê hewl bidin ku îmaja êdin/tirkan raxin ber çav. Ji ber vê yekê jî her çiqas em hevokan ji romanê bigirin jî hewl bidin ku paşbûyeran jî binirxînin. Lewre îmaja tirkan ya heye/hatî avakirin li derveyî vê romanê û nivîsarên hunerî heye/hatî avakirin, bi rêya van navgînan berdewamiya xwe çêdike.

Dema em di derbarê îmaja tirkan de ya di wêjeya kurdî de bifikirin û li ser van berhemana lêkolîn bikin divê em li ber çav bigirin kî/kê “tirkan” temsîl dike. Bi gelemperî di wêjeya kurdî û di bîra hevpar ya kurdan de temsîliyeta tirkan wek; leşker, karmend û xebatkarên dewletê xwiya dibe. “Tirk û tirkbûn nasnameyeke leşkerî ye” (Yücel, 2011: 194). Di rastiyê de em dikarin vê di romanên dema destpêka Komara Tirkîyê de hatî nivîsandin de jî bibînin. Di berhemên vê demê de lehengên bi kurdan re dikevin têkiliyê bi piranî leşker an jî bi awayek xebatkarên dewletê ne. Di wêjeya kurdî û bîra hevpar ya kurdan de ev wek tirk/romî tîn pênasekirin.

### **Di romana *Gundikê Dono* de êdinbûna yên ji me an jî nefoksiyonelbûna girêdana netewî**

Bi rêya hevokên ji romanê hatine girtin, tiştên bi tirk û tirkan ve girêdayî an vegotinên kêrî çêkirina îmaja tirkan tê dê bîna amajekirin û ev hevok bi hurgulî dê bîna revakirin. Hevokên wek mînak hatine girtin di niv honaka bûyerê de bê nîrxandin û her wiha hewl bê dayîn paşxana bûyeran li ber çav bê raxistin. Me dest neda şaşiyên jêgirtinên ji romanê.

Di romana *Gundikê Dono* de tiştê herî balkêş; tişt, bûyer an jî kifşkirinên em dikarin wek nû bi nav bikin awayek bi tirkan ve girêdayî ne. Di derbarê nebûna çanda çay vexwarinê de wiha tê gotin. “Bes carcaran gava diçûn mala Hecî Zorav li ser serdikê di destê wî de didîtin. Ji wan kirî ku çay vexwarin tenê mafê axan e, şifêran e, an jî ew kesên ku bi tirkî diaxivin ê wan e.” (r. 14) “Çay” a ku ji bo civakê bi awayek nû ye bi tirkan ve tê girêdan. Nivîskar vê kevinbûn/kurdbûn, nûbûn/tirkbûnê bi nav dike û li gor eşyayên tîn bikaranîn tesnîf dike. Ligel eşyayan zimanê lehengan ên pê diaxivin jî wek nû û kevn tîn senifandin. “Tiştên kevin û nû bi hev ve zeliqîbûn. Perîxan û Salo ne tam Kurd bûn, ne jî Tirk” (r. 18) Di berdewamiya rûpelan de ji ser Perîxan û Salo, tirk bi cixare, şalpe, kirasên gulgulî, eynikên naylon û şe ku tiştên nû ne tîna pêwendîdar kirin û kurd jî beravajî bi tiştên ku li hember tiştên nû disekinin. Ev hinek bi rihê demê re jî girêdayî ye, tişt û dîtinên nû ji ser tirkan diket qada Kurdistanê û ev jî dibû sedem kut irk bi tiştên nû bîna zanîn. Ji ser van taybetiyan xerabnîşandayîna “êdin” tune ye ji ber ku nivîskar tiştên nû baş dinirxîne. Xirabnîşandayîna tunebe jî bi awayek “em” û “êdin” ji hev tîna veqetandin.

Lê her kesê/a bi nû/tirkan ve dikeve têkiliyê kêmasîkî pê re peyda dibe, bi saya vê kêmasiyê “nejimebûna wan” derdikeve holê. Ne tam kurdbûna Perîxan û Salo û axaftina wan a bi tirkî serê gundiyan tevlihev kiriye.

Taybetiyek dina balkêş a di derbarê “êdin/tirkan de ev e; axa, beg û şêxên her çiqas ji hêla nijadî de kurdbin jî di nava hevokan de bi tirkan re girêdayî tînen vegotin. Di gelek cihan de pêwendîdarkirina wan heta radeyeke wek “ji wan be” tînen nîşandayîn. Di hevoka jor de “axa, beg û kesên tirkî diaxivin” dikevin kategoriya kesên çay vedixwun. Herdem balkişandina pêwendîya axa û dewletê hinekî jî bi rihê demê ve girêdayî ye. Wek ku tê zanîn piştî ku Tirkiye derbasî pergala pirpartîtiyê bû û Partiya Demokratîk bû serdest bi hinceta “xetereya komînîzmê” ji Amerîkayê arîkariya maddî hat girtin û aboriya dewletê baştir bû. Di nav arîkariya hat stendin de traktorên heta wê kêliyê li Tirkiyê nedihat dîtin jî hebûn. Helbet li Kurdistanê jî kesên ku hêza wan tînen bike vana bistîne axa bûn û dewletê jî bi zanetî vê hêzê xist destê axayan. Ev jî bû sedemek ji sedeman ku di navbera axa û began de tînkiliyek kûrtir çêbibe. Di romanê de jî ji traktor wek sembolek tînkiliyê di navbera dewlet û axayan de tê behskirin. “Tu pirr bi siûdî Fero, Hecî Zorav ne tenê axayê çend gundan e; warê Xerzan tev de ê wî ye. Hikûmet ku hikûmet e, li ber derê deriyê me buye parsek. Hakîm û qaymeqama dinê ji me re xulamtiyê dikan.” (r. 47) Wek ji jêgirtinê jî tê famkirin herdem binê pêwendîya axa û dewletê tê xêz kirin. Di honaka bûyerê de axa û hukûmat/dewlet/tirk herdem piştevaniya hev dikan. “Heylo xwelî li serê te be Hesên. Hesênê Cinan, wile tu ji vadanê bêtir bi kêrî gûkî jî nayî. Kuro dîno, ketiye serê te ku hikumeta Tirkan ê rabe ser xwe û milê metrûke ji Hecî Zorav bistîne û bide me ha.” (r. 55) Di tevahiya vegotinê de bi awayek kategorîk ji bo îmajçêkirinê axa û dewlet di heman derewayê de cîh digrin. “Ger hun bi a min bikin, emê sibê bi hev re herin Sêrtê ba walî; çare qereqol in, Mehmed beg. Bê cendirman em êdî bi mîrikê gundî nikarin.” (r. 90) Ji devê axayan tînkiliya di navbeyna axa û dewletê tê zexm kirin û her wiha tevkariya çêkirina îmajê tê kirin. Di hevoka jor de axayên ji bo rê li ber girtina serîhildana gundiyan civiyane wek tevkariya ji xwe re “êdin/tirkan” dibînin.

Li gel axayan Şêx jî bi awayek qethî bi “êdin” re tînen girêdan. Meriv dikare wek sedem bîrdoziya nivîskar û rihê wê demê re vê girê bide. “Şêx Mehmûdê Zoqeydê piştî xwe da bû Enqerê û ji bo maladinê xwe ji Xwedê dikir. Gava hinek axayên Xerzan xwestin ku li ber Kemalî rabin, Şêx Mehmûd Fetwa da û got: “Ên li dijî hikumetê şer kin, ew kafir in. (...)” (r. 97)

Îmajçêkirina di derbarê “êdin” de cardin şîrovekirina bûyerên dîrokî û ser vê bûyerê re çêkirina nasnameyek nû û her wiha zexmkirina îmajê “êdin” xalek din a balê dikşîne ser xwe. “Mala Eliyê Unis, Qewmê çiya, di kon û kozikên xwe de ber-siva zilmê û qetlîamê didan.” (r. 80) Ev hevok balê dikşîne ser bûyerên Serîhildana Sasonê û îmajê “êdin” ku wek “zilmê û qetlîamê” dike dide nîşandayîn û her wiha bi navlêkirinê ev kar û kirinan dike para “êdin”. Bi gelemperî di bûyerên dîrokî de îmajçêkirinek xerab –wek ku me di pênaseya îmajê de jî diyar kiribû ne mecbûr e ku ev rast bin lê helbet tiştek wiha jî heye ku îmaj bingeha xwe ji rastiye digrin- hêsantir e û di nivîsaran de rêyeke bêtir tê hîlbijartin e. “Hey lolo, hey lêlê... Xwediyên me



tune dara di me ke. Ma lawo bîra w eli şerê Motka nayê? Eskerên Tirkan bi hezaran zar û zêç kuştin... Motka wêran kirin.” (...) Şikeftên Motkan hê tijî hestî ne.” (r. 98) Dîrokê berevajiyê baweriya serdest li bêjingeke din dixê û pêşkeşî xwandevevanan dike. Di derbarê tevkujiya ermenan de jî hevokek wiha derbas dibe. “Lê ev dostanî û cîrantî ji aliyê Osmanîyan ve hatiye xira kirin. Roma bêbext ev her du gelên dost û dilsoz berdane hev.” (r. 18)

Di bûyerên dîrokî de bi vegera paş sedem û çavkaniyên “êdinbûna” “êdin” bi demên berê ve tê girêdan. “Hahî, hahî Rizgo Axa... Ma we çi zû jibîr kir lawo? Ma ên bavê me, pismam û hogirên me kuştine ne cendirme bûn? Ji Osmanîyan heta niha, ê me dikujin kî ne gelo?” (r. 91) Ji hevoka jor jî diyar dibe ku “êdinbûna” “êdin” ji berê de heye û ev bi mînanan tê zexmkirin.

“Îmaja tirkan” di romanê de bi piranî ji ser leşker û karmendan tê avakirin. Leşkerê ku tirkan temsîl dike bêhtir noqê peyvên “mirin”, “zilim” tên kirin. “Alaya Sêrtê, tevên cendirmên Xelatê ketibûn nav gundan. Kî diket ber wan dikuştin. Jin zarok, pîr, dapîr. Gund dişewitandin, pez û dewar talan dikirin.” (r. 80) Karê “kî diket ber wan diku(j)e” her “êdin” dike. “Cendirman derî şikand û ketin hundir. Dê û bavê Bedo, xuşk û birayê wî yê piçûk bi derbek de dan ber gulan. Bedo di qulika kewarê de vê wehşetê bi çavên xwe dît.” (r. 81)

“Cendirme wek gurên har ketibûn nava gund. Bi zimanê Tirkî, weka seyên dijwar, çi dihat ber devê wan, ji gundiyan re digotin.” (r. 83) Nivîskar cendirmeyan dişibîne gurê ku nîşaneyê êrîşkariyê û dirindeyiyê ye bineyekserî îmaja “êdin/tirkan” çêdike. Di gel karên xerab “êdin” her dem bi şixulên mirin, şer, birîndarkirin ku tundiyê di nava xwe de dihewîne ve tînan zanîn.

Dema derbarê “êdin” de îmaj tê çêkirin bîra kolektîf paş ve tê vexwendin, bûyerên dîrokî yê di bîra gel de ne bi îmaja nebaş a “êdin” ve tê girêdan. “Herdu jî bi bûyera malbatên xwe mezin bibûn. Haya wan ji zilma Roma reş, ji qatlîama kurdan, ji nefiyê hebû.” (r. 17) Nivîskar li vir bîra kolektîf paş ve vedixwîne. Hay wan jê heye ku ev “zilma”, “qatlîam”, “nefikirin” bi destê kî/kê bûye.

Di romanê de îmaja “êdin” ne tenê bi ser tîkiliyên mirovan her wiha bi ser xirakirina xwezayê, bi ser “hatina ji derve êdin” jî tê nîşandayîn. “Rata weysilqranî, Çemê Hazo, Naqeba Bilwanis, ji qewanê topan, metralyozan û çapliyan sor û zer bibûn.” (r. 80) Xirakirina xwezayê ji “êdin” tê zanîn. “Dengê top û tîfing, kevir li ser keviran nehişt. Dar û ber şewitîn. Pezkovî, xezal, şalûr û bilbil di bin gulan de, di bin dengê topan de can dan...” (r. 79) Beriya em derbasê encamê bibin divê ku em cardin bi- kirpînin ku di bîra kolektîf a kurd de tirk bi ser “leşkeran” ve tînan zanîn. Hê jî wisa tê zanîn ji ber rewşa heyî hê neguherî ye. Helbet ev rê li ber hin gotin û xebatên din jî vedike lê ne mijara vê nivîsê ye.



## Encam

Di romana *Gundikê Dono* ku em li ser sekinîn de bi gelemperî wêderkirin û bi wêderkirinê ve girêdayî “êdin” di nav hin qaliban de tê nîşandayîn. Ev bi piranî di-yarkirina tixûbên çandî yên di navbera “em” û “êdin” de dibe. Li gor nivîskar zimanê me kurdî ye û zimanê tirkî êdin e. Wek vê qadên cihêtiyê tê diyarkirin. Ev di şikl û şemalên fîzîkî, li xwekirin, hewîn, helwest, tevger, baweriyên de derdikeve holê. Nivîskar di şeyesandina “êdin” de van cihêtiya bi zelalî diyar dike. Di van şeyesandina de herçiqas zimanek wêderkirinê bê bikaranîn jî zimanek kêmxistî tune ye. Di hin ciyan de jî “êdin” bi “tiştên baş û nû” tên zanîn.

Kategoriyeke din ya wêderkirinê; nêzikbûna tundiyê, kavilkirinê, zalimtiya yên “êdin” e. Meyla wan tê nîşandayîn û van wesfên xerab di nav hevokan de bi “êdin” re tê bikaranîn. Ligel vê nivîskar “êdin” dişibîne ajalên “dirinde” û “êrîşkar” û vê rewşê bêtir xurt dike. Herçiqas şeyesandinên xerab ên wek “Bêbavê Romê”, “Roma reş û bêbext”(r. 80) hebin jî “êdin” bi çêran nayên zanîn ku ev jî kategoriyeke wêderkirinê ye.

Di romanê de “êdin” di çarçoveyêke bûyerên nexweş de tê tesfîrkirin ku ev bi piranî bûyerên kuştin û tundiyê ne. Di romanê de rêya herî zêde hatî hilbijartin ev e. Bi gelemperî bûyerên dîrokî wek referans tên dayîn avakirina êdin ji nû ve tê saz kirin.

Encama herî balkêş ya di romanê de ew e ku hin kes herçiqas jî “me” be jî çîn û hilbijartina politîk dive sedem ku bikeve nav kategoriya “êdin”. Di romanê de “em”ê nijadî û “em”ê olî û çînî di rewşêke dijber de ne. Gundiyê kurd ji me ye lê axa û şêxên bi dewletê re tevdigerin dikevin çarçoveya “êdin”. Em bi rehetî dikarin vê bi bîrdoziya nivîskar ve girê bidin û ev rê li ber me vedike ka bîrdoziya nivîskar çawa nirxandina bûyeran de bi bandor e. Di romanê de bingeha pênaseya “êdin” li ser kesên bi dewletê re têkiliyê de ne tê danîn. Ev jî bi me dide zanîn ku di nav honaka nivîsarê de cihêbûna nijadî û çandî tena serê xwe têr nake ku yek bibe “êdin”.

Bi awayek politîk kurdbûn; di nav vegotîneke dîrokî de û di çeperê wî de tê avakirin. Li paş tê vegotîna bûyerên hatî jiyîn cardin tê vegotin û hûnandin. Di vê jî nû ve çêkirina dîrokê de îmaj û nasnameyên hene cardin tê saz kirin û tê beravajîkirin.

---

## ÇAVKANÎ

- Arslan, R. (2015). *İmajdan Kimliğe: Cumhuriyet Dönemi Romanlarında Kürtler*. Diyarbakir: J&J Yayınları.
- Baksi, M. (1992). *Gundikê Dono*. Stenbol: Gökyüzü Sanat Ürünleri.
- Bilgin, N. (2007). *Kimlik İnşası*. Enqere: Aşina.
- Bilgin, N. (2013). *Tarih ve Kolektif Bellek*. Stenbol: Bağlam.
- Cibo, N. (2016). *Kürt Tarihinde Garzan ve Pencinarîler*. Stenbol: İsmail Beşikci Vakfı Yayınları.
- Connerton, P. (1999). *Toplumlar Nasıl Anımsar*. Alaeddin Şenel (Wer.), Stenbol: Ayrıntı Yayınları.
- Demirözü, D. (2003). *İlk Dönem Yunan Romanında (1834-1880) Öteki İmajı*, 2003, Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih Coğrafya Fakültesi Dergisi 43, 1 169-194
- Jusdanis, G. (1998). *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür: Milli Edebiyatın İcat Edilişi*. Tuncay Birkan (Wer.), Stenbol: Metis.
- Milas, H. (2000). *Türk Romanı ve "Öteki" Ulusal Kimlikte Yunan İmajı*. Stenbol: Sabancı Üniversitesi Yayınları.
- Müslüm, Y. (2011). *Osmanlı-Türk Romanında Kürt İmgesi*. Stenbol: Agora Kitaplığı.
- Sebrî, O. (2005). *Şerrên Sasûnê (1925-1937)*. Stenbol: Weşanên Pêrî
- Öteki: [http://tdk.gov.tr/index.php?option=com\\_bts&xarama=kelime&guid=TDK.GTS.574c4286202e65.14411813](http://tdk.gov.tr/index.php?option=com_bts&xarama=kelime&guid=TDK.GTS.574c4286202e65.14411813) dîroka ketinê: 21 Adar 2017.

# Em, Ew û Dodan

NURDAN ŞARMAN

Ji TIRKÎ: BESRA

Di pêşbaziya muzîkê “O Ses” de dîsa kurdek bû yekemin ku pêşkêşiya wê Acun Ilıca dike û kanala wî TV-8 de diweşe. Di sezona beriya vê de xortekî batmanî Emre Sertkaya di pêşbaziya de bi ser ketibû. Vê carê jî muzekjenekî vartoyî bi navê Dodan bû yekemîn. Digel ku wan tiştek derbarê nasnameyên xwe de negotin, xwedî lê nasnameyên xwe derneketin, bi zimanê xwe stranek negotin jî wek wan piraniya me<sup>1</sup> jî piştgirî da van şampiyonên kurd ku ji ber nasnameyên xwe rê li ber gelek nîqaşên îdeolojîk vekirin. Em nivîsa xwe bi Dodan bidomînin ji ber ku Emre bi qasî wî ne di rojevê de ye û li ser wî ewqas nehat nîqaşkirin. Bila şaş nê famkirin, di vê nivîsê de hedef ne Dodan e. Dodan tenê mînak e ku em di wî de dikarin çavdêriya xwezaya patolojîk û paradoksî ya serdest û bindestan bikin û hin tecrubeyên din û elbet ji ber ku ew di rojevê de ye.

Em ji serî de vê jî bêjin, di vê nivîsê de dibe ku gelek îfadeyên nakokbar li ber çavan keve, ev ji ber xwezaya tşkiliya serdest û bindestan e ku îlham jî daye vê nivîsê. Belê, me jî wan jî piştgirî da van şampiyonên kurd lê bêguman sedemên me cuda bû.

## Em

Ji ber ku paşiya wî bi me ve bû, me ew rexne kiribû lê dîsa jî me bi xwe nikaribû ku piştgiriya wî nekin. Wek ên piştevanî dan Dodan, sedemên me û kaniyên cuda yên ilhama ma hebûn. Dodan xwe avêtibû bextê me ji ber tawîzên di lehê wê gurûhê de

1 Di nivîsê de qest ji “em” wek ên bindest, kurd in, ji “ew” jî yên nekurd, yanî yên serdest in.

dabû ku tirs û nefreta wan a li hemberî me ketiye halekî patolojîk. Hin ji me Dodan ji vê bêpar nehiştin. Me dizanibû ku Dodan ne ji ber oto-sensurê piştta wî bi me ve ye, ew ji ber şertên li paş sehneyê ye ku ew mecbûr e îtaatî wan bike. Me bi sedemên vê sensurê dizanibû û sedema van jî: digel ku ew bixwe muzîkjenekî profesyonel e, qebûlkirina wî ya rêbertiya juriya medyatîk ku ne hêjayî neynûka wî ne, birrek amator layiq dît ku bibin reqîbên wî û hê gelek tiştê din. Me dizanibû bêyî ku ji xwe tawîz bide ew nikare li ber deriyê serdestan bibe notirvan jî. Ji wêdetir, Dodan jî êdî bêzar bûbû ji ber durûtiyên serdestan û ewên ku ew şertên giran layiqî wî dîtibûn. Ev bû tiştta me ji zimanê laşê wî yê ku her diçû giran dibû û bêtevger dibû –belkî jî me dixwest wisa bibînin- fam dikir. Ji bo xatirê vî haletî ruhiyeta wî be jî, me berê xwe jê neguherî, wek ku em bêjin “ne tu, bila yên tu kirine vî halî ji xwe fedî bikin.”

Hin ji me xwe jî rexne kirin. Me rû nedabû Dodan, ew ber bi xelkê ve dehf kiribû. Yek sedem jî ew bû, baneke dewletê ya ku aîdî me ye tunebû ku bi saziyên xwe piştgiri bide û kesên xwedî qabiliyet û şehreza neçin ber deriyê xelkê ku navûdengiya heq dikin bi dest bixin. Ger Dodan wêrektir tevbigeriya, yekemînî û dewama pêşbaziye biavêta talûkeyê û stranek bi zimanê xwe bigota, bêguman wê bibûya mînakê serbilindiyê. Lê nekirina wî ne ji ber serberjêriya wî bû, ew yekî bêçare bû ku ne li ser sergoyê xwe lê li ser sergoyê serdestên xwe ketibû dafika arezûyên populer ên cîhana modern. Di eslê xwe de, ew kesên li ber diketin Dodan çima ketiye dafika arezûyên cîhana kapitalist lazim e li ber vê biketina. Belê, divê yê bindest beriya her tiştî li ber xwe biketa ku ew dafikên kapitalîst jî tunene li ser sergoyê wî/wê. Him jixwe ew arezûyên madî û manewî –navdarî, îtibar, pere- bi însanbûnê re jî eleqedar in, ne tenê bi dinyaya kapitalist re. Dema yê serwer nasnameya etnîk bipelçiqîne, sînorên etnîk zevt bike, ji bo van arezûyên madî û manewî bi dest bixe, ma ne mecbûr e paşiya xwe bide ‘xwe’? Ger îcrakirina stranên bi ziman û nasnameya xwe qezencek wan madî an manewî tunebe, ji pêşandana nasnameya xwe û dayina deynê wicdanê wêdetir naçe, îjar çi heqê me heye em li bende bin Dodan bi erdemeke awarte tevbigere?

Ji bo me hin kesan, piştgirîdana bo Dodan awêzevedana alîkarî û piştevaniyê bû ku em, ên bindest gelek caran hevdu jê bêpar dihêlin an mecbûr dimînin bêpar bihêlin. Wek hemû bindestan, em jî mehcûb bûn li hemberî xwe. Wek hemû bindestên ku dixwazin vê mehcûbiyete bitepisînin, wijdana xwe rihet bikin, pêdiviya me hebû li hin ciyan jî em piştgiriya hev bikin bi zordayîna bîranînên me yî dema em li hember mirina hevdu jî bêdeng diman. Dodan, herçiqas paşiya wî bi me ve be jî, bo me bû amraza paqijkirina wijdana me. Ji me hin kesan jî, bi saya Dodan ev pêşbazî wek gazinek muzîkal dît li hemberî gotinên serdestan ku em bi her awayî biçûk û bêkêr didîtin. Me estetîk û qabiliyeta xwe ya muzîkal nîşanî wan dida. A din, serdest her tim li ber çavên me berz in. Em bûbûn xwedî wê şerefê jî ku me taqdîr û ecibandina yên ji me berztir bi dest xistibû. Dodan yek stranek kurdî negot lê tişt nabe, me ew dengê wî nas dikir qasî ku em di dengê wî wê olana kurdî bibînin. Bi zimanekî din

bibêje jî, dengê wî bi ziman û çanda xwe terbiye bûbû. Dema wî bi zimanekî din distira, wek ku dengbêj be me lê guhdar kir. Wî hemî êş û rengên, li gor wan, ên Anadolê li gor me yên Kurdistanê di dengê xwe de hewandibû. Li gor wan “pêşbazê rojhilatî” yekî kemilî, bo me jî “pêşbazê me yî kurd” bû ku me li ber serdestê xwe dikaribû pê xwe îspat bikin.

Wek hemû bindestan, em ên ku her tim li hemberî serdestan marûzî têkçûnan mane, pêdiviya me bi serfiraziyekê hebû ku em bêjin me zora wan biriye. Di şexsê Dodan de, me û wan şer dikirin. Me yekemîniya Dodan wek rizgarbûna ji mehkûmiyeta têkçûnê be didît. Bêguman me xwe dixapand dema em difikirîn ku me li qada serweran me îdiayên wan pûç derxistine. Wek hemû bindestan, me jî pir dixwest em serfiraziyek simbolîk bi dest bixin û sebra xwe pê bînin. Wek li her derê cîhanê, serfiraziya yekî ji bindestan –ev çawa dibe bila bibe- di nav bindestan de wek serfiraziya hemû bindestan hatibû kolektîvîzekirin. Kesî nikaribû ji vê bireve.

## Ew

Serdest pir baş hay jê heye, ê bindest li hember wan çiqas tengijî ne û çiqas dixwazin wan têk bibin û gelek tiştên din ku wan dane ser hev û di xwe de tepisandine. Serdest, wek sosyoterapîstekî baş, muqtedîr in jî dafik an qadan ava bikin ku yên bindest tatmîn bikin, hêrsa wan bêtesîr bikin, wan kedî bikin û wan ber bi aliyê xwe ve bikişînin. “O Ses Türkiye” jî yek ji wan qad an dafikan bû ku di şexsê Dodan de hesteke sixte ya serfiraziyê bi me bidin çêkirin, arezûyên me yî li dijî xwe tatmîn bikin, enerjîya me terbiye bikin û kedî bikin.

Serdestan li dijî nijadperestên xwe bi nivîs û gotinên xwe Dodan parastin. Ew hevnijadên xwe şermezar kirin ku gerdûniya muzîkê fam nakin. Bêyî ku li rastiya meseleyê binêrin, di şexsê Dodanê ku xwe bênasname kiribû û taqlîdê miriyan dikir, ew muxalefeta nehewce ya serdestan li hemberî hevdu çiqas eceb bû. Digel ku paşîya wî bi me ve û “xwe” ve jî bû, çawa ku me nikaribû Dodan ji nasnameya wî xalî bikin, wan jî wek me nikaribûn wî ji rastiya wî xalî bikin. Serdestên di aleyhê wî de dipivîvîn ji kurdbûna wî aciz dibûn, ên ew diparastin jî di eslê xwe de, ew ji ber başbûna dengê wî ne lê wek bindestekî îtaatkar, bêitiraz pesnê wî didan û piştgiriya wî dikirin.

Ger yekî bindest qebûl kiribe bi yê serwer re li ciyekî be, mecbûr e wê tirs û nefretê li hemberî xwe kedî bike, bawerî bidê û wî/wê aram bike. Lewra di vê pêvajoya bihevrebûnê de yê bindest jî wek sosyoterapîstekî tevdigere. Ma “kî ji yê bindest bêtir amade ye ku wê wateya berbad a civakê têbigihêje?”<sup>2</sup> Nefret, tirs û paranoyaya juriya serwer ku ji gerdûniya muzîkê –ger ne kurdî be (!)- bawer kiriye û elbet muzîk ji ziman, dîn û nijadê xalî kiriye(!), ewqas mezin bû ku, wek a serwerên din î fermî û

2 Paulo Freire, *Ezilenlerin Pedagojisi*, wer. Dilek Hattatoğlu-Erol Özbek, weş. Ayrıntı, Stenbol, 1995, r.25.



sivîl, ji bo xatirê reytingê jî nikaribûn danîna aliyekî. Ji ber vê pir bi temkîn tevdi-geriya Dodan. Pir bi baldarî tevdiageriya Dodan ku ew nevrozên fobîk ên serdestan şiyar neke an bi tev nede û tenduristiya ruhî ya serdestan qet xira neke. Tişta ku ew kir şampiyon ne tenê dengî wî bû, ev baldariya wî jî bû. Bi saya van tevgerên wî yên ‘baş,’ jurî bi saya Dodan sempatîk dibû bi vê alikarxwaziya xwe ya sixte. Digel ku ew bi temamî ji nasnameya xwe xalî bûbû, bi kurdî ku zimanê muzîka wî ya bi salan e îcra dike yek stran jî negot, Hadîse digot “bo min pir girîng e ku tu bi azadî stranên xwe dibêjî.” Murat Boz digot “muzîk mirovan nêzî hev dike, gerdûnî ye. Ziman û dînê muzîkê tune.” Ev gotinên ku Freire<sup>3</sup> wek pitepitên bîyanîbûyî û bîyanîker pênase kiriye ji ber ku muxetabên xwe ji kirinê/pratîkê bepar dihêlin, her kesî bi hewes çepik jê re lê dixist. Ê serwer careke din ew qabiliyeta xwe nîşan dabû ku bê çawa dikare hemû îmajê xwe ya xirab a ji aliyê bindestan ve, dikare bi durûtiya xwe berovajî bike. Di bin siya ewle ya serweriyê de ewên ji her gotinên wan durûtî difûre, careke din ew qabiliyeta xwe bêkêmasî îcra kirin wek her tim. Ma ji vê normaltir çi heye ku yê serwer ku hebûna xwe li ser tunebûna me ava kiriye, mîrovatiya xwe jî di ser me re îlan bike.

### Encam

Tiştê bû sedem ku em piştgiriya van yekemînên kurd bikin “ziman, dîn û nijada muzîkê” bû berovajî motoya “ziman, dîn û nijada muzîkê tune” ku di vê pêşbaziyê de bi durûtî dihat barekirin. Wan destek dan muzîkek ku paşîya wê bi me rûyê wê bi wan ve ye, me jî, her çiqas paşîyê wî bi me ve be jî, ji ber êwê distrê ji me bû, me gelek wate lê bar dikirin, destek dan wê muzîkê.

Taliya talî me jî wan jî ji serfiraziya wan/ên serwer re li çepikan xist her çiqas ew arezûyên me yên ku bûn sedem em destek bidin Dodan hêvî didin ku daxwaza me ya serfiraziyê û hêrsa me tam ko nebûne. Bi saya Dodanê ku me dixwest bawer bikin ew me temsîl dike, di qadeke ku serweran bexşî me kiribû, me zen kir ku em tê de çalak in lê di rastiyê de me serê xwe ji wan re tewand, wek parçeyek ji wan be em tevgirayan û em nikaribûn ji gotina wan derkevin.<sup>4</sup> Me bi hev re entegrasyoneke ku bi kêrî serwerên me tê, pîroz kir. Careke din di mejiyê me ciyê xwe girt ku serkeftina me girêdayî pîrbûna tawîzên me ye ku em didin serwerên xwe. Ew serfiraziya sixte ya bexşandî bû sembola jinûavakirina biratiya me (!) ya ebedî û ezelî ku wê her tim xizmeta wan bike. Ew hay ji vê hebûn lê em hay jê tunebûn ku em xalibiyeta wan a mutlaq û têkçûna xwe ya ku me careke din dadihurand, pîroz dikin.

Hemû ew halên ku serdest û bindest tên ba hev, wek şahiyêke birûpoş e ku gelek helwest û tevgerên civakî û psîkolojîk ên nakokbar û xapînok rû didin. Ev şahiyêke

3 B.n.b., s.66.

4 B.n.b., r.57.

govendê ya kolonyal e ku organîzatorê wê yê serdest e, û bi kêf tê temaşekirin. Qadên herî zêde wekhevîxwaz û bitolerans ku yên serdest û bindest dikarin li hev bicivin jî tijî nîşane ne dike ku em bibînin xwediyê wê derê kî ye. Qadên bi vî awayî jî dibin qadên ku serdestbûn û bindestbûn her dem ji nû ve lê tîn sazkin. Serdestê zêdetirîn wekhevîxwaz û bitolerans jî, ew serdest e ku ji bo berjewendiyên xwe çend tawîz daye. Ger pêşbaziya “O Ses Türkiye” de ku serdest bi eşkeryî serdestiya xwe nîşanî me da, stranên kurdî hatibûya gotin, wê ev rewş neguheriya. Ji ber vê sedemê, humanîstên serdest û bindest ku nîqaş dikin Dodanekî çawa be an “O Ses Türkiye” yek çawa be, ji bo me tiştê bikêr nabêjin. Ê ew kesên bi hêrs qala durûtiya alîgirên Dodan dikin jî. Ne gunehê Dodan hebû ne jî yên, wek me, alîgiriya wî kirin jî. Gunehkarê tekane û mutleq serdest bûn. A girîng divê em vê bizanibin, wek ku gelek ramangerên dij-mêtinger diyar kirine, heta ev sîstema stabîl ku kaniya gelek patolojiyên sosyolojîk û psîkolojîk e ku serdest û bindestan diafirîne, nerûxe, wê em jî ew jî nikaribin bibin insan. Bi ya min encama dawî ya em dikarin ji vê pêşbaziya ku rastiya wan a acizker û ya me ya belengaz hatin ba hev, ev e.

# Dahûraneke Pêkhateyên Baxtîn di Pêşandana Mîr Newrozî de li ser Bingeha Têgîna Karnawalê

KHOSRO SINA

JI FARSI: MUHSÎN OZDEMÎR

**Puxte:** Ev xebat hewldanek e ji bo dahûrana merasîma Mîr Newrozî bi pêvîsteka şêweyî ya pêşandanên kolanî û şanoya berxwedanê, bi palpiştiya têgîna 'karnawal'a Baxtîn. Bi heman mebestê tevî daxwuyandinên ramanên Baxtîn di avakirina têgîna kû bi palpiştîna têgîna weke pirdengî, kenên komîk, bedenên ecêb û xerîb û hem jî felsefeya çalakiya xwendina berawirdî bi çawaniya şikilgirtin û xwiyabûna dubare ya van têgînan di pêşandanên kolanî yên Mîr Newrozî de hat bicihanîn. Encamên vê xebata lêhûranê nîşan da ku ev têgîn di nasnavkirina pêşandana civakî-siyasî de Mîr Newrozî rola xwe ya bandordar hebûye û mirov dikare wê wek şêweya karnawala bi fonksiyana civakî-siyasî bizane. Bi vê wateya ku her yek ji van lîstokgerê vê pêşandanê xwediyê kesayeteka tenayî û pênasekirî ne ku heman demê de xwedî hêza bandorkirina li ser piraniya kesayetiyên din ên li pêşandanê ne. Bi vê wateyê ku herkes, dengên êdin dibihîzin û her ferd, bivênevê, şêwe dide kesayetiyê yê din. Di pêşandana Mîr Newrozî de beşdarvan di yek qalibê hevgirtinî de tînin dîtin ku şiyana wan liberxwedan û guherîna rewşa xwe û yên din de hene; ku ev bandorhiştin bi riya têgîna Baxtîn re gengaz dibe.

**Peyvên sereke:** Baxtîn, karnawal, Mîr Mîran, Mîr Newrozî, pêşandana kolanî.

## Destpêk

Di qada pêşandanên destnîşankirî- îmayî-de pêşandana Mîr Mîran (piranî li Kurdistanê), her salê bi heybetmendiyeke mezin dihat lidarxistin. Ev yek ji pêşandanên herî girîng yê kolanî û gelêrî bûye li Îranê, ji berê ve hetanî serdema hemdem.<sup>1</sup> Li gor agahiyên dîrokî hebûna Mîr Mîran, di qalibê karnawalekî de bi fonksiyonên cewiyên siyasî, civakî û şadîdêr dihat sepandin û bi domandina kevneşopiya olî ya herî kevin ve têkildar bi mîtolojiya Şahkujî û qiyameta xwezayê bûye (Sîna, 1392). Rola girîng a ku bi tevahiya beşên gel û amadebûna komên pirreng ê stranbêjan, reqsvanan û hem jî bi amadebûna karakterên serekî yê wek trajî komîk di vê pêşandanê de, di qalibê yek mîhrîcana şahiyê de girîngiyê xwe ya zêde hebûye. Ev merasîm bingeha wê li ser dabeşkirina rola di navbera lîstikvan û temaşevanan de bûye.

Ji aliyê mekanên gelemperî yê hatîne hîlbijartin ve ji bo lidarxistina ku hemû beşdarvan derfetê wan ê tevlîbûnê hebin wexteke gunca ji wan re vediqetandin. Bi awayekî taybet lidarxistina vê pêşandanê şik û guman ji holê radikir ku bi misogeri mirov dikare wê di nav koma pêşandanên mezin û girîng a kolanî ya kevin li Kurdistanê bizane. Ev baweriya zemanekî hêzdariyek zêdetir li xwe digre ku naveroka siyasî û civakî ya Mîr Mîran bi sîfeta serekî ya girîng di pêşandanên kolanî bi mebesta propaganda û ajîteyên siyasî were pejirandin. Mîr Mîran di qalibê hunera performansê de<sup>2</sup> de bi awayekî jixweberî, (doğaçlama) bêyî metna pêşandanê, yan nivîsa çîrokek tê zanîn, tenê tevgêrînek li gor hin zagonên pêşandanê (di nav de hem dabeşkirina rol û zagonên têkildar bi rêbazê hîlbijartin û peywirgirtina Mîr) pê re hebûne. Bêyî şik ev zagonên ji ber naveroka jixweberîbûna pêşandanê tiştêkî kêmtir nake. Ji ber ku di mînakên berbiçav û tîn pejirandin ên cîhanê de, di nav kevneşopên pêşandanî de “komediya hunermendan”<sup>3</sup> jî amadebûna karakterên sabît-westar û rêbaza sepandina taybet, beşek ji pêşandananan bûne. Ji karakterîstîkên herî girîng ên vê merasîmê, pejirandina naveroka wê ji aliyê tevahiya beşdarvanan ve ye ku digel bandordariya rasteqîn a li ser civakê “ji ber sedema naveroka fonksiyonî û pêydakirina mercên

---

1 Wêne û agahiyên vê pêşandanê di serdema dawîya Desthilatdariya Pehlewî ya Yekemîn de berdest dikevin.) N.K: şêklê hejmarê 1 di heman xebatê de) Helbet piştê ev pêşan hat qedexekirin; lê şêklê wê yê coşandinê di gundan de di qalibê lîstokê de hê jî didome.

2 Performance Art

3 Commedia Dell'arte

nû, ji bo azadkirina zindaniyên bêguneh, lêkirina pirê li ser çêm û ...” (Eyûbyan, 12: 1962) her weha xwezaya pêşandana xwe diparêze. Û hevzeman bi sedemên bandorkirinên li ser civakê û gel (çalakiyên ku çavkaniya xwe ji danûstendinê civakî digrin) re mirov dikare wan wek nimûneya propagandaya pêşandanên kolanî bi hemû karakterîstikên wê re bizane.

### Paşperdeya lêkolînê

Li Îranê hejmarek pir zêde gotarên têkildarî pênasekirina Mîr Newrozî û şêwaza sepandina wê hene, ji van ( Kerîman Serdeştî, 2009 û Eyûbyan, 1962 û Muxtaryan, 2000 û Rizayî; Erjene, 2009 û Me’rûfî, 1980) ku di tevahiya van gotaran de yan bi vekolana şêwaza lidarxistinê hatiye destnîşankirin. Tenê di yek mijarê de (Huseynî, 2004) di yek qalibê berawirdiya gelnasiyê de destnîşan li hêla siyasî û têgîna “hakimê xespker” kiriye.

Têkildarî têgîna karnawalê û lêkolîna wê di beşên pêşannameyê de jî xebatên lêhûrane ên wek Remezani, 2015 û Yezdî; Îbrahîmî, 2011 hene. Gotara herî zêde têkildar girêdayî vê mijarê ya (Erebzade, Mûsewî Iqdam; İftixarî, 2015) ye, li ser mijarê bi riya têgîna karnawalê xebitiye, ku bi lêkolîna berhemên peykerî yên Pieter Bruegel<sup>4</sup> re şîrove bike. Xebatên îranî û biyaniyan hetanî niha tu vekolînên wan ji bo lêpîrsîna karnawalên pêşandanên, bi taybet merasîma Mîr Newrozî negihiştîyê encamê. Bi baldariya berfireh a li ser naverok û girîngiya Mîr Mîran di civaka Îranê ya wê serdemê de, ji berhemê mezinên wek Hafîz, Ebû Reyhan Bîrûnî, Menûçehrî û ... ji nû ve reng vedaye. Ji fêhmandineke hê zelaltir li ser nasnameyên pêşandanên Îranî, bi taybet di qada pêşandanên kolanî de vekolîna li ser vê mijarê girîngiyeke xwe ya taybet heye.

### Rêbazên lêkolînê

Ev lêkolîn di çarçoveya xebateke çawanî û bi belge û bi şêweya peyda kirina çavkaniyan bi rêya pirtûkan, kovarên zanistî yên vekolînê, belgeyên têkildarî lêkolînê û hem jî bi riya danberhevên encamgirtî bi riya kesên têkildar bi lêkolîn û agahiyên berhevkerî yên malperên bawerpêker encam hatibe sitandin. Peyda kirinên -encamên lêkolînên di xwendina danberhevî de bi şêweya şîrove- analîzeka di qalibêke kategorîzekirina belgeyên bi berdesteka nihêrîna dîrokî hatî dahûrandin. Di beşa qalkirin û encamgirtinê de jî netîceyên vê xebata lêhûranê li ser bingehê têgîna karnawala Baxtîn ji nû ve xwendin û lêkolîn hatiye kirin.

4 Bruegel the Elder: Wênesazê Holandî yê serdema Ronesanê ye ku di wêneyên dîmenê xwezayî û jiyana de navdeng e.

### Merasîma Mîr Newrozî<sup>5</sup>

Ayîna pêşandana Mîr Mîran<sup>6</sup> (Mîr Newrozî) merasîmek e ku di gava pêkanîna wê de gel (ehlê gund û bajar) di destpêka biharê û rojbera sala nû û di qalibê mîhrîcan û karnawalê û bi amadebûna tevahiyan li dar dixin.<sup>7</sup> Tevahiya beşdaran bêyî li ber çav girtina zayendê û çînên civakî diviyabû di mîhrîcanê de amade bin. Herkesî pêdiviyên xwe di vê bizava bihevreyî de dîtiye. Civata şad lê ne wek hev (bir cureyî), di daketa bajêr an gund de li endê dimînin û yekemîn mêvan an rêborê ku ji deverê derbaz dibe bi nasnavê –sifata mîr emîr, şahê nû, ku ketiye şûna hakim an şah û di berdewamiyê de, wezîr û derdorên ji heman xelkê ji rêzê jî ji bo xizmeta mîr dihatin hilbijartin. Daxistin û tacdanîna ser serê şah an hakim dihat spartin û zêr û zeber, hesp û pêdiviyên derbarê (bi riya gel bi xwe hatiye amadekirin) bi şiklê bawerî pê heye dispêrin wî. Bi heyamek bi qasî sêzdeh roj û şevan (li gorî mercên guncaw) îdareya<sup>7</sup> bajêr an gund bi temamî dispêrin ‘mîrê nû yê hilbijartî.<sup>8</sup> Ev ferman helbet li gor hevsengiyên berî hingê û agahiya giştî, her sal li dar dikeve. Bi hejmarek mezin dixwazin di amadebûna vê merasîmê de meaf bin, diviyabû li gor adetê cirmekî razînin û bi şeweya amadekirina alav û derfetên malî yên mîhrîcanê de xwedî par bin.

Mîrê hatî hilbijartin, ne nişteciyê malê ye, bi xîlafê hakimê berê, bi piranî bi yên nêzî xwe re di nav gel de amade dibe û hevzeman bi gel re, her mal û devereke serî lê dide axaftinên gel dibihîze û fermanên ji bo çareserkirina pirsgerêkan di çarçoveya derfetan de dispêne. Gel di nav hewayê şadî ya mîhrîcanê de, bi hev re bi tevahiya pêşandanê û tecrûbeya jiyana nû ve mijûl e. Deriyê koşka desthilatdar di dirêjiya roj û şevê de vekiriye û herkesê ku pêwistî yan daxwazake wî hebe, destûr heye ku hakim û desteya pê re ji bo çareseriyê karê xwe vexwînin. Pêkanên girtî û sinordar ji bo sepandina Mîr Mîran,

5 Mir-E Nowruzi

6 Mîr Mîran; mirov dikare wek karnawala herî dirêj a pêşandanê bizane ku di heyama çendîn roj û şevan de û bi şikleke bînavber û dirêjwext di nav kurdan de pêş ketiye.

7 Kose; merasîma ‘koseyê bernîşîn’ an ‘bihara cejnê’ zêde zêde bi Mîr Newrozî re dişibin hev. Merasîmek bû li Îranê nêzî biharê dizanin û gelek navdengiya wê hebû û cejn-şahiyan karnawalê tîne bîra mirov. Ebû Reyhan Bîrûnî şîroveya vê merasîmê kiriye ku di yekemîn rojên destpêka biharê de, mêrekî kose, li kerê siwar dikirin, destekî wî de qijik hebû û di destê din de jî bawêşîng hebû ku xwe pê bawêşîn dikir, helbestek dixwend ku xatirxwestina zivistan û sermayê bû. Ji gel jî tiştêk sikke an dînar werdigirt. Ji berbangê hetanî nivro ji bo xezîne û şah bû. Ya ku ji nivro hetanî esrê berhev dikir ji wî re bû. Hingê heke ji esrê ve ew dîtibûna eziyet û zilm lê dikirin. Ev kevneşop di dewrana Sasanî û Islamê de, bi riya xulamên reşîk bi cih dihat. Yê ku hatî hilbijartin bi cil û bergên wan ên rengî rengî û xemlandineke taybet û devokek şikestî û taybet hebû. Def û teblîk lê didan û stranên Newrozî dixwendin. Hacî Feyrûziyên îroyîn ku nêzî newroz û sala nû li kuçe û kolanan gel dicoşandin. Ji bermayîya wan mîhrîcanên kevne (Reza, 1979).

8 Ceymz Ferîze, destnîşan dike ku di ayînen karnawalên serdema kevnar û Mezopotamyayê de, ferqa navbera çînan bi awayeke demkî hatiye cemidandin û erbaban cihê dane dîlan û li ber serê maseyên wan xizmet dikirin (Firîzer, 1382).



nedihat pênasekirin da ku derfetên beşdarvanan ên ji gel di wexteke berfireh de pêk bê. Gel bi hev re, mijarên xwe yên şexsî û gelemperî parve dikirin. Mîr û wezîran û rayedarên wan jî bê navber ji bo wan pêngavên pêkan bûn pêk dianîn.

### Desteya ligel Mîr Newrozî re

- Wezîrê cîhandîtî Pîrî Jîr: ku carinan ji bo çareserkirina pirsgirêk û meseleyan bi wî dişewirîn û jixwe bi piranî temendarekî henekkirinê ji vî cihî re hildibijêrin.
- Wezîrê destê rastê: Di bin çavdêriya Mîr de, hukmên dadwerî û mentiqî disepîne
- Wezîrê destê çepê: Bi hukmek ê henekpêkirinê û xîlafê pîvanên exlaqî û carna der sinorên pêkanînê tê naskirin.
- Mîrza: Mîrza katibê koşkê bûye
- Paqijker û xizmetkar: Bi hejmareke têkel lê her yek peywira wan diyarkirî
- Desteya xencerjen an serbir: Cilên sor lixwe dikirin û karmendên bicihanîna fermanan bûn ji dîtîne ve poş li ber wan û tirsdêr bûn.
- Mêrê Kopalê Zivîn (kopal bi tîl): Bejinstûr û ragehandina fermanan
- Desteya mûzîkê: Mûzîkjen û hunermend (carna hetanî 25 kes jî dibûn)
- Newabêj û srûdbêj: (Çerger) ku carna yek kes û carna jî bi awayekî, grûpekî stran û newa dixwendin. Car heye hejmara wan hetanî sedî bûye.
- Wişkern, palyaçoyê henekker bi postê heywan li ser milê wî û zengil bi cilên wî ve hilawistî, perçeyên awênayekî li ser mil û sînga wan bi cilê xwe ve girê didan,



Şikil 1: Merasîma Mîr Newrozî li Kurdistanê (Çavkanî Îranîka)

kelaş<sup>9</sup> (merê şemame bendî) radikir û ji bilî kesê ku emîr e, her cihî û her demê bi hemûyan re henek dikirin û helbet di dema kênîna gel de, hin ji hewldanên wî her timî, kenandina Mîr bû (Eyûbyan, 1962).

Piştî çend rojên Emîrtiya Mîr Newrozî yê Emîrê Biharê bi mebesta geşt û rêwingiyê şahiyê diçû gereke gelemperî. Tevî ehlê koşkê, mirovên ji beşên cihê yê tevî ger û geştê dibûn. Pereyên ku di dirêjahiya heft roj û heft şevên reqs û şahî û pêşbirkên zorbaziyê û siwariyê û mûsîqî de berhev dibûn, di rêya xwe de ji bo desteng û dawetên ciwanan û mijarên giştî mesref dikirin.

### Tacgirtin an tacrakirin: ketina Mîr Newrozî

Bûyera herî balkêş a Mîr Mîran, ketina Mîr Newrozî ya ye ji ber sedama kenîne yan axaftina mîr a yekser bi yê amade re (Ji bilî wezîr û Mêrê Kopal Zîvîn). Mîr tenê kesek e ji civatê ku kenîn di heyama mîhrîcan û şahiyê-karnawalê de ji wî re qedexe ye. Ji ber ku, li gor adet û zagonên pêşandanê kenê mîr bi wateya ketina ji hêzdariyê û ketina ji text e. Ji ber heman sedemê, di rojên dawî yê hukumeta mîr de, heke şert û merc bi cureyekî derkeve holê ku nikaribe wî ji desthilatîyê bîne xwarê, hemû hewldanên xwe dide ku mecbûrî kenîne bike, çî alîkariya mîzahên palyaço (wişkern) û di qalibê bizavekî komî de pêk tînin. Bi nêzîkbûna bidawîhatina karnawalê re) bi taybetî roja sêzdehemîn a Nîsanê de) Mîr di dawiyê de mecbûrî şaşîtiya mezin (kenîn) dibe û tevî ji desthilatîyê vekişanê derfetê veegerana nav civakê bi pîvan û mîzanên berê jê re vebe. Xala hêjayî girîngiyê, ketina Mîr ji desthilatîyê bi riya palyaço ye (bi sifata semboleka ken û henek) ku cihê wî yê tekane ye. Li pey ketinê re, Mîr divê li ser xwespartina cihekî mîna mala yekî rihspî yan jî kesî xwedî ehtubar (mutewelî) ê heman bajarî yan jî bajarên derdor da ku xwe ji destê mirovên ku dikin li wî bixin û mal bi mal li pey wî ketine, rizgar bibe.<sup>10</sup> Mîr bi destê heman gelê ku wan bi xwe ew wek emîr hilbijartine, di derbeyekê de ji lûtkeya desthilatdariyê tê daxistin.

### Çarçoveya teorîk: têtîna karnawalê

“... Ev dîrok, heman ziman bi xwe ye; ne bi awayê gotar, ji ber ku bi asta mîhrîcaneke pir têtî û tije de ye. Ev mîhrîcan ji her cure edeb û ayînên îbadetê dût e. Di wê de qet pesindayîn tune. Zimanê wê bi xwe heman fikra pexşan e ku mirov wê fêhm dikin. Tam heman awayê ku zadeyên roja yekşemê zimanê çûkan fêhm dikin” Walter Benjamin.

9 Kelash: coreyek pêlavê ye li Kurdistanê

10 Şibihandinek zêde di hilbijartina Mîr û şêwaza daxistina wî ji hêzdariyê, di Mîr Newrozî de bi merasîma ayîna baranxwaziyê (Cenga Baranê) ya li Kurdistanê (Bi taybet di nav êzîdiyan de). Di wir de gel gayekî nîşan û perwerde dikin û serencam piştî qedandina mîhrîcanê, di wexta ku dorevanên ga nedihîştin mirov zerê bigihînin ga û pêşiya wan digirt de, ji bo serjêkirinê dibirin mezbexaneyê, hêjayî nirxandinê ye.

Mixayl Baxtîn (1895-1975) ji feylesofên navdeng ê bandordar di dîroka ramana hemdem de têtînek tevli hewze û şaxên zanista mirov, bi taybet a wêjeyê kiriye ku gelek bikêr û mayînde ye. Têtîna karnavalê bi kurtahî ev mijar in. Dema ku mijarên hunerên Dostoyevskî bi Ingilîzî hat wergerandin û li rojavayê hatin çapkirin, Baxtîn beşek di derbarê karnawalê<sup>11</sup> de, li ser pirtûkê zêde kir. Berhem bi navê kêmzêde cihê cihê wek “Mijarên Ciwankarî yên Dostoyevskî” hat weşandin (Hîl, 1986).

Bi ya Baxtîn, jiyana mirovên Sedeyên Navîn bi du cureyan bûye, yek jê jiyana bi tevahî fermî û di bin pergaleke hiyerarşik a cewî de bi tirs û hizrên dogmatîk ê xwe spartina qalibê baweriyê. Ya duyan jî, jiyana di karnawal û qewmînên komî de, jiyana azad û tije kenên seraserî yan watedar, avêtina pîroziyan bi aliyekê ve, girîngîdayîna xerabgotinê, lezetê, xerabnêzbûnê re bi şikestina navberan û têkdana norm û adetan qewî ye (Teodorof, 1377, 153). Ev du cureyên jiyane di rastiyê de berovajiyê hev in. Rewşa fermî, encama tecrûbe û dîroka çinayeti ya mirov e. Rewşa karnawala berhema berteka li hember rewşa fermî ye û hêla pêşberî wê ye. Îstihza û henekpêkirin li pêşberî cidîbûn, girîngîdana laş li pêşberî îstilaya Dêrê û redkirina ramana yekalî û rewşa yekdengî, bi henek girtina rewşa fermî û nirxên wê, têkildarkirina mirinê bi jiyane ve, girîngî dayîna girseyî û pirdengî, bi kurtî ev tiştên li pêşber in.

Kevnedemiya mîhrîcanan, hevniirxiya jiyana civakî ya mirovan e û mîhrîcana bûyîna ayîn û baweriyên mîtolojîk ên kevnan in. Tevî ku nasname û sedema hebûna karnawalê yan mîhrîcanan -bi taybet di serdema dawîn de- rûbirûyî guherînên gelek tund bûne lê ruhê wan hevpar bi hev ve girê dide ku ji hêlekî ve berhema meyla ji bo jiyana hevbeş a mirovan e, ji hêla din ve, girîngîdayîna laş û lezet û afirandina şadiyê ye (Berandîst, 2002).

Her weha Baxtîn, romanê (berhema Dostoyevskî û helbet ne her roman) wek formekî wêjeyî bi heyîna baldariyeke din, peydakirineke din ji bo îfadekirina hebûnê digere, bêyî zordayîna nivîskar a li ser xwendevên û berhemê, hebûna cure û hindikahiyan cureya herî baş ê wêje û berhemê dihesibine. Lê wî bi xwe di derbarê berhemên pêşandanî û hwd. jî, derfetê hebûna van îmtiyazan (çend dengîbûn, karnawala pirşeweyî û hwd. derdixê nîqaşê. Têtîna Baxtîn ji vekolînên hewzeyên din ên ramanan jî gêlekî hêsantir dikare were sepandin.

Di derbarê karnawalê de, Baxtîn derfet û taybetmendî nimre kiriye. Karnawal ji bo Baxtîn, xelasiya ji zordariya desthilatiya Stalîn bûye, ji bo xatirê heman tiştê ew bû mirovekî azad ku pirdengî û çend dengîbûn û henek û azadî di berhemên xwe de, bi taybet di karnawalê de daxwaz kir. Karnawal û mîhrîcan têkdana hovîtî û bawerhişkî û tirs ji rewşa fermî ne. Ji ber heman sedemê jiyane ji mirinê zêdetir hez dikan. Karnawal girîngiyeke zêde didin jiyane, qebareya wê ya cestayî û madî, zindîtî

11 Karnawal, ji peyvên kilîdî yên wêjeya Baxtîn e û tew piraniya têtînen din jî çavkaniya xwe ji wê girtine. Di karnawalê de şewaza nû ya têtîliyê mirov bi mirov re şekil digre (Nolz, 1391).

û têkilî û keyfê. Û beşdarvan di mîhrîcan û karnawalekî de ku berê hev nas dikirin, lê di metnê de ev encam û şadî ye ku dilrihettir û bêxemtir bi hevdu re di têkiliyê de ne. Li gor van saloxan, mirov dikare mîhrîcanê wek vegera wê utopyayî bizane ku rewşa çîneyetîya dîrokê ya kêmar û hejaran a zehmet bide nîşandan lê kesayetiyên karnawalê, wê li gel vedigerînin.

Baxtîn karnawalê wek çanda gel a ku herî berbiçav eşkerebûyî dizane û ken û cidî-negirtinê destkeftiya herî girîng a karnawalê dihesibîne. Kesên amade, di karnawalê de di heman demê de obje û sujeyê. Karnawal xwe naspêre cûre û senifandineke taybet. Di kolanê de ye û ne di qesrên pir wurşedar an dikên şikomend ê şanoyê de, wêrek û bi azwer e, têkiliyên civakî ji holê radike. Karnawal, têkiliyên serdest civakê, îmtiyazên çîneyetî, rê û rêbaz û qedexeyê bin pê dike û wek henek digre dest. Ji ber heman sedemê karnawal li pey redkirina hêzê di qalibê hebûna hunera gel de ye.

### **Belavbûna têgînên teorîk**

Ji bingehtirîn ramanên Baxtîn ê karnawalê, realîzma grotesk e û berdewamê de laşê grotesk e. Grotesk taybetiyek di berhemên hunerî û wêjeyî de dest pê dibe ku du karakterên pêkhate û dijberiya ji tirsê ne û hebûna kesayetên dijber di pêkhateyê de ya berhema hunerî de, berteka dualî (ken-matmayî-absurd) di me de diafirîne. Baxtîn di xebata vekolîna absurdê di serdemên romantîk û klasîk de, digel meydan xwendina herdu, nusxe û pênaseya nû ya ji name û taybetiyên absurd di bin navnîşana têgîna “realîzma absûrd” de ji şîrovekirina taybetiyên karnawalê disepîne. Baxtîn, absurd bi zêdekirina bêjeya realîzm re, zêdetir nêzî rastiyê dike. Bo nimûne absurd, klasîkê, mîqdara bedeneke tekane û bêzaro hatî îzolekirin pênase dike, li pêşperî bedena absurd amade di karnawalan de dînamîk, komî û di rewşa guherînê dizane. Sermiyana herî bingehtirîn ya mîtoya bedenê, meseleya mirin û jiyane ye. Beden tên dinyayê û dimirin. Derfetê guherîn û veçerxîna ku ceste, hilgir û nimûneya wê ya berbiçav e, me bi mîtolojiyên nûzayî û bereket (ducanîbûnê) ve girê dide. Heman awayê ku şeklên serekî yên baweriya gel di Yewnan û Roma kevnar de mirov dikare di wek mezin dîtina jiyana dubare ya Diyunîzos de vekole. Helbet, berî Yewnaniyan jî Misriyan bi mirin û jiyana dubare ya Osîrîs bawer kirine û ji wan zêdetir jî di şaristaniyên Mezopotamyayê<sup>12</sup> de, lipeyketina pergala dayîksalariyê re her salê ji bo zayîna dubare ya xwezayê, kesek dikirin qurbanî.<sup>13</sup>

12 Mesopotamia: Navê herêmeke cografîye ku dikeve navbera çemê Dijle û Feratê. Îraniyan ev herêm wek Meyan Rûdan navandine ku heman nav bi Yewnanî hatiye wergerandin û bûye Mezopotamya. Di berdewamiya dîrokê de Kurd nişteciyên serekî yên vê herêmê bûn û hene.

13 Ev merasîma di serdema Hexamenişi û hetanî padşahiya Erdeşîrê Derazdest (B.Z 424-646) jî pêk hatiye.



Amedebûna bedenê, ji bo derketina holê û piştire mirina wê, qabiliyeteke mîto-lojîk diyarî wê dike. Helbet, di vir de ya ku li gor teoriya Baxtîn ji bo laşê absûrd û karnawalekî ye, bi taybetiyên din ê laş û madeya mirov re vediqetîne û ew jî ew e ku beden ber bi metafizikî re ku di wê de heye bi cîhan û bi bedenên din re di têkiliyan de ye. Ê di encamê de nemir e. Tevî ku em dizanin laş û made, yê bimrin û yê mirinê ne. Di vir de taybetiyên nakokdar û dualî yên laş, xwe de dide nîşandan. Absurdê bi taybetiyên laş û madeyê ve girê dide.

Beden bi navê hilgirê wateyî ya paradoksê (mirin û jiyan), çî di çîrokê de, çî di rastiye de, bergeha tevgerê ji cîhanekê ber cîhanekê din e. Mekanîzma ku vê fermanê pêkan dike bi hewas û cesteya bedenê ve têkildar e. Bedena ku ji cîhan û deverê radikêşe (dixwe, vedixwe, bêhn dike, dibihîse...) û ji aliyê din ve dispêre cîhan û devereke din (dibêje, dût dixwe û ...) bedenên karnawalê, bi pêşandanê ya ku nîşaneyên mirin û jiyanê ye lê dikin, vedixwin, direqîsin, dixwin, li xwe dikin û şahiyê dikin, daxwaz dikin, dibexşînin, dadiqurtînin û derdiavêjin. Tew mirov dikare bêje her beden kurtebira tevahiya heyînê ye.<sup>14</sup>

Beden di karnawal û mîhrîcanan de di asta herî bilind a têkilî û beşdarî û nêzbûnê de bi hev re ne. Kesek an jiyaneke ne di sînore derveyî karnawalê de ye, tenê şah bûye biyanî. Tecrûbeya jiyani komî di karnawalê de, ken û nîşaneyên din ên jiyane tirsê ji mirinê ji holê radike. Zagonên fermî ku berê desthilat bûn, cihê xwe danê doşeka civakî ku ji bilî xelasî û tecrûbeyê îzolekirina çînê û berpêkirin û nijad û pêşandana laş û şiyane wê, bendewariyeke wê ji beşdarvanan (gel) tune.

Bizava girseyî ya gelê bêçîn, ji kuçe û bazarê re derbazbûn ji bo destpêkirina mîhrîcana Mîr Mîran, vegirtina cihê mîrê rasteqîn û tacdarkirina sembolîk a mîrê nû, darizandina gunehên desthilatdariya berê û berhevkirina pereyên cirmê ji serdestiya berê û qezencên desthilatiya wê, beden xemlandin û lixwekirina gel bi cilên herî bijarte ji beşdariya merasîmê, bikaranîna maske û xemlên taybet ji aliyê beşdarvanan ve û pêkhênerên merasîmê ve. Her weha meyla ku di rastiya tevlîbûna wê qewmînê (karnawal) de coşiyaneke derketiye holê. Nîşanderê derfetên realîzma absurd bi tevahiya taybetiyên wê ye.

### Nîqaş û dahûran: tégîna ken di karnawalê de

Ji hêmanên herî qewî yê karnawalan û helbet a Mîr Mîran, ken û rola listikvanê wê ye ku bi wêrekî di hemû alî û hemû kêliyên mîhrîcanê de xwe xişikandiye û ji vegera mîhrîcanê yan veguherîna bi tişteke mîna rewşa fermiyeta berî hingê pêşî lê digre. Hêmanên ken û taybetiyên wân ên dîtbarî û bihîstinî, bingehe parastina nasnameya karnawalî ya Mîr Mîran in. Bêyî têkbirina mijara cidiyeta tackirina Mîr,

14 Balê dikişîne daxistina nihêrtina li asîmên ber bi erdê ve ku bi riya bercestebûna bedenê û rola wê di pêkhatina karnawalê de bandordar e.

rêveçûn di mekanaanê civakî de, daxistina şah/hakim, bidestxistina desthilatdariyê bi riya gel û kiryarên zagona qulipî, zagonên berdest ku di Mîr Mîran de hene, di her gav û her kêliyê de her kiryareka mîhrîcanê, ev hêmana kenînê ye ku di rehikên mîhrîcanê de diherike. Û her tim pêşiya têkçûna nasnameyê hatî lêkirin û rewşa nû digre. Mirov dikare Mîr Mîran di tevahiyeke a mîzaha watedar a absûrdê de bi danîna desthilatîyê bizane. Metaforek e ku bi demkîbûna hebûna mirovan di vê cîhanê de, helbet hebûna sultan li ser textê desthilatîyê, henekpêkirin û tahnek e li ser bendewariya mirovan ku zeman û serdem li gor daxwazên xwe neguher bikin, dizwazin û di rewşa xwe ya demkî ya tevlihev de. Heke ken tunebe ne tenê Mîr Mîran û karnawala wê, belku jiyan (mîrovî, giyahî û heywanî) jî dê nikaribe xwe ragre. Cilên ku ji karmendên fermî û ji hakim bi xwe di dest ve tînin û li bedena mirovên herî hêsa yê civakê dikin. Çekên ku li ber dorevanên bizirxî nin, bêyî tu zordariyê tînin derxistin û li laşê xwe yê ne hêsa û bi gelemperî mirovên belengaz (kurt ya dirêj, fireh an teng) cîlwe dikin. Rûdêmên hêzdarên û bi taybet yê palyaço (wişkern) di pêşandana Mîr Mîran û gelekên din de, tim axaftinên zirtebozî ne ku di bin barê mirovên jibîrker -ji hakim hetanî kesên ji rêzê.

Ferman û hukmên kendar ku mîrê nû wan diweşîne, û şêwr û pêşniyazên komîk ên Wezîrê Destê Çepê; “ji cih bi cihbûna devera lêmayîna gundiyan li bajêr, bajariyên li gundan, qusandina nivê simbêlên mêran, tachildana riswayî, navnîşanên pir bi tûmtûrak û pûşdar ji bo koleyên dûh.” (Eyûbyan, 110, 1962) Hemû nimûneyên ji tahn û henek ên absûrdê pêk tînin di merasîma pêşandana Mîr Mîran de.

Hêmanên kenî piştevaniya herî qayîm a di çanda çend dengî ya Baxtîn e. Ji ber ku di tevahiya kiryarên fizîkî yê heya lidarxistina Mîr Mîran de, hewaiyê fizîkî ya mîhrîcanê û piraniya aliyê merasîmê de “ken” dorevanê azadî ye ku gel, hêz û fermanên mîrê nû jê negre, û civak, wê bi awayê tevekî pisepîne. Ji bo nimûneyên hukmên ku ji vî destî dihatin weşandin “... mînak [mîr] fermanekî dinivîsîne ji bo filan ê diyarkirî<sup>15</sup> ku divê hûn sed hezar tûmen radestî xezîneyê bikin, (helbet feraset ev e ku sed tûmen divê hûn bidin). Helbet ev sed kêm û hindik dibûn lê belê her çi be tiştêk dihat sitendin” (Qezwînî, 16, 1323).

### **Karnawal û felsefeya çalakiyê (philosophy of action)**

Felsefeya çalakiyê ji têgehên bingehîn yê ramanên Baxtîn, di destpêka jiyana xwe ya ramanî de di bin bandora ramanên Nûkantî<sup>16</sup> de ye. Bi mesafe û valatiya di navbera tecrûbeyên fizîkî, rasterast û bêyî navgîniya mirov bi fikrên sembolîk ê ji van tecrûbeyan pêk tîne. Di vê tîgînê de ya ku dexdaxeya Baxtîn e, di mirov de ku wî ber bi qalibdayîna tecrûbeyên berçav û radestkirina wan bo sîstema giştî û sembolîk

15 kesê maldar, dewlemend

16 Neo-Kantianism



(mebest fêhma wan) dikişîne. Riya çareya ku mirov ji bo fêhmkirina tecrûbeyên li pêş xwe datîne, xwe dispêre dinyaya sembolîk û razber yekî ku me li pêş çav bi piştevanî û sistematîka xwe ji fikar û serwendahiya perçebûyî xelas dike.<sup>17</sup>

Ya ku Baxtîn di derbarê têkiliyên tecrûbeyên hîsî bi sistema sembolîk re dixist nav fikaran, ev bû ku em di bandora fikarên ji bo pêdiviya ewlehiyê, kiryarên fîzîkî/ ceribandî em dispêrin sistema sembolîk û razber a merasîmê mîna hewldanekê ye ku ji bo senifandina pirtûkên di pîrûkxaneyê xwe dikin, an jî hewldanek a li gor Lakan<sup>18</sup> ji bo lêbarkirin û radestkirina cihê rastîn bo cihê sembolîk bi awayekî nepêkan û beyhûde şêwe digre, bi vê wateyê ku em dixwazin tecrûbeyên sehekî û fîzîkî di nava sistema razberî û sembolîk de xerq bikin û binixwimînin. Bi esasgirtina vê nêrînê ew e ku têkiliya sistema sembolîk a bi tecrûbeyên sehekî û fîzîkî, bi hevserengiya têkiliya teorîk an kiryar an zanîn, an fêhm e. Bi baweriya Baxtîn di vê derbarê de, me aliyê hilgirtina perpirsiyariyê, aktîvîzim û beşdariya bandordar li diyardeyan, têkilî û derfeta hebûnê ji xwe revandiye û di nav pîşkariya (subjective) rêpîvana razberî de,<sup>19</sup> dixişike û ber bi derbara encamên her kiryarî û çalakiyên ku cîhana me diyalektîkî, dînamîkî û çend dengî dike, me xwe jê mehrûm û bê şîyan kiriye.

Di pêşandanên Mîr Newrozî de dikare were gotin ev ayîn/pêşandan ne tenê hewldaneke ji bo vekolîna têkiliyekê ye ku di civakê de ji bo bidestxistina karûbarên xwe ye (vekolîna dadê û sepandina siyaseta gel a giştî) pêk tê. Di heman demê de jî, ji rûbirûmayîna qadên sê alî yê bi girêka Birûme<sup>20</sup> ve projeya têkiliyê bi awayê beş beşî (kesîtsel), pêkan dibe. Mîrê Mîran bi sedema dagirkirina bi çalakî, bi riya daxistina hewzeya fermî û serobinkirina rewşê ne bi emûdî, bi awayê berwarî, emrê ramanî bi emrê objektîfî vediguherînin, ji bo xatirê heman tiştê ji karên wisan e ku fikarên Baxtînî di biwarê teslîmbûn û spartina tecrûbeyan bi navgînên hîsî ji holê

17 navnîşanek di helbestên Şil Sîlwer Astayn ( 1932-1999 M) Helbestvanê navdar ê Emrîkî.

18 Jacques Lacan; **Jacques-Marie Émile Lacan** psîkoanalîstekî navdar ê Frensî ye. Di 13 Avrêl 1901'î li Parîs ji dayîk bûye û li heman derê di 9 Kewçêr 1981 'î de jiyana xwe jidestdaye.

Lacan teoriyên Freud pêşxistiye û gelek rexne jî li Sigmund Freud kiriye. Li ser cîhana sîmbol û ziman, kesayetiyên neurotîk û psîkotîk, neuroz, narsîsîzm, psîkoz hwd xebat û keşf kiriye. Lacan wekî feylesofekî Ewropî jî tê naskirin. Wekî "Freudê Frensî" jî dihate binavkirin lê wî di dawîya tamenê xwe de xwe ji riya Freud dûr xistiye. Rexne li kapîtalîzmê kiriye û pesnê rêbaza diyalektîk a ramanê daye. (Muwellî, 1387 )

19 Abstract subjectivity

20 Borromean Rings: Li gor perspektîfa Lacan, pêwendîya di navbera aliyê xeyalî, aliyê sembolîk û aliyê rastîn ê jiyana mirovan li ser bingeha bibingehkirina Bromeyî ye ku pêwendiyên her kîjanî be, dibe têkçûna ên din. Xala hêjayî giringiyê ew e ku yek ji van sê helqeyan di nav ên din de ne zindanîkirî ye. Ji ber ku her kîna wan girêdayî ye bi her kîna yê din. Avahiya nefîsî ya her ferdê hatî spartî cureyek pêwendî ye ku li gor serboriya wî ya di navbera van her sê hêmayan de diafire. Di rastiyê de têkiliya dialektîkî di navbera van her sê sisteman de. Her ber bi xerakirina yê din. Ev girîng e, ku yek ji van sê xelek di yek din de li girtîgehê ne lê ew li ser ahenga girêdayî

radike. Ji ber ku “Baxtîn li pey vegeza ber bi aliyê bêyî navgîniya tecrûbeyê rût e.” (Gardnîr, 1381: 37)

### Hêmanên Berxwedanê di Mîrê Mîran de

Heke em hêza tevgerdar a taybetiya cewherê wê ango serobinkerê rewşa civakî bizanin; pêşandana Mîrê Mîran meydana hebûna vê hêzê ye. Mîrê Mîran ji serdestî û zagonên civakî re dixwîne û hewl dide û goftûgoyên xwe bi serhildirê pêş ve dibe. Piranî, çawaniya vê danûstendinê (kenîn û xwestin û tevgerên hevzeman) hem di rê û rêbaz û hem di bermaya encamê bi bingeş û rewşa berê, bi giştî cihê ye. Divê wisa be jî da ku zerer li radîkalbûn û îradeya nîsbî ya kiryarên wê nebe. Karnawal di gelemperî û Mîr Mîran de bi nav û nîşana nimûneya meydaneke wî, bi cihguherînên komîk û bi şidet li ser sembolen heyî yên civakî de êrîşkar dibin. Hilnebijartina wêjeya fermî ya di îtiraza hewzeya fermî de hîleyeke wêjeya berxwedanê ye, beş beş dibe û pê xwedî dibe. Xwedûrkirin ji karanîna zimanê fermî şiyana li hember wê, îlankirina hebûna hêmayê berxwedanê ye. Aliyên din yên pêşandana Mîr Mîran jî bi heman hêmayê berxwedanê zindî ye, lê wek ziman) di asta wê ya dualî de –wesîleya têkilî û cîhana ku em tê de ne) alava serekîtir-kokdartir û radîkaltir li hemberî hewzeya fermî ya ku heye, ev were destnîşankirin dê bes be.

Di pêşandan/ayîna Mîr Mîran de, rola navgînên ku perpirsiyar in ji taloqkirina têkiliyên mirovan –siyasetê ne, kêmrang bûne û kiryar û bêşaşîtî, fezaya civakê dagir-kirine û hemû însiyatîfên kiryarî di destê xwe de dihêlin. Di vê mîhrîcanê de, daxwaz û pêngavê çendengî û serşikandina desthilatîyê ku pêdiviya dadê ye, bi riya kar nîşandan û peywîr nîşandana her hêmayî ve û serobinkirina rewşê ne tenê bi têkiliyên emûdî/qinc û berwarî yên desthilatîyê nîşan dide, bi şiklekî tê vekolan û her weha pêşiya entegrasyoneke hêza nû di tevna desthilatîyê de asteng dike. Ango guherînên û cih bicihkirinên di asta fermanber û hakimên fermî de bi awayê danîna faktorên desthilatîyê napejirîne, ji ber ku em rû bi rûyê guherîna tevahiya civakê tên ku gel (ne herkîn) wan ava dike û rêvebirina wê jî radestî Lewîyethanên<sup>21</sup> nû nake, ji ber ku ew bi xwe “siyaseta geleri” vedikolîne, karûbarên jê re pêwîst di dest xwe de digre.

Mîrov dikare rewşa karnavala Mîr Mîran vegeze (şûnde wergirtina) rewşa ji dest çûyî ku di dirêjahiya dîrokê de bi riya danîna desthilatîyê hatiye îhlalkirin û ji ber heman sedemê bizaveke ber bi bergeha utopya û pêkankirina xwe gihandina wê. Tenê, cil û rûdêm û bizav, ji bo xelasî û têkdana têkiliyên heyî, di rastiya pêş-

21 Leviathan (Mîta Êrgarîtî) yan jî ya Rehab ( Mîta Asya Navîn). Hûtên deryayî yên bi şeklê marî ya erjderhayan in, her çiqasî bi çandên cuda cuda re têkiliyan heye, lê belê, di dirêjahiya demê de ligel hev û bi hev û din ve têkildar dibin. Cureyên hûtan ên bi vî rengî bi awayekî eşkere di mîtolojiyên cîhanê de hatine qalkirin û hema bêjêli her derê şev û tarî û malzoraka dayîkê û ava kozmîk ve hatine girêdan û tîkildar in.

nûmakirina rewşa kut ê xwestin bi hev ve girêdidin. Û hemû kesên civakê bi hev re dengbêjên çend dengî ne. Ew hem sîstem û ewlehiya derewîn têk didin, hem ya ku bûyî adet li nav hev dixin û hem jî kesên ku tevdanê dikin diqewirînin. Ji ber ku di dirêjahiya şoreşên dîrokê û dadxwaziyê de rola wan di derketina dubare ya olîgarşî<sup>22</sup> û pêşgirtina temasa civakê bi siyaset û mirov û xweza re bûye. Mîhrîcana Mîr Mîran bi navnîşana qewmînek tekane û hevgirtî (mutenasip) bi zeman –mekan, nasnameya xwe ve, di redkirina dengê bihorî de û pêşwaziya çend dengiya îro pêşkêş dike.

Di pêşandeya Mîr Mîran û heyama desthilatiya demkî ya mîr de du zagon hene. Yek şertê zagona destpêkê nepenîbûna hakimê rastîn (yê berê) e. Di heyama desthilatdariya Mîr Newrozî de zagona duyem daketina mîrê nû û betalkirina desthilatdariya demkî ya çendrojî ye ku tevî keniyaye<sup>23</sup> Şertê Mîr Mîran dayîna şeweya hêz û rûdema wê ye. Betalkirin û demkîbûna wê ev e.

Di tevahiya peyamên Mîr Mîran de, guherîna rewşa yek dengî (şah û anîna desthilatiyê) bi guherîna çend dengiyê (desthilatiya demokrasiyê û desthilatiya gelperwerî) yê encam digre. Mîhrîcan ji ber nexweşketina mekan-zeman ê di rewşeka qeyranî de (bi sedema bêhempabûna girêdayî şert û mercên zayînê û zayîna wê ya dubare) mercên pêwîst ji bo kombûna gel di qalibê karnawalekî û her weha derbirîna vê îradeya komî amade dike. Zagonên hatin danîn di rewşa yek dengiyê de hatin pinpêkirin û şeklê nû yê civakî li xwe girtin (her çiqas demkî be jî) tê avakirin. “Li gor fermana Emîr Biharî, hakim, divê zindaniyên bêguneh azad bike. Malbatên ku ne li hev in li hev bînin, dewlemend zekatên xwe bidin feqîran.” (Eyûbyan, 106, 1962).

### Nîqaş û Encam

Pêşandanên civakî-siyasî yê Mîr Mîran bi şibandina pêngaveke sembolîk a civakî –hunerî, mînaka herî girîng e ji bo cihêrengiya fikrî û hewldana ji bo jinûvezayîna civakî di çarçoveya têkiliyên nû yên mirovatî û civakî ya navendî li ser hêzê ye. Tevî ku bingeh û fikra serekî ya vê pêşandanê di derbirandina çêkirina têgîna şadiyê ye, di hundurê wê de bi hinek girtina dest a pozîsyonên heyî ye. Lê heman dualîtiya rasteqîn û sembol ali ser zemên cureyek avakirina nasnameyê ye. Di wê de dengên belengaz jî dê bibin xwedî hêza bihîstinê. Û ev bi destê yên din ên mezin tê inkarkirin yan jî rû bi rûyê şer dimîne. Di çerxîna têgîna rewşa nû de dê fêhmeke kûrtir ji belengazên din bi dest ve bîne.

Pêşandanê kolanî di wateya xwe ya heqîqî de bi navnîşana çepera berxwedanê, berhema astengiya têkiliyên di navbera azadî û civakekî ye ku ji hundur ve binketin

22 Oligarchy: (desthilatiya komeke biçûk) Peyveke ku kêmxistinê destnîşan dike; wateya wê ne tenê desthilatiya komek biçûk e, her weha desthilatiya komek biçûk e ku li hember girseyên gel ne berpirsiyar e, fesad e, yan jî aliyên din ve rû bi rûyê nefreta yên din e.

23 Ev zagona duyem, mebest absûrd bû, rewş.

û bédengkirinên bi ser de hatî derketiye û bi fonksiyonên cur bi cur ê perwerdehî, ajîtasyonî û li pey ronahîbûn û binesaziya werçerxîna civakê ye. Lê ev werçerxîn di bin siha guherîna rewşa yekdengî ber bi çenddengiya di civakê de dê pêkan be. Baxtîn bi belavbûna çanda çenddengî û rewayî dayîna çanda diyalogê li hemberî monologê ye bi mecbûriyeta pêdiviya “wî” ya yê “din” ji bo fêhmkirina xwe destnîşan dike. Û rikebera xwe bi vegotinê otorîter<sup>24</sup> cihguherîna wan bi komek a berfireh ji têtîngên hûmanîstîxwaz bi heman armancê ye ku ew di hewldana rewayî dayîna çanda lê-pirsîniya di hemû astên civakî û siyasî de ye. Ji dîtbariya Baxtîn “lêpîrs, lingên herî girîng ê berdewamiya axaftinê ye” (Ehmedî, 93, 1278).

Xebata dawî lêhûran bi jêdera şîroveya berawirdî di navbera têtîngê Baxtîn a karnawal û şeklên kolanî yên pêşandana Mîr Mîran, nîşan dide. Ku pêşandana Mîr Mîran, ji aliyê bicihanîna rola şadîya ji bo qayîmdanîna desthilatîyê (bi jêdera bi şîroveya Ferankfurtî<sup>25</sup> ya ji hunera çandê<sup>26</sup>) ferehtir bûye û ne tenê vediguhere amêrên desthilatîyê, her weha bi bizava derxistina hemû hucreyên civakê di asta xeta dadê de li ser cihêrengiya pêkvejiyanê ye. Bi lêcivîna nîşandana enerjî û hêzên ji navendê direvin/navendrev (centrifugal) bi daxistina hêzên navendger (centripetal) pêngav diavêje û di bin ronîya rexnekirinên xwe re tevî amadekirinê derfetên jinûvezayîne hafizeya komî bi afirandina binesaziyên lazim re ji bo pênaseya nû ya desthilatdariyê di civatê de dibe rêber.

24 Authoritative Discourse

25 Frankfurt School: Navê dibistaneka Elmanî ye ku di deheya 1930an de ji aliyê Max Horkheimer ve wek Enstîtuya Lêkolînên Civakî hatiye damezrandin û disîplîne weke civakî, siyasî, derûnî, dîrok, ciwankarî, felsefe, muzîkolojî aniye cem hev.

26 Culture industry: Pişesaziya çandî bi awayekî ji wateya wek pişesazîyê tê ku îde (raman), hilberîn, belavkirina berhem, xizmetekê derdixe holê ku naveroka wê ya çandî heye. Serî aliyê çandî ya şexs û civakê didin. Di hin welatan de, pişeya çandî amûreke ku di keşmekêşên siyasî û gelêrî de tê bikaranîn. Di hin welatên din de, naverokek a bazirganî li xwe digre û di hin welatên din de amûreke ji bo bandorkirina li ser gel û pişeyî ku di dorpêça desthilatîyê de ye.

## ÇAVKANÎ

- Ayoubian, Ubaidullah (1962) *Mîr Newrozî, yek ji merasîma kevnar li Kurdistanê*, Zanîngeha Wêje û Zanistên Mirovî, Tebrîz, hej. 60 (rr. 99-112).
- Agamben, Giorgio (1995). *Rewşên Awertê*, wer. Poya Emînî, Tehran, Neqşê Cihan.
- Benjamin, Walter (1987). *Bûklîstok û Qambost*, wer. Murad Ferhad Pour, Omîd Mêhregan, Tehran, Gamê Nû.
- Todorov, Tezvetan (1977). *Mentiqê Goftu yê Mikhail Bakhtin*, wer. Daryûs Kerîmî, Tehran, Neşrê Merkez.
- Rezayî Deşt Ersene, Mehmûd (2009) *Ontolojiya Mîr Newrozî Bi Palpiştaya Beytek A Hafîz*, Xebatên Îranî, hej. 15 (rr. 75-96).
- Riza, Haşem (1979). *Kronoloji û pîrozbahiyên Îrana Kevnar*. Tehran, Intişarat Foruher.
- Ramezanî, Ebulfezl; Yazdani, Anisa (2015). “Lêkolîna Sê Temayî ya Baxtîn a Karnivalê, Gotûbêjgerî û Krontop Li ser Pêşandnameya serî rakirî da ku ser bikeve, yan Şaşîtiyê Yek Şev, berhema Eltus Goldesmîs”. *Lêkolînerê Wêjeya Hemdemî ya Cihanê*. hej.72 (rr.245- 274).
- Samuel Wells, Wergera Qedîmî, Seher, (1378). *Pêşandanên Ayîn û Ayînîşandani*, Teater, hej. 41 (rr.140-160).
- Sîna, Xosro. (1392). “Venêrînek Li ser Mîtolojiyên Bereket û Qurbanî di Ayînên Pêşandani yê Kurdistanê”, *Pêşandana Pazdehem a çapê* (r.28-32).
- Aşûr Por, Sadiq. *Mîr Newrozî* (Mîr Mîran), Teatir, hej. 25 (rr. 46-49).
- Ereb zade, Cemal. Mosewî Eqdem, Kambîz. Iftixar Yekta, Şerare. (2015) “Analîza Peter Brugel, li ser bîngehê ramanê Mîxayl Baxtîn” *Kîmyaya Huner*, hej.14 (rr.31-52).
- Xulamhuseynzade, Xerîb Reza. Xolam Por, Nigar; (1378) “Mîxayl Baxtîn, Jîyan: Raman û têgînên Sembolik” Tehran, Neşr Rozgar.
- Firîzer, Ceyms Corc, (1382). *Şaxa Zerîn*, wer. Kazim Firozmend, Tehran, Neşr Agah.
- Qezwîni, Muhemed (1323). *Mîr Newrozî*, Neşriye Yadgar, Sala Yekem, hej.3 (rr.13-16).
- Kerîmyan Serdeştî, Nadir 1377. “Mîr Newrozî”, *Kitabê Mah Huner*, hej. 5 (rr.13-15).
- Gerdnîr, Mayel 1381. “Hêza Xeyalî Ya Baxtîn” wer. Yûsuf Abzerî. *Fesnameya Erxenun*, Hej.20 (rr. 33-66).
- Marufî, Sîrus 2000. “Merasîma Mîr Newrozî li Kordistanê”, *Kitabê Mah Huner*, hej. 29 û 30 (r. 67-68).
- Mewlewî, Keramet 1387. “Bîngehê Psîkanalîza Firuyd Lakan”, Tehran, neşr ney.
- Meysun, Bîm 1380. “Teatra Xeyalî û Cureyên Pêşandanên din ên derûnî”, wergera Şîrîn Bozorgher, Tehran, Intişarat Danişgah Huner.
- Nolz, Runeld 1391. “Şekspîr û Karnawal: Piştî Baxtîn”, werger, Roya Por, Azerî, Tehran, neşr Hormiz.
- Yezdî, Nergis. Ibrahîmî, Mensûr 2011. “Lêkolîna destanên Karnawalî di Pêşannameya Rumeu û Julyes de bi çavê Baxtîn”, *Hunerên Pêşandani û Musîqî*, hej. 43 (rr. 51-8).
- Silurastayn, Şel 1391. *Berhemên Berhevkerî yê Silurastayn*. wer. Sara Feroxî, Tehran, Intişarat Sebzân.
- Ehmedî, Babek 1378. *Avanî û şîroveya Metnê*, Tehran, Neşr Merkez.
- Brandist, Craig (2002). *The Bakhtin Circle: Philosophy, Culture and Politics*, London, Sterling, Virginia: Pluto Press.
- Hill, Jane H (1986) “The Refiguration of the Anthropology of Language” (review of Problems of Dostoevsky’s Poetics) *Cultural Anthropology*, vol. 1, No. 1, rr. 89–102.

---

---

---

---

---

---

---

---

HEVPEYVÎN LIGEL STRANBÊJ ERCAN BÎNGÖL  
**RON: Ev Albüm Divê Neyê  
Paşguhkirin**


MIHEMED ŞARMAN

*Ercan Bîngöl li Gimgima Mûşê hatiye dinyayê. Dehan salan e bi musîkê re eleqadar dibe. Albuma wî ya yekem RON hem bi terza xwe ya nûjen hem jî bi rîtmên bluesê bal kişand ser xwe. Mixabin ev albûma hêja bi me têra xwe li nav guhdarvan belav nebû. Gelek awaz û gotin aîdê wî bixwe ne. Bi albuma xwe ye yekem hêviyek mezin da guhdarvana. Demek dirêj e li Enqereyê dijî, ber bi karê muzîkê re karê mamostetiya îngîlîzî jî dike. Me ji bo vê hejmarê bi Ercan re li ser albûmaya wî ye serkeftî û xweşik sohbet kir.*

**Ercan, ez dixwazim em bi peyva bluesê dest pê bikin: Qasî ez dizanim blues muzîka gelê Efrîqayê ye û piranî ji stranên karker û dilgirtiyan bûye. Yani bi hesrata azadî û aramiyê teşe girtiye. Helbet ev muzîk niha pir guheriye. Lê dîsa jî bo me kurda cûreyeke nû ye. Mirov dikare albuma te wek albumeke blues binav bike. Gelo sedem çi bû ku bluesê bala te kişand eleqa vê bi van gotinê jorîn heye?**

- Belê, em dikarin muzîka blues wek cureyek ku ji aliyê kesên ji welatên xwe hatine dîrxistin hatiye afirandin bi nav bikin. Ew kesên ku ji welatên xwe hatine dîrxistin afrîkî bûn û wek kole hatin koçberkirin û zevîyên pembû û bostanan de –di başûrê Amerîkayê de- hatin xebitandin. Wekî ku stranbêjek di daweta gundê xwe de stran bistrê û gundiye din jî gotin lê vegeînin... Bêguman, ew reşikên afrîkî nîrxên xwe





yên heremî jî bi xwe re anîn û bluesê bi rênîşandana van hêmanan û keserên xwe afirandin. Di albûma RON de stranên ku em dikarin wek rock, country, blues û hwd. bi nav bikin hene. Lê ez dikarim bêjim çend taybetmendiyên vê albûmê hene. Yek ji wan strana “Bluesa Benda Sînê” û cûreya wê ye. Bi vê stranê, him “12 bar” a bluesê, him jî skalaya bluesê hatiyê bikaranîn û forma xwe ber bi “slow blues”ê dawî kiriye. Em dikarin bêjin, hinek ber bi “Stormy Monday Blues”ê ve jî diçe. Bi vî rengî, ji bo

muzîka kurdî pir û pir, bi zêdeyî formek nû ye. Û divê ji aliyê ciwanan berdewamiya vê pêk jî were.

Piştî ku min lêkolîna li ser vê cûreyê kir, min dît her çiqas erdnîgariyên me ji hev cûda û pir dûr bin jî, neheqiyên afro-amerîkî û kurdan dîtine gelek dişibin hevdu. Dagirkirin û talankirina welatên wan, neazadbûna wan, asîmîlebûna wan, piçûkxistina wan, êşkencedîtina wan û hwd. Ji ber van sedeman, hemhestiya min û wan çêbû û min xwe di nava deryaya bluesê de dît. Ji wê rojê pê ve jî hewl didim bi kurdî bibluesînim.

**Min albûma te li ser riya tora civakî bihîst hema beje hê nû derketibû min stand, guhdar kir û pêşniyazî gelek kesî kir. Lê dîsa bala xwe didimê têra xwe nehate naskirin. Bi te jî wisa ye an çima wisa ye?**

- Zor spas. Ji xwe, ji bo danasîna RONê me giranî da tora civakî. A rastî, ji bilî wî me ji bo danasînê pir tişt nekir. Ji ber ku min zanîbû di destpêkê de ev albûm ji bo pirî guhdarên muzîka kurdî hinek biyanî xûya bike. Dîsa min zanîbû ev berhem piştî demekê bê naskirin û wek tişteke hundirîn û tişteke wek ji wan bê hîs kirin. Ji xwe wisa jî bû. Ji bo kesên di muzîka kurdî de li dû formên nû ne, ez dikarim bêjim, ji bo mehdekiriyên muzîka kurdî bû bêhn û motîvasyonek. Bila xeled neyê fêhm kirin; teswîrên bi vî rengî li ser torên civakî ji min re wek peyamên pîroz kirinê hatine. A rast, niha, ez behsa wan peyaman dikim.

Piştî ku albûm derket, bala çapemeniya tirk kişand û bi min re hevpeyvîn çêkirin û hinek rexnegirên tirk yê binavûdeng û tecrûbedar li ser RON nivîsandin. Û ez bi muzîkjen û hunermendên tirk û navneteweyî re muqayese kirin. Ev tişt jî, ji ber xwe, bala kurdan jî kişand. Sed mixabin, çî tişteke sosret e ku, tişteke ku bala çapemeniya tirkan bikşîne bala çapemeniya kurdan jî dikşîne. (Dikene...) Piştî van qalkirinan, RON hîn pirtir hate naskirin. Li aliyekî din, ez dikarim bêjim, xebat û berhemên ku em wek nirxên demdirej bi nav dikin, di xwezaya xwe de, ji xwe, bi vî rengî dimeşin.

**Muzîka kurdî ji salên nodî heta salên 2004 filan ji çavkaniyên politikaya şoreşê û gelemperiyê gelek sûd vegirt. Mirov dikare bêje gelo ev herdû tişt riya muzîka kurdî diyar kir. Loma gelek kom ava bûn. Van bi stîlên nû stranên gelemperî gelek caran jî bi serkeftî şîrove an arenje kirin lê ev yek miçîqî. Niha jî rewş felaket e. Te, ser navê xwe, ji van herdu xalan kîjana sûd girt an motîvasyon û çavkaniyên muzîka te çî bû û çî ye?**

Destpêka salên 90an, herdu jî bi hev re perisî. Herdu jî hevdu tamam kir û hev-kariyek mezin di navbera wan de hebû. Bi piştgirî dayina hevdu, hevdu bi hêztir dikirin. Bi rastî jî berhemên bêhempa derxistin holê. Wek hûn jî zanin, nirxên ku tevgera apoyîyan afirandin bi saya wan albûman li her çar perçê Kurdistanê, heta



Ermenistan û Kazaxîstanê û gelek dewletên Ewropa û dinyayê, bi taybetî li bakûrê Kurdistanê belav bû û gelek şopîner û dilxwaz kom kirin. Bi vî rengî, gelek ciwanên kurd jî beşdarê refên gerilayên PKKê bûn. Ji bilî şîrovekirin û aranjekirina stranên gelemperî ya bi şewazên nû, gelek stranên ku behsa têkoşîna PKKê kirin jî hatin çêkirin. Ez dikarim bêjim van stranên gelemperî û polîtîk di salên 90an de mohra xwe li muzîka kurdî xist. Nifşekî bi vana mezin bû û hişmendiyek çêbû.

Ez bi xwe jî, yek ji wî nifşî me. Ez jî wekî milyonan ciwanên kurd bi stranên wan koman mezin bûm. Keda wan a hûnerî û polîtîk li ser min hene. Muzîka min jî, bi formekî nû be jî, ji aliyê ramanê ve berde wama wê demê ye. Lê dem diguhere û tu, li gor civata guherî an jî ji bo civata ku tu dixwazî biguherînî, şiklekî didî hest û ramanên xwe. Ev şikla ku min xwest bidim muzîka xwe jî blues bû. Dema yek guhê xwe bide RON, rexnegirtinên bi zimanekî tûj dibîhîzin. Min hinekî xwest jî, heta ji destê min were, bala ciwanên kurd ên li metropolan dijîn bikşînim û ji muzîka kurdî dûr nekevin. Ji ber ku, şewazên berê êdî bala ciwanên kurd nedikşand. Ez hêvidar im, gelek muzîkjenên kurd ên nifşê nû jî xwe ji vî tiştî berpirsiyar dihesîbin.

**Te di albûma xwe de bi min tişteki pir balkêş kiribû, strana Şakiro ya navdar (rastî ya Reso ye) “Wey Dil” bi tarzêki slow cover kiriye. Halbûki em bi salan vê stranê bi tarzêki din guhdar dikin. Piştî aranjeya Hakan, dueta Rojda, mirov qet texmîn nedikir ku ev stranê ji lez û bazê xwe were ser qewlekî wisa xemgîn û slow. Gelo xebatên te yî bî vî awayî yê hebin?**

Pêşîn, min dixwest ji gotinên pêşîn ên kurdan stranek blues çêbikim. Heta min ji kal û pîrên xwe gelek gotinên pêşîn jî berhev kir. Lê piştî ku min ji Îsmail Ulker -birayekî hêja ji Mêrdîn, Qoserê ye- wan gotinan berhev kir, ew strana ku min dixwest

ji gotinên pêşinan çêbikim wisa ma. Lê, li aliyê din, dibe ku stranek bi vî rengî di albûma duyem de jî cîh bigre. Ev strana ez qal dikim çêbikim hinek zehmet e. Ji ber ku, divê ez ji wan gotinên pêşiyên çîrokek biafirînim. Ma her kes dikare ji her tiştî fêm bike û bibe pisporê/a wî? Dibe ku nivîskarên wekî we alikariya min bikin û rê nîşanê min bidin.

**- Wek me li jor diyar kir, piştî ku kaniya stranên gelemperî miçiqî, kêr hunermend bi rengê orijinal karibûn muzîka xwe dewam bikin albûman çêbikin. Piştî vê yekê min go hunera kurdî qey ser arenje, cover şîrovekirinê tenê ava bibû. Ez ser navê xwe te jî yek ji van muzisyena dihesibînim. Lê ev zû de ye te albûm çênekir. Wek guhdarvanekî te ketim nav metîrsiyê. Ka tu dixwazî ji me re çê bêjî?**

- Na, vê metîrsiyê li dû xwe bihêle. Ez bi bawer im ku albûma duyem û projeyên min te û guhdarên delal hîn kêfxweştir bikin. Ez dîsa dilbawer im ku hûnê rastê ti dubareyên neyên. Çima wisa dibêjim û ji xwe ew qas bibawer im? Lewre ez hîn li ser bluesê dixwînim, dişopînim û hîn li ser nota, akor û armonyên vê şêwazê dixebitim. Hêvîdar im, di stranên xwe de bikaribim çîrokên ku bala “bajariyan (!)” bikşîne biafirînim. Dibe ku tişteke ji dûrê rastiye û rastiya civata me jî derkeve holê. Nizanim. Lê her çibe jî, bi min wisa xuya dike ku wê dubareyên tiştan neke. Lewre em ji tiştên ku xwe dubare dikin westiyên û êdî dilê me ji wan hev dikeve.

Li aliyê din, berhemdarî ne bi “sîparîş”ê lê bi tiştên ku mirov jiyaye/dijî ji nêz ve girêdayî ye. Tu nikarî ji bo tu berhemdêr bi jiyaneke çêkirî, ne xwezayî ji xwe re ava bikî. Bikî jî ew jiyana ji te re berhemên sînî û ne xwediyê çîrokek bixweser bi rê dike. Bi ya min, hunermend û muzîkjenên ku jiyaneke bi vî rengî dijîn sedemên metîrsiyên te ne. Ez bi xwe, dema ku xwe di nav tevgera şibandina pergalê de dibînim, hema, tişteke xwe diguherînim. Wek mînak, cihên ku ez xwarinê dixwim, kesên ku pê re hevaltiyê dikim û hwd. Heta carina xwe ji her kesî û jiyana civatî îzole jî dikim. Ji ber ku, pirranî, mirov bi çavên ku ji aliyê civatê ve hatine şêwandinê dinyayê dinirxîne...

**Ku ser muzîka kurdî ya rast ser hunera kurdî tişteke were nivîsîn, teqez bêgavî yê cihêkî fireh didin naverok û şêweyên epîk û hêla wî yê polîtîk. Di albûma te de jî straneke dijwar polîtîk heye. Bi min pir xweş e. “Kûçik Hatîn”. Dikarî çîroka vê stranê ji me re bêjî?**

- Baş tê bîra min. Payîza sala 2007’an bû. Li hinek deverên Kurdistanê şer giran bibû û çapemeniya tirk çend rojnameger şandibûn wê derê. Lê wargeha karên wan li Stenbol û Enqerê bû û cihên wan rehet û xweşik bûn. Ew rojnamegerên ku çapemeniya dagirker şandibûn gundên me, bi hinek kesan re hevpeyvîn kiribûn lê hevpeyvîna wan li ser derewan bû û hevpeyvînkirina wan bi awayekî bêexlaqî bû. Gotinên ku gundiyan nedigotin dişandin Stenbol û Enqerê an jî di weşanên zindî de



bi vî rengî werdigerandin. Gotinên ku gundiyan bi tundî li hember tiştêkî derdiketin nedidan lê berevajî belengaziya kurdan, feqîrbûna kurdan didan ber çavê medyaya tirkan. Halbûkî kurd bi wan sekinên xwe serbilind bûn. Pişt re min got gelo çi karê van li gundê me hene? Di wan nûçeyên ku çêkirine behsa mêvanperweriya gel jî dikirin. Îjar, vêya jî wek mêvanperweriya milletê tirk nîşan didan. Warê ku diçûn serî lê bixin û hevpeyvîn bikin ji xwe welatê kurdan bû. Gelo ew tişt çima û çawa bû mêvanperweriya miletekî din? Mêvanperwerî xweş e, lê di strana “Kûçik Hatîn” de ji bo vê rewşê dibêjim; “*masî ji çemên me girtin, av ji kaniyên me vexwarin, hûn bi xêr hatin, xêrê ji xwe nebînin, kûçik hatin, li gundê me ne*”. Peyamek wê ya bi vî rengî jî heye; “Zilma we em gelekî êşandin, lê, li aliyê din, hîn ew hêz bi me re heye ku em bi van stranên henekê xwe bi we dikin û em hîn li vir in.” Lê sed mixabin, hinek kesayet û rêxistinên kurdan bi van dagirkeran re hevkarî dikin û şer li me giran dikin.

**Çend stranbêjê kurd têra xwe ji helbestên kurdan sûd girtin heya mirov nikare navê wan bêyî helbestavana hilde. Wek mînak, Mehmet Atli û Arjen Arî; Cîwan Haco û Goran Haco, Rojen Barnas; Şivan Perwer, Cegerxwîn; Nizamettîn Arîç, Ferîkê Ûsiv (nexasim ji bo herdu albûmên dawî). Gelo berê te çiqas li edebiyat û helbesta kurdî ye?**

- Bêgûman, bandora wêjeya kurdî ya li ser bingeha min a hestî gelek e. Bi taybetî jî destanên me yên wek *Mem û Zîn*, *Siyabend û Xecê*, *Rustemê Zal û hwd*. Mîna ku berhemên gelemperî û kevn rê nîşanî dilê min bidin. Lê, li aliyê din, haya min jê heye ku ez muzîkjenekî ku xwe bi çirokên nû û aktûel îfade dikim. Divê ev yek nakokîyek be jî. Nizanîm. Ez dikarim bêjim helbestvanek ku ez hêla hunerî ve pê re têkildar im Memê Mala Hine ye. Di albûma RON de strana ku min wek *Lo Lo Qulingo* stran helbesta wî ye û bi min pirr û pirr hêja ye. Ji bo albûma duyem jî -heger destûra wî hebe- min stranek ji helbestekê wî ya din jî çêkir û pir dixwazim di albûma duyem de cîhê xwe bigre.

**Wek guhdervanekî gazinekê min her tim heye û ez di gelek ciyan de jî tînim ziman. Di muzîka kurdî ya modern de amûr heya tu bêjî modern lê naverok hê jî pir gelemperî ye. Minak, yekî mîna Cîwan Haco ku bi salan e Ewrûpayê dijî hê stranên evîni de behsa berîvanan filan bêvan dike. Ne ku ez vî yekî bi pozbilindî dinirxînim lê dengê bajêr dengê êş û şadiyê ye. Qereker û nifşa nû kêman caran dikevin nava stranên. Ev yek jî dike ku em hestên xwe di eyna van muzîsyenan de nebînin. Bi te ev yek çima wiha ye? Bi min ez dikarim vê rexnê ji bo muzîka te jî bikim.**

- Tespîta te pirr hêja ye. Muzîkjenên kurd her çiqas stran û albûmên xwe bi soundekê hemdem (!) jî bixemilînin, pirranî, gotinên wan gelek kevn û ne xwediyê



çîrokekê ne. Dibe ku, tiştên asayî dijîn, teqlîdê kesên ku beriya wan albûm çekirine bikin, ji ber pîrsgirêkên aborî stran çêdikin û distrên... Hemû pêkan e. Bi ya min, divê ji bo pêşketina muzîka kurdî yekî/ê muzîkê ji ber xemên aborî çêneke. Heger muzîka xwe ji bo pêdiviyên xwe yên aborî îcra bike, şibîna wî/ê ya li kesên ku di bazarê de ne bivênevê ye. Şibîna li kesên din ji bo afirandina berhêmen bixweser tehdîdek mezin e. Ji bilî van tiştan, divê ji bo qalîteyê rexnegirtin jî hebe. Van rexnegirtinan erênî be û ji bo berjewendî û pêşketina hunermendan bin hîn baştir in. Kemasiyek me yê wisa jî heye ku rexnegirên me yên muzîkê -hema bêjin- qet nîne. Dibe ku kêmasiya vî tiştî yek ji sedemên şûmîtiya muzîkjenên kurd bin jî. Kî zane?

**Slogan, epîk di demekî de têra xwe mirovan tîne coşê lê herkes dizane muzîk jî hûner jî ne ev e. Gava tu dixwazî straneke pîr şexsî çêbikî ev polîtîka li te dibe bar. Ser navê xwe bejim gava ez çîrokekî dinivîsim ev yek her tim li min dibe bar.**

- Bi rastî, li ser vê mijarê çend nêrîn hene û hîn jî nîqaşî ne. Hinek kes hunerê wek hewldanek şexsî û ji hêmanên polîtîk û civakî rizgar dibîne, hinek jî nikare hunerê beyî hêmanên polîtîk û civakî binirxîne. Herdû jî hêja ne lê bi nêrîna min, divê berhem sê awa bin. Yek, berhemên şexsî; du, berhemên polîtîk û civatî; sê, berhemên ku dê bi hêmanên him şexsî him jî polîtîk bîn çêkirin. Hema ew berhem li ser çî hatibe afirandin, pêwîst e ku bi hewcedariyên nirxên hunerê bê xemilandin. Bî vî rengî be, berhemên yekî/ê her li ser çî hatibe afirandin jî, kes nikare îdîa bike ku van berheman beyî dilzîziyên hunerê hatine çêkirin. Tiştê ku ez dixwazim bêjim, berhema yekî/ê li ser çibe jî, mecbûr e ku aliyekî wê ya hunerî jî hebe. Hêman û nirxên hunerî ji bo min bivênevê ye. Lê, li aliyê din, ez nikarim hunerê ji pîrsgirêkên civatî rizgar bihesîbînim. Heger derdekî min ê civatî jî tineba, minê çima stranên wek “Kûçik Hatîn”, “Xwe Ker Ke” û “Dîk û Mirîşk û Cîran” çekira?

**Klîşeyeke ecêb heye lê wekê her kilîşiyê jî têra xwe para xwe ji rastiye digre. Muzîka kurdan baş e û kurd bi muzîkê re her tim nêzîkê hev bûne. Lê binê vê gotinê nayê dagirtin. Mirov divê vê klîşeyê ne tene bi kelepura dengbêjî bizanin û lêkolînên ser muzîka olî jî were dagirtin. Mînakek jê ya yarsaniyan û kurdên rojhilat e. Lewre şaxeke muzîka kurdî ya qedîm ser ayînên olî nexasim yarsaniyan ava bûye. Dixwazî ser vê mijarê tiştekek bêjî?**

- Qasê ku em ji lêkolînan zanin, gelek amûrên ku em li ser dîwarên şikeftan dibînin di ayînekê olî de hatine lêdan. Em dikarin bêjin wan amûran dişibin tembûrên ku em niha bi kar tînin. Li aliyê din, em zanin ku yarsaniyên rojhilat, kakaiyên başûr û elewiyan bakûr jî di ayînan xwe yên olî de tembûr bi kar tînin û ji bo wan tembûr ne bi tene amûrek e an jî “stran”ên wan ne bi tene muzîk in. Nirxên wan ên hevpar wek ronahî, xweza û hwd. jî hene. Tişteki/ê ku têkiliyek wî/ê bi xwezayê hebe, bi muzîkê

re jî heye. Kes nikare muzîk û xwezayê ji hev cûda binirxîne. Xweza jî bê hêmanên aqlî nikarê bê nirxandin.

Ew jî muzîk e û ew jî “men” e. “men” ji zimanê grekî ye û wateya wî “hiş, aqil” e. “men” koka peyva “mousa” ye. Di mîtolojiya grekî de “mousa” navê neh periyên pêxamê (îlham) ne û ev peyv bi lêzêdekirina dawîneya “-ike” bûye “mousikê”. “mousikê” jî ew zimanê ku “mousa” yan diaxivin e. Zimanê aqil û hiş, muzîk! Û bêgûman zimanê xwezayê ye jî!

*men* → *mousa* → *mousikê* → *music*

Loma ez nikarim bêjim ku kurd muzîka bi tenê ji bo govendê strandine û afirandine. Divê bingeha wan berheman bi ew tiştên ku min li jor qal kir re girêdayî an jî têkildar be. Ji ber ku kurd beriya bibin misilman tişteki/ê din bûn û dibe ku pişt re, perisîne.

**Ji partî an dezgehên me yên zorpoltîk qet ricayek ji bo straneke sîparîş nehat heya niha. Ji te re negotin ser vê an ser filan kesî stranekê çê bike?**

Na. Daxwaz an jî di ber de avêtinek bi vî rengî qet nehate kirin. Ji xwe muzîkjenên ku ji bo kesayet an jî rêxistinek stran çêdikin kadro an jî dilxwazên wê têkoşînê ne. Ez bawer nakim ku li ser sîparîş an jî xwestekê stran hatibe çêkirin. Kes nikare bi darê zorê bi yekî/ê stran bide çêkirin. Qasê ku ez şahid bûme û bîhîstîme, ev qîjeqîj ji bo ku propagandaya reş a hin rêxistin û tevgerên kurdan bikin tê bikaranîn.

**Tu li bajarekî tirkan dijî. Ji bo muzîka te çi avantaj an dezavantajên vê yekê hene?**

- Tu dikarî bi çavek din li welatê xwe binihêrî. Ev avantajek e. Lê, li aliyê din, tu mecbûr dimînî ku jiyanek hatiye perçe kirin bijî û bi rê ve bibî. Ev tişt min pir diêşîne...

**Wek dawî ji bo şexsê xwe pirsekê bikim. Gelo tu Şahê Bedo dinasî? Li ser wî û muzîka wî çi difikirî? Ez yek heyranê mezin yê Şahê Bedo me. Ji bo min tu bibersîvîni ezê kêfxweş bim, nebersîvîni serbest î.**

(Dikene...) Di hevpeyvînekê de, pirsê herî sosret ku ji min hatiye pirsîn ev e. Bi rastî jî pirsek gelek orjînal e. Divê ev pirs ji hêla civatî, polîtîk û aborî ve bê bersîvandin. Bi gotinek din, mesele kûr û dirêj e... (Dikene...)

Ez, wek gotina xwe ya dawîn, ji bo keda we spasiya te û kedkarên Kovara Zarema dikim. Kar û xebatên we de serkeftinê dixwazim. Ji bo ev keda we ya bêhempa em ji we re spasdar in. Hûn her hebin...

# Pêsrên Dayê û Zilamekî Berşîr

FERZAN ŞÊR

“Îro dayê mir. Belkî jî do bû, ez nizanim.”

Albert Camus (Ji Pêsrên Dayê ya Hesênê Metê)

“Dayik namire, kirasên nû li xwe dike”

Ferzan Şêr

**Puxte:** Ji ber ku Psîkanalîz tiyorî û pratîka ilma xwe li ser vegotina mirovan ava kiriye, têkiliya wê û janrên edebî yên xwedî vegotin jî bi awakî misoger xurt e. Ji ber ku janrên edebî yên xwedî vegotin bi zanîna nivîskaran an na, xwestine ku kêrhiya derûniyên lehengên xwe jî vebibêjin û dest nîşan bikin, bêguman karekî psîkanalîtîk jî kirine. Di çîroka Hesênê Metê ya bi navê “Pêsrên Dayê” de em vê zewaca psîkanalîz û vegotinê dibînin. Him hêmanên psîkanalîzê him jî yên pêşkêşkirina vegotina piralî û curbecur in. Di çîroka “Pêsrên Dayê” de li ser objeya memikê, em kêrhiya rêwitiya derhişîn ya lehengê dibînin ku ji erebeyê ber bi bakur ve; ji xewnan ber bi seansên psîkanalîzê de diçe. Ji daxwaza xwekuştinê, ber bi dermankirinê ve em dibînin ku çawa memikê nebaş ya zaroktiyê bi bûyerekê re, derdikeve rûyê hişmendiya û ji hêla derûniyê ve zilamekî vediguherîne zarokekî berşîr.

**Peyvên sereke:** Travmaya zayînê, tiyoriya têkiliya objeyan, objeya şûngir, Hesênê Metê, ajoya mirinê

Ji roja ku kral Odîpûs û çîroka wî bi riya Freud ketiye nava psîkolojiyê û bingeha têngnasiya herî xurt a psîkanalîzê ava kiriye vir ve têkiliyeke qewî di navbera edebiyat û psîkanalîzê de hatiye danîn. Pey re jî dema Freud dest bi şîrovekirin û analîza çîrokên mîna “Wolfman (Guremêr)” û “Sandman (Qûmemêr)” kir jî êdî girêkên di navbera wan de qewîtir bû. Ji bo ku Freud ji derdora psîkanalîstan bê afarozkirin jî navê edîbiyê lê kirin, tu carî nexwestin wî wekî psîkologek/psîkanalîstek qebl bikin. Freud bi xwe pesnê Dostoyevskî daye ku ji berhemên wî gelek tiştan li zanista xwe zêde kiriye. Ji bo edebiyatê ev yek tiştêkî gelek girîng e. Ji bo edebiyatê jî şayanê pesnê ye ku psîkanalîz çavkaniya xwe ji tecrûbeyên edebiyatê yê girtiye û neha jî ji (çav)kaniya hev vedixwin. Li pey nasîna têngîn û dîsîplîna psîkanalîzê re dema mirov li berhemên edebiyatê dinêre dibîne ku li ser fahma psîkolojiya mirovan di navbera psîkanalîst û edîban de nêzîkdayînek heye. Di nivîsê de di nav gelek çîrokên Hesênê Metê de em ê li ser çîroka “Pêsîra Dayê” û li ser metafora memikê bisekinin, li derdora vê têgehê em xwendineke psîkanalîtik bikin. Em ê bibînin ku yekbûyîna dayik û zarokan bi travmaya zayînê dişkê. Peyre zarok dixwaze û hewl dide şûna dayikê, tiştên di navbera xwe û dayikê de dagire, her ku bi temamî ne pêkan be jî.

### **Vegotina ezê û psîkanalîz**

Di “Pêsîra Dayê” de vegotin ji devê kesê yekemîn (Ez) ve tê kirin. Ev ji bo analîzeke tekûz a li ser psîkolojiya lehengê rehetiyek e, her çiqas em hay ji tevnsazî û metafîksiyon û pêbaweriya vebêjerê hebin jî. Lewra ger vegotina ji devê kesê sêyemîn ve bihata kirin û vebêjer çîroka yekê derveyî xwe neql bikira wê demê pirsgirekek dîtir a vegotinê lê zêde dibû. Bi vebêjiya vebêjera sêyemîn re hikmên wî/ê, darazên wî/ê, şert û mercên hişmendiya wî/ê, yanê bi kurtasî dê bêjînga sansûra wî/ê tevli çîrokê bibûya. Dê ev jî me hebki dûrî derhişê bikira. Bi vegotina Ezê re rasterast em dengê lehengê xwe (helbet bi şerha vebêjeriya pêbawer û nebawer de), likûmînên wî yên zimanî, şopên hêmanên psîkanalîzê bi hêsanî karin bibînin. Bijartina vebêjeriya Ezê ji bo vegotina çîrokeke bi vî rengî bo min gelek girîng e, lewra nivîskar bi tenê naveroka çîrokê nedaye pêş form û şêwaza wê jî li hev aniye, ji bo mijareke wiha şêwaza herî maqûl bikaraniye. Ji bo psîkanalîzê ziman gelek girîng e. Çîroka psîkanalîzê yanî têkiliya di navbera analîst û analîzan de têkiliyeke veguhastinê ye, û berî her tiştî bi zimên tê veguhastin û di hundirê zimên de tê veçirandin. Kesên ku hinek hay ji psîkanalîz hebin, rasterast klîşeyên psîkanalîzê bi kar tînin. Bo mînak di rêzefilma *Masters of Sex* doktorekî ortopedîst heye, yekî tolaz e. Tim li pey jinan e. Di têkiliyeke cinsî de sist dibe û berê xwe dide psîkanalîzê. Kêliya ku xwe li ser dîwana analîst dirêj dike, hêj analîst tiştêk negotiye dibêje “ez ne aşîqê diya xwe me, baş e?” Bes bi vê peyvê re jî em pê derdixin ku ew aşîqê diya xwe ye, an arezûya jineke ji xwe mezintir, di temenên dayikê de dike, yanî bi awayekî girêka odîpal lê hatiye pêçan. Dû re bi jineke zewicandî ya “pîr (temena wê 60-70î ye)” şa dibe çend caran. Di çîroka

“Pêsirê Dayê” de ji ber ku “ez” dema di serî de dibêje “Çima berê min li wê derê ye, çima ewqas bi lez dajome wir, kesek pê nizane” (7), esil dixwaze her kes hay ji çîroka wî hebe. Di vir de dema dibêje “kesek pê nizane” em hîna nizanin gelo “ez” bi xwe jî nizane, ango ew dixwaze bila kes nizanibe. Di rûpela pey wê de ev diyar dibe. “Lê wek min got, ez naxwazim kesek pê bizane” (8). Bi awakî derhişîn vebêjer çîrokeke (vebêjer dibêje “tirs”) ku em lêbikolin ji zimansaziyê wî veçirînin, pêşkêşî me dike.

Ne tenê bijartina vebêjerê Ezê, hêmayên din a şêwazê jî balkêş in. Yek jê diyalog in. Diyalogên di navbera wî û doktor de gelek baş in bo analîzê. Him diyalogên rastîn him jî yên di xewnê de ku wî ew pêk anîne gelek tiştan bo analîza me nîşan dide. Di çandên Rojavayî de diyalog gelek girîng e, “mikurhatin” him di teolojiya wan de him jî di vegotina wan de xurt e. Zanista “psîkeyan (psikoloji, psikanalîz û hwd.) bi pêş ketiye. Wekî ku teoriya Bakhtinyen ji bo pîvana romanê qala diyalogiyê dike. A din jî mekân e. Çîrok wekî mekan di nav nivînan de bi xewnekê dest pê dike, leheng ji “tirsexewnê” şiyar dibe, civana wî bi derûnnasekê re heye û li nivîsgeha wê derûnnasê xelas dibe. Heman şêwaz di nav xewna destpêkê de bi xwe jî heye, li wir jî çîrok di nav erebeyekê de dest pê dike, li nexweşxaneyekê li hemberî doktorekê dawî dibe. Ger em bi giştî li hev bînin jî hêla teknik û şêwazê ve harmoniyekê bêhempa saz kiriye nivîskar. Teknîka psîkanalîzê eyn wek têkiliya veguhastinê neql kiriye/saz kiriye. Bella Habib di pirtûka xweya *Psikanalîzin Îçinden (Ji Hundirê Psîkanalîzê)* ji bo psîkanalîstan wiha dibêje “ji têkiliya veguhastin û dijveguhastinê malzemeyek dertê. Ev malzeme bi saya pêwendîdanîna psîkanalîst pêk tê ku xwe jî bi kartêkî di nav wê pêwendiyê de saz dike” (20). Ji bo vê jî mînakê balkêş dide, diyar dike ku pisporên qelbê ne mecbur in ji qelbê xwe emeliyat bibin, lê psîkanalîst mecbur in ji analîzê derbas bibin (20). Di vir de jî nivîskar ev tiştî kiriye, vebêjera xwe ji hundirê vegotinê saz kiriye. Bo mînak gelek caran di seansên psîkanalîzan de ji derekî pê ve ji ber ku analîst jî perçekî wê rêwitiya analîzê ne, ji aliyê analîzanan ve têne “îdealîzekirin” ango ji hişsaziya analîzanan de şûna “tişteki” digrin. Di van diyalogan de em dibînin ku vebêjerê çîrokê dibêje “meriv dibêje anuha ne psîkologek e, meriv dibêje qey jineke weke hemû jinan e”. Di vir de psîkolog dikeve şûna dayikê û eyn wek ku di jiyana rastîn de di analîzê de pêk bê, saz dibe. Bo vê yekê jî mînakê balkêş dide Habib. Li gor Habib dema analîzan, analîst xwe bixe şûna bavê xwe, analîst nabêje “ez ne bavê te me, ez analîsta te me”, ji dêvla vê yekê listokê didomîne (20). Ev fahma analîstan li gel vebêjer jî peyda dibe.

### **Ber bi (ba)kûr ve**

“Çima berê min li wê derê ye, çima ewqas bi lez dajome wir, kesek pê nizane...tenê em herdu pê dizanin: ez û Xwedê” (7). Leheng diyar dike ji bilî wî û Xwedê kes pê nizane. Dema em van ji devê leheng dibîhizin, wek tiştên bêhemdî diqewimin, raste-rast em berê xwe didin derhişê. Hêj di peyvên ewil de nivîskar berê me dide derhişê.



Bakûr cihê reva nivîskar e. Ji Kurdistanê ber bi welatekî “bakurî” ve koç kiriye. Em dizanin ku welat dayik e. Dema ji diya xwe qetiyaye ji bo rehetiya derûniya xwe ango bi zextên derhişa xwe berê xwe daye bakur. Ev ji bo nivîskar xwendineke biyografîk e lê balkêş e ji bo leheng jî cihê revê bakûr e. Îcar dema em bifikrin ku perçeyê welatê ku jê reviyane jî “bakur” e, bakurê Kurdistanê ye. Yanê ji bakur her ber bi bakurtir ve direve. Ji diya xwe her û her ber bi dayikek din ve direve da ku li wir bihewe. Bi çûyîna bakur re hem dixwaze ji pêsîra diya xwe bireve, hem jî bi awakî paradoksî dixwaze vegere wir. Di pirtûka xwe ya bi navê *Doğum Travması* (Trawmayê Zayînê) de Otto Rank diyar dike ku keştî, vagon, erebe, fayton şûna dayikê digre û li gor wî “derhiş, veqetînê, rêwitiyê, heta ku mirinê jî encax wekî bicihanîna arezûya vegera malzarokê dikare fahm bike, lewra jê pêv arezûyeke dîtir nas nake û nikare taswîr bike” (81). Berê çûyîna wî jî girîng e. Bi ku ve diçe? Li gor Otto Rank di xewnan de hemû livên bi pêş de wekî (paş)vegerînê tê dîtin (81).

Her ku ji diya xwe, ji welatê xwe bireve jî tu carî ji girêka odîpûsî ji fantaziya mêtina pêsîrê xelasiya wî nîne. Em di xwendina metnê de hîn dibin ku piştî mirina diya xwe çav berdide cîrana xwe ya bi navê Bodilê, ji ber ku memikên wê jî wek ên dayika wî ne. Lê li wir Bodilê bertek nîşanî wî dide, bi wê bertekê re fahm dike ku şerm çî ye (Superego).

Bakûr yek ji hêmaya dagirtina şûna dayikê (şûngir) ye, Bodilêya cîrana wan re jî em dibînin gelek jinên “xwedî pêsîrên wek a dayika wî” şûna diya wî digrin. Yek ji van jî bi awakî sembolîk Fadîme Şahîndal e. Ji xwe leheng bi awakî zelal vê yekê diyar dike:

Şeva çûyî... wek ku katib dibêje, “îro dayê mir. Belkî jî do bû, ez nizanim.” Lê do Fadîme radikirin, Fadîme Şahîndal. Wêneyê wê bi pêşiya tabûta wê ve şidandibûn. Baş tê bîra min porê dayê jî weke porê wê reşekî bi ser more ve bû. Ku Fadîme hinekî kej, hinekî bilind û hinekî jî tijetir bûya... ew ê rasterast dirûvên dayê bida. Hîn jî bi sedemên mirina dayê nizanim. Lê dayê ji zû ve miriye. 11-12

Di seansa psîkologê de em hîn dibin ku bi kuştina Fadîme Şahîndal re birînên wî yên dewisandî cardin rû dane. Îcar dema daxwaza reva wî ya ber bi bakûr li pey mirina Fadîme Şahîndal rû dide, em dizanin ku Fadîme Şahîndal şûngira diya wî digre. Axaftina bi psîkolog re ev tişt dertên holê. Em pê re pê derdixin ku heya bi temeneke mezin pêsîra diya xwe mêtîye, ne bi tenê ew, li gor gotinan “pêsîra” diya wî bûye belayê serê diya wê jî. Dayika wî jî wek Fadîme Şahîndal hatiye qetilkirin. Û di vir de rola pêsîrê girîng e. Ji ber daxwaza ku hinek pêsîra wê bimêjin dayika wî ber bi mirinê ve çûye. Îcar yek ji wan objeyên arezûya dayikê jî leheng bixwe ye, ew bi xwe, xwe yek ji wan sedema qetlbûyîna dihesibîne, xwe tewanbar hîs dike.

Di vir de şûngira dayikê gelek girîng e. Lewra em dibînin ku leheng tu carî ji girêka odîpûsî nafilite. Bi gelek tiştan re dixwaze şûngira dayikê peyda bike, yanê şûna dayika xwe dagire. Metafor û sembolên jorîn hinek ji wan bûn. Lê bi awakî metonomîk jî

dayik daweriviye hemû sazûmana metnê. Memik metonomiya dayikê ye û ji xwe bi awakî peyvnasî û dengnasî jî di navbera memik û dayik (mom, mum, mama hwd ev deng di gelek zimanan de peyda dibin) analojiyek heye. Dema behsa memikê dibe rasterast dayik tê bîra me wiha ku carina rêgeza metonomiyê jî xera dibe. Em dizanin ku dema perçe tevahiyê bîne bîra me, ango perçe şûna tevahiyê bigre metonomî ye ev huner. Lê di vir de perçe him şûna tevahiya dayikê digre him jî cihekî jê mezintir digre. Em vê yekê ji gotinên leheng (pê)derdixin: “Ku îro jî dayê bi hîkmetek îlahî ji gornê rabe û ez wê bibînim, dibe ku ez wê nas nekim, lê ku ez bêhna pêşîrên wê hîs bikim, ez ê bibêjim dayê ev e” (12). Pêşîr bi awakî eşkere him cihekî dayikê digre him jê zêdetir e. Di vir de xwendineke antropolîjîk jî dertê holê ku ew jî ne dûrî psîkanalîzê ye. Zarok dema çarlepki dimeşe û laqê diya xwe dibe pêşîr piyê diya xwe dibîne (bingeha fetîşîzma piyan) dûre dixwaze xwe bigihîne kana (ve)xwarinê. Zarok bi vê armancê re radibe ser piya (û helbet bi fîzyolojiya mezinbûnê) û ev çûyîna ber bi memikan ve heya dema “ji ber şîr dibe” didome, pê re jî objeya arezûya kesane ber bi objeyeke rastîn ve diçe. Di vê çîrokê de em dibînin zarok di vê xelekê de asê maye, wekî girêkek li derûniya wî hatiye pêçan nema kare xwe jê rizgar bike.

### Xwekuştin

Di derûniya mirovan de xwekuştin rewşeke sînorî ye. Şerên di navbera ID û Superegoyê de hingî tahde û zextan li Egoyê dibe, takekesê di bin van de dixwaze bi xeweke abadîn xwe aş bike, bikeve xewa rehetiyê. Di vir peyva herî balkêş “abadîn” e. Lewra derhiş tim wekî metafor tiştên ku dişibe “abadînbûnê” bi kar tîne. Di metnan de behr, asîman, xew hwd. Tiştên bi vî rengî piranî ji aliyê rexnegir û analîstan ve wekî sembolên derhişîn tînin xwendin. Em vê yekê di çîroka “Pêşîra Dayê” de di rêveçûna lehengê xwe de dibînin. Ew di xew(n)a xwe de dizane ku ber bi bakûr ve diçe û di destpêka çîrokê de wiha dibêje “[j]i vir û ber bi bakur jî êdî tişt nîne, jê û pê ve meriv nîne, civak û şênî nîne. Tenê deryayên cemedîn hene” (7). Di vir de em hem daxwazên derhişîn hînin dibin (abadînbûn), hem jî sedemên revê hebki zelatir dibe. Lehengê me dixwaze biçe cihekî ku “meriv, civak û şênî” nîn be, yanê sansur û medeniyet nîn be, yanê Superego nîn be ku ew tiştên dijmêre bi zagonên xwe zextê li Egoya wî nekin, bila di qada derhişê de hêmanên derhişîn hespên xwe xweştir bibezînin. Hespên bê bînin bi ku de diçin? Li gor Otto Rank “fikra mirinê ji serî de bi fikra vegera malzarokê ve hatiye pêçan ku ew jî bandoreke xurt ya hezî [coşî, kêfxweşî] pêk tîne” (*Doğum Travması*, 41).

Çawa ku bi hêmanên derhişîn desthilatiya hişê wî dikin û wî ber bi (daxwaza) xwekuştinê ve dajon di heman demê de tiştên li hemberî daxwazên xwekuştinê jî wî ber bi aramiyekê, ber bi başbûnê ve dajon. Li vir divê dijkevaneke paradoksî bê vekirin ku daxwaza mirinê jî daxwazeke aramxwaz e. Bes tengasî û gengeşiya di navbera hêmanên derhişîn de aramiya mirovan dikujin. Dika ewil, ango epîzoda

ewil xew(n)a wî ye di wir de ji daxwaza “ciheke bêmeriv, bêcivak û bêşênî” li ciheke “bimeriv, bicivak û bişênî” yanê li nexweşxaneyekê bi dawî dibe. Di epîzoda düyemin de jî dîsa psîkolog roleke wiha digre. Di her du epîzodan de doktor/psîkolog cihê Superegoyê digrin. Derman di destê Superegoyê de ye. Lowma dawîya dawî ji dêvla xwekuştineke abadîn, xwekuştineke (raketin) dem bi demî yanê xew û îlûzyona xwekuştinê, dermanê xewê (propovan) didê psîkolog.

### Ji pêsîrên dayê ber bi memikên Melanie'yê

Di ferhenga psîkanalîzê de “memik” her çiqas di asta oral de bala gelek analîstan kişandibe jî, ji bo sazkirina têgehên “hesûdî û spasdariyê/minêkarî (bi ing. envy and gratitude)” herî zêde bikêrî Melanie Klein hat ango herî zahf wê ew “sermemikan” di çavê me de rakir. Di kitêba xwe ya bi navê *Haset ve Şükran* de teoriya xwe ya bingeşînên li ser van têgehên li ser “avakirina memikên baş” saz kir.

Berî ku em derbasî ferhenga Klein bibin, em guh bidin hin jêderkên di pêşgotina vê kitêbê de wê gelek baş be. Lewra di wir de Saffet Murat Tura balê dikşîne ser cudahiya di navbera Freud û Klein de û ev yek jî di ferhenga psîkanalîzê de cihê Klein destnîşan dike. Li gor Tura, ajok/zext (drive) a di Freud de, di Klein de dibe navajo (instinct) ev yek jî bi “Rastî”yê re tê girêdan (8). Li gor veguhastina Tura, teoriya Fruedian xwe dispêre astengkirina ajokan, bi astengkirina ajokan re Rastî dertê holê. Di ya Klein-de fantazî û îmajên mîna penîs, memik hwd. ji destpêkê ve heye û her berê wan bi Rastiyê ve ye (10).

Di xwendina Klein de navenda teoriya wê li ser memikê saz û ava dibe. Lê hin têgehên navxweyî hene, him ji tiyorîzekirina hin hestan (hesûdî, dexesî, çavbirçîtî) heye. Objeya hundirîn bi awayekî binyadî di hundirê hişsaziya mirovan de amade ye, lê hin obje jî hene ku ji derva tên dikevin nav derûnê, tên daxilandin ew jî “objeyên daxilandî” ne. Ev ji bo karîgeriya derûniyêke asayî tişteki baş e. Li gor veguhastina Tura xerabiya hundirîn bi daxilandina objeyêke derveyîn tê aştkirin (9). Klein jî di mijara objeya ewilîn de giringiya vê karîgeriyê dike. Objeya ewilîn memika dayikê ye, tatkiliya pê re wek me got xala bingeşîn a tiyoriya Klein e û li gor Klein di asayîbûna derûniyê de xala herî girîng ew e ku objeya ewilîn a daxilandî dema di EZê de baş bê rehberdan, dê hîma pêşveçûneke çê bê dayîn (20). Dabeşkirin yek ji têgeheke gîring a vê mijarê ye, bi dabeşkirinê re objeyên baş û xerab (bi memika baş û xerab ve tên temsîlkirin) dizên, ev jî objeyên qismî ne. Di vê demê de hêmayên paranoid û şizoid dertên. Ji bo derûneke asayî zêdebûyîna objeyên xerab bi veberhênana objeyên baş re tê aştkirin û ev du obje yekbûyîna xwe bi parastina hebûnên xwe re didomînin. Ev rewşeke dualî ye, rastiyeke dualî ye ku li gor veguhastina Tura Klein vê têgeha “ambivalence”ê wekî “asta herî mezin a mirovahiyê” (12) dibîne. Lewra li gor veguhastinê, hesta sûcdariyê û ûjdanê ne ji tirsê cezaxwarinê tê, objeya ku êrîşkarî berê xwe dayê

di heman demê de objeya hezkirinê ye, ev jî rewşeke “ambivalence” e. Dabeşkirin ku li vir cihêkî girîng digre esil wek sazûmana parastinê tê pêşkêşkirin, sazûmana duyemîn jî hembûna<sup>1</sup> vebeyandî ye (yansîtmalî özdeşlik, projective identification). Ev têgehên hanê di ferhenga psîkanalîzê de di bin sîwana “têkiliya objeyan” de tîrî nîqaşkirin.

Neha jî em bîr ser mijarên hestî û tîkiliyên wan ên objeyî. Hesûdî di bin ajokên anal-sadîst û oral-sadîst de derbirîneke rûxîner e. Dema tiştêkî ku mirov daxwaz dike di yekî de peyda bibe, hêzê bide xwediyê wî tiştî ajoka hesûdiyê dixwaze wî tiştî xera bike, qirêj bike. Dema memikê dayikê bi zorê bi dest dixwe pê namîne, xerabiyên li dayikê (memik) dike, pîsî (mînak gû) dike, bi vî yekê re afrîneriya dayik diherifîne. Hesûdiya zêde nîşana derûnên paranoid û şizoid in. Mehrûmî û kê-mêtinê şîr dibe ku hesûdiyê pêk bîne lewra têrbûn (memika baş) hêza jînê ye, afrînerî ye; berovajîya wê birçîbûn tirsî mirinê zêde dike, rûxîner e. Bi hembûneke hundirîn (daxilandî) birçîbûn dikare bê çareserkerî û afrîneriyê saz bike. Di vir de şerê li hemberî “tirsê” (tirsî mirinê) di afrîneriyê de hîmeke girîng digre.

Di dexesiyê de kesekî sêyemîn dikeve navbera kesên hezkirî û kirdeyê. Di vir de xerabî-pê-kirin tune ye, “başî” jî hêla yekê din ve hatiye girtin. Çavbirçî(tî) jî dixwaze kirdeyê hişyar bike, lê belê têrbûn ne pêkan e, jî pêdiviya kirdeyê zêdetir, tim zêdetirî daxwaz dike (ne “dixwaze”). Dixwaze bi mêtinê diya xwe biqedîne, lewra daxilandinê rûxîner e. Dibe ku jî gumana li hember bav pêk bê, bav wek ku memikê dayik direvîne tê dîtin.

Têkiliya memikê di psîkanalîzê de bengîniya li doz, mirov û nirxan jî saz dike. Li gor Freud jî bextewerîya (ji) memik-mêtinê pêşmînaka têrbûna cînsî ye û ev yek jî dike ku hesta yekbûyîna bi mirovan re li mirov peyda bibe. Li vir spasdarî û comer-dî dertê pêşberî me, bi daqûrtandina ango temsîlkerîna objeya baş re. Memik dibe du beş; objeya baş û xerab. Di destpêkê de ev dabeşbûn tiştêkî baş e lewra derfeta avabûna “ambivalence” diguncîne. Lê dema bidestxistina objeya baş jî ber hesûdiyê pêk neyê obje tê mengîkirin (idealîzekirin). Di heman demê de em dikarin wiha jî lê binêrin, dema ku objeya baş (ewilîn) bi awayekî ewle û serketî saz nebe mengîkirin wekî sazûmanê parastinê dertê holê. Mengîkirina zêde nîşana tirsî tahdeyê ye, yanê mengîkirin jî tirsî tahdeyê pêk tê. Memika mengî (ideal) berovajîya memika rûxîner e.

Demê di derûniya mirovan de memik xala herî girîng be di laşê dayikê de, lazim e di laşê zarokan de cihê herî girîng jî dev be, ango berovajîya wê jî rast e giringiya dev (ji bo xwarin û domandina sazûmana jîndariyê) giringiya memikê bi xwe re ava dike. Di ramana Klein de hesûdî rê li ber têrbûna oral digre, daxwazên oral bi vî yekê re berhêlî genîtalê dibin. Ev yek pîranî di averêbûn û bixweşabûnên hingof de tîrî dîtin.

1 Ev têgeha “hembûn” hebekî di bilêvkirin û bikaranînê de xerîb xuya dike, lê di etimolojîya giraniya “identity” li ser “şibandîn, hevûn, hembûnê” bû lowma min jî wekî hembûn bi kar anî.

Ev berhêlî bûn, ji daxwazên oralî ber bi yên genitalî ve di rewşa asayî de giringiya memikê kêmkirî dide. Hesûdiya penisê, yek ji têgehên bi nav û deng a psîkanalîzê ye, Klein vê yekê jî bi hesûdiya memikê ve girê dide, hebki pêştir dajo xemsariya cinsî bi aciziya ji penisê ve girêdide û diyar dike ku bingeha wê jî reva ji objeya ewilîn e.

Dema mirov di ramansaziya Klein de li şeweyên parastinê binêre, Klein heşt xalan pêşberî me dixê; mengîkirin, reva ji dayikê, objeya şungir (ev dibe ku bibe navgîna reva ji nefreta dayikê), her dijarastin bi demê re dirûva bînirxkirina objeyê digre, bînirxkirina EZê (bi taybetî tîpên depresîf), çavbirçîtî, halandina hesûdiyê di kesên din de, hestên hezkirinê têk diçin pê re nefret har dibe.

Ji bo dermana asayîbûna derûnê ji Klein sazûmana xwe digihîne “dewisandinê”. Em bînin bîra xwe sazûman têkiliya objeyan çawa li dar diketin. Dabeşbûn (pêvajoyeke şizoid û paranoid) memikên baş xerab pêk tîne, ev dabeşbûn di rewşa depresîf de, yekbûyîna xwe saz dike (ambivalence), di sala dûyemîn de jî dewisandin pêk tê. Dema ev dewisandin pêk tê, nayê wê mahnê ku wekî ku mirov miriyan binax bike. Cihê binaxkirina zext û ajokan ji hişsaziyê xwedan derî ye. Gornên hişsaziyê bi derî ne, û carinan tiştên binaxkirî vedigerin. Xebata asayîbûnê him bi dewisandinê dişuxile him jî di şûna dewisandiyan de tiştek bi cî dike. Memikokan em bînin bîra xwe, zarok ji bo dev ji şîr berde şûna memikê digre. Bala libîdoyê diçe ser objeya şungir; ev obje dibe jîndar be dibe şênber û heyber be. Fetîşîzm bi vê hêla xwe ve dunirxî ye, him hêla baş heye ku avakar e, şûna tunebûnê dadigre lê ji hêlekê ve jî rûxîner tam têrbûnê pêk nayne wek ku pêk tîne dide xuyakirin. Li ser vê çîroka me em bibêjin. Dema diya wî dimre, serê pêşî Bodê bala wî dikêşîne. Memikên Bodilê û Bodilê bi xwe şûna dayikê digre. Dûre ew daxwaz hêj pêk nayê yanî têr nabe hildiweşe. Piştî çûna welatê Bakur, heya wê xewna ku çîrokê pê dest pê dike em nizanin, lê ji çîrokê diyar dibe ku bêhna dayikê û memikên wê li ser bûyera Fadîme Şahîndal ji wê deriyê dewisandî vegeeriyaye.

### Encam

Psîkanalîz jî wekî bizav û teknîkên din ên rexneyê gelek caran qalibên hazir dide, klîşe û şablonan ava dike. Qalibên wê dema mirov ji dûr ve lê binêre vezelokî dixuye û ev yek wekî ku li jor me mînakê wê da her kes piçekî jê haydar e, dema serê xwe datînin ser qada vê dîwanê mêr bin dibêjin “ez ne aşiqê diya xwe me”; jin bin dibêjin “ez ji kîrê mêran nahesidim”. Zewaca di navbera psîkanalîz û vegotinê de çî roman çî film be, ji destpêka serboriya psîkanalîzê vir ve heye. Lîsteyên romanên psîkanalîtîk, filmên psîkanalîtîk tene çêkirin. Piraniya van berhaman berhemên populer in, bala rexnegir û ramangeran nakşînin. Lê wekî ku Freud berhemên Dostoyevskî dest nîşan dike, berhemên ku wê qadê dewlemendtir dikin, fikr û şewazên psîkanalîstan xurttir dikin hene. Bi min qedrê berhemên Hesênê Metê jî bi vê rengî ne. Bi vê yekê



re em li vê çîrokê binêrin, bi şêwaza xwe re (vegotina Ezê, lêzêdekirina diyalogan û naveroka diyalogan), hîlbijartina mekanan (nivîn, erebe, nexweşxane, nivîsgeha psîkolog) re hêla xwe ya teknikî baş ava kiriye. Li aliyê mijarên xwe û tevna wê ve jî naverokê bi awakî lihevhatî lê kiriye. Bi termên psîkanalîzî, rêwitî, çûyîna ber bi bakur ve di hundirê erebê de, bi lez arezûya vegera malzarokê ye; bi bûyerekê mîna kuştina jinekê, zextên dewisandî berdidin û yê dewisandî vedigerin pozîsyona berî hişî; bipaşveçûyîne re demên têkiliya objeyan dertê pêşberî me; pê re memikên baş ku leheng pê têr dibe û pê dilîze dû re jî memika nebaş ku dibe sedema mirina dayikê. Di her asta van têkiliyan de şerek di navbera ID û (Super) Egoyê de pêk tê ku piranî bi sazûmana şûngiriyê tê çareserkirin/taloqkirin. Li vir jî di encama ewqas keftûleştan de arezûya mirinê, aştbûna abadîn bi mirineke biçûktir bi dermanan tê beralîkirin.

---

#### ÇAVKANÎ

Habip, Bella. *Psikanalizin İçinden*. Çapa 2. Stenbol: Yapı Kredi Yayınları, 2012.

Hesenê Metê. “Pêşîrên Dayê”. *Pêşîrên Dayê*. Çapa 2. Stenbol: Weşanên Peywend, 2014

Rank, Otto. *Doğum Travması*. Wer. Sabir Yücesoy. Çapa 1. Stenbol: Metis Yayınları, 2001.

Tura, Saffet Murat. “Editörün Önsözü”. *Haset ve Şükran*. Niv. Melanie Klein. Wer. Orhan Koçak û Yavuz Erten. Çapa 3. Stenbol: Metis Yayınları, 2011. 7-13.

# Kuştina Ciwanekî: AAron Swartz

BİLAL ATA AKTAŞ

*Dizî bi eslê xwe tişteki çawa ye? Kî ye diz, kî ji ku tişteki bidize em jê re dibêjin dizî? Diz dizê kê ye? Aya armanc e ya ku bingeha têgehan diyar dike an nêt e ku bexta kiraran zelal dike? Aaron Swartz, gava ku xwe li odeyekê dikuje agira van pirsan carerêk din hat dadan. Ev çîrok çîroka wî ye.*

Li kurikekî bifikirin, bi emrê xwe yê 26 salî darqîtkekê dixwe pergala înternetê ya Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê. Li heman kurikê bifikirin ku hê di 3 saliya xwe de bi tena serê xwe hînî xwendin û nivîsinê bûye.

Eynî kurik hê nebûye 13 salî lê belê bi navê theinfo.com sîteyêke înternetê çêdike. Di vê sîteyê de kî agahiyeke çawa bixwaze dikare li ser mijarekê zêde bike û gel jê sûd werbigre. Ji cîkî nas tê ne wisa? Lê na, wikipedia hêj li holê tune ye di wan çaxan de. Sal 2001 û Aaron vêga 15 salî ye, kompîtir û înternet êdî tiştên her giranbûha ne di jiyana wî de. Tu dibînî geh ji bo konferansekê lê dixwe diçe bajarekî dûr û ber, geh li mala xwe ye û bi saetan dikeve pey fikr û zikrên nû yê alema rawêjî.

Sal li pey salan digindirin, xortê nû-simêlbadayî pêşengiya hereketên cûrbicûr dike ku tev jî bi awayekî girêdayî poîtîkayê, daxilî meseleyên binîqaş in.

Sixûrî ji bo her dewletê karekî heyatî ye. Ev yek ne tenê ji bo şopandina welatên dijmin lê belê ji bo kontrolkirina welatîyên xwe jî girîng e. Êdî bi saya înternetê mirov bi her tikandina xwe rêçeke xwe li ser behra sixûriyê zêde dike. Diyarkirina cihan, ecibandinên me, şîroveyên me, sîteyên ku em ketinê, tev bi şiklekî tê qeydkirin û li benda roja xwe ya ku xwediyê rêçê reş bike disekine. Beriya înternetê, diviya dewlet

---

---

---

---

---

---

---

bêtir xîret bikira da ku derheqê welatiyan de agahiyên kêrhatî bi dest bixe. Lê niha heman karî welatî bi xwe dikin.

Digel vê yekê, nesînorbûna dewletê her li dar e. Dewlet dixwazin bêtir agahî peyda bikin. Li aliyê din jî kesin hene ku li hember vê yekê têdikoşin. Aaron Swartz jî yek ji wan e. Di meha mijdarê ya 1986an de li Şikagoyê ji dayik dibe. Mabeyîne du birayên xwe ye. Ji biçûktiya xwe ve eleqeya xwe bona kompîtîrê çêdike û emrê xwe yê kurt jî li ser heman tiştî diborîne. Lê bihurandina wî ne bihurandineke pasîf û “bêzerer” e. Bi armanca ku zanyariyê ji pawana dewlet û şirketên mezin derxe rêyeke dûr û dirêj hildibijêre.

Bi ya min tişteki girîng e ku mirov dinyayê wek ku çawa ye qebûl neke... Ez her tiştî pirsyarî dikim, bi awayekî zanistî nêzî wan dibim, tiştên ku ez hîn dibim demkî ne û ji bo guherîne vekirî ne, dibe ku bi vedîtînen nû werin betalkirin. Li gorî min heman rêbaz ji bo civakê jî derbasdar e. Dema ku min ferq kir ku di bingeha civakê de pirsgirêkên cidî hene, têgihîştim ku xwe li nedîtîne danîn ne mimkûn e.<sup>1</sup>

Ji bo gihîştina vê armanca li jor, bi navê [watchdog.net](http://watchdog.net) û [openlibrary.com](http://openlibrary.com) du sîteyên înternetê vedike. [Openlibrary.com](http://Openlibrary.com) derheqê pirtûkên heya niha weşandî de agahiyên sereke dihewîne, mîna; filan kitêb kengî li ku derê hatiye çapkirin, bêvan pirtûk li ku derê heye, gelo bi deyn stendin pêkan e yan na...

Swartz qeyda xwe li Zanîngeha Stanfordê çêdike ku yek ji zanîngehên hêjatirîn e. Salekê li wir civaknasî dixwîne lê pê qayîl nabe. Piştî salekê teklîfa karekî jê re tê û yekcar dev ji zanîngehê berdide. Sîteyeke di ava dike û piştî salekê qedera 1 milyon dolarê wê difiroşe. Ecêb e ku di emrê xwe yê 19an de vê pereyê jî jiyana wî pîrr naguherîne. Aaron odeyekê piçûçik ji xwe re peyda dike û xebatên xwe didomîne.

Aaron Swartz dixwast zanyariyê bi awayekî belaş têxe xizmeta raya giştî. Çi hat serê wî jixwe ji ber vê yekê bû. Di 2009an de Swartz, binikê ragihandinê ya bi navê PACERê ku aîdî mehkemeyên Amerîkayê yê federal e, hack dike û ji bo gihîna xelkê diweşîne. Zêdetirî 18 milyon belge bi vî awayî bêpere digihîje xelkê. Welatiyan ji bo gihîştina qeydên mehkemeyan diviya pere bidaya û ev sîte bi kar baniya. Salane qezenca PACERê xwe dabû 120 milyon dolarê. Yanê tişteki ku di qanûnên dewletê de jî diviya belaş bûya niha serê salê dikir 120 milyon dolar.

---

1 Ji inglîzî: Yusuf Eldemir

Helbet Aaron xwe li nedîtîne danayne û tiştê ku li gorî xwe diviya bikira dike. Lê belê Swartz bi vê kiryarê bala FBIyê bêtir dikişîne ser xwe. Êdî ji bo dewletê kesekî bi talûke ye. Şopîna ser Aaron wî gelek ditirsîne. Lê belê Aaron dev ji azadiya bidestxistina zanyariyê û gihîna serbest bernade.

Di vê germ û geşedanê de îjar bala Aaronê şîrketên qerase dikişîne ku gotarên akademîk bi peretî dixin xizmeta kesan. Aaron neheqîyeke mezin dît li vir. Li nik wî, çawa pêkan bû ku hemû agahiyên mirovatiyê ku heya niha bi êş û elemên cûrbicûr hatine parastin û wek mîrate gihîştine me tenê di destê çend şîrketên mezin de bin? Aaron vê yekê qebûl nake.

Akademîsyenan piştî xebat û cehdên xwe ji ber ku gotarên xwe bigihînin xwîneran gotar didan wan şîrketên mezin. Bi vî awayî piraniya gotaran bere bere diket bin pawana çend şîrketên sereke. Yê ku dixwestin sûde ji van gotaran bigirin, neçar diman pere diherikandin van deran. Yanê xizanekî ji Kamboçyayê heke pere nedîta egera gihîştina wî ya bona van gotaran tunebû.

Aaron ji bo guhertina vê pergalê gava xwe ye yekem avêt. Cara ewil bi sîstema MIT<sup>2</sup>yê dikeve JSTOR<sup>3</sup> û dest bi daxistina gotaran dike. Piştî demekê hewldana Aaron tê ferqkirin û wî asteng dikin. Dûre rêyeke din dibîne. Li jêrzemîna MITê dikeve odeya datayê û sererast kompîtira xwe girêdayî sîstemê dike û dikeve sîstemê. Li vir jî wî ferq dikin lê pê nadin hesandin, di şûna wê de kamerayên nehênî dixin odeya ku Aaron done(data) jê dadixe û bona dewayeke xurt peyt û çespan tov dikin... Paşê Aaron tê girtin...

***Aaron Swartz tiştên ku dadixist dizî nedikir, nedifirost û bi peretî belav nedikir. Lê pê çi dikir? Bersiva viya diviyabû ji bo dewletê. Hege Aaron hackerekî ji rêzê bûya ku tiştê dadixist difiroşe, dê rayedarên dewletê bi ihtîmaleke mezin çend sal ceza lê bibirîna û tazmînatek jê bixwastana. Lê belê Aaron ew nedifirost. Tiştêkî talûketir dikir: Bêpere pêşkêşî raya giştî dikir.***

Piştî encama teşqeleye mezin, Aaron bi sed hezar dolar kefarete serbest tê berdan. Lê gavên wî li ser hev in, vêga tiştêkî nû derdikeve pêşiya wî ku divê li hember têbikoşe: Pêşqanûna SOPA<sup>4</sup>

Ev pêşqanûn heq dida şîrketan ku bêyî pêvajoya dadgehê sîteyan asteng bikin û heta ji google bidin jêbirin. Bes ku hinceta wan bînpêkirina mafên telîfan bûya.

2 Massachusetts Institute of Technology: MIT. Yek ji zanîngehên herî navdar û serkeftî ye DYAyê ye.

3 JSTOR: Bi navê xwe yê tam Journal Storage (Arşîva Kovaran). Ji bo gotarên akademîk platformek e.

4 SOPA: Stop Online Piracy Act (Korsaniya Onlayn Rawestîne). Pêşqanûna Parlemantoya Nûneran a DYAyê ye ku 26ê Cotmehê 2011an de ravebûye.

Gava ku ev pêşqanûn tê tezekirin derbasbûyîna wê wek misoger tête hesibandin. Piştî vê yekê, têkoşîneke tûnd û tûj dest pê dike navbera terefan de... Dûre tiştêkî nû diqewime, hêvî hêdî hêdî zîl dide û Qesra Spî daxûyanîyek dide û ku dijberiya xwe li dijî vê pêşqanûnê nîşan dide. Paşê wikipedia serrûpela xwe tarî dike, paşê reddit.com<sup>5</sup>, craigslist.com... Di nava 24 saetan de dijberên vê pêşqanûnê li Parlamentoya Nûneran ji 31î dipeke 101î û pêşqanûn wek pêşqanûn dimîne.

Piştî vê bûyerê Aaron tê ser hemdê xwe. Xwebaweriya xwe cardin qezenc dike, zîndîbûnek tê û li ser rih û canê wî vedinîşe. Li rex wî têkoşîn asteke pîrr mezin derbas kiriye. Lê ev serkeftin pîrsgirêkek jî bi xwe re tîne: Aaron êdî bêtir talûke ye bo dewletê.

Mehkemeyên DYAê îdianameya berê betal dikin û di dêvla wî de yeka nû amade dike û sûcên nû lê zêde dikin. Çîroka xwekuştina Aaron Swartzê jî ji vir, ji cihê ku maye, dewam dike û di 26 saliya xwe de li Broklynê di apartmana xwe de xwe dadiliqîne û dimire. Bavê wî di cenazeya wî de wiha dibêje: Aaron ji aliyê dewletê ve hat kuştin.”<sup>6</sup>

Di behiya wî de îdolê wî, Sir Tim Berners-Lee<sup>7</sup> wiha şîn digire:

Aaron mir.  
Gerokên vê dinyayê delodîn,  
Me yek ji rûspiyên xwe, zanayê xwe wenda kir.  
Hackerên li dû rastiyê! Em yek kêr bûn,  
Me yek ji xwe wenda kir,  
Ey nêrewan, guhdarwan, hemû malbat,  
Me zarokek ji dest da!

Li jêrê hûn ê manîfestoya wî ya ku dilê têkoşîna wî xulase dike bibînin.

#### **Manîfestoya Bidestxistina Serbest – Gerilla<sup>8</sup>**

Zanyarî hêz e. Lê wek hemû cureyên hêzê, kesin hene ku dixwazin wê ji tenê ji bo xwe bi kar bînin. Hemû mîrata zanistî û çandî ya cîhanê, ku bi sedsalan e di kitêb û kovaran de çap bûne, her ku diçe tîr pencekîkirin (digitize) û berbendkirin ji aliyê çend şirîkeyên xusûsî ve. Tu dixwazî nivîsên ku cî didin baştirîn encamên zanistî bixwîni? Divê tu meblaxên mezin bişîni ji weşangerên wek Reed Elsevir re.

Hin hene tédikoşin ku vê biguherînin. Bizava Bidestxistina Serbest bi wêrekî şer dike piştrast bike ku zanyar mafên xwey çapê nakin bin hukm lê dikin xebatên wan li ser înternetê bîn weşandin di bin şertê ku herkes karibe bi dest bixe. Lê di rewşa herî baş de jî,

5 Yek ji avakarên vê sîteyê Aaron bi xwe ye.

6 [https://ku.wikipedia.org/wiki/Aaron\\_Swartz](https://ku.wikipedia.org/wiki/Aaron_Swartz)

7 Di sala 1989an de sîstema www ava kir û ti heqê telifê nexwast ji bonê, bêpere pêşkêşî raya giştî kir. Bi saya wî ye ku hemû torên înternetê niha girêdayî hevdu ne û em dikarin lînkên jevre bişînin.

8 wer. ji îngilîzî Yusuf Eldemir



hewla wan tenê wê ji bo neşrên dahatuyê derbasdar be. Lew ên berê wê tev ji kîsê me biçe. Bedeleke zêde dixwazin ji me. Akademîsyenan bêgav dihêlin ku incax bi heq karibin xebatên hevpişeyên xwe bixwînin. Hemû çavkaniyên kitêbxaneyan êsken (scan) dikin lê dihêlin xelk wan tenê ji ser googleê bixwîne. Gotarên zanistî dabîn dikin lê ne ji bo zarokên cîhana sêyem lê ji bo kesên di zankoyên bijarte yên Rojavayê de dixwînin. Ev tev neheqî ne û nayên qebûlkin.

Gelek kes dibêjin “Rast e. Lê em karin çî bikin? Şîrîkeyan mafê çapê kirine bin destên xwe, meblaxên zêde qezenc dikin û ev bi temamî qanûnî ye. Tiştêk tune ye ku em karibin wan bisekinînin.” Lê tiştêk heye ku em dikarin bikin. Tiştêkî ku jixwe ji zû ve tê kirin; em karin li dijî vê derkevin.

Ewên ku xwe digihênin van çavkaniyan – xwendekar, kitêbxanevan, zanyar – takemafek dane we. Hûn xwe têr dikin di nav şahiya agahiyên de lê derî ji yê din re girtî ye. Lê divê hûn vê takemafê di bin destê xwe de nehêlin – a rast, aliyê exlaqê ve hûn nikarin. Hûn berpirs in vê bi cîhanê re parve bikin. Û hûn bazîrganiya şifreyan dikin bi hevpişeyên xwe re, daxwazên hevalên xwey bo daxistina nivîsan dipejirînin.

Vê navê de, ewên ku li pişt deriyên mane, vala nasekinin. Di qûlan re hûn bi dizîka derbas dibin, xwe di ser çeperan re davêjin, agahiyên ji aliyê weşangeran ve kilîtîkirî xelas dikin û bi hevalên xwe re parve dikin.

Lê ev çalaki tev bi dizî û bin erdê de dimeşin. Ji vî karî re dibêjin dizî an korsanî, wek ku parvekirina zanîne bi talankirina keştiyekê û kuştina personelên wê re yeksan be ji aliyê exlaqê ve. Lê parvekirin ne bêexlaqî ye – divêtiyeke exlaqî ye. Tenê ewên ku bi çavbirçitiyê kor bûne wê nehêlin hevalên wan kopyeyekê derxînin.


Şîrîkeyên mezin helbet bi çavbirçitiyê kor bûne. Lew zagona ku di bin de kar dikin vê ferz dike li ser wan – şîrîkên wan dê bixeyidin ger para wan kême keve. Û siyasetvanên xwefiroş piştewaniya wan dikin, qanûnan datînin bo wan ku hêzeke derker bi dest xîna da ew bixwe biryarê bidin bê ka mafê kê li ser kopîkirinê heye.

Ti edalet nîn e di bidûketina qanûnên neadil de. Wext e êdî em hişyar bibin, di kelepora gewre ya bêîtiyaya sîvîlan de dijraberiya me eşkere bike li dij van dizên çanda gel.

Agahî li ku kilîtîkirî be divê em bi dest xîna, kopîyan jê çêkin û bi cîhanê re parve bikin. Xebatên ku derveyî mafê çapê mane divê em kom bikin û jê arşîvekê çêkin. Divê agahî-dankeke (database) bidizî bikirin û wan bavêjin ser tevnokê (web). Divê em kovarên zanistî daxînin û li torên parvekirina dosyeyan bar kin. Divê em şer bikin bo Bidestxistina Serbest –Gerilla.

Li seranserê dinyê, bi têr-hejmareke mirovan ji me, em ê ne tenê peyameke xurt bişînin li dij xwemalîkirina zanîne, heman katê de em ê bikin ku ew tişt di raboriyê de bimîne. Tu yê tevî me bibî?

**Aaron Swartz**  
**Tîrmeh 2008, Eremo, Îtalya**




Pirtûkeke berdest:

## Mehrdad R. Izady, *Kürtler*

Hin berhemên ser dîrokê ji naverok, nasname û agahdariyên xwe wêdetir bi tesir û hêza guhertina nêrîna xwendevanê xwe bêtir qîmet digrin. Di navbera xwendin û xilasbûna kitêbê de mirov ne tene di warê zanînê, di warê hîssiyatê de hati-be guhertin, an nêrîna mirov li dîrokê bi awayekî eşkere hatibe guhartin ew dem mirov dikare bêjê kitêbeke serkeftî ye.

Li ser dîroka kurdan gelek pirtûk hene hin ji van xebatên şexsî hin jî yê dezgeh û xebatên akademîk in. Helbet gelek kurd ji ber valahiya derbarê dîroka Kurdistanê dabigrin dest davêjin van kitêban dixwînin. Ew agahdariyên tepîsandî, zanîna di bin kontrola neyar û akademîsyenê nîyetxirab, derewker, bi zanîna dîroka ku jê re hatiye qedexekirin dixwaze hilweşîne. Mixabin gelek caran xwendina van kitêban zikê hutê nêrîneke seqet têr dike. Ev hût ji nêrîn û tezê serdestan mutesekkîl e, serdest di nava hin hêmayan di nava çemberekî de li kurdan dinhêre, çiqas nivîskar dixwaze vê beravajî bike dawiya dawî de ew jî tezên serdestan dubare dike. Loma gelek kitêb û gotarên ser kurdan de kurd dîsa xayîn, dîsa nezan dîsa paşverû tèn nişandan, pênûsa van nivîskaran bi awayekî mehçûp tenê sedemên paşverûtiyê nişan dide wek îddîa dike ku wiha wiha nebûya kurd jî dê baş bûna piranî jî bi anakronîzmeke amator. Ev hewldana bi niyeta dijderketina epîstomoljiya serdest dawiya dawî de bi awayekî din xwe dide der.



Mehrdad R. Izady,  
*Kürtler*,  
weşanxaneya Doz,  
Stenbol, 2004.

Li hêla din tezên serdestan nivîskar an dîroknasan aciz dike her tim xwe dixwe bîra wan, lê ne agahdariyên dîroknas ne lêkolînên wî ne jî hissîyata wî têr nake van tezan bi awayekî îlmî jixwe bawer binpê bike, ew jî di nava formeke nepîxî de hewariya xwe dibe ber gotinên qerase, tiştên nebûyî, pesindaneke ne ji milkê îlmê lê ji hêrsê. Kurdan ji hemî nebaşî, nezaniya dişû hew pesin penda dide heya ji lêkolîneke baş wêdetir dibe dîroknasekî propagandaîst an amator.

Ev cûre berhem berê pir bûn nûiha hêdî hêdî kêr dibin. Taybetiya kitêba Mehrdad R. Izady jî di vir de dertê holê ne tenezûlê pesnê bêbinyad dike ne jî poz bi tezên serdestan dike ne bi komplekse kêmdîtîne tevdi gere Xwebawerî (Ev yek ji zanina wî ya kûr tê) hezkirineke xwezayî, di çarçovaya îlmî de dîroka kurdan dinivîse. Loma gava kurdek serî heya dawî kitêbê dixwîne ew herdû tezên kirêt bi şeweya wî ya kemilî bi agahdariyên wî balkêş hildiweşe ew dem bê astengî dikare li xwe li dîroka xwe binere.

Kurdek di serî û dawîya xwendina pirtûka Mehrdad R. Izady de ne yek e, gava bergên kitêbên hat girtin jixwebaweriyê mafdar li rih canî wî diale, plan û projeyên afirîner nav serî de diçe tê. Loma ev kitêb dibe bibe kitêbeke berdest di her mala kurdan de hebe. Ev hissîyate serbilind û mafdar di xwendina dîwana Cîzîrî de jî li min peyda bibû. Ev hissîyat ji kurdên bakur re pir lazim e belkî ev yek dikare kurdan ji qîrêj û enkaza pişaftinê, ji nêrînên seqet bişo.

Kitêb ne tenê ser dîroka xwerû disekine ji musîk, erdnigarî, sosyolojî, siyaset hunera kurdan hemî bi awayekî kurtasî peşkeş dike. Van beşên zanîne jî bi sentezeke homojen bi penaseyên kêrhatî rave dike. Xerîte ku di kitêbe de cih girtine jî dehan lêkolîn û gotaran re bûne referansên xurt. Xwezî ev xerîte wek kitêbeke cuda bibin etlesek. Jiber van yekan navê kitêbê “Kitebeke Berdest” e. Dixwaze wêneyêke giştî der heqe kurdan de bide.

Îzady di zaningeha Harwardê de akademisyenêkî pir navdar e. Diya wî belçîkî bavê wî kurd e. Ev çend sale deng jê nayê mixabin. Bi ya min ger we heya niha nexwendibe teqez bi vê kitêbê dest bi dîroka kurdan bikin. Derfet hebe mirov vê kitêbê bi riya qampanyayan bigihîne her malê kurdan lewra berhema Izady elifbeya zanîna kurd û Kurdistanêye ku we carekî bi vê berhemê derî vekir hûnê xwe nav per û pêlên dîroke qedîm, gelekî şanaza çandêke dewlemend bibînin, hem dîroka serdestê kurdan a xedar zelal dibe hem jî bi agahiyên hurgilî bi lêkolîneke zor ciwan nêrina kurdan a navmalî û seqet bête guhertin.

# MEKANÊ TEMSÎLA RASTEQÎNIYÊ: Sînemaya Dokumanter a Kurdî li Tirkiyeyê


İLKNUR BİLİR

Ji TIRKÎ: KÜBRA SAĞIR-YUSUF ELDEMİR

Bi editoriya Can Candanê ku li zanîngeha Boğaziçiyê akademîsyen û derhênerê filmên *3 Saet* (2008) û *Zarokê Min* (2013) e û Suncem Koçera ku li zanîngeha Kadir Hasê akademîsyen e, çavkaniyek nû ya akademîk di warê xebatên kurdî de zêde bû. Kîteba *Sînemaya Dokumanter a Kurdî li Tirkiyeyê*; bi binnavê *Estetîk û Polîtîkaya Berxwedan û Nasnameyê (Kurdish Documentary Cinema In Turkey-The Politics and Aesthetics of Identity and Resistance, Cambridge Scholars Publishing, 2016)* bi beşdariya gelek kesên hêja derket holê. Di vê kîtêbê de sînema weke warekî xebatê ya zanistên civakî jî bi gelek lêkolînan û di forma babeta kifşê derdikeve pêşberî me. Ev rewş ne tişteke nû ye lê li gor vê kîtêba ku ji xebateke înterdîsîplîner pêk tê ji bo sînemayê fikirîneke nû lazim e. Wusa xuya ye kesên ku li ser sînemaya kurdî difikirin û dixebitin wê ji vê kîtêba ku ji aliyê akademîsyenên ji beşên cuda hatiye nivîsandin sîd wergirin. Ji ber vê di vê nivîsê de ji nivîsandina dîroka sînemaya dokumanter a kurdî bêtir hewl didim kesên ku li ser xebatên kurdî, sînemaya kurdî, netewe-borî dixebitin fikreke wan li ser vê kîtêbê hebe. Ez dixwazim balê bixşînim ser girîngiya kîtêbê ya ji aliyê kulliyata sînemaya kurdî û binê çend pirsên ku di vê mijarê de bîn pirsîn xêz bikim.

## Nîqaşa filmên kurdî

Hunera sînemayê ya ku dinya weke hunera heftemîn bi nav dike, ji dêvla ku rasterast dînamîkên sedsala ku tê de pêş ketiye bigre, mecra û medyayek e ku dikare heyama ku em tê de dijîn biguherîne û di bin bandora xwe de bihêle. Sînema weke mecra yek teyîda hebûna neteweyan çî îfade dike û kîjan dînamîk neteweyîbûna sînemayê pêk tînin, mijara nivîseke din e. Li vir ji bo pênaseya dokumanterên kurdî cihê



**Kurdish Documentary Cinema In Turkey-The Politics and Aesthetics of Identity and Resistance, Cambridge Scholars Publishing, 2016**

xwe bigre weke ku editorên kîtêbê di destpêka wê de pirsîne divê mirov pêşî bipirse ka filma kurdî çi ye. Wexta bersiva vê pirsê bidin, diyar dikin ku sînema jî di nav de, di her warî de mirov divê nirxên siyasî û çandî yên kurdan bide pêş çav û bi vî awayî bibersivîne. Ji ber ku kurd civakeke bêdewlet e taybetmendiyên xelkekî netewe-borî nîşan didin; ev jî di berhemên wan, sînemaya wan de tê dîtin. Li ser mijara gotina sînemaya kurdî û em ê kîjan filman wek filmên kurdî bi nav bikin, ne sînemager ne jî kesên ku di akademyê de dixebitin li hev nekirine lewra hilberînekî pir-netewî û diyaspora jî di nav de sînemayekî netewe-borî li holê ye.

Beriya ku di ser vê kîtêbê re li nîqaşa filmên kurdî kûr bibin, pirsê di nav qada sinemaya li Tirkiyê tê afirandin sînemayek kurdî ya derengmayî heye an na tê pirsîn. Di nivîsa min de sînemaya Tirkiyeyê dê wek alternatîfa têgeha sînemaya tirk ya yekrengparêz û bi zîhnîyeteke netewperest hatiye afirandin bê bikaranîn.

Wexta em di çarçoveya teoriya sînemaya netewî de li qada sînemayê ya li Tirkiyeyê tê afirandin dinerin, em dibînin ku weke Benedict Anderson di *Imagined Communities* de tîne ziman, tiştê ku me bi hev ve girê dide hebûna jêparên me yê hevpar in. Ne ji wan be mirov nikare bifikire ku kesên li zeman û mekanên cuda bijîn ji bo hev xwediya heman nirxan bin û ji bo van nirxan şer bikin. Têgeha ku em dibêjin netewe, çêkirî ye, hewl dide ku nirxên civakî û çandî yê hevpar li ser piyan bimînin. Wexta em gotinên Anderson ji bo têgeha sînemayê difikirin, ziman û nasnameya sînemayê ya neteweyî bi armanca afirandina neteweyekê heman rê û rêbazan dişopîne û ji wan xurt dibe.

Sînemaya kurdî ji kîjan filman pêk tê, taybetmendiyên ku filmekî dike filmeke kurdî û yê ku vê senifandinê gengaz dikin çi ne, kîtêb fikirîna li ser van pirsan û ji bersivan bêtir dîtina nêrînekê ji xwe re dike armanç. Di temamê vê lêkolînê de dixwazin pirsên we hebin, weke edîtoran jî di beşa pêşwazîkirinê de diyar kiriye kîteb ji bo zêdetir rê li pirsan veke hatiye nivîsandin.

### **Estetîk û polîtîkaya nasname û berxwedanê**

Heke mirov ji binnavê kîtêbê dest pê bike navlêkirin an jî pêvajoya binavkirinê ji bo fehmkirina ka xebata destê me çi li derve dihêle çi di hewîne gelek serbendan dide me. Wexta em bi baldarî li binnavê *Estetîk û Polîtîkaya Nasname û Berxwedanê* hûr dibin em dibînin du xemên sînemagerên kurd dema kişandina filmên xwe gelek xweş rave dike; nasname û estetîk. Kurdan, piştî 1980yî di nav qada sînemaya li Tirkiyeyê tê afirandin de ji madûnbûnê wêdetir warekî temsiliyetê nedîtine. Nasnameya kurdan di salên 1990an de, piştî avakirina Navenda Çanda Mezopotamyayê an jî NÇMyê dû re jî bi Konservatûara Aram Tîgran û Navenda Çanda Cegerxwînê derbasî qadeke xweser bûye û hilberîna çandî ya kurdan zêdetir bûye. Vê zêdebûnê hem ji aliyê çendaniyê hem jî çawaniyê xwe pêşî di sînemaya kurdî de nîşan daye. Derhênerên wek Kazim Öz, Huseyîn Karabey, Ozkan Kuçuk yê ku filmên ewil ên sînemaya kurdî çêkirin, di atolyeyên NÇMyê de perwerdehî dîtin û niha jî di hilberîna sîne-



maya kurdî de cîhekî wan ê girîng heye. Sînemaya kurdî mijarên ku ji xwe re kiriye mîsyon; nasnameya kurdan û nivîsandina dîroka nefermî, polîtîkaya nasnameyê û sînemaya kêmaran dihewîne. Wexta afirandine, polîtîkayên nasnameyê xera kirine û derveyî nasnameya kurdan a asîmîlebûyî, xwe li ser “ne Tirkbûnê” terîf nekirine lê di warekî netewe-borî de ya ku di nav dîrok û çanda kurdan re derbasbûyî terîf kirine. Di vê terîfkirinê de em dibînin ku hêza herî çalak di sînemaya dokumanter a kurdî de ye. Li ser vê mijarê, beşa çaremîn ya kitêbê, nivîsa Ozgur Çiçek ya bi navê *Arşîva Fîktîv: Çêkirina Sînemaya Kurdî Li Tirkiyeyê (The Fictive Archive: Kurdish Filmmaking in Turkey)* weke destpêk dikare bê xwendin. Di vê beşê de weke Çiçek jî diyar dike, ji bo xirakirina dîroka fermî ya ku sînemagerên kurd ên dokumanter xwe tê de nabînin, beriya her tiştî dokumaterekî hîlbijartiyê ku bargiriya rasteqînê dike û warê temsîlê pêk tîne. Li aliyekî din, di vê beşê de nivîskar nîqaşa dokumanter û fîktîvê li ser belgefilma *Du Ziman û Baholek* (Orhan Eskîkoy û Ozgur Dogan, 2008) dinirxîne; dokumanterên ku derdikevin derveyî kevneşopiyê ji rasthatina hêmanên tengker bêtir wek amrazeke nû ya vegotinê tînin.

Sînemaya kurdî ya ku di nav qada sînemaya li Tirkiyeyê tê afirandin de ji nasnameya madûniyetê bêtir hebûna xwe bi awayekî ji rastiya xwe siyasî ne dûr, bi temaya berxwedanê re pêş ve biriyê. Di dokumanterên kurdî de polîtîkayên fehma dewletê ya netewî, ya ku hemû hêmanên etnîk bertaraf dike di ser tevgera siyasî ya kurd re bi gelek dokumanteran nîşan da. Beşa bi navê *Nêrîneke Giştî ya li Dokumanterên Kurdî yê li Tirkiyeyê (Kurdish Documentaries in Turkey: A Historical Overview)* dinamikên derketina sînemaya kurdî ya li Tirkiyeyê ji NÇMyê heta Mîhrîcana Filmên Kurdî ya Londonê bi awayekî berfireh rave dike. Beşa ku li ser dahatûya sînemaya dokumanter a kurdî jî ciheke piçûk dihewîne, bi nirxandineke sînema, estetîka berxwedanê û hebûnê diqede.

### **Cihên temsîlî ên rastiyê, dokumanter**

Ku em çavekê davêjin beşên din ên kitêbê em dibînin ku kurd dokumanterên rastîn dinivîsin da ku dîroka yekalî ya ku ew bi zanebûn piştguh kirine, telafî bikin.

Di kitêbê de bi tevahî 12 beş hene. Beşa dawî deşifreyê gotûbêja 17mîn Visible Evidence Conferenceê (Konferansa Dokumenta Berçav) e ku li ser sînemaya kurdî çêbû. Ger em bi nav bikin kesên ku bi berhemên xwe tevkariya vê kitêbê kirine; Ali Fuat Şengül, Lousie Spence, Aslı Kotaman Avcı, Özgür Çiçek, Ayça Çiftçi, Zeynep Yaşar, Josh Carney, Kevin Smets and Ahmet Hamdi Akkaya, Nagehan Uslu Selvelli û Alisa Lebow e ku dibaceya gotûbêjê amade kiribû.

Dema em li van 11 beşên cihê dinerin em dibînin bo sernavê giştî yê kitêbê beşa Ali Fuat Şengül guncaw e, bi navê xwey “Bi Kurdî Vegotina Rastiyê û Tomarkirina Heqîqetê: Pirsyarîkirinek li ser Polîtîkaya Dokumantarên bi Kurdî” (Speaking Truth, Recording Reality in Kurdish: An Inquiry into the Formal Politics of Kurdish-Language Documentary Films). Di vê beşê de Şengül li rastiya ku sînemagerên kurd temsîl

dikin dipirse û vedibêje sînemager, ku li vir ew bixwe di rewşeke kêmarîyê de ne, bê ka rastiya ku bi derfetên dokumanteran re çêdibe çawa dikin yek bi jiyana kirdeyên dokumenterê re. Dema kêşana dokumentarê de, ew lê dikole bê ka sînemager çawa têkilî datînin bi kirdeyên nav qeydê re. Dokumentar herçiqas rastiye tîne zimên jî ev rastî kirdewar e û ji şexs û nirxdaraziya wê/wî ne cihê ye lewma jî ev beş li ser rastiya dokumentarê û li ser rastiya şexsî hûr dibe. Gotarake din a ku li ser vê mijarê disekine ya Zeynep Yaşar e bi navê xwey “Niqaşa li ser Rastiye Berovajî: Bersivên Rexneyî li Metota Dokumantera Çavdêr a *Du Ziman û Baholek*” (Negotiating Clashing Truths: Critical Responses to the Observational Documentary Mode in On the Way to the School). Yaşar, ku di gotarê de vedibêje bê ka 2Z1B dikare rastiye ku angaşt dike bi serkeftî bîne zimên bi rêbaza xwe ya ku derveyî metota dokumantera çavdêr a bastan (conventional) e, dike ku pirsin di serê me de bimînin.

Sînemaya dokumanter wek amûrekê tê bikaranîn bo rapêşkirina rastiye û ev kiriye dokumanter bibe warekî girîng bo dîroknûsîna alternatîf. Gotara Lousie Spence û Aslı Kotaman Avcı, a bi sernavê “Olanên Raboriyê; Polîtîkaya Rastiye di Dokumentarên Guvah de” (Echoes of the Past: The Politics of the Truth in the Talking Witness Documentary), pêwendiya zeman, çavdêrî û rastiye ya bi dokumentarê re vedikole jî ser dokumentera Çayan Demirel a bi navê *Hepsa Nimra 5a* (5 No’lu Cezaevi). Wek di gotarê de jî tê gotin dokumantera *Hepsa Nimra 5a*, bo ku meriv fêhm bike bê ka piştî derbeya 1980î çî jiyane însanên ku wê li cîkî din rastî hev neyên, xwendineke alternatîf a li ser dîrokê dide bîneran. Dokumentar, ku xwe dispêre bîranîn û hevpeyvînên mehkûman -ku wê demê di *Hepsa Carbekir a Nimra 5a* de mane, amûrekî girîng e da em bibînin hiş û dîroknûsîn rastiyeke fîktîv di nav xwe de dihevine. Gotar destnîşan dike ew bîranîn û agahiyên ku demeke sext de di bîra meriv de çêdibin –Foucault vê wek bîra dij (counter memory) bi nav dike – meriv kare di dokumantera *Hepsa Nimra 5a* de yekser raçav bike.

Piştî ku ji ser hin gotaran me xalên giştî ên kitêbê derxistin holê meriv kare li ser kitêbê qala van xalan jî bike: Kitêba *Sînemaya Dokumanter a Kurdî li Tirkiyeyê* (Türkiyede Kürt Belgesel Sineması) pirsra “Dema ku Kurd dest bi sînemê dikin, bo çî pêşî bi warê dokumanterêyê dest pê dikin?” jî xwe re dike destpêk û dike ku em li ser babetên wek ciwankarî, siyaseta nasnameyê û siyaseta ciwankariyê bifikirin. Di Konferansa Dokumenta Berçav de Kazım Öz gazinin kiribûn jî ber sedema ku akademî dereng mabû li ser sînemaya kurdî bifikire û nîşanî me dide bo ku em bibînin çavkanî çiqas hindik in di vê babetê de. Lewma ev xebata Can Candan û Suncem Koçer dibe çavkaniyeke girîng û berfireh bo gelek akademîsyen û sînemagerên vê beşê.

#### ÇAVKANÎ

Can Candan, Suncem Koçer, *Kurdish Documentary in Turkey; Politics and Aesthetic of Resistance and Identity*, ed. Cambridge Scholar Publishing, 2017.

Benedict Anderson, *Imagined Community*.

---

---

# A B S T R A C T S

---

---

## **Islamic Revivalism and Kurdish Nationalism in Sheikh Ubeydullah's Poetic Oeuvre**

**KAMAL SOLEIMANI**

This article investigates Sheikh Ubeydullah of Nehri's Kurdish -Islamic revivalist project based on a close reading of his *Mesnewi*. This article primarily focuses on the fusion of the Sheikh's Islamic revivalism with his Kurdish nationalism in his poetic work. A close reading of the *Mesnewi* leaves no doubt that in the mind of his author both the future of Kurds and that of his revivalist project depended on the creation of an independent state.

**Keywords:** Kurds, Ottomans, Islam; religious-nationalism, state.

## **Modern Islamic Political Thought, "Islamism" and Nationalism**

**KAMAL SOLEIMANI**

This paper theorizes the nexus between "Islamism" and nationalism, showing that neither nationalism nor religion(s) can be studied in isolation. I argue that Islamism is unable to conceive of a political system beyond the nation-state and appears to have internalized the political boundaries imposed by the discourse of the nation-state. Such internalization, in turn, affects the Islamist understanding of umma and similar 'universalist' concepts. My paper insists on a keen attention to the context in the analysis of religious interpretations. Despite elements of continuity in religious thought, contextual influences transform the practice of religious interpretation and mark it with temporal specificity. Muhammad Iqbal (1877 -1938) once noted that "the task before the modern Muslim is, therefore, immense. He has to rethink the whole system of Islam without completely breaking with the past." However, such a rethinking is not homogeneous and bears the mark of interaction with particular socio-historical contexts; religious thought in the era of nationalism was affected by its context as much as it affected the context itself. This dialectic manifested itself as reciprocity and mutual entanglement. In this paper, I explore these entanglements and reciprocities of nationalism and Islamism.

**Key words:** Islamism, nation-state, *umma*, islamic revivalists

## **Guardians of Natin Versus Guardians of Tradition**

**SHARO I GARÏP**

Theoretical domination by sovereigns turns ethnicities and peoples into corpses, then proceeds to perform an inquest on them. The nationalism of dominant nations attributes the terrible sorrows and costs of ethnic wars to the vague general curse of nationalism in

the name of universalism, while at the same time attempting to cover up their own crimes and preventing oppressed nations from taking the stage. Dominant nationalism thus entails a process of dispossession/uprooting and loss of cultural identity. The plundering of nations and cultures is a perfect example of this; cultures which have been shackled in chains are seized and subsequently banished from civilization.

Nationalists of oppressed nations are the guardians of their traditions and cultures; in the event of their failure, cultural depredation occurs, and the history of the plundered culture is always written by the dominant culture. The struggle of tradition to be rescued from museums of anthropology and ethnology, which have been turned into ethnic graveyards by the guardians of the dominant nation, is not due to an interest in antiquity on the part of the oppressed, but is rather the struggle to protect their freedom.

**Keywords:** Ethnicity, nation, identity, nationalism

### **Kurdish Language and the Unconscious of the Subject**

#### **BEXTIYAR SECADÎ**

The present paper seeks to closely explore the direct relation of language to the unconscious of the subject. There is a close association and a one-to-one relationship between language and the unconscious. Language constructs subjectivity and Identity construction is thus argued to be mostly conducted in terms of language acquisition process. Linguistic alienation is considered as a highly crucial stage in the formation of the subject's identity. Correspondingly, in the present study attempt is made to demonstrate the representation of Kurdish language in the identity of the Kurdish subject. The article argues that three major affiliations between Kurdish language and identity include the significance of the privileged past as compared to the unprivileged future in both Kurdish language and identity, lack of individuality in the words and thus in identity, and the predominance of natural sounds including onomatopoeic words in Kurdish language, and natural elements and tendencies in the Kurdish subject.

**Key Words:** Language, identity, the unconscious, linguistic alienation, identity construction.

---

---

---

---

---

---

---

---

**The Analyses of Bakhtinian Concepts in ‘Mir-E Nowruzi‘ Based on  
Carnival Concept  
KHOSRO SINA**

This present article tries to analyze Mir-e Nowruzi ceremony as a form of street theater and resistance theater based on Bakhtin’s carnival concept. To achieve this goal along with explanation of Bakhtin’s thoughts in construction of carnival concept and reference to concepts such as polyphony, laughter, grotesque bodies and actionery philosophy in a comparative reading, the present study is also dealt with howness of formation and representation of these concepts in ‘Mire Nawrouzi’ street theater. The results showed that these concepts have had an effective role in giving identity to the social political theater of ‘Mire Nawrouzi’ and it could be interpreted as a form of carnival with a social and political function. The researcher mean that each of actor- audience of the play has his/her separate individual define character that simultaneously is able to affect and be effective by the other characters of the play. Furthermore, each person hears the speech of the others and each, inevitably forms the other’s characterizations the participants in this play are viewed as a totality who are able to resist and change the status quo of his/ her own & the others and this effectation is achieved through the Bakhtinian concepts.

**Key words:** Bakhtin, carnival, Mir Miran, Mire Nawrouzi, street theatre.

**Representation of Turks as “Others” in the Novel of *Gundikê Dono*  
AZİZ TEKİN**

Several works on the reproduction of reality in literary works - in particular the production of identity, image and imagination - were leading the way of the work done here. As it is widely known, the creation of “the other” was the most effective way to reproduce and establish a specific reality firmly. In this work, we are taking a closer look on the representation and imagination of the Turkish in Mahmut Baksi’s novel *Gundikê Dono* (The Village of Dono). This novel is carrying traces of the time, place and society it was written in and thus provides the opportunity to take a different look at the society’s collective memory, from which the novelist takes its ideas from. We will analyze the novel and its specifical image creation by its humiliating, excluding or including approaches to the other’s physical appearance, ways of dressing, housing, attitude and belief. All this will be explained with the help of the examples given in the novel.

**Keywords:** Image, imagination, collective memory, identity, othering, unconsciousness



---

---

---

---

---

---

---

---

**“Pêsîrên Dayê” and a Suckling Man**  
**FERZAN ŞÊR**

Since psychoanalysis set its own theoretic and practical construction on narration of people, this narrative journey establishes a strong bond between the genre of literature and psychoanalysis. Undoubtedly, the narrative genre of literature through act of their authors who try to understand and show their deepness of their characters' psychology, did a psychoanalytic job too. In Hesenê Metê's shorty story named “Pêsîra Dayê” (Breast of Mom) we can exactly observe this cooccurrence of narration and psychoanalysis. The psychoanalysis and the literature have lots of multiple and diverse elements. We can call the “breast” as a major element of them in the story. Through the reading of the story we can observe the deepness of character's journey to unconscious from a car to the north; from dreams to the psychoanalytical sessions. We see in the period of from desire of suicide towards therapy how the bad breasts of childhood come to the surface of conscious as a result of an incident and turns a man to a suckling child.

**Keywords:** Trauma of birth, object relations, substitute objects, Hesenê Metê, Death drive

کتابخانه

## KURTEJIYANA NIVÎSKARÊN VÊ HEJMARÊ

**Bilal Ata Aktaş:** Di sala 1993yan de li Mûşê ji dayik bû. Ji dibistana seretayî heta lîseyê li Mûşê xwend. Di sala 2015'an de di 8. Pêşbaziya Çîrokan a Abdullah Duran a Egîtîm-Sena Amedê de xelata yekemîniyê girt. Di 2016an de di filma Huseyîn Karabeyî ya bi navê *Ûç Kuruş* de asîstaniya Derhênera Hunerê kiriye. Demekê li Zanîngeha Kolnê ya Almanayê perwerdehî dîtiye. Nivîs, xebat û wergerên wî di çendin kovar û sîteyên înternetê de hatine weşandin. Ji 2016an vir ve edîtorîya kovara *Barê* dike. Niha li Zanîngeha Stenbolê, di fakulteya zanistên siyasî de siyasetzanî û têkiliyên navneteweyî dixwîne.

**Îlknur Bilir:** Di sala 2016a de li Zanîngeha Boğaziçiyê Beşa Ziman û Wêjeyên Rojavayî lîsansa xwe qedandiye. Niha li Zanîngeha Bilgiyê Beşa Sînema û Televizyonê de lîsansa bilind didomîne. Teza wê ya masterê li ser sînemaya kurdî de jin û berxwedanê ye. Babetên li ser dixebite sînemaya kurdî, sînemaya netewe-borî û antropolojiya dîtbarî ye. Li Medyascope.tv de pêşkêşî û edîtorîya bernemaye "Sinemasalî" dike. "Köz Film"de asîstaniya produktur dike.

**Sharo I Garip:** Fakulteya Zanistên Siyasî ya Zanîngeha Enqereyê xilas kiriye. Li Almanayê Zanîngeha Kolnê di beşa aboriya giştî de lîsans xwend. Mastera xwe li heman zanîngehê liser siyaseta pere ya Banka Navend a Ewropayê nivîsand. Doktoraya xwe li Zanîngeha Kolnê di Zanista Siyasî ya berawirdkî de derbarê pevçûnên etnîk ên li welatê Bask û Kurdistanê de kir. Wek lêkolînerê mêvan li Norwecê ma. Piştî ku serdemeke li Îngilîstanê, di beşa sosyolojîya zanîngeha Wanê de ders da. Xebatên wî liser neteweperwerî, etnîsîte û pevçûnên etnîk didome. Email: sharohurri@yahoo.de

**Bakhtiar Sajjadi (Bextiyar Secadî):** Li Rojhilatê Kurdistanê bajarê Sinê di sala 1976an de hatiye dinyê. Akademisyen, nivîskar û wergêr e. Li Sinê Zanîngeha Kurdistanê di beşa Ziman û Wejeya Îngilîzî û Zimanzaniyê de doçent e. Li ser wêjeya hevçerx û teoriya çandê û rexneyê, dîroka wêjeya britanî û amerîkî, terminolojiya rexneyî, û rêbaza lêkolînkirinê ders daye. Pileya yekem a doktorayê di sala 2007an de li Hindistanê ji Zanîngeha Pune di warê rexneya modern de pêwendîya felsefeya Nietzsche (critical philosophy) û teoriyên rexneyî, pileya duyem a doktorayê sala 2010an de ji Zanîngeha Exeterê di warê Wêjeya Îngilîzî de wergirtiye.

Hin berhemên wî ev in: *An Analytical Dictionary of Literary and Critical Terms* (Fehengi Shikaraney Zaraway Edebi) bi Mohadmad Mahmudi re, 2004: *A Glossary of Literary and Critical Terms*, (Kurdish-English, 2001, bi Muhamad Mahmudi re); *Gellaley Paradaymi Peresendini Kulturi* (2005), Editora Kurdish modern literature anthropology, 2014 (2 bergan). *Diroka Edebiyata Kurdi* (bi Farsi, 2008), *Edebiyata Kurdi a Hevcherx* (bi Farsi, 2015) Werger: *Az Roman ta Mellat: Pajuheshi dar Gofte mane Revaiye Farsi ve Kordi (Nation and Novel: A Study of Persian and Kurdish Narrative Discourse*, Hashim Ahmadzadeh) bo Farisî 2007; *Mikhayl Baxtin: Sewady Wituwej, Pekenin u Azadi, 2008 (Mikhail Bakhtin: Passion of Dialogue, Laughter and Freedom,*), wer. bo Farisî. email: [bakhtiar\\_sadjadi@yahoo.com](mailto:bakhtiar_sadjadi@yahoo.com)

**Kamal Soleimani:** Doktoraya xwe di 2014an d li Zanîngeha Columbiayê xilas kir. Babetên xebatê wî diroka îslamî û siyaseta Rojhilata Navîn e: Îran, Iraq, Tirkiye û Kurd. Li Tirkiye li Mêrdînê Zanîngeha Artukluyê û li NewYorkê City Collegeê dersên li ser diroka Îslamiyê û Rojhilata Navîn û siyaseta dane. Niha li NewYorkê Queens Collegeê doçentê alîkar e di Lêkolînên Rojhilata Navîn û Xebatên Îslamî de. Pirtûka wî *Competing Nationalisms in the Middle East* di Pûşbera 2016a de çap bûye. **Email: [ksoleimani8@gmail.com](mailto:ksoleimani8@gmail.com)**

**Nurdan Şarman:** 1986 hatiye dinyê. Lîsansa xwe li Zanîngeha Gaziyê Enqerê Beşa Tûrîzme de qedand, mastira xwe li wanê Zanîngeha “Yuzuncu Yıl”ê fakulteya Îktîsadê de kir. Li Zanîngeha Şirnexê 5 salan wek akedemîsyen xebitî. Di vê nabeynê de ser çand û folkloran kurdan sê kitêb nivîsî, di hin kovaran de jî li ser çand, antropolojî ya kurdan gotarên wê kurdî, îngilîzî û tirkî hatin weşandin. **Email: [nurdanurek@gmail.com](mailto:nurdanurek@gmail.com)**

**Ferzan Şêr:** Bi navê xwe yê fermî Taylan Şahan Tarhan, di sala 1986an de li gundê Hezyatê yê Biş-êriyê çêbû. Di sala 2010an de Zanîngeha Hacettepeyê beşa “Kewandina Fîzîkî û Rehabîlasyon”ê qedand. Li Zanîngeha Istanbul Bilgiyê di be a wêjeya Berawirdî de lîsansa bilind bi teza xwe ya bi navê “Helîm Yûsiv’in Edebi Dünyasında Beden ve İktidar (Di Cihana Edebî Ya Helîm Yûsiv de Beden û Desthilatî)” kuta kir. Di kovara *Ajdayê* de ku ji aliyê hin xwendekarên li Enqereyê ve dihat weşandin edîtorî kir. Di sala 2008an de çîroka wî ya bi navê “Min bi Perrên Kevokan Bifirrinin”, di pê baziya çîrokan a ku ji aliyê kovarên “Tîroj” û “Evrensel Kültür”ê de hatibû organîzekirin xelata yekemîniyê wergirt. Di 2009an de berhema wî ya ewil *Otopsiya Berbejneke* hat çapkirin. Çîrok, gotar û helbestên

---

---

---

---

---

---

---

wî di kovarên mîna *W*, Çirûsk, *Ajda* û *Tîroj* ê de weşiyar. Niha bi karê rexnegirîya wêjeya kurdî ve eleqedar e û li Stenbolê Zanîngeha Mimar Sinanê beşa sosyolojiyê de xwendevanê doktorayê ye. **email: [ferzansheer@hotmail.com](mailto:ferzansheer@hotmail.com)**

**Aziz Tekin:** Di sala 1992an de li Mûşê ji dayîk bû. Zanîngeha Marmarayê beşa rojnamegeriyê qedand û di ber re jî di rojname û televîzyonan de xebitî. Demeke dirêj tevli xwandinên Şêwira Xwandinê ya Stenbolê bû. Niha li zanîngeha Arelê di beşa Medya û Xebatên Çandî de master dike û xebatkarê Weşanên Weqfa İsmail Beşikci ye. Her wiha di bloga [xwe.xewname.blogspot.com.tr/](http://xwe.xewname.blogspot.com.tr/) de jî dinivisîne. **email: [tknaziz@gmail.com](mailto:tknaziz@gmail.com)**

**K I N B E Ş**

هدهو النامهى كتيب



## Konferansa Şerefname û Şerefxanê Bidlîsî

25ê Adarê li Stenbolê, li Weqfa Îsmail Beşikci, Koma Xebata Akademîk ya Bêdlîsê li ser Şerefname û Şerefxanê Bêdlîsî konferansê li dar xist. Di konferansê de piştî agahiyeke di derbarê naveroka Şerefnameyê de, sosyolog Yaşar Abduselamoğlu li ser Şerefname û Şerefxan nixandineke berfireh kir. Bi giştî hat gotin ku ku di şerefnameyê de dîroka hikumdarên Kurdistanê hatiye nivîsandin. Ligel vê bi awayekî pre-nasyonel pênasekirina nasnameya Kurdîtiyê û welatê Kurdistanê terîfkin. Weke encam serwer û dewleteke yekbûyî ya Kurdistanê tê xwestin. Di ser



şopa Şerefxan re Ehmedê Xanî Mem û Zînê nivîsandiye. Di axaftinan de Şerefxan wek bavê bîr û baweriya Kurdistan, Ehmedê Xanî jî wek mîmarê wê hat dîtin. Beşa konferansê ya girîngtirîn li ser mijara kuştina Şerefxan bû ku heta niha nedihat zanîn. Nivîsa Mistefa Dehqan, “Şerefxan Bo Çi Hat Kuştin?”, ya ku di hejmara heftemîn a Kovara Zaremayê de cih girtibû, li ser kuştina Şerefxanê Bêdlîsî agahiyên nû derxistibû. Di konferansê de ev metn weke referans hat nîşandan û nîqaşek li ser mijara kuştina Şerefxan jî hat kirin.

(Kübra Sağır)

## Aynur Doğan “Xelata Hosteya Muzîka Akdenîzê” wergirt

Dibistana Muzîkê ya Berklee ku navenda wê li Dewletên Yekbûyî ya Amerîkayê (DYA) ye ji sala 2014'an ve Xelata Hosteya Muzîka Akdenîzê dide kesekî/ê; îsal hunermend Aynur Doğan hêjayî vê xelatê hatiye dîtin. Xelat ji aliyê Enstîtuya Muzîka ya Akdenîzê ve tê pêşkêşkirin.

Dîrektorê hunerê yê enstîtuyê Javier Limon li ser xelatê wisa gotiye: “Aynur di

serdema hemû kariyera xwe de rastî gelek zehmetiyan hatiye û lêgerîna xwe bi sebir dom kiriye. Em bi vê xelatê dikin ku ew ji bo muzîkarên jin ên paşerojê bibe mînakek hêja.”

Di sala 2014an de xelat dan gîtarîstê flamenko Pepe Habichuela û stranbêje flamenko Jose Merce, bi dû re xelat dan hunermendê muzîka Antonio Serrano û efsaneyê flamenko Pepe de Lucia. Êvara 16ê meha Adarê ev xelata hêja bi merasimekê dan Aynur Doğan.

(M. Emin Cırık)



# XWENDINÊN DERBARÊ NETEWEPERWERIYÊ DE

## Kokên Netewperweriya Kurd

ed. Abbas Vali

Dibistana Muzîkê ya Berklee ku navenda wê li Dewletên Yekbûyî ya Amerîkayê (DYA) ye ji sala 2014'an ve Xelata Hosteya Muzîka Akdenîzê dide kesekî/ê; îsal hunermend Aynur Doğan hêjayî vê xelatê hatiye dîtin. Xelat ji aliyê Enstîtuya Muzîka ya Akdenîzê ve tê pêşkêşkirin.

Dîrektorê hunerê yê enstîtuyê Javier Limon li ser xelatê wisa gotiye: "Aynur di serdem hemû kariyera xwe de rastî gelek zehmetiyan hatiye û lêgerîna xwe bi sebir dom kiriye. Em bi vê xelatê dikin ku ew ji bo muzîkarên jin ên paşerojê bibe mînakê hêja."



Di sala 2014an de xelat dan gîtarîstê flamenko Pepe Habichuela û stranbêje flamenko Jose Merce, bi dû re xelat dan hunermendê muzîka Antonio Serrano û efsaneyê flamenko Pepe de Lucia. Êvara 16ê meha Adarê ev xelata hêja bi merasimekê dan Aynur Doğan.

(M. Emin Cırık)

## Netewperî û Ziman li Kurdistanê

Amir Hassanpour

Di vê berhemê de, dîroka wêjeya kurdî ligel standardkirina wê ya rastnivîsê û wêrara wê ya erkî, perwerdeyî û rojnamegeriyê tê raçavkirin ji kevntirîn çavkaniyan -helbestên hostayên wek Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û Hacı Qadirî Koyî- heta sedsala bîstem.

Kitêba Hassanpour, tevkariyeke baş li berhemên ser kurdan zêde kiriye û sentezeke hostayî ye ji materyalên heyî. Kesên ku dixwazin bibin kurdologek û herwiha yên ku dixwazin baştir fêm bikin tiştên ku li Îran, Iraq û Tirkiyeyê diqewimin, bila vê kitêbê bixwînin. (Michael L Chyet)



Armanca vê berhemê vegotina serpehatî û ezmûna kurdan e ku ev serpehatî tevkariya netewe, neteweperestî û zimên kiriye. Neteweperestiya kurd belkî ji kevntirîn bîrdoziya neteweperestiyê be di cîhana îslamê de û manendê wê tunebe û deredemî (anachronistic) be wek ku hin çavdêr destnîşan dikin.

(Ladislav Zgusta)

هه‌وێ و ئێزله‌یه‌ی

# Tevgera Neteweyî ya Kurd

Chris Kutschera

Kurd, ku di nav çar welatan de parçe bûne li Rojhilata Navîn, wê gelo yek ji wan miletan be ku qet nikaribe mafê xwe yî çarenûsê bi dest bixe? Ev gelê ku gelheya wî zêdetir e ji gelên ku îro endamê Neteweyên Yekbûyî ne û serxwebûna xwe bi dest xistine ji 1945an vir ve, wek ku ew kirine mehkûmê çarenûseke bi vî rengî. Cihê stratejîk ê Kurdistanê qismî be jî dihêle meriv fêm bike bê ka ji bo çî ew kirine bin destê xwe. Kurd di bin tehdîda dagirkeran de axên ku dilê Rojhilata Navîn e û bêrdar e ji aliyê petrolê ve, ji xwe re kirine war. Lê teqez sedemên hindurîn ên her tevgerê hene. Chris Kutschera, ku bi aktorên serreke yên drama(êş) kurd re hevpeyvînê dike

û dikeve nav arşîvên dîplomatîk ên fran-sîz û îngîlîzan, aliyên Tevgera Neteweyî ya Kurd ên kêmtên zanîn ji nû ve hildide dest û di serê Şerê Yekem ê Cîhanê de ji komeleyên polîtîk ên ewil ên Stenbolê heta tevgera General Barzanî, ji serhildana Şêx Saîd heta tevgera gerîlayî hemû raperîn, serhildan û zextan bi ye gerdûnî vedikole.



# Dîroka Neteweperweriya Kurd

Wadie Jwaideh

Kitêba Jwaidah li ser tevgerên neteweyî yên kurd wek kîtêbeke klasîk kare bê dîtin; bo vê berhemê di nav hemû xebatên ser vê mijarê de atfek heye. Ev berhema bingehîn, ku pêkhatina neteweperestiya kurd a heta 1950an, dirûv û qonaxên wê yên polîtîk hildide dest, wê tevkariyeke hêja be hem bo têngîhîştina vê pisrgirêka sûznak hem jî bo ku bibe çavkaniyeke din ser siyaseta Rojhilata Navîn. Dîroka Neteweperestiya Kurd, pêşî, di zemanên hevçerx de qonaxa guherîna tîkel a jiyana gerdîşî û dirûvên rêxistîbûna




polîtîk ronî dike. Jwaideh guherîna mezin a vê qonaxê, di nav pêwendîya qonaxên pêkhatina netewe-dewletên vê erdnî-gariyê û polîtîkayên hêzên “mezin” de raçav dike. Piştî vê qonaxa guherîna ya trawmatîk, di nêvenga Şerê Yekem ê Cîhanê û bi dû wê re, tevgerên siyasî ên kurdan û hewla wan a bo bidestxistina serxwebûnê tîkel vekolîn. Di paşxaneyê vê lêkolînê de –ku bi rêjeyêke bêhempa xwe dispêre agahî û daneyan– çand, hînbûnî û jiyana rojane ya kurdan bi berfirehî tîkel pêşkeşkirin.

## Mem û Zîn

Ehmedê Xanî

Ger dê hebûya me ittîfaqek  
Vêk ra bikira me înciyadek  
Rûm û 'ereb û 'ecem tamamî  
Hemiyar ji me ra dikir xulamî  
Tekmil dikir me dîn û dewlet  
Tehsil dikir me 'ilm û hikmet



## Mêtingeha Navdewletî Kurdistan

Îsmail Beşîkcî

“Pirsa statuya siyasî ya netewa Kurd û Kurdistanê pirsarê herî muhîm ya Rojhilata Nêzik e. Di sedsalê 20an de bi piştgirî û itîfaqê li dinyayê nîzamek dij kurdan hatiye avakirin. Hebûna netewa kurd hatiye înkarkirin. Niha binavkirina pirsgerêka kurdan wek “pirsgerêka etnîsîteyê”, “pirsgerêka kêmanan”, “bi-destxistina mafên şexsî yên kurdan li Tirkiyeyê” şaş e. Ev pênasekirina ku li diyardeya şênber re ne li hev e, rê li ber dîtina rêya rast bo çareseriyê asteng dike. Pirsgerêka Kurdistanê, xilaskirina netew û welatekî ji qirkerên, ji mêtingehiyê, ji perçebûnê ye. Daxwaza azadî û wekheviya bi netewên din re ye.”



(Kübra Sağır-Yusuf Eldemir)

## Şerefname

Şerexanê Bêdlîsî

“Berî ku dest bi nivîsandinê bike, naverokê ji mijarên ku dê li ser binivîse çêdike û li gor vê karê xwe dimeşîne. Ev naveroka kitêbê jî, li gor rewşa îdarî û serwerî ya ew malbat û mîrekiyên di derbarê wan de nivîsandiye bûye. Wan malbat û mîrekiyan dîke sê sefhe û temamê kitêbê jî dîke çar sefhe. Sefhe jî dibin beş û qisim. Şerexan dibêje: “Sefheya yekê derbarê serpêhatiyên fermanrewayên mezinên Kurdistanê de ne ku alaya saltanat û serxwebûniyê bilind kirine û dîroknivîsan ew di rêza sultanê de he-



sibandine.” Ji bo sefheya duduyan jî dibêje: “Di derbarê serpêhatiyên fermanrewayên mezinên Kurdistanê de ne ku her çendî negihîştine derceya serxwebûniyekê temam, bi xwe jî xwe hukumdar nehesibandine, lê di serbestî û azadiyê de gihîştine derceyek wisa ku hinek ji wan li ser navê xwe sikke lêdane...” Ji sefheya sîsiyan re jî dibêje: “Di derbarê hinek mîr û fermanrewayên dinên Kurdistanê de ne. Sefheya dawiyê û ya çaran jî di derbarê mîrekiya bav û kalên xwe ya Bêdlîsê de nivîsandiye. Şerexan, yekem kes e ku sînorê Kurdistanê yê coxrafîk kêşaye û bi awayekî vekirî daye xuyakirin. Dîsa yekem kes e ku bi awayekî zelal behsa qewmîyetê, hîs û ruhê kurdîyetiyê kiriyê.”



# T E M A Ş E V A N

## • HAVÎN KIYE

**Tu kî yî, dikarî bi çend hevokan behsa xwe bikî?**

Navê min Havîn paşnavê min Kiyê ye, ez di sala 1994an de li gundê Girêsor a ku girêdayî navçeya Wanê, Şaxê, ji dayik bûm. Dibistana seretayî û navîn min li Wanê xwendin. Piştî di sala 2016an de li Zanîngeha Mardîn Artukluyê, ji Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî mezun bûm. Niha jî li heman zanîngehê, di bin banê Enstîtûya Zimanên Zindî de li ser Ziman û Çanda Kurdî lisansa bilind dixwînim.

**Filmê ku heta niha tu herî zêde di bandora wê de mayî kîjan e?**

Filma ku ez dixwazim qala wê bikim, filma derhêner Dalton Trumbo ya bi navê *Johnny Got His Gun* e. Bi kurdî mirov dikare wek *Johnny Sîleha Xwe Hilgirt* wergerîne. Senoryoya vê filmê ji romana bi heman navî hatiye adaptekirin. Nivîskarê romanê di heman deme de derhêner û senarîstê filmê ye. di sala 1971ê de hatiye kêşan.

**Ji ber çî di bandora wê de mayî?**

Filmeke antî-mîlîtarîst e. Film bi gelemperî qala leşkerekî emerîkî dike. Johnny berî ku şerê cihanê yê yekem dest pê bike biryara tevlêbûna şer dide. Ji ber ku hikûmeta wê deme ya emerîkî bi propagandaya anîna demokrasîye ve dixwaze ciwanan bal bi refên şer ve bikişîne. Helbet ya ku di vê filmê de bala min kişand ne “ji bo pêkanîna demokrasîye” daxwaza şer e! Em gelek caran pêvajoya şer û mirinê bi çavê kesên mayî re dinêrin. An

zarokek bêbab, an jinek bê heval an jî dayîkek bê law dimîne û ajitasyon diçe her diçe. Li vir bûyer bi tevahî ji hestên leşkerêkî tên neqilkirin. Min got hest ne çav! Çimkî Johnny bi awayekî giran birîndar dibe û dest, ling û hin parçeyên laşê xwe yên din wenda dike. Nabinê û nikare biaxive.



**Tu dixwazî ji derhênerê filmê re çî bibêji?**

Sînema jî wek gelek qadên çandî, hunerî û edebî rêyeke xwe îfadkirinê ye. Trumbo jî hestên xwe yên li dijî şer bi rêya edebiyat û sînemayê aniye ziman. Xebatên antî-mîlîtarîst xirabî û nexweşîya şer bi awayekî xurt berbiçav dikin. Di vî warî de filmeke pir serkeftî ye siheta wî xweş.

Ji bilî vê filmê ji bo xwendevanên me tu dikarî çend filman pêşniyaz bikî?

*Aspe Du-Pa* – Samira Makhmalbaf

*Where Do We Go Now* – Nadine Labaki

**Dixwazî bi çend hevokan sedema vê pêşniyaziyê binivîsî?**

Ya rastî ji aliyê senoryoyên xwe ve bala min kişandin û jinbûna her du derhêneran jî ji bo temaşevanan wê bibe bergeheke nû.

(Kübra Sağır)

# X W Î N E R

## • MEM ARÎN

### Tu kî yî, tu dikarî bi kurtî qala xwe bikî?

Birastî jî di serî de ev pirsek gelekî zehmet e, gelo kî dikarî bêje ez xwe bi tenamî nas dikim û ez zanim ka ez kî me? Ilmê civaknasî û derûnnasîyê ev demeke dirêj e ku hewl dide insên bi awayekî giştî nas bike û pênasê bike lê hîn jî ev yek ne pêkan e. Ma ne Celadet Eli Bedirxan dibêje; “Belê dotmam heta ku mirov xwe nas dike, emrê xwe xilas dike”

De îja ez vegerim ser xwe, ez dikarim wek kurte jiyana xwe bibêjim belkî hûn min nas bikin. Ez ji gundekî girêdayî navçeya Rihayê Sewregê me. Gundê me li ber pala çiyayê Qerejdaxê hema xwe dispêre sînga vî çiyayê bi reng û deng û navdar. Gundekî mezin e ji sêsed malî û sê-çar mezreya pêk tê. Wek ku tê zanîn erdnîgarîya ku mirov lê dijî bandor û tesîra xwe li ser kesayetî, rewşa civakî, siyasî û aborî dikê, dide teşekirin. Û gundê me jî mal ava be herî zêde xwedî kevir û zinar û lat e. Ji ber wê jî çandinî pir kême û gundî debara xwe bi xwedikirina ajalan dike. Bi taybetî jî pez xwedî dikin. Ji bona wê li seranserê çiyayê Qerejdaxê hemî şûnewar û wargehê gundiyê me ne; kîjan war, bend, bîr, av, gir û best û nawalek heye serpêhatiyek gundiyê me lê hene. Ya herî gring jî belkî ew çand û jiyanê koçerîyê ye li gor min. Ji ber ku bi hatina biharê re gundiya kon û çit û alav û amur, ajalên xwe digirtin û berê xwe di da Qerejdaxa hênîk û xweş. Li vir jiyaneke gelek xweş û rengîn diborî; pez û şivan, bêrî û bêrîvan û îşqa di navbera şivana û bêrîvana de li vir bi gîyan dibû, dihate jiyîn. Şivanê bilurvan

gelekî berbelav bû hema bêjî piranîya şivana pir xweş li bilûrê didan û distran.

Heta ku payîz bi nivî dibu li wir bûn û di pê re hêdî hêdî vedigeriyan, hinek di hate gund û hinek jî ji ber şert û mercên zivistanê yê zor diçûn berîyê. Ez jî di nava vê çand û jiyanê de mezin bûm. Li gund xwendin û çuyîna dibistanê kême; yê diçine dibistanê jî nivco diçinê, gelek zarok, 3-4 heyva tenê (niha hinekî din rewş baş e) diçin dibistanê.

Ji ber ku di karê xwedikirina ajalan de birastî jî hewcedarî bi mirovan heye û zarok jî bê par namînin. Ez bi xwe jî di pêvajoyek wisa re derbas bûm ya xerabtir piştî dibistana seretayî bavê min ne dixwest ez xwendinê bidomînim salekê neçûm lê min pir dixwest ez bixwînim û ya rast bi insiyata xwe min destûra xwendinê girt û ez çûm Ameda rengîn min dest bi dibistana navendî kir. Di serî de ez şagirtê tenbel bûm jî axir me xwe bi wextê re gîhand hawala, kêmasîyê xwe temam kir. Piştî dibistana navîn û lîsê ez niha li Stenbolê di zaningeha Stenbolê de beşa hiqûqê dixwînim û di sala sêyemîn de me.

### Berhema dawî ya ku te bi kurdî xwend kîjan bû?

Berhema dawî ya ku min bi kurdî xwend pirtuka Selahattin Bulut ya bi navê *Xadim* bû, çîrokek dirêj e.

### Ji bo çî te ev berhem xwend, tiştek bû sedema hilbijartina te?

Sedemek xwe ya taybet an balkêş tunebû ya rast. Lê dibe ku pêvajoya têkilîya min û




xwendina bi zimanê kur-  
dî bûbe sedemek giştî, ez  
dixwazim hinekî behsa vê  
pêvajoyê bikim. Pêş de jî  
min got gava em li gund  
bûn em diçûn ber pez,  
şivanîye de radyo herdem  
bi me re bû. Di vê radyoyê  
de herkesî heman frekans  
guhdarî dikir: Radyoya  
Dengê Mezopotamya.

Ev radyoya ku ji heftê  
sibê heta heftê êvarê bi  
kurmanci weşan dikir, ji bo  
me hema tu bêjî tenê amûra  
ragihandin û têkilîya me ya bi cîhanê re bû  
bi taybetî jî her çar perçê Kurdistan ê. Ji kur-  
distanê heta Ewropayê herkes bi rêya telefonê  
tevlî bernameyê dibûn. Fikr û ramanên xwe  
digotin û xwestek dixwestin. Ev radyo di sala  
2011yan de navê xwe wek Dengê Kurdistan  
guherî. Bi saya guhdarîkirina radyo ez fêrî  
axaftina zimanê kurmancî ya rast bûm, bi ser  
de jî wek hişmendîya kurdbûn û kurdewariyê  
bi min re wek xeyalekî çêbû.

Di pê re wek ku min behs kir ez çûm  
Amedê di sala 2007 an de, rojekê ez ketim  
mala gel ya ku şaredariyê bi armanca pirtukxane  
û navenda xebata ji bo xwendevan  
nan çêkiribû. Min wa çavê xwe bi pirtuka re  
gerand û min yek girt li nivîskarê wê niherî;  
Mehmet Uzun. Hemşeriyê min bû û kêfa min  
jê re gelkî hat. Pirtuka wî ya *Bir Dil Yaratmak*  
(Afirandina Zimanekî) bû.

Min ew pirtuk girt û min bir wargehê  
xwend û di pê re pirtuka bi navê *Zincirlen-  
miş Sözcükler Zincirlenmiş Zamanlar* jî min  
xwend û bandorek giran li ser min çêkir.  
Mehmet Uzun bi kurtasî wisa digot; ger tu  
bi zimanê xwe edebiyatê/wêjeyê çenekî tu  
nikarî bêjî ez miletek im, ez neteweyekî bi  
serê xwe me, li hemberê înkarkirina miletê  
kurd amûra îspatê ya herî girîng zimanê me



û wêjeyek bi vî zimanî ye.  
Ji wê rojê heta îro ez bi qasî  
ku derfet hebe wêjeya kurdî  
dişopînim.

Gava ez hatim Stenbolê  
min hewl da ku kitêbfiro-  
şekî ku berhemên kurdî  
difiroşe bibînim. Li Be-  
yoğlu di kolana Îstiklalê de  
Kitêbxaneyê Medyayê min  
dit, xwedîyê wê Selahattin  
Bulut min naskir ku bist  
û pênc sala karê pirtûkfi-  
roşiyê dike. Êdî her cara ku  
rêya min bi kolana Îstiklalê

diket ez diçûm min slavek lê dida û min pirtu-  
tukek an kovarek ille tiştêk dikirî. Rojekê dîsa  
ez çûm min dît ji refikê pişt xwe pirtûkek  
derxist û li ser navê min îmze kir û gote bila  
ev jî diyariya min be ji bo te! Ji hingê de di  
destê min de bû, îja min got de dora wê hatiye  
ez bixwînim.

### **Te ev berhem çawa dît, tu dixwazî li ser berhemê çi bibêjî?**

Gotinek gelekî berbelav heye ku dibê-  
je, huner mirêka civakê ye. Û hunermend jî  
gelek caran bi vê hesasiyete tev digere. Wejê  
jî yek ji cûreyê hunerê ye û ev taybetmendî  
herî zêde di wêjeyê de xwe nîşan dide. Ev wek  
qanûnek ku nayê guhertin. Mesela tu berhe-  
meke Ehmedê Xanî bixwîne tu yê bibîne ku  
civaka kurd bûye mala çil-aqila her mîrek,  
axayek, şêxek li cihekê serweriyê dike û ye-  
kitiyê pêk naynin. Di vê pirtûkê de ji nivîskar  
dîmenekî ji civaka kurd nîşanî me dide.

De îja ez dixwazin bi kurtayî behsa nave-  
roka çîrokê bikim. Lehengê çîrokê yê sereke  
Jêhat e, ji çar zarokên Xelil Beg û Berfê yê herî  
mezin e. Û ji ber di nav rêxistinê siyasî de  
cih digre piştî derbeyekê wek gelek hevalên  
xwe tên girtin û hin ji hevalên wan derdikeve  
derveyî welêt, diçin Ewropayê.

Jêhat di girtîgeha leşkerî ya Amedê dimîne û li vê derê rastî gelek êşkence û kiryarên hovane tê, ceyranê dide canê wî, polis gelek xerabiya pê dikê, di encamê de jî ji mêrantî dikeve, piştî deh sala ji girtîgehê derdikeve lê Jêhat gelek tişt wenda kirîye û bêhêvî ye.

Dayika wî û malbat bi derketina wî gelek kêfxweş in lê Jêhat wek dîna bûye. Her du bira û xwişka wî zewicîne, dayika wî jî dixwaze bi keçika cîrana xwe Biharê re bizewicîne. Bihar ji Jêhat hezdike lê rewşa Jêhat diyar e. Dayika wî gava behsa vê mijarê dike Jêhat pir aciz dibe û dinihêre ku Berfê dev jê bernade, siwar dibe tê Stenbolê li gel hevalê xwe Hesên. Li vir jî bo nexweşîya xwe diçe textorekî lê textor êşa wî nikare çareser bike. Ji vê radeyê pê de ne ji bo mirinê ne ji bo jiyânê tu hêvîya wî nîne li hember jiyânê têkçûye. Wek ku tê zanin gelê kurd sed sal e ku dibin zext, zor û çerxa pişafînê, asimilasyonê de ye. Gelek caran rastî komkujî û kiryarê qirêj hatî ye. (Di şer de jî mixabin di dîroka cîhanê de jî gelek pratîkên qirêj wek tecawûz, êşkence û xesandin rû didin). Yek ji wa belawata jî yek derbeyê 1980 î ye. Nivîskar bi xwe jî di vê serdemê de heyst sala di girtîgeha Amedê ya leşkerî de girtî ma ye, bêguman ev serpêhatiyê bi êş jî di nava pirtukê de tête dîtin.

Li aliyê din zimanê pirtûkê gelekî sivik e û hinekî tûj e jî. Ez dikarim herî dawî vê bêjîm, bi rastî jî berhemek pir xweş bû, ji bo hemû xwendevanê wêjeya kurdî pêşniyar dikim.

### **Dixwazî tişteki ji xwediye berhemê re bibêji?**

Di serî de ez dixwazim di keseyatîya nivîskarê berhemê Selahattin Bulut de slav û hurmetê xwe pêşkêşî her kesekî/ê ji bo zimanê kurdî keviyek danî be ser keviyekî û bi vî zimanî berhem afirandin e bikim. Ku zimanê me entegreyî wêjeya dinyayê kirin e. Her berhemek ku tê afirandin hêjayê xwendinê û hilberîna kedeke mezin e. Li vir ez jî wek nivco-xwendevakî wêjeya kurdî dikarim vê

bêjîm: Pirtuka Selahattin Bulut ya bi navê *Xadim* jî yek ji wan berheman in. Pirtuk ji aliyê teknîkê ve pir serkeftî ye. Û heta tu bejî herikbar e, wek ceyranê meriv zext dibe û tu nikarî ji dest xwe berde. Naveroka wê jî wekî li jor min nişan da mijareke gring e, zext û zora li ser gelê me, bandora derbeyan ya li ser Kurdistanê, îşkencekirin (di peymanê navnetewî de yasax e lê dijmin ê me her gav ev rêbaza qirêj ji bo me xistiye pratîkê heta roja îro jî ev rewş nehatî guherandin mixabin).

Lê di çîrokê de gava ku xwendevan dixwîne tê digihîje ku lehengê çîrokê Jêhat piştî ku jî girtîgehê derdikeve tîkîliya xwe bi rêxistinê siyasî re qut dike (Jêhat bi xwe girtîyekî siyasî ye û girtîyên serdema derbeya 1980 î temsîl dike) û piştî derketinê rojekê bi hevalê xwe yê berê Cemal re hevdiîtinê pêk tîne ji hinekî behsa rojên berê dikin lê naxwaze têkeve nava rêxistinê. Ev xala dibe ku nivîskar bi zanebûn nişan dabe; belê rast e hin caran bûyerên wek derbeyan pêk tên û weke lehîyê di ser civakê re û xebat, rêxistina re derbas dibe her tiştî serûbin dike, bi taybetî jî ev bûyerên bi vî awayî li Kurdistanê bandora xwe zêdetir dide hîskirin. Gelek caran dibe sedema tunekirina destkeftîyên kurdan. Rastîyeke din heye ku em dizanin îro di zindanan de pazdeh hezar girtîyê doza Kurdistanê hene û her yek bi awayekî qehreman li ber xwe dide li ber dijmin tu carî serî natewîne û zindan kirine qada perwerdehi û peşxistinê. Tu carî jî têkçûn û pişafîn qebûl nekirine, xebatê xwe û ideolojîya xwe xurttir dikin. Li ser vî esasî gava min pirtûk xwend min pir dixwest ku legengê çîrokê yê hêja Jêhat piştî deh sala ji girtîgehê derket bila xebatê xwe yê di rêxistinê de bidomanda û bi Biharê re bizewicîya di ser de Bihar jî wek şoreşvaneke jin bila di tevgerê de cihê xwe bigirta. Lê di dawîya çîrokê de min nedixwest mesela Jêhat wek kesayetîyek politik biçe karên nexweş bike. Di dawîyê de şûna wê dimenê têkçûn e, bi dimenekî serkeftinê bi dawî biba dê baştir bûya.

(Kübra Sağır)

# G U H D A R

## • ŞIVAN KELEŞ

### Tu kî yî, tu dikarî bi kurtî qala xwe bikî?


Navê min Şivanê Keleş. Ez 20 salî me. Ez li bajarê Qamişloyê mezin bûme û niha li Brîtanyayê dijîm û li zanîngeha Manchesterê di beşê çapemeniyê de dixwînim. Ez herwisa di beşê Zimannasiyê de bi Projeya Zaravayên Kurdî re xebatê dikim. Ji sê salan û vir de ez bi gelek awayan bi ziman û wêjeya kurdî ve mijûl bûme, min gelek wergerên zanistî, wêjeyî, siyasî, çîrokî û dîrokî yên kurt wergerandine û hinek ji wan di malper û kovarên kurmançî de hatine weşandin. Ez niha jî di wergerên dirêjtir de dixebitim. Hezkirina min a ji kurmançî re ji kalik û pîrika min hatiye, min zaroktiya xwe bi wan re buhirandiye û wan gelek çîrok, çîvanok, listik û stranên kurmançî ji me re digotin ku bandoreke mezin li ser kesayetiya min kirine. Ez bawer im wê ew bandor di pêşerojê de di wergerên min de jî diyar be û di her xebat û berhemeke biçûk û mezin ku ez ji bo zimanê xwe bikim.

### Berhema dawî ya ku te bi kurdî guhdarî kiriye kîjan e?

Albuma kurdî ya dawî ku min guhdarî kiriye navê wê *Peşk* e.

### Ji bo çi te ev berhem guhdarî kir, tiştek heye ku bûbe sedema guhdarî kirina te?

Min ev berhem guhdarî kir û bala min kişiya wê ji ber ku li ser xuya bû ku ew ê helbestên helbestvanekî kurdî resen bi awayekî modern û nûjenkirî pêşkêş bike. Herwisa, ji ber ku min gelek caran navê Broyê Omerî



bihîstibû û min dizanibû ku ew jî ji herêma ku kalik û pîrikên min jê hatine tê, lê tu carî delîv nebûbû ku ez berhemên wî bixwînim yan guhdarî bikim, û wî nas bikim.

### Te ev berhem çawa dît, tu dixwazî li ser berhemê çi bibêjî?

Ev albumek e ji du CDyan pêk tê û bi tevahî 23 tomar tê de hene. Albuma *Peşk* ji bo bîranîna nivîskar û helbestvanê kurd Bro Omerî (1942-2007) hatiye amadekirin, û hemû stranên wê ji helbest û pexşanên wî hatine çêkirin. Du tomarên dengê Bro Omerî bi xwe di albumê de hene, û 21ê din jî berhemên mûzîkî ji aliyê hunermendên kurd ên navdar û ciwan in.

Min ev berhem bêhemdî xwe li firoşgeheka mûzîkê li Stenbolê dît, bala min kişand û min xwest ez bi riya wê hinekî li ser Broyê Omerî nas bikim. Ez dikarim niha li ser helbest û pexşanên Broyê Omerî bêjim ku du taybetmendiyên wan ên -ji min re- ge-

lekî balkêş hene; yek ji wan ew e ku her dem êşek di wan de heye. Dema ku Broyî digot: *Erê dilo, lo dilo, Agir kete sênca çilo, Dinya alem bûne dewlet, Kurdistana min ma wilo*; zimanê kurdî li Tirkiyê hîn jî bi gelek awayan qedexe bû, fikra Kurdistanê bi tundî dihat bînpêkirin, loma jî di gotin û rêzên berhemên wî de diyar e ku kezeba wî bi rewşa kurd û Kurdistanê dişewitî dema ku ev nivîsên xwe dinivîsandin.

Taybetmendiyêke din a berhemên wî jî; ev e ku gelek caran bi devoka xwe ya sade û resen dinivîsand, bi omerkiya xwe ya malê, ya gundê xwe, ya dê û bavê xwe û kalik û pîrika xwe. Çiqasî bi raman û berhemên xwe nûjen û modern bû jî, nedihîşt ku ev nûjenî bandoreke mezin li ser paqijî, resenî û hêsaniya zimanê wî bike, yanî em dikarin bêjin Broyê Omerî nivîskar/helbestvanekî bi ramanên xwe nûjen e û bi ziman û dilê xwe omeriyekî resen e.

Stranên di albomê de jî, yên ku ji aliyê 21 hunermendên kurd ve hatine çêkirin, gelek caran li ser vê rêbazê diçin. Di awaz û tonên

wan stranên de mirov gelek caran bala xwe dide du şêwazên mûzîkî yên ku ji hev cuda ne lê bi hev ve xweşik hatine dirûtin; şêwazeke nûjen î modern ku mirovî nêzîkî nûjeniya gotin û hevokên Broyê Omerî dike, û şêwazeke kurdî yî resen û tije êş û jan ku mirovî dibê omeryan û rewşa kurd û Kurdistanê û kula dilê nivîskarê wan rêzan li ber guhdarvanî radixe.

### **Tu dixwazî tiştêkî ji xweyê berhemê re bibêjî?**

Ez dixwazim ji stranvan, hunermend, mûzîkjen û amadekerên vê berhemê re bêjim destên we sax bin. Û ez dixwazim ji Bro Omerî re jî bêjim ku ez hêvîdar im bêhtir nivîskar, helbestvan, wergêr û wêjevanên me kurmancan li ser rêbaza te bin û bi zimanekî bixebitin ku li ser kalik û pîrikên me jî ne zehmet be, û ji aliyekî din ve xwendevan û şagirt jî karibin bi her awayê zanistî û wêjeyî di jiyana nûjen de bi kar bînin.

(Kübra Sağır)

هه‌وایێ وێسێ  
 بێگێ



# R A P I R S Î

• **KUBRA OZEK** / *Zanîngeha Artûklûyê, Ziman û Edebiyata Kurdî*

**Neteweperwerî çî ye? Tu çî ji neteweperweriyê fam dikî?**

Neteweperwerî, wekî ku em ji peyvê jî fam dikin evîndariya li hember gel e. Neteweperwerî li gor min ev e yanî hez kirina dijî gelê xwe. Ev hez kirin bes ne hestek e, xwedîlêderketina ziman, çand, huner hwd. jî di nav xwe de dihevine.

**Heta îro te li ser neteweperweriyê çî xwendine?**

Bi rastî wekî min got, li gor min, neteweperwerî ji her alî ve xwedîlêderketin û hezkirina netewe, ziman û çandê ye. Ji ber ve yekê tiştên ku min li ser neteweperweriyê xwendine ez goriya çî krîterê bikim nizanim lê dikarim bêjim ku min gelek tez, gotar nexwendine. Lê min *Hawarê* xwendiyê (bi taybetî Celadet Êlî Bedirxan) wek çavkanî jî min *Hawarê* ji xwe re girtiye. Pirtûk û nivîsên Îsmail Beşikçi, hin pirtûk û filmên lîderan jî dixwînim dişopînim.

**Bi ya te divê em neteweperweriya kurd çawa tarîf bikin?**

Neteweperweriya kurd, xebatên ku ji bo hebûn û yekîtiya gele kurd hatine kirin in. Yanî xebatên ku ji bo hebûna gel tînin kirin -ji axaftina ziman heya hezkirina welat û çandê-hemû bîngeha neteweperweriya gel pêk tînin.

**Dema tu li neteweperweriya kurd difikirî kî tê bîra te?**

Ev pirs hinek talûke ye bi rastî. Ji ber ku ez behsa kîjanê nekim ê bibe neheqî. Lê evên vêga tîne bîra min ev in; Qazî Mihemed, Celadet Bedirxan, Ehmedê Xanî, Abbas Valî, Amir Hassanpour, Ebdulla Peşêw, Ebdula Goran, Pîremerd, Musa Anter, Hecî Qadîrê Koyî, Celîlê Celîl, Îsmail Beşikçi, Cegerxwîn..hwd.

**Bi ya te bo Kurdistanê çareseriyek çawa lazîm e?**

Xwedê nizam :) Ez dikarim bêjim divê em pêşî mafên ku jixwe ê me ne dest bixin, perçebûna kurd û Kurdistanê, jeopolîtîka cografya Kurdistanê çareser bikin, dewletbûna Kurdistanê..hwd.

Lê bi ya min mesele meseleya hebûnê ye û hebûna gelekî jî, ji ziman pêk tê. Ne ji alî akademîyê ve dibêjim. Bêguman akademî ji bo zimanê me tiştê herî girîng e. Lê ya ku ez dibêim zimanê axaftinê ye. Kurd bi zimanê xwe dikarin hebûna xwe pêk bînin û berdewam bikin. Axaftin û xwedîlêderketina ziman ê dewletbûnê bi xwe re bîne. Ji ber ku bîngeh ziman e û ziman ; zanîn, çand, huner, siyaset.. hemû tiştî bi xwe re tîne.

• **ZOZAN YAŞAR** / *Zanîngeha Stenbolê, Zanista Siyasetê û Têkiliyên Navnetewî*

**Neteweperwerî çî ye? Tu ji neteweperweriyê çî fahm dikî?**

Neteweperwerî hezkirin û parastina axa xwe ye, ku di dîrokê de gelek netewe bi wê awayê xwe dane nasîn.

**Heta îro te li ser neteweperweriyê çî xwendine?**

Min li ser neteweperweriyê nêrînên Anthony D. Smith, Benedict Anderson, Ernest Gallner, Îsmail Beşikçi û Umut Ozkirimli xwendin.

**Bi ya te divê em neteweperweriya kurd çawa tarîf bikin?**

Divê neteweperweriya kurd tenê ne xwe-parastin be di heman demê de divê yekgirtî û bi bandor bê tarîf kirin.





### **Dema tu li ser netewperweriya kurd di-fikirî kî tê bîra te?**

Ismail Beşikçi.

### **Bi ya te ji bo Kurdistanê çareseriyek çawa lazim e?**

Çareseriyê yekbûyî û hevgirtî pêwîst e. Mixabin îro netewperwerên kurd nikarin bandoreke baş li ser civakê çekin ji ber ku zimanê neteweperiyê şaş tê bikaranîn.

• **SEYYID YILDIZ / Mimar Sinan**

*Güzel Sanatlar Üniversitesi, Radyo Sinema û Televizyon*

### **Netewperwerî çî ye? Tu ji netewperweriyê çî fahm dikî?**

Neteweperestî an jî neteweperwerî ev e ku netewekî li ser berjewendiyên xwe ew bi xwe biryar bide, berjewendiyên neteweya xwe jî berjewendiyên neteweyên din girîngtir bibîne.

### **Heta îro te li ser netewperweriyê çî xwendine?**

- *Kürt Milliyetçiliğın Tarihi, Kökenleri ve Gelişimi*, Wadie Jwaideh

- *Kürt Milliyetçiliğının Kökenleri*, Abbas Vali

- *Kürt Millet Hareketleri ve Irak'ta Kürdistan İhtilali*, Dr. Şivan

### **Bi ya te divê em netewperweriya kurd çawa tarîf bikin?**

Netewperweriya kurd, netewperweriyek e ku dewa mafê xwe yê tayîna qedera xwe dike û li hember neteweyên din daxwazên wê yên agresîf û belavbûnê tune ne.

### **Dema tu li ser netewperweriya kurd di-fikirî kî tê bîra te?**

Hem jî ber ku di tarîxa modern de cara ewil daxwaza dewletê pêk aniye û hem jî ji ber sekna xwe ya serbilind û birûmet, sembola netewperweriya Kurd Qazî Mihemmed e.”

### **Bi ya te ji bo Kurdistanê çareseriyek çawa lazim e?**

Di çarçoveya mafê tayînkirina qedera xwe ya neteweyan de çareseriyê ku neteweya kurd karibe qedera xwe bi xwe tayîn bike lazim e.

• **ABDULLAH / xwendekar**

### **Netewperwerî çî ye? Tu ji netewperweriyê çî fahm dikî?**

Wexta endamên neteweyekî ji nirxên xwe yên bingeîn ên ku wan dikin netew tawîz nedin ev dibe netewperwerî.

### **Heta îro te li ser netewperweriyê çî xwendine?**

*Hayali Cemaatler*-Benedict Anderson

Nivîsên İhsan Fazlıoğlu û Mustafa Özel

*Kürt Milliyetçiliğının Tarihi Kökenleri ve Gelişimi*-Wadie Jwaideh

### **Bi ya te divê em netewperweriya kurd çawa tarîf bikin?**

Netewperweriya kurd heta sedsala dawîn jî bi awayekî xurt hatiye û kûr bûye jî lê weke hemû neteweperweriyên din di vê çaxê de ku li dinyayê gelek tişt digûherin li ser nirxên ku tawîz bide hişê wê tevlihev e.

### **Dema tu li ser netewperweriya kurd di-fikirî kî tê bîra te?**

Ehmedê Xanî, Mele Mistefa Barzanî, Qazî Mihemed, Şêx Ubeydûllahê Nehrî, Şêx Seîd.

### **Bi ya te ji bo Kurdistanê çareseriyek çawa lazim e?**

Bi ya min hewce nake mirov bêje “Eger hûn nebin yek hûne herin yek bi yek”. Ne mîmkun e ku di neteweyekê de her kes bêyî pirs-girêk li dora armanekî kom bibe. An di nav wê neteweyê de wê kesên bihêz belengazan bipelçiqînin û wek ku yekîti heye xuya bike an jî wê kesên ku cuda difikirin di nav xwe de tawîzan bidin hev û li hev bikin. Divê takekes ev pênaseya ku min li jor nivîsand bînin cih da ku alîkariya vê rêyî bikin.

(Kübra Sağır)

---

---

---

---

---

---

---

## JI BO HEJMARA YANZDEMÎN

- Bo hejmara 11mîn hûn dikarin nivîsên xwe yê derbarê sînema, wêje, muzîk, sînema, şano û hunerên din û hemû şaxên zanistên civakî bişînin.
- Nivîsên bê şandin divê li ser wordê bin; jêgirtin û çavkanî divê bi stîla MLA an APAYê bîn nivîsandin. (bo van rêbazan bnr. Ferzan Şêr, “Rêbera Rêbazên Nîşandayina Çavkaniyan”, Kovara Zarema, hej. 5, sal: 2015, r.173-184)
- Di destpêka nivîsê de divê **puxteyek bi kurdî û îngilîzî** (abstract) ku fikr û ramanên nivîsê diyar dikin bê nivîsîn ku herî kêr 120, herî zêde ji 140 peyvan pêk bê.
- Li bin puxte û abstractê divê **4-5 peyvên sereke** (key words) bîn nivîsîn.
- Gotar divê mebesta wan zelal bin, analîtîk bin û ne dubare bin; tê de heqaret, nijadperestî û zayendperestî tunebe.
- Biryara weşandina nivîsan lijneya weşanê dide.
- Dema dawî bo şandina nivîsan: 25ê Tîrmeha 2017an.
- Dema belavkirina hejmara dehemîn: 1ê Îlona 2017an